

KT

Zanîngeha Mardîn Artûklûyê Enstîtuya

Zimanên Zindî yên li Tirkiyeyê Şaxa

Makezanista Ziman û Çanda Kurdî

Teza Lîsansa Billind

MONOGRAFIYA ÇANDA GEL A DÊRIKA ÇIYAYÊ MAZÎ

Emre Ece

12711027

Mêrdîn - 2017



TC

Mardin Artuklu Üniversitesi

Türkiye’de Yaşayan Diller Enstitüsü

Kürt Dili ve Kültürü Anabilim Dalı

Yüksek Lisans Tezi

DERİK HALK KÜLTÜRÜ MONOGRAFİSİ

Emre Ece

1271107

Tez Danışmanı

Yrd. Doç. Mustafa ASLAN

Mardin 2017

TAAHHÜTNAME

TÜRKİYE'DE YAŞAYAN DİLLER ENSTİTÜSÜ MÜDÜRLÜĞÜNE

Mardin Artuklu Üniversitesi Lisansüstü Eğitim-Öğretim ve Sınav Yönetmeliğine göre hazırlamış olduğum “Monografiya Çanda Gel a Dêrikê” adlı tezin tamamen kendi çalışmam olduğunu ve her alıntıya kaynak gösterdiğimi ve tez yazım kılavuzuna uygun olarak hazırladığımı taahhüt eder, tezimin kağıt ve elektronik kopyalarının Mardin Artuklu Üniversitesi Sosyal Bilimler Enstitüsü arşivlerinde aşağıda belirttiğim koşullarda saklanmasına izin verdiğimi onaylarım. Lisansüstü Eğitim-Öğretim yönetmeliğinin ilgili maddeleri uyarınca gereğinin yapılmasını arz ederim.

Tezimin tamamı her yerden erişime açılabilir.

Tezim sadece Mardin Artuklu Üniversitesi yerleşkelerinden erişime açılabilir.


Tezimin ... yıl süreyle erişime açılmasını istemiyorum. Bu sürenin sonunda uzatma için başvuruda bulunmadığım takdirde, tezimin tamamı her yerden erişime açılabilir.


19/09/2017


Emre ECE

KABUL VE ONAY

Emre Ece tarafından hazırlanan “Monografiya Çanda Gel a Derika Çiyayê Mazî” adındaki çalışma, 24.08.2017 tarihinde yapılan savunma sınavı sonucunda jürimiz tarafından Kürt Dili ve Kültürü Anabilim Dalı, **YÜKSEK LİSANS TEZİ** olarak oybirliği / oyçokluğu ile kabul edilmiştir.

Yrd. Doç. Dr. Necat KESKİN 
(Başkan)

Yrd. Doç. Dr. Canser KARDAŞ 

Yrd. Doç. Dr. Mustafa ASLAN 

Onay
Enstitü Müdürü
Doç. Dr. M. Nesim DORU

PÊŞGOTIN

Di nav hezar salan de mirov di encama ceribandinên jiyane de rê û rêbazên xwe yên her aliyê jiyane ava dikin, berhemana diafirînin. Ev jî dibe folklorê wan mirovan. Fikreke em li ser digêhêjin hev ew e ku folklorê miletan rengvedana hest, raman, zanîn û jiyana wan e. Yanî folklor neynika jiyana gelan e. Bi berhevkirina ûnsûrên folklorîk em jiyana xwediyê wê çandê ya wê serdemê qeyd dikin. Bi tesnîf, tehlîl û şîrovekirina wan ûnsûran jî hest û ramanên civaka aferînerê wan bi hûrgilî tên veçirandin. Herwiha di derbarê jiyana wê civakê de agahiyan girîng tên bidestxistin. Di encamê de tiştên ku di bingeha ûnsûrên folklorîk cih digrin bi awayekî zelal derdikevin holê.

Analîz û senifandina ûnsûrên folklorîk li gor rê û rêbazên zanistî bi pêşengiya Birayên Grîmm di sala 1812 an de li Elmanyayê bi weşandina çîrokên gelêrî ketiye merhaleyeke nû. Di pê re Fînîyan bi Destana Kalavela, ku di 1835 an de hat weşandin, ruh dane netewekî wendabûyî. Welatên din jî bi berhevkirin, tehlîl û xebatên avahîsaziya berhemên folklorîk ne kêmtî Fînîyan e. Di nava kurdan de jî serê sedsala 20 an û vir de girîngiya folklorê bêhtir hatiye fam kirin û hewlên nêzîkbûna folklorê bi zanistên hemdem re derketine pêş.

Xebatên Mela Mehmûdê Bazîdî yên bi navê “Adat û Rusûmatnameê Ekradiyê” û “Cami’eya Risaleyan û Hikayetan Bi Zimanê Kurmancî” yek ji metnên ewil in ku di van metinan te zanayekî kurd, bi awayekî berfireh li ser folklorê kurdî sekinîye. Ji xeynî xebatên wî heta îro çî zanyarên kurd, çî jî kurdnasên biyanî û rojhilatnasan rasterast xebat li ser folklorê kurdan kirine. Gelek heban xebatên xwe kirine pirtûk. Herwiha gelek kovar û meqale hatine weşandin; tez di vî warê de hatine amadekirin. Digel xebatên zanyaran ên zanistî û akademîk, herwiha jî hêla kesên bi folklorê re mijûl dibin berhevokên li ser keresteyên folklorê kurdî hatine amadekirin jî gelek in.

Li zanîngehan lêkolînên li ser folklorê tên kirin yek jê bi wî rengî ye ku ji sehayekê digel nîşandayina çavkaniyên zindî berhevkirin, tesnîf û qeydkirina keresteyan e. Di van xebatan de li ser amûrên folklorîk ên sehayê xebatê berfirehî lêkolînên tên kirin, bi riya tehlîl û tenkîdan hinek encamên tên derxistin. Bi navekî din, ji vî cureyê re “Monografîya çanda gel” tê gotin. Monografîyên çanda gel ne ew xebat in ku tenê li ser zargotinê ne. Çanda gelan bi tevahî dide pêş çavan. Xebatên bi vî rengî wêneyên nivîskî yên serdema xwe ne. Di salên dawî de li zanîngehan, li ser sehayên kurd lê dijîn xebatên monografîk çêdibin; lê gelekên wan ne bi kurdî ne. Weke mînak Amed, Erxênî, Midyad û Islahiye ku piraniya şênîyên wan kurd in tezê lîsansa bilind ku li ser çanda gel a van bajaran hatine amadekirin bi Tirkî ne. Lê ûnsûrên çanda gel bi zimanê xwe yê esasî were qeydkirin wê ji bo lêkolîneran çêtir be.

Navçeya Mêrdîn, Dêrika Çiyayê Mazî sehayê me ya xebatê ye. Gund bi gund, li hemû qadên bajêr em li pêy şopa çanda gelê Dêrikê geriyan. Çi tiştên ku xwedî buhayê çanda herêmê ne heta ji dest hat me ew berhev kirin. Em hêvî dikin xebatên di vî warî de zêdetir werin kirin da ku ûnsûrên folklorê yê ji me re mîrat mane, têkeve nav dînamîzma huner û edebiyatê.

Di dawîya gotine de ez spasîyên xwe di serî de ji rêzdar Alk. Doç. Mustafa Aslan re dişînim ku bi eleqeyek mezin bi min re bûye alîkar û bi şeweyên akademîk her daîm rê nîşanî min daye. Dîsa çî li gundan, çî jî li navenda Dêrikê hemû kesên bi sebra xwe û bi mêvanperweriya xwe ez hewandim û zanînen xwe bi min re parve kirin ez minetdarim ji wan re. Mamoste Ramazan Çetin ku di warê rastnivîsî de bûye alîkar em spasîyên xwe dişînin ji wî re. Di dawî de hevsera min Zeliha, dîya min Zibêde û lawikê min Muhammed ku her daîm wan ez teşwîqî vî karî dikirim ez mal avaya wan jî dikim.

Emre ECE

KURTE

Di vê xebatê de navçeya Mêrdînê Dêrika Çiyayê Mazî û gundên derdora wê wekî navend hatine girtin. Ji xeynî beşa yekem ku agahiyên derbarê metod û teknîkên di tezê de hatine bikaranîn tê dayin, xebat ji sê beşên sereke pêk tê. Di beşa duyem de sehaya xebatê hatiye nasandin. Di beşa sêyem de adet û toreyên herêmê û ji serdemên jiyana mirovan zayin, zewac, mirin; cejn û rewresm, zanyariyên gelêrî, awayên xeml û girêdanê, bîr û baweriyên gelêrî û lîstikên gelêrî yên xort û zarokan ên herêmê mijarên sereke ne ku hatine lêkolînkirin.

Di vê beşa sêyem de ewil agahî ji çavkaniyên nivîskî yên berê, digel yên wekî din, bi taybetî ji yên di derbarê folklorê kurdan de ne hatine dayin. Bi vê sayê hatiye xwestin ku têkilî û guherînên çanda herêmê bi berawirdkirina agahiyên di van çavkaniyan re derkeve holê û mijar bi hêsanî hîna çêtir werin şîrove kirin.

Beşa çarem di derbarê edebiyata gelêrî ya herêmê de ye. Di serê van keresteyên pexşanî û yên bi nezm de ewil agahiyên kitêbî hatine dayin, piştê di bin siwana wan agahiyan de ew kereste hatine şîrove kirin. Keresteyên ji kesên çavkanî hatine bidestxistin li gor teşe û naveroka xwe bi rêza alfabetîk hatine senifandin. Di derbarê naverok û teşeyên wan de îzahat hatine kirin.

Di encama van lêkolînan de hatiye dîtin ku çanda herêmê ya îro û çanda kurdan ya demên borî, ku em bi riya metnên beriya xwe ji wan agahdar dibin, bi têkiliyeke xurt bi hev re girêdayine. Herwiha di çanda herêmê de bandora çanda gelên din ên bi sehayê re têkildarin jî çêbûne. Dîsa tê famkirin ku erdnigariya sehayê û şertên jiyane jî di qewimîn û stewbûna vê çandê de xwedî cihêkî taybet in.

Bêjeyên sereke: Dêrik, monografi, edebiyata gelêrî, çanda gel

ÖZET

Bu çalışmada Mardin'in Derik ilçesi ve onun civar köyleri esas alınmıştır. Tezde kullanılan metod ve teknik hakkında bilgilerin aktarıldığı birinci bölüm hariç, çalışmamız üç ana bölümden oluşmaktadır. İkinci bölümde çalışma sahası tanıtılmıştır. Üçüncü bölümde yörenin töre ve adetleri, insan yaşamının geçiş dönemlerinden doğum, evlilik ve ölüm; bayram ve törenler, halk bilimleri, giyim ve süslenme biçimleri, halk inançları ve bölgenin anonim genç ve çocuk oyunları incelenen esas konulardandır.

Bu bölümde ilkin konuyla ilgili bilgiler, önceki yazılı kaynaklardan verilmiştir. Diğer kaynakların yanı sıra özellikle kürt folkloru ile ilgili kaynaklardan yararlanılmıştır. Bölgenin kültürel değişikliklerinin bu kaynaklardaki bilgilerle mukayese edilerek ortaya çıkması ve bu sayede konunun daha kolay yorumlanabilmesi amaçlanmıştır.

Dördüncü bölüm ise bölgenin halk edebiyatı hakkındadır. Düzyazı ve nazım biçiminde olan bu ürünlerin başında evvela kitabi bilgiler verilmiş, daha sonra bu bilgiler ışığında ürünler yorumlanmıştır. Kaynak kişilerden elde edilen ürünler şekil ve içerik yönünden değerlendirilerek alfabetik sıraya göre sınıflandırılmıştır. Şekil ve içerikleri hakkında izahatlar yapılmıştır.

Bu araştırmalar sonucunda bölgenin bugünkü kültürünün, önceki metinler yoluyla haberdar olduğumuz eski dönem kürt kültürü ile yakın ilişki içerisinde olduğu belirlenmiştir. Aynı zamanda yörenin kültüründe saha ile ilgisi bulunan diğer halkların da etkisi olmuştur. Yine sahanın coğrafyasının ve yaşam şartlarının bu oluşum ve gelişimde özel bir yere sahip olduğu anlaşılmıştır.

Anahtar sözcükler: Derik, monografi, halk edebiyatı, halk kültürü

ABSTRACT

In this study; Derik district of Mardin and its surrounding villages have been taken as a basis. Our study consists of three main parts except for the first part where the information has been transferred about the method and technique used in the thesis. The study is composed of three main parts. In the second part the working site has been presented. In third part, the manners and customs of the region, the birth-marriage and death from the transitional period of human life, feast and ceremonies, folklores, clothing and adornment styles, folk beliefs and the region's anonymous child and teen games are the main topics which have been examined.

In this section, firstly, the informations about topic have been given from the previous written sources. In addition to other sources, it has been benefited from related to Kurdish folklore especially. It has been aimed that the cultural changes of the region have been revealed by comparing them with the information in these sources and they can be interpreted more easily.

The fourth part is about the region's folk literature. At the beginning of these products, which are in the form of prose and poetry, firstly, the book information have been given. And then the products have been interpreted in the light of these informations. The products obtained from the sources have been classified according to alphabetical order by evaluating in terms of form and content. Some explanations about the figure and content has been made.

As a result of these studies, it has been stated that the region's current culture is closely related to the old Kurdish culture that we are aware of through previous texts. It is influenced by other folks interested in the area of the culture of the region. It has been understood that the geography of the area and living conditions have a special place in this formation and development.

Keywords: Derik, monography, folk literature, folk culture

NAVEROK

PÊŞGOTIN.....	I
KURTE.....	III
ÖZET.....	IV
ABSTRACT.....	V
LÎSTEYA TABLOYAN.....	XI
LÎSTEYA WÊNEYAN.....	XII
KURTEBÊJE.....	XIII
DESTPÊK.....	XIV

BEŞA YEKEM

MIJAR ARMANC Û RÊBAZ

1.1. Mijara Lêkolînê.....	1
1.2. Armanc û Giringîya Lêkolînê.....	2
1.3. Çarçoveya Lêkolînê û Sînorên Xebatê.....	2
1.4. Rêbaza Lêkolînê û Teknîkên Hatine Bikaranîn.....	3
1.5. Pirsgirêk û Astengîyên Lêkolînê.....	5

BEŞA DUYEM

DANASÎNA SEHAYA XEBATÊ

1.1. Dîroka Sehaya Xebatê.....	6
1.2. Taybetiyên Erdnîgarî yên Sehaya Xebatê	9
1.3. Aboriya Sehaya Xebatê	10
1.4. Çandinî û Sewaldarî li Sehaya Xebatê	11
1.4.1. Zeytûnên Dêrikê.....	12
1.5. Serjimara Sehaya Xebatê, Komên li Herêmê.....	13
1.5.1. Kurdên Kurmanc.....	13

1.5.2. Kurdên Zaza	13
1.5.3. Ermenî.....	14
1.5.4. Tat.....	15
1.6. Mezhebên li Sehaya Xebatê.....	15
1.7. Eşîr û berên li Sehaya Xebatê.....	15
1.8. Perwerdeya sehaya Xebatê.....	17
1.9. Rola Sehaya Xebatê ya di Hawarê de	18

BEŞA SÊYEM

ÇANDA GEL A DÊRIKÊ

1. ADET Û TORE	20
1.1. Dada Ûrfî û Çareserkirina Kêşeyên Civakî	21
1.1.1. Mêr kuştin	22
1.1.2. Keç Revandin.....	24
1.1.3. Sond Dayin.....	26
1.2. Çend Mînak ji Kevneşopiyên Herêmê.....	28
1.2.1. Berdêlî.....	28
1.2.2. Kirîvantî.....	30
1.2.3. Bêşkirin.....	32
1.2.4. Palûte	34
1.2.5. Şopgerandin/Şopajotin.....	35
1.2.6. Pêşwazîkirin û Birêkirina Mêvanan.....	37
2. SERDEMÊN JIYANÊ	38
2.1. Zayin.....	39
2.1.1. Dermankirina kordûndetiyê.....	39
2.1.2. Pîreka Zêstanî û Dergûşa wê.....	40
2.1.3. Navik Birrîn.....	41

2.1.4.Heftek.....	42
2.1.5.Navlêkirin.....	43
2.1.6.Diranên Ewil.....	44
2.1.7. Meşa Ewil û Kostekberrîn	45
2.1.8.Şîrvekirin.....	46
2.1.9.Sinetkirin.....	47
2.2.Zewac.....	48
2.2.1. Pêvajoya Berî Dawetê û Hinek Şêweyên Zewac..ê	48
2.2.2.Temenê Zewacê.....	49
2.2.3. Lêgerîna li Bûkekê.....	49
2.2.4.Xwestina Keçikê.....	50
2.2.5. Çûna Xwazgînî.....	50
2.2.6. Qelen.....	51
2.2.7. Xelat	53
2.2.8. Şêrani/ Dergîstîbûnî.....	54
2.2.9. Awayê Dawetan.....	55
2.2.10. Hine.....	57
2.2.11. Nanê Dawetê.....	57
2.2.12.Dema Dawetê.....	58
2.2.13.Peza Aziban.....	59
2.2.14.Berderî.....	60
2.2.15.Mehr berrîn.....	61
2.2.16.Şeva Zavatiyê.....	61
2.2.17. Sebahî.....	62
2.2.18. Zeyî.....	62
2.3.Mirin	63
2.3.1.Berî mirinê.....	63

2.3.2.Dema mirinê.....	65
2.3.3.Definkirin.....	65
2.3.4.Şîn/ Azayî.....	67
2.3.5. Îsqat.....	69
3.CEJN Ê REWRESM.....	70
3.1. Newroz.....	70
3.2. Cejnên Dînî	72
3.3. Sersal	74
3.4. Çûnûhatina Hecaciyan.....	76
3.5. Nimêj û Dia Baranê.....	77
4. ZANYARIYÊN GELÊRÎ.....	78
4.1. Hekîmtiya Gelêrî.....	78
4.1.1.Hekîmên Gelêrî ên Herêmê.....	80
4.1.2. Cureyên Nexweşiyên û Tedawiya Wan.....	80
4.2.Beytariya Gelêrî	86
4.2.1.Beytarên Gelêrî ên Herêmê	87
4.2.2.Rê û Rêbazên ji bo Parastina Siheta Sewalan.....	87
4.2.3.Tedawiyên Nexweşî û Birînan.....	88
4.3. Salnameya Gelêrî.....	90
4.3.1. Binavkirina Roj, Meh û Demsalan.....	91
4.3.2.Heyamên Di Nav Salê de.....	92
4.3.3.Stêrknasiya Gelêrî.....	100
4.3.4. Awayê Diyarkirina Rojbûnên Mirovan.....	101
5. AWAYÊN XEMLÊ Ê CILÛBERG	103
5.1.Awayê Xemlên Gelêrî	103
5.2. Cilûberg	108
5.2.1. Cilûbergê Jinan.....	108

5.2.2. Cilûbergê Mêran.....	110
6.BÎR Û BAWERİYÊN GELÊRÎ.....	112
6.1. Baweriyên Derbarê Nezerê.....	112
6.2. Baweriyên Derbarê Êcax, Tirb û Cihê Ziyaretan.....	115
6.3. Baweriyên Derbarê Ajalan.....	118
6.4. Baweriyên Derbarê Jiyana Rojane.....	120
7. LÎSTIKÊN GELÊRÎ YÊN XORT Û ZAROKAN.....	121
7.1 Li Dêrikê Awayê Hinek Lîstikan.....	122
7.2. Lîstikên Sereke yên Herêmê.....	123

BEŞA ÇAREM

EDEBIYATA GELÊRÎ

1.EDEBIYATA GELÊRÎ YA DÊRIKÊ.....	128
1.1. Cureyên Pexşanî.....	129
1.1.1. Çîrçîrok.....	129
1.1.1.1. Çîrçîrokên Lehengên Wan Heyinên ji Xeynê Mirovan in.....	131
1.1.1.2. Çîrçîrokên Lehengên Wan Mirov in.....	136
1.1.2. Pêkenokên Gelêrî.....	148
1.1.3.Memorat.....	154
1.1.4.Efsane	157
1.1.5. Biwêj.....	158
1.1.6.Gotinên Pêşyan.....	177
1.1.7.Têgehên Sondxwarinê.....	189
1.1.8.Nifir-Dia.....	192
1.1.9. Gotinên qalibgirtî	200
1.1.10.Nav û nûçik	203

1.2. Cûreyên bi Nezm.....	208
1.2.1. Zûgotinok.....	208
1.2.2. Mamik.....	220
1.2.3. Dûrik.....	225
1.2.4. Lorîk.....	229
ENCAM.....	232
ÇAVKANÎ.....	237
LÎSTEYA KESÊN ÇAVKANÎ.....	241
PÊVEK.....	243
Pêvek 1. Wêneyên Dêrik û Dêrdora wê.....	243

LÎSTEYA TABLOYAN

Tablo 1: Heyamên di Nav Salê û Demên Wan

Tablo 2: Rêjeya Bikaranîna Cureyên Xemlên Herêmî

Tablo 3: Rewşa Cilûbergên Mêrên Dêrikî

Tablo 4: Berawirdkirina Pêşgotinên Herêmê û yên di Jînê de



LÎSTEYA WÊNEYAN

- Wêne 1:** Ji taxa çiyê dîmenek Dêrikê
- Wêne 2:** Sewalvanên hiriya beranê xwe dibirrin
- Wêne 3:** Atolyeyeke sabûna zeytûnan
- Wêne 4:** Nanê daweteke Dêrikiyan
- Wêne 5:** Li Qizilê ciwanên li meydana gund dilîzin
- Wêne 6:** Ermen-Îsewiyekî Dêrikî û Emre Ece
- Wêne 7:** Li bejahiya bajêr kon û pezê koçeran
- Wêne 8:** Dermanê bayê sor
- Wêne 9:** Awayê deqandina jinan li Dêrikê
- Wêne 10:** Girêdana bi kitanê ya jinek Dêrikî
- Wêne 11:** Dîmenek ji Maşmaşkê
- Wêne 12:** Peykerê Xeto û Remo li meydana bajêr
- Wêne 13:** Deriyê Dêra Sor
- Wêne 14:** Zarokên li kolanan dilîzin
- Wêne 15:** Rewresmeke mirî veşartinê
- Wêne 16:** Dahnok

KURTEBÊJE

Amd.	: Amadekar
c.	: Cild
DB	:Dêrik Biwêj
DÇ	:Dêrik Çîrçîrok
DD	:Dêrik Dia
DDÛ	:Dêrik Dûrik
DE	:Dêrik Efsane
DL	:Dêrik Lîstik
DLO	:Dêrik Lorîk
DM	:Dêrik Mamik
DME	:Dêrik Memorat
DN	:Dêrik Nîfir
DNN	:Dêrik Nav û nûçik
DP	:Dêrik Pêkenok
DPÊŞ	:Dêrik Pêşgotin
DZ	:Dêrik Zûgotinok
j.	:Jimare
r.	: Rûpel

DESTPÊK

Di roja me de herçiqas ziman û nijadê miletan ji hev cihê bin jî, awayên jiyânê di gelek waran de bûne wekhev û çandê hevpar a gerdûnî derketiye holê. Ji bo ku em bandora vê rewşê ya li ser civakê fam bikin monografiyên gund û bajaran rênîşanin baş in. Belê divê bi awayekî sistematîk û zanistî agahiyên folklorîk ji çavkaniyên diyar werin komkirin. Em jî dixwazin di vî warî de kevîrekî deynin ser dîwarê folklorê kurdî.

Bi bandora pêşveçûnên li cihanê diqewimin, di awayê jiyana gelê kurd de jî guherîn çêbûne. Buka wan a ku di zemanekî de “Li ser hespê bû, kesî nizanîbû kismetê kê bû” îro ji hespan daketiye û li otomobîlan siwar bûye. Destar, mîrkuç, tevn û meşkê cihê xwe dane mekîneyên teknolojîk. Dengbêj hew êvaran li odeyan rûdinên û distrên. Ev hemû nîşan didin ku folklor di nav lebat û guherînê de ye. Gelo bûka ku îro li balafirê an li otomobîlê siwar hatiye, ji bo wê jî tiştêkî gotine heye; hebe çawa ye? Çimkî folklor her daîm reng vediguhere, bi bermayên beriya xwe re di merheleyên nû derbas dibe û roj bi roj dikemile. Divê em bizanibin gelê Kurd, ku xwedî çandê kevînar tî zanîn, îro sermiyanê xwe yî çandî çawa xerc dikan.

BEŞA YEKEM

MIJAR ARMANC Û RÊBAZ

1.1. Mijara Lêkolînê

Mijara vê teza ku me amade kiriye monografiya navenda bajarê Dêrikê û gundên derdora wê ne. Bi vê xebatê em ê folklorê herêmê bidin ber çavan. “Di xebatên zanista gel de tiştên ewil ku ji zanyarê gel tê hêvîkirin hilbijartina mijarê û sehaya lêkolînê ye” (Artun, 2009: 35).

Ji ber ku awayekî lêkolîna ûnsûrên folklorîk yê gelan bi xebatên şeweya monografiyan çê dibin me hewl da ku em mînakekê di vî warî de amade bikin. Ev cure xebat serdema xwe bi gelek awayan dike nemir û rewşa wê serdemê vediguhêze nîfşên dinê. Dema em li xebatên edebî dinerin em dibînin ku di vî warî de gelek xebatên kirin. “...Di zanista gel ya tirkî de ji xeynî monografiyên ku motif û cure serkeftî tene bikaranîn, xebatên monografiyên gund, bajarok yan jî bajarên tene binavkirin belavbûye ku di van xebatan de li ser çanda gelê gund bajarok yan jî bajarok bi tevahî tê xebitîn” (Çobanoğlu, 2005: 54). Di xebatên bi vî rengî de jiyana kesên wê sehayê di warê civakî, aborî, edebî, bîr û bawerîyê bi awayekî zelal eşkere xuya dibe. Dîsa ji hêla dîtina tiştên hevpar ên bi herêmên din re, tiştên veşartî yê tenê li sehayê xebatê û parvekirina wan ya bi sehayên din re monografiyê dibe pirayek di navbeyna civakan de.

Sehaya xebata me Dêrika Çiyayê Mazî, him ne li ser riyên bazirganiyê ye û him jî zêde koç nestendiye. Ji ber vê jî mirov dikare ûnsûrên çanda gel ên ji

kevneşopiyê dawerivîne bêhtir li wir bibîne. Em ê di vir de bi nîşandayina çavkaniyên zindî û ji devê wan, ûnsûrên çanda kurdî ya vê deverê bi zimanê resen qeyd bikin.

1.2. Armanc û Girîngiya Lêkolînê

Tiştê ku ji hêla zanyaran weke pirsgirêk tê dîtin tesnîf û tehlîla berhevokên ûnsûrên folklorê kurdî ne. Me hewl da ku ûnsûrên çanda gel a Dêrika Çiyayê Mazî em bi lêkolînên zanistî biseniffîn û heta ji dest were bi rê û rêbazên zanistî tehlîl û tenkîda wan di bin banê vê tezê de bikin. Bi vî awayî wê baştir were dîtin ku bê bingeha beşeke çand û edebiyata kurdiya îroyîn çawa saz bûye. Ev keresteyên bikevin xizmeta nifşên nû êdî wê neyên jibîr kirin û wenda nebin. Bi vî awayî wê ev keresteyên folklorîk têkevin nav dînamîzma zimên û edebiyatê. Xebateke bi şêweya monografiyan wê çanda bajêr ji gelek hêlan ve rohnî bike.

1.3. Çarçoveya Lêkolînê û Sînorên Xebatê

Li Dêrikê û derdora wê kurdên Kurmanc û Zaza hene. Tenê şêniyên gundekî xwe weke "Tat" binav dikin û bi diyalekteke erebî dipeyivin henin. Dîsa digel du malbatên Îsewî, Ermeniyên bûne misilman li navçeyê dijîn.

Ji van şêniyên me li jor jimartine em li sehaya Sefiyan nexebîtîn. Ji xwe Sefî bi rabûn û rûniştina xwe û bi gelek hêlên din weke şêniyên Wêranşar û Sêwregê tevdişerî, lê ji hêla rêvebirîya fermî ve bi ser Dêrikê ve ne. "Tat" jî ji ber ku bi erebî dipeyivin li derveyî xebata me mane. Eger ne giş be jî elbet gelek endamên van koman ji ber ku di nav kurdên kurmanc de dijîn bi kurmancî jî dizanin. Eger hewce bike mirov nexşeyeke Dêrikê ya çandî derxîne, mirov dikare herêmê veqetîne sê beşên sereke:

1. Çanda Navenda Dêrikê: Li gorî wesîqeyan, ku em ê di pêşde jî nîşan bidin, li Dêrikê serjimareke mezin ya Ermeniyên hebû ku niha tê famkirin hinên wan koç kirine; hinên wan jî bûne Misilman û niha li bajêr dijîn. Kurdên Dêrikê û Ermenan bi hev re li bajêr çandek ava kirine. Ji xwe ji ber ku gelek Ermenî bûne misilman cudatiya çandên herdu milletan jî zêde nemaye. Ji xeynê van

herdu tebeqeyan bi koça gundiyên çiyê û gundiyên beriyê re, ku ewan jî kedek xistine nava vê çanda hevbeş, di bin esasiya çanda Dêrikanî de çandeke hevpar derketiye holê.

2. Çanda Gundên Dêrikê yên li Deştê: Bi gotineke din gundên beriyê, bi awayekî xurt bi Wêranşar û bi taybetî jî bi Qoserê re têkildar in. Çûnûhatin û bazirganiya wan bi van bajaran re ji ya bi navenda Dêrikê re pirtir e. Xanî û karxaneyên gelek gundiyan li van bajaran hene. Herwiha şênîyên van gundan ji ber van çûnûhatinan bi Eşîrên Erebi yên li Qoser û Wêranşarê; bi Êzdiyên li gundên Wêranşarê re jî di minasebetê de ne. Rewşa aborî ya van gundan ji gundên din yên bajêr gelekî çêtir e. Çanda van gundan dîsa di bin sîwana çanda Dêrikê de, lê bi hinek nuansên cihê çandeke hebekî cudatir e.
3. Çanda Gundên Çiyê: Ev gund ne nezî navendên mezin in. Dîsa riyên zîndewar yên biçûnehat dûrî van gundan e. Herwiha ji hêla aborî ve jî qelstir in ji gundên beriyê. Danûstendina wan him bi navenda Dêrikê re ye û him jî bi Amedê re ye. Ne dûrî Şemrexê ne jî. Di van şert û mercan de çandeke taybet, kû dîsa di bin tesîra çanda navenda Dêrikê de, li vir jî ava bûye.

Navenda Dêrikê û ji gundên wê yên em dikarin bivêjin, li gorî tesnîfkirina li jor, dikevin xala duduyan ên bi navê Maşmaşk, Remok, Qizil, Erbeta, Eynterî, Qesra Hisênê Qenco; Ji gundên em dikarin wan têxin xala sisiyan jî ên bi navê Xanûk, Kevirşîn û Birîniyê ew gund in ku me keresteyên çanda gel ji wan berhev kirin e. Yanî bi tevahî 9 gund ketine nav xebatê. Ji van gundan Birînî ku bi çanda Dêrikê re tevdigere, lê ji hêla rêvebirî bi ser Şemrexê ve ye. Kevirşînê ku me derfetê çuyina wê bidest nexist bi riya telefonê û kesên ku me ew ji Kevirşînê li Qoser an jî li Dêrikê kirine mêvan me agahî ji wan girtine. Li Wêranşar û Qoserê jî piştî salên nodî kesên ji van gundan koç kiribin û bicîh bûne gelek in. Me ew jî xistin nav çavkaniyên xwe.

1.4. Rêbaza Lêkolînê û Teknîkên Hatine Bikaranîn

Xala sereke ya xebatên monografiyan hevdîtînan rû bi rû yên bi kesên çavkanî re ne. Berî hevdîtînan me pirsên xwe amade kirin. Em bi çavkaniyên xwe re rûniştin, me hem bi pirsan hem bi riya sohbetê agahî bidestxistin. Rêbaza duduyan ya

xebata me bi riya çavdêriyê bû. Li sehayê weke çavdêrekî me hewl da em agahiyan bi zelalî û herî teze û aktuel qeyd bikin.

Ji bo ku mijara em li ser xebitîne ji her aliyan ve rohnî bibe me cure cure pirs amade kirin. Me hewl da ku bi her kesên beşên civakê re em hevditinan pêk bînin. Yanî keç, pîrek, law, zilam; xwende, nexwende; ciwan, kesên navsere û extiyar. Me ev jî piranî bi cih anî. Ji Qosera Mêrdînê bi wesayîte bi tevahî pênc caran em çûn navenda Dêrikê û van gundên bûne mijara xebatê. Di van çûnûhatinan de du caran em şevder li navendê man.

Bi taybetî me hevdîtînen xwe bi wan kesên ku ji hêla civakê weke pispor tîn naskirin re kirin. Ew kesên baldarî ser çanda hêrêmê ne û kevneşopiyan dişopînin, dîsa kesên pêşengiya civatê dikin û li gor çanda herêmê tevdişopînin em bi wan re rûniştin, me ew raçav kirin. Ew kes bûn çavkaniyên me yê sereke. Gelemerî me rewşa aniha ya îroyîn û serdest qeyd kiriye. Lê ji bo mijar xweştir were fam kirin di cihên hewce de rewşên berê jî ku me ji çavkaniyên xwe veguhastine, me nivîsandin. Bi taybetî di mijarên weke pêşgotin û biwêjan de me hewl da em bi riya çavdêriyê, digel bikaranîna wan ya di nav peyvê de em bikaribin wan qeyd bikin. Di lêkolînen xwe de me cih cih wêne kişandin. Çavkaniyên me yê ku destûr bidana bi riya cîhazan jî me dengê wan qeyd kirin, da ku agahî wenda nebin û neyên xelitandin.

Tixûbên sehaya ku em ê li ser bixebitin me ji berê de diyar kir û di derbarê wê de me ji komeleyên Dêrikiyan û hin kesên sehayê baş nas dikin alîkarî sitand. Beriya em derkevin sehayê em ketin lêgerîna lîteraturê û me bi riya xwendina çavkaniyên nivîskî amadekariyên xwe kir. Me nexşerêya xebata xwe digel xebatên wekî din piranî li gorî xebatên beriya xwe yê di derbarê folklorê kurdî de hatine kirin amade kir. Kataloka ku beşên folklorê kurdî bi rêk û pêk tê de cih digirin ya di dest de pirtûka bi navê “Ji Destpêkê Heta Niha Folklorê Kurdî” ye. Me hêmanên sereke yê teze ji vê çavkaniyê girtin. Herwiha pirsên ji çavkaniyan hatin pirsîn jî piranî me ji vê pirtûkê sitand. Elbet xalên ku di wir de cih nagirin û tîkildarî folklorê kurdî ne, me ji çavkanî û xebatên wekî din ên di warê zanista folklorê de ne girtin û me ew jî xistin naveroka xebata xwe. Dîsa teze di vî warê de yê di navenda dokumantasyonê ya YÖK ê de ne, di nav berhemên ku me sûd jê wergirtine cih digirin.

1.5. Pirsgirêk û Astengîyên Lêkolînê

Di serî de divê em bînin ziman ku ciwamêrî, mêvanperwerî û qedirnasiya gelê herêmê hêjayî behsê ye. Li deverên ku em diçûnê bi rûyekî bi ken em dihatin pêşwazî kirin û oxir kirin. Şêniyên bajêr û gundên wê eleqeyek mezin nîşanî xebata me dan û bi me re dibûn alîkar. Elbet carinan hinek astengî jî derketin. Bi taybetî kesên ku em nas nedikirin û em bêyî referans diçûn cem wan digel pêşwazîkirina bi dilgermî dema me mijara lêkolînê ji wan re vedikir bêdeng diman û nedixwestin agahiyên bidin me. Hinekên agahiyek bida me jî nedixwestin em navên wan binivîsînin. Dipirsîn: *“Ma ev ji bo çiye, tê navê me çawa bike, tiştêkî tahlûke be em napeyivin...”* her wekî din. Ji xwe qeydkirina deng bi tena serê xwe kêşeyeke mezin bû. Bi taybetî li gundan kişandina wêneyan jî ne ewqas hêsan bû. Mixabin gelê herêmê ji ber bûyerên siyasî hinekî bi gûman nêzî mijarê bûn. Me ev fam kir ku lêkolînvaneke bixwaze ji sehayê karê berhevkerinê bike divê bi şêniyên herêmê yê naskirî û xwedî xatir re têkiliyan deynin û bi nav û referansa wan biçe li sehayê bişuxule. Gelek caran me jî wiha kir.

Di warê berhevkerina keresteyan pirsgirêka sereke “jibîrkirina” keresteyan bû. Gelek kesên me hevdîtin bi wan re pêk anîn ji hişê xwe gazin dikirin û digotin ku wan gelek tişt ji bîr kirinin. Hinek tiştên dixwestin bibêjin carinan nedihat hişê wan. Yan jî nivco digotin. Elbet ev rewş ne ji bo her tiştî, lê di hinek mijaran de derbasdar bû. Hewla nivîsandina keresteyên berhevkerî ya bi awayê derketina ji devê kesên çavkanî karekî dijwar bû. Çimkî devoka herêmê dûrî standardên zimên ên îro û qaîdeyên rastnivîsê ye. Ji xeynê çend mijarên piçûk ku ji bo xwendevan di têgiştinê de zehmetiyê nekêşin, me kereste li gor devoka kesên çavkanî derbasî nivîsê kirin. Di bin van şert û mercan de heta ji dest hat me hewl da ku bi awayê herî dirist û têkûz em xebata xwe bikemilînin.

BEŞA DUYEM

DANASÎNA SEHAYA XEBATÊ

Beriya ku em agahiyên derbarê çanda gel a herêmê bidin ewil em ê hewl bidin ku sehaya xebata xwe ji hêlên weke aborî, civakî û erdnîgariyê bidin nasîn.

1.1. Dîroka Sehaya Xebatê

Dema em li çavkaniyan dinerin em dibînin ku bi navê “Dêrik” gelek gund û bajar li Kurdistanê henin. Lêkolîner Eyüp Güven di pirtûka xwe ya bi navê “Derik” de 16 gund û navçeyên navê wan “Dêrik” e tesbît kiriye.¹ Navê vir yê ku wê ji cihê din vediqetîne “Dêrika Çiyayê Mazî” ye. Berî ku em bi berfirehî li ser dîroka bajêr bisekinin em ê behsa navê bajêr bikin bê ev nav ji ku derê hatiye. Wateya “dêr”ê di ferhengên kurdî de weke “Peristgeha Filehan” (Botî, 2007: 196) yanî bi gotineke din “mabeda Îsewîyan” hatiye bi wate kirin. Li gorî ji çavkaniyan tê fam kirin niştecihên Dêrikê yên berê gelek jê Îsewî bûn û mabedên wan hebûn. “Dêra Sor” ku hê jî li Dêrikê li ser nîga ye yek ji wan e. Ev jî wê baweriyê dide ku girêdanek bi navê “dêr” û “Dêrik” yanî “dêra piçûk” hebe. Di hin çavkaniyan de Derîk bi Tirkî weke

¹ Eyyüp Güven, Derik, Ar yayıncılık, İstanbul 2015,17

“Kilisecik”² (Noyan, 2009: 89) tê binavkirin. Jixwe ev weke gotegotekê di nav gelê herêmê de meşhûr e.

Gotegoteke din jî ew e ku: Yên ewil koçî navenda bajêr kirine ji herêma Têrikan a Amedê ne. Lewma nispet bal bi wê herêmê, navê vir jî ji “Têrik-an” bûye Dêrik. Tezeke din ya li ser navê navçeyê ew e ku ji ber darên bi navê “dirîk” wext bi wext navên daran li navçeyê bûye û bûye Dêrik (Güven, 2015: 16).

Dêrik niha ji hêla rêvebiriyê ve navçeyeke welayeta Mêrdînê ye.³ Herwiha nêzî Amedê ye û ji mêj ve têkiliyên wê bi Amedê re xurt in. Herçiqas bajar bi berhemên xwe dîroka xwe ya kevnar bide xuyakirin jî, di warê dîroka bajêr de agahiyên berfireh di dest de tune ne. Agahiyên di derbarê Dêrikê bêhtir ji salnameyên Amadê tên bidestxistin. Niha jî çûnûhatina gelek şênîyên bajêr ji xeynî karên fermî, ji Mêrdîn bêhtir bi Amedê re ye. Ji ber ku di dîroka Dêrikê de ev herdu bajar xwedî bandor in, em ê dîroka wê bi van herdu bajaran jî bidî ber çavan.

Ji bermayiyên kevnare yên li derdora bajêr tê famkirin ku dîroka bajêr digihêje salên gelekî kevin. Li zinarên ku bajêr pala xwe dayiyê li Turcelê gorên kevirî henin. Tilbisim, Rebet û mintîqa Metînan jî çend cihên din ên xwedî avahiyên dîrokî ne. Dêra wêranbûyî ya li Qizilê û Dêrmetînan; bermayiyên kela ên li Bircê û Rebetê, bajarê dîrokî yê li Fitinê berhemên girîng ên li dora Dêrikê ne. Li navenda bajêr jî Dêra Sor ya ku ji nivîsa li ser deriyê wê tê famkirin di 1650î de ava bûye, li gorî yên me li jor jimartine berhemêke dîrokî ya ne zêde dûrî roja me ye. Hebûna gundên bi navên Çildiz, Heramiya, Heramiyê û Elîbegê ku di hin menqibeyên bajêr de nîspet bal bi “Çil heramiyên meşhûr û Elî Beg/Baba” tên kirin; herwiha gundê bi navê Eynterîyê ku ji hêla hin kesan ve nîspetî *Eynter* ê bi nav û deng yê di meselokan de behsa wî tê kirin, dîroka sehayê balkêştir dike.

“Li derdora gundê Rebetê, rolyefeke şêr ya serdema Îraniyan û hin kevirên bi motifên narîn hene. Li gundê Tîtnê xerabeyên “anfiteatr”, mozayiq û hin lahit, li Taşît û Tilbismê jî bermayên bi heman rengî hene. Hebûna kîtabeyeke nirxdar bi

² “Dêra piçûk”

³ <https://www.e-icisleri.gov.tr/Anasayfa/MulkiidariBolumleri.aspx> (Lênerîna dawî 07.06.2017)

zimanê Yunanî ya li Qesra Qenco û dîtina diravên Bîzansiyan dîroka zengîn ya vê navçê nîşanî me dide” (Noyan, 2009: 89).

Herêma Dêrikê tevî derdora xwe di sala 1516an de dikeve hakîmiyeta Osmaniyan. Ev tarîxek nêzîkî tifaqa Kurd û Osmaniyan e jî. “Dema ku ev tifaq ava bibû, pêvajoya damezrandina Mîrekiyan qediyabû. Qederê çil mîrekiyên piçûk û mezin, piraniya deverên ku wekî Kurdistan tê nasîn bi rê ve dibirin. (Bedlîsî, 2007: 19) Mêrdîn ku niha Dêrik pê ve girêdayî ye, cîranê Mîrekiya Botanê bû. “Derdora wê (Mîdyad/Tor Abidîn) dikeve bin hakimiyeta Bedirxaniyan” (Özcoşar, 2007: 448). Lê di çavkaniyan de em lê rast nayên ku Dêrik jî ketibe bin vê hakimiyetê. Herwiha em navê Dêrikê di qeydên beriya wê demê de jî zêde nabînin. Ewliya Çelebî di sala 1655an de tê Amedê di heman demê de tê Mêrdînê jî û di gelek waran de agahiyan di derbarê herêmê de dide. Ewliya Çelebî ku navê gelek senceq û hikumetên⁴ girêdayî eyaleta Amedê dijmêre, weke gundekî behsa Qosera cîranê Dêrikê jî dike. Lêbelê em navê Dêrikê di van qeydan de nabînin.

Piştî Fermana Tenzîmatê ji ber serhildana Bedirxan Beg di salên 1850î de Eyaleta Amedê tevî Mêrdîn vediguherînin Eyaleta Kurdistanê. Hinek qeza bi ser Mêrdînê ve têne girêdan û wê jî dikin qezaya vê eyaletê (Kankal, 2007: 110). Piştî vê tarîxê êdî navê Dêrikê bi awayekî serbixwe di çavkaniyan de derbas dibe. Di Salnameyek Amedê de ewil em dibînin Dêrik weke “Midûriyetek xwedî 31 gund e û bi ser Qezaya Rasileynê ve ye” (Diyarbakır Salnameleri, c.2, 1999: 74). Di heman çavkaniyan de dîsa Dêrik weke nahiyeyekê tê nîşandayin û tê gotin ku serjimara wê 1108 kes e. Ji van 320 xeyrî muslîm in. Ên mayin jî muslîm in. 472 xane li vê nahiyeyê henin (Diyarbakır Salnameleri, c.2, 1999: 335).

Di salnameyê 1900î de em dibînin navê Dêrikê wek qezayek Amedê derbas dibe. Herwiha berfirehî Dêrik wiha tê nasandin: “Ev qeza li rojavayê Sêwregê ji 3448 km. erd pêk tê. Xwedî bajarokê, 2 nahiyeyek, 102 gund (62 misliman in, 41 tevlihev in) û 18288 serjimarê ye. Qezaya Dêrikê ku navend e, 13 saet dûrî Amedê ye û qezayek ji 500 xaneyan pêk hatiye. Di qezayê de qonaxek hikûmetê, mizgeftek,

⁴ Binerin: Evliya Çelebi, Seyahatname 4.Cilt, Üçdal Neşriyat, İstanbul: r.1116

2 dêr, dibistanek ibtidaî, 2 dibitanê sibyanan, 2 dibistanê Îsewîyan, xanek, himamek û 10 kanî hene” (Diyarbakır Salnameleri, c.5, 1999: 41).

Di serê sed sala bîstan de tevî Mêrdîn, Dêrik jî dikeve bin desthilatdariya Brahîm Paşayê Milî. Herwiha Eşîrên derdora Dêrikê yê weke Metîniyan jî ji berê de bi Milan re tev digeriyan. (Kıran, 2003: 82,177). Komara Tirkiyê ava dibe û pê ve Dêrik, ku heta wê demê bi ser Amedê ve girêdayî bû, di 1926 an de şaredarî lê ava dibe û dibe navçeya Mêrdînê. Şemrex jî heta 1937an weke nahiye bi ser Dêrikê ve bû, di pê re jê veqetiyaye (Yıldız, 2007: 150).

1.2. Taybetiyên Erdnîgarî yê Sehaya Xebatê

Dêrik dikeve hêla Başûr-Rojavayê Mêrdîn. Navenda bajêr di lêf de, li ser kaşekî rêzeçiyayên Mazî ava bûye. “Tixûbê navçê bi Şemrex, Wêranşar û Qoserê re heye. Ji deryayê 780 metreyî bilindtir e. Bilindahiya çiyayên navçeyê 1500 m yî derbas nake. Bi çiyayên Mazî dorpêçkiriye ku ev şaxek ji rêze çiyayên Hekkariyê ne.”⁵

Gundên bajêr ên li başûr ku hinek ji wan li kêleka çeman ava bûne giş dikevin hêla erda rast. Gundên rojava jî herçiqas di deştê de bin, ji ber volkanê Qerejdaxê û dîsa bi bandora hinek girikên piçûk ên volkanîk bi kevirên reş dorpêç kirîne. Ev kevirên bazalt ku gelê herêmê wan cure keviran weke “*kevîrê nêr*” bi nav dikin li seranserê van gundan berbelav e. Ji ber van keviran çandiniya van qadan jî bi zehmet e. Li hêla rojavayê bajêr derên nêzî qelaçan di kortê de dimîne. Hinek gundên bakûrê bajêr jî dikevin nav çiyayan.

Çemê Beamberê û Fezikê ku jêderên xwe ji nêzî çiyê digirin ji bakûr ber bi başûr ve di gelek gundan re derbas dibin û axa navçeyê diterikînin. Her ku berjêr dibin ava van çeman bi taybetî havînan zuha dibe. Jixwe li ser van çeman bendavên avdanê hatine çêkirin. Ava Xabê nêzî navenda bajêr e. *Xab* qadeke bi dehl û rezên xwe û bi siruşt xwe navdar e. Dar û berên wê li gor derdora xwe baştir e. Li herêmê ji ber şênahiya wê ji bajêr re dibêjin “Yeşîl Derik”⁶. Di vê şênahiyê de darên

⁵ [www.derik.bel.tr//syf/-Derik Coğrafyası](http://www.derik.bel.tr//syf/-Derik%20Coğrafyası)

⁶ “Dêrika şîn”

zeytûnan û xerzikên tirî xwedî pareke mezin in. Ji xeynî navendê li derdorên bilind şînahiyên piranî ku ji darên mazî pêk tên hene.

Navbêra Dêrik û Mêrdînê 72, Dêrik û Amedê 93 km ye. Riya bazirganiyê ya Hevrişimê⁷ 19 km yan ji başûrê bajêr derbas dibe. Wesayitên komguhêz her roj di navbeyna Dêrik û Amed, Qoser, Mêrdîn, Şemrexê de dişuxulin. Gundiyên navçeyê jî ya bi wesayitên xwe yên xîsusî yan jî bi wesayitên komguhêz ên gundan dikarin her roj her û werin navçeyê.

1.3. Aboriya Sehaya Xebatê

Dêrik dikeve hêla çiyê. Ne li ser riyên biçûnehat e. Riya wê ya bi dinya derve re ew e ku ji Riya Hevrişimê ya meşhûr tê navçê û berjor dewam dike diçe di Şemrex re digihêje riya reş a Mêrdîn û Amedê. Wekî din tu riyên din, ji xeynî yên gundan, nayên ser navçê. Dûrbûna wê ya ji riyên bazirganiyê di qelsbûna aboriya wê de sedema sereke xûya dike. Wêranşar, Qoser, Nisêbîn ku bajarên ji Dêrikê ne zêde dûr in, ji ber ku li ser Riya Hevrişimê avabûne ji hêla aborî ve pêşde çûne. Dîsa koça Ermeniyana ya ji navçê jî derbeyeke mezin li aboriya navçê xistiye. Lewra bazirgan û sinetkarên bajêr gelek jê Ermenî bûn.

Hatinên herêmê hindik in. Di warê pîşesaziyê de tenê karxaneyek çimento heye. Esnafên piçûk di karxaneyên xwe de hew bi qasî ku debara wan bibe xwedî hatinên aborî ne. Hinek şênîyên bajêr bi riya deriyê sînora yê Qamîşlo, bazirganî bi Sûrî re dikirin. Lê belê derî, aniha ji ber şerê li vî welatî girtiye. Ev jî bûye sedema kêmbûn û di ber re jî bihabûna gelek amûran.

Çavkaniya aborî ku herî zêde gel debara xwe pê dike mixabin li derveyî bajêr e. Ew jî “Xebatên demsalî” ne. Kesên xebatkar di nava biharê de diçin xerîbîyê û di payizê de jî vedigerin welêt. Lewra ji malên ku em zivistanê çûbûnê, havînan ji xeynî du yan sê kesan me tu kesên din nedîtin. Heman mal ku di zivistanê de em çûbûnê kufletê malê giş li malê bûn. Ev rewş ji bo gelek gundên em lê geriyan û malên navendê derbasdar e. Manîsa, Îzmîr, Entalya, Bûrsa, Edepazarê di vî koçê de bajarên

⁷ Riya Hevrişimê ku meşhûrtirîn riya bazirganiyê, di navbeyna Enedolê û Rojhilata Navîn de xwedî rolek mezin e.

ku serî dikşînin. Gelê herêmê keda ku bihar û havînî li xerîbîyê bi dest dixin, payiz û zivistanan li navçeyê xerc dikin.

Yek ji reha sereke ya aboriya bajêr û gundên wê zîreet e. Yanî çandinî û sewalvaniye. Zeytûn ku Dêrik pê hatiye naskirin, ne xwedî hatinên bi rêk û pêk be jî, debara malbatên xwediyên xwe dikin. Li navenda bajêr du atolyeyên sabûna zeytûnan hene. Digel sehayî fireh ya darên zeytûnan gelê herêmê ji bo ku zeytê ji zeytûnan bigrin wan dibin Wêranşarê û ji mekîneyên li wir zeytê bi dest dixin. Em çend qadên piçûk ên gundan jê derxin, darên zeytûnan pîranî li navendê hene. Ji xeynî zeytûnan hin kes li malên xwe ji tirîyên xerzikan şerabê çê dikin û debara xwe pê dikin. Dims, gwîz, bihîv, benî xwarinên herêmî nin ku dan û sitandina wan çêdibin.

1.4. Çandinî û Sewaldarî li Sehayî Xebatê

Pez (mîh, bizin), çêlek û ga sewalên li herêmê ji bo hatinên aborî têne xwedîkirin. Werdek, elok, qaz, mirîşk, mêşên hingiv jî weke adeta herêmê li ber deriyê gelek malan tên xwedîkirin. Hêstir di barkirinê de, ker jî di şivaniyê de sewalên sereke ne. Di nav wan de yê hatinên wan ên aborî hêjayî gotinê ne “pez û çêlek” in. Bi taybetî jî ji serê biharê heta havînê gundî her sibeh şîr, mast û penêr dibin bajarên derdorê û difroşin. Sewaleke ku ji bo koçeran gelekî girîng bû û pîranî di çûn û hatina deşta Amedê de dihat bikaranîn deve bû. Lê di salên dawî de ji ber bûyêrên siyasî û rewşên civakî ku koçerî pir hindik çêdibe, deve jî li herêmê qelîhîne. Carinan ji hêla Mûş û Bîngolê koçer⁸ tên û li hinek gundan konên xwe vedikin, li vir pez xwedî dikin. Koçerên payizî tên vir, di serê nîsanê de jî bar dikin.

Li mintîqa Mefînan li derên weke Sêpinatê ku bendavek piçûk lê heye sehayên medrebê cih digrin. Ji çemê Ferêt qenalek avdanê ber bi Dêrikê ve hatiye vekirin, lê hê qenal neketiye xizmetê.⁹ Gelê herêmê yan bi ava sondajan yan jî bi jêderên siruştî çandiniyên xwe dikin. “Ceh, genim, garis, nîsk, nok, pembû, zeytûn,

⁸ Dema lêkolînan di Adara 2016 an de li navbeyna gundên Dêşî û Ûsibê Pîrî de em li koçerên Mûşî rast hatin.

⁹ Niha kolandina qenalê qediyaye û ji bo girtina avê li derdora gundê Qizilê sehayêke weke bendavê tê amadekirin. Hêvî heye ku dema ev qenal were qedandin wê bereket û rihetî were herêmê.

tirî, bihîv, hijîr, hinar, şebeş, petêx li dêrikê fêkiyên herî zêde tên çandin.¹⁰ Divê ji bo zeytûnan em di vir de xaleke taybet vekin:

1.4.1. Zeytûnên Dêrikê:

Dema ku behsa Dêrika Çiyayê Mazî dibe, di serî de zeytûn têne bîra mirov. Niha li navçê hejmara darên zeytûnan 103 hezar e.¹¹ Her sal bi hezaran şitlên nû têne çandin. Li gundan jî darên zeytûnan hene, lê ekla wan ne weke yên navenda bajêr xweş in. Di vir de taybetiya cih û hewayê bajêr derdikeve pêş. Bi taybetî jî qelaçên ku ne avgîr in, ekla zeytûnên wan xweştir e. Hinek qelaçên Xabê ku nayên avdan zeytûnên wir, ji yên tên avdan hîn xweştir in. Xisûsiyeteke di ya zeytûnên Dêrikê ewe ku bi mehan di avê de bimîne jî nanermijin. Di zeytûnên Dêrikê de reh zêde tune ye, ev taybetmendî çêj û ekla wan zêdetir dike.” Piraniya zeytûnên li Dêrikê çêdibin zeytûnên ku jê re *Xilxalî* tê gotin, şiklê wan hêkanî ye û bi zeyt in” (Güven, 2008: 203). Niha li hin gundên derdorê, sehayên şitlên Xilxaliyan hene. Di wan sehayên de ji tovên Xilxaliyan şitlan bi dest dixin.

Li gor hinek çavkaniyan, beriya niha hejmara daran û çalakiyên li ser zeytûnan behtir bû. Di pirtûka Monografiya Mêrdîn ya 1950 de ev agahî cih digirin: “Li Dêrikê li ser 360 hektar erdê ku ji hêla zeytûnan ve hatiye îşxalkirin 133.700 heb darên zeytûna henin. ...Li bajêr teva yên li gundan 10 îmalatxaneyên sabûnan hene ku xebatkarên her yekê ji wan deh kesî derbas nakin. Derdora 20 presên zeytê henin (Noyan, 2009: 91).

Li gorî agahiyên li jor me ji Noyan neql kirine, ku ev qeyd ên 1950 ne, serjimara navçê hindiktir bû jî darên zeytûnan ji yên niha bêhtir bûn. Xetereyeke mezin di warê zeytûnan de ew e ku piraniya darên zeytûnan îro di nav taxên bajêr de mane û bi birrînê re rûbirû ne. Zeytûnên niha tên bidestxistin, li bajêr û li derveyî bajêr piranî bi şînî tên xwarin. Mixabin digel ewqas zeytûn tu atolye yan febrîqeyên têkildarî zeytûnan, ger em du îmalatxaneyên sabûnê ên piçûk jê derxin, tune ne.

¹⁰https://www.google.com.tr/search?q=derik+belediyesi&rlz=1C1GTPM_trTR636TR636&oq=derik
Lênerîna dawî: 12.07.2017

¹¹ www.mardinkulturturizm.gov.tr/derik-ilçesi.html. Lênerîna dawî: 04.03.2017

1.5. Serjimara Sehaya Xebatê, Komên li Herême

Li gor jimariya sala 2016 an serjimara navçê 61.523 ye. Jimara mêran 30.551 û ya jinan 30.972 kes in¹². Serjimarek mezin di van salên dawî de ji navçê û gundên wê koçî derve kirine. Digel sedemên weke xwînîti, bûyerên siyasî û mamûriyetê; sedema sereke ya vê koçê tunebûna sehayên aborî ne. Li bajarên weke Stenbol, Mêrsîn, Amed, Îzmîr; navçeyên weke Qoser û Wêranşar girseyeke mezin a Dêrikîyan dijî. Li van bajaran gelek saziyên Dêrikîyan jî hene. Dîsa li welatên Ewropa jî Dêrikîyên koçber û penaber ne hindik in. Li navenda bajêr ji ber bûyerên ku di salên 2015 û 2016an de qewimîn bi taybetî ji taxa çiyê ya bajêr koça derve gelek çebûye. Digel van koçan îro li Dêrik û gundên wê şênîyên mensûbê netew û olên cihê cihê bi hev re dijîn. Niha em ê agahiyan derbarê van koman de bidin:

1.5.1. Kurdên Kurmanc

Serjimara navenda navçê bi girseyî ji Kurdên kurmanc pêk tê. Dîsa li 164 gund û mezrayan ,ji xeynî çend gundên Kurdên Zaza û gundekî Tatan, Kurdên Kurmanc rûdinên. Li navçê û li van gundan zimanê rojane Kurdiya Kurmancî ye.

1.5.2. Kurdên Zaza

Li mintîqeya eşîra Sefîyan ku dikeve rojavayê Dêrikê çend gundên Kurdên Zaza hene. Şênîyên van gundan bi rabûn û rûniştin û bi kevneşopiyên xwe bêhtir nêzî Wêranşar û Sêwregê ne. Ji hêla rêvebirîya fermî bi ser Dêrikê ve ne. Kurdên Zaza di nav xwe de bi zaravayê Zazakî û bi xelqên din re jî bi zaravayê Kurmancî xeber didin. Hinek Kurdên kurmanc yên herême di warê zaravayên Kurdî de ne xwedî agahiyan berfireh in. Ji ber vê yekê gundiyan Kurdên kurmanc ku ji devoka herêma Sefa fêm nakin û belkî jî hebekî ji nezanî, hinek ji wan, dibêjin: “Zimanê Sefa zimanê çûkê ye.” Ev gotegot li herême berbelav e.

¹² <https://biruni.tuik.gov.tr/medas/?kn=95&locale=tr> Lênerîna Dawî: 31/01/2017

1.5.3. Ermenî

Di derheqê dîroka Ermeniyên herêmê de agahiyên hene yên van sedsalên dawî ne. Li gorî serjimara 1882an a navçê 327 kesên nemisilman li navçê dijîn. (Diyarbakır Salnameleri, 1999: c.3, 170). Miliyeta van xeyrî mislîman çî ne, ev ne diyar e. Şênîyên Dêrikê ji şênîyên xeyrîmuslîm re dibêjin “File”. Li gorî hinek çavkaniyan hejmara Ermenên bajêr bi hezaran bû (Sazan, 2014: 24). Di nivîsa ku di 1863yan de Patrîkê qedîm ê Suryanî ji Siltanê Osmanî re dinivîsîne, ji ber zilma kesekî bi navê Hecî Şêx Axa li Sêrt, Mêrdîn, Dêrik û Mîdyadê gelek xane wêran bûne(Özcoşar, 2007 b: 207). Piştî vê dirokê di salên tehcîrê de jî Ermenên li bajêr hatine kuştin û ji hêla waliyê Amedê Reşît Beg fermana wan hatiye dayin (Sazan, 2014: 25).

Niha li navçê Ermeniyên ku ji bav an ji bapîr ve bûne Misilman hene. Ev kes weke “Bavfile” tên binavkirin. Lê bi rabûn û rûniştina xwe û bi folklorê xwe weke Kurdên herêmê tevdigerin. Jixwe hinekên wan xwe ji eşîreke Kurd ku nêzî xwe dibînin dihesibînin. Weke bûne Misilman pê re jî bûnin Kurd. Di lêkolînên xwe de me kesekî ji wan ku bi Ermenîkî zanibe tesbît nekir. Li navenda bajêr tenê du malbatên Ermen hene ku hê li ser dîne Îsewîtiyê ne, nebûne Misilman. Mifteya Dêra Sor li cem wan dimîne. Ew jî di hevdîtina me de dibêjin ew jî bi Ermenîkî nizanin. Zimanê wan yê dayikê jî Kurdî ye.¹³ Hinek Ermeniyên Dêrikî jî ku hê li ser dîne Îsewîtiyê ne niha li Stenbolê dijîn û di rojên taybet de tên Dêrikê li Dêra Sor tevî ayinê dibin.

Li gor agahiyên ku me ji şênîyên bajêr stendine beriya çend sal berê jî Ermen li bajêr zêdetir bûn. “Di zarotiya me de, hema bîst sal berê, hevalê me ê Ermenî hebûn. Xalê Meqsî¹⁴ hebû sobecî bû. Em ‘eyda diçûn malê wan şekir nedidan me, me ji wan re xeber dida” (S. Dinç, 2016). Wekî din jî gelek şênîyên bajêr di hevdîtînen me de behsa Ermenan û serpêhatiyên xwe û wan kirin. Wer xuyaye ku hîna şopa Ermenan li bajêr germ e.

¹³ Hevdîtina taybet bi Ermen- Îsewîyê dawî yê li Dêrikê Naîf Demircî re (03.02.2016).

¹⁴ Meqsî: Îsewîyekî ku di umrê xwe de carekê çûbe “Qudsa Şirîf”. Yanî yekî biçe Qudsê ziyaret bike êdî jê re dibêjin “Meqsî”.

1.5.4. Tat

Li ser vê komê me agahiyên zanistî bidest nexistin. Agahiyên di destê me de tenê ew gotegotên di nav gel de ne. Li gorî hinan eşîrek Ereb û li gorî hinan jî Kurdên melez in. Bi diyalekteke Erebî dipeyivin. Yê li Dêrikê hew niştecihên gundê Welikê ne. Ji xeynê vir “Tat” li çend gundên Qoserê û yê Mêrdînê jî bi cih bûne. Li ser miliyeta wan gotegota herî berbelav ew e ku tê gotin *Tat*, miletekî melez e. Yanî ji bavekî Kurd û ji diyeke Ereb zêdebûne. Ev nêrîn ji hêla Tatan ve tê qebûlkirin û ekserê wan koka nijadê xwe Kurd dihesibînin. Çavkaniyekî me yê ji Welikê di derbarê nesebê xwe de ev agahî da me: “Em bi eslê xwe ji Mazîdax in. Bavanê me yê ewil jî Kurmanc in. Vê dawiyê hatinin hêla Wêranşar û bi jinê Ereba re zewicînin. Di pê re jî ji hev bela bûnin” (M. Irmak 2016).

1.6. Mezhebên li Seha Xebatê

Piraniya şênîyên bajêr li ser mezheba Îmam Şafîî ne. Li hinek gundan û li navçê kêmbin jî Henefiyên niştecih henin. Dema em bala xwe didin mezhebên herêmê em dibînin ku gelek caran gundên tenê ji eşîrekê pêk tên, herwiha li ser yek mezhebê ne jî. Gundên ji eşîrên curbecur pêk hatibin, carina zêdetir mezheban jî di xwe de dihevin. Weke mînak: Maşmaşkê “Sorikî” ne û hemû şênîyên gund Şafîî ne. Lê du gundên mezin Heramî û Qizil, ji eşîr û komên cûrbecûr pêk tên. Mensûbê herdu mezheban jî (Şafîî-Henefî) li van gundan hene.

1.7. Eşîr û Berên li Seha Xebatê

Li herêmê pergala eşîrtiyê hê jî heye. Lê li vir bêhtir di warê hevnasîn û meseleyên civakî de rola eşîrtiyê derdikeve pêş. Dîsa di qadên siyasî de jî eşîrên herêmê roleke aktîf dilîzin.¹⁵ Di demê hîlbijartin û dijminahiyan de reha eşîrtiyê xurtir dibe. Ji ber hebûna pergala eşîrtiyê li Dêrik û gundên wê herkes hevûdu nas dikin. Ev naskirin bi vî hawî ye ku li hev dipirsin: “Bê tu ji ku yî, ji kîjan eşîr û kîjan

¹⁵ Binerin: Safiye Ateş Durç, Türkiye’de Aşiret ve Siyaset İlişkisi: Metinan Aşiret Örneği, Teza lîsansa bilind a çapnebûyî, (2009), Ankara H. Ü Sosyal Bilimler Enstitüsü

ezbetê yî û law an keça kê yî?” Ger hinekên bi hev re têkiliya wan tune be jî, bi pirsê tê famkirin ku bê kî ye û ji ku ye. Êdî ew tê nasîn û hew wenda dibe.

Li navenda bajêr û li gundan eşîrên cûrbecûr cih digirin. Eşîrên sereke ên navendê Mehmûdî, Ebbasî, Salikî, Xidirî û Rûtî¹⁶ ne. Li gundên derdorê jî li hêla erda rast, yanî li deştê: Sorikî, Sarxwanî, Îzolî, Bêreşî, Rûtî; li derên nêzî çiyê jî Metînî, Çiyayî, Medayî, Şêbî, Meşkinî, Sefî û Hamî eşîrên sereke ne. Ji van eşîran hinek jê, weke Çiyayî, nîspetî herêma ku lê bi cih bûne hatine binavkirin. “Eşîr ji navê pevxistî yê pêşiyên xwe bêhtir bi navê herêman tên binavkirin. Eşîrên koçber ên Kurd piştî niştecih bûne navên pêşiyên xwe wenda kirine û navên herêmên lê bi cih bûnin sitendine” (Heckman, 2012: 136). Ji xeynî van eşîrên sereke, elbet ji hin eşîrên din jî di asta mensûbiyeta eşîrî de hinek kes li sehayê bicîh bûne. Lê ew ne eşîrên bi girseyî ne ku xwedî bandor bin. Di derbarê hinek eşîrên herêmê de Qedrî Cemîl Paşa wiha dibêje:

“...Ewana ji çiyayê Têrika dahatine biniya germiyana Mêrdînê. Di rê de gayê hinên wan westiyane û li dora Dêrikê mane. Yê ko li dora Dêrikê mane ko îro bi navê qebîla Rûta deng dayine, bi xwe xwerû kurmanc in.” (Cemilpaşa, 2012:806)

“Ji wexta koçeriyê û dema ku Kurdan barên xwe li ga dikirin hin eşîr gava diçûn zozanan an jê vedigeriyan, ji ber ko gayên hinan diwestiyan ew eşîr bixwe ji hev vediqetîn û birê bişûndemayî di cih de dima, nema vedigeriya welatê xwe û ji xwe re warekî nû dibijart. Ji wî birî re gawestî digotin” (Ezîzan, 2010).

Metîniyên herêmê jî xwe weke koçberên ji Silêmaniyê û Kerkûkê dihesibînin û ew jî li gora xwe weke li jor efsaneyêke “Metîniyên Gawestî” dibêjin (Durç, 2009: 63). Dîsa li gorî hinek Metîniyan binavkirina herêma Metînan ji Mata yê nivîskarê Încîlê tê ku dibêjin wî hatiye Dêra Metînan ava kiriye. Nîspet bal bi navê wî ji herêmê re gotine Metîna (Matanî). Hinek endamên eşîra Ebbasiyan jî dibêjin em Kurdên Îranê ne û pêşiyên me ji wir koçî van deran kirine. Sorikiyên ku teqrîben di deh gundan de niştecih in, ew jî koka xwe dispêrin Soranên Başûrê Kurdistanê.

Li jor navên ku me weke eşîr jimartine hinek ji wan xwe ji dê û bavekî dihesibînin. Eşîra Sorikiyan dibêjin em hemû bi xwîne digêhêjin hev û bi şecereya devkî her ber û zom xwe nispetî bavikê mezin “Soro” dikin ku navê wî nîspetî eşîrê dibe. Lê Şêbî an jî Çiyayî tu nîşaneyê wan a ku hemu ji yek bavikekî hatibin tune ye.

¹⁶ Li gorî agahiyên me ji şênîyên bajêr girtine helbestvanên kurd Qedrîcan û Reşîdê kurd jî Rûtî ne.

Lê xwe weke eşîr dibînin. Bi xwînê nagêhêjine hev. Ji ber ku bi salan bihev re jiyane li hev dikan. Bi navê herêma lê dijîn bi nav bûne. “Ger em li eşîrên biniya deşta Mêrdînê binêrin, wek eşîrên Kîkan û Deqoriyan yên ko eşîrên giran in emê bibîn ko tev da ne ji bavekî ne, ji eşîrên din gîhane hev” (Cemîlpaşa, 2012:806). Mewzûya ku Cemîlpaşa behsa wê dike ji bo hinek eşîrên Dêrikê jî derbasdar e.

Qada ku me ûnsûrên folklorîk lê dan hev Êzîdî lê tunebûn. Lê ji ber bandora çanda wan em ê behsa Kurdên Êzîdî yên li nêzî herêmê jî bikin. Di tixûbê Dêrik û Wêranşarê de çend gundên Êzîdiyan hene. Ev gund ji hêla rêvebirî bi ser Wêranşarê ve ne. Têkiliyên şênîyên van gundan û yên gundên Dêrikê bi hev re gelekî xurt in. Ji ber vê danûstendî Dêrikî çavnasên çanda Êzîdiyan e jî. Kurdên misilman ji van Kurdên Êzîdî re dibêjin *Şerqî*. “Şerqiyên eşîrek Êzîdî ye ku ji Şengalê hatine û li vir bi cih bûne. Herwiha vê eşîrê jî di konfederasyana eşîrên Milan de cih digirt” (Kıran, 2003: 82). Kurdên misilman û Kurdên Êzîdî yên li vir, bêyî ku kirîvantiyeke wan hebe weke kirîvên hev ên qedîm bin, ji hev re dibêjin “kirîv” an bi gotina herêmî “kirîb”.

1.8. Perwerdeya Sehaya Xebatê

Ji ber serjimara Ermeniyên li bajêr perwerdeya modern zû dest pê kiriye. Çimkî Ermeniyên ji xwe re berîya yên dewletê dibistan vekirine. Vekirina vana elbet ji bo perwerda zarokên bajêr ên Kurd jî rewşeke erênî derxistiye holê. Lê dîsa jî xwendin û nivîsandin, ji xeynê Erebi û medreseyan, dereng li bajêr bi cih bûye. “Di 1950 de % 15 kes xwende bû, kesên bi Tirkî zanîbûn jî % 7 bûn” (Noyan, 2009: 91).

Niha li Dêrik û gundên ku bi ser wê ve ne, bi tevahî li 103 dibistanan 16.848 xwendekar perwerde dibîn¹⁷. Keç û law herkes diçe dibistanan. Dibistanên taybet, fakûlte yan jî enstîtu li bajêr tune ne. Digel tunebûna dibistanên navîn ya li gundan, ji ber hin rewşên civakî, xebatkariya demsalî û zewacê bi taybetî li gundan çûyina keçan ya dibistanên navîn kêmtir e. Asta xwendekariya zanîngehan li tevahiya bajêr di salên dawî de bilindtir bûye.

¹⁷ Derik.meb.gov.tr Lênerîna Dawî: 22.08.2016

Li Dêrikê perwerdeya klasîk ya medreseyan ku sedema hatina Cegerxwîn ya vî bajarî bû, di salên dawî de qels bûye. Li cihê ziyaretê ya bi navê “Sîn û Seydoş” medreseyek hatiye avakirin. Lê li van deran jî ne bi rêk û pêk û berdewamî ye. Weke encam, perwerdeya medreseyan li Dêrikê dike biqede.

1.9. Rola Sehaya Xebatê ya di Hawarê de

Elbet di gelek kovar û rojnameyên din de behsa Dêrikê hatiye kirin û gelek nivîskarê Dêrikî di wan de nivîsên curbecur nivîsandine. Lê cihê Hawarê di vî warî de taybet e. Gelek nivîsên Qedrîcan û Reşîdê Kurd ku bi eslê xwe Dêrikî ne, di Hawarê de hene. Ji xeynî wan Cegerxwîn jî demekê li Dêrikê maye û derheqê Dêrikê de ji bo Qedrîcan helbest nivîsandiye. Di van nivîsan de rengîniya siruştê Dêrikê û hisreta herdu helbestvanan ya li hember bajêr baş tê dîtin.

*Pesna Dêrikê*¹⁸

Ji brayê nazdar û ciwan Qedrîcan re

*“Dêrik çî xweş e, bi dar û av e
Ev av e, li erdê bû belav e
Yek Xab e, belê bihuşta me’wa
Pir mişmiş û sêv û darên selwa
Pir gwîz û hejîr û xox û hinar
Sed kanî û aş û gol û cobar
Yek dî heye pê dibên kulebê
Gorî ye ji wê re Xurs û Şêbê
Pir aveke sar û rind û şêrîn
Pir dar û ber û giyayên rengîn
Bilbil digirî bi ah û zar e
Daxwaza wê komela Hawar e,
Mizgînî dide heval û yara
Qedrî ko li Şamê bendewara
Çepkan dikutin dibên biravo
Qurbana te bin xweh û birawo”*

¹⁸ Cegerxwîn, (2012) Pesna Dêrikê. Hawar j. 5. Stenbol: Weşanên Belkî

Di miqabilê vê helbesta jorîn em dibînin di hejmara 12an de îca Qedrîcan helbestekê bi şeş bendan ji bo Cegerxwîn dinivîsîne. Ji wê helbestê du heb bend ev in:

....

*“Hevalê xoşewîst pesna gundê min
Bi ah û keseran pêşkêş didî min
Ji nû ve pêtek ar, da ser daxê min
Derd û kul tevdayîn tewşê Cegerxwîn*

*Dêrik pir xweş e hêja ye pesnê;
Çi bikim nakev dest; ji ber vê xesmê
Bi dil birîndar in Kurdên vê neslê
Ne ez û tu tenê hemî Cegerxwîn!”¹⁹*

Wekî din di hejmarên 5,13,21,22,24,52 an ên Hawarê de nivîsên rasterast di derheqê Dêrikê de cih digrin. Ev nivîs têkildarî Dêrikê ne. Ji xeynî wan weke me berê jî gotibû gelek nivîsên din ên nivîskarên Dêrikî di kovarê de hene. Ev jî dide nîşan ku di ekola Hawarê de bandora Dêrik û Dêrikiyan xurt e. Dîsa em têdigehejin ku wê demê jî Dêrik qadeke naskirî û bi ehemiyet e.

¹⁹ Qedrîcan, (2012) Hawar j. 12. Stenbol: Weşanên Belkî

BEŞA SÊYEM

ÇANDA GEL A DÊRIKÊ

1. ADET Û TORE

Dema behsa çanda herêmekê tê kirin tiştên ku tê hişê mirov yek jê jî adet û toreyên wê civakê ne. Li gorî pênaseya folklorê ya zanyaran adet û tore jî beşek ji folklorê wê civakê tê hesabandin. Li gorî Propp:

Folklor beyî asta pêşveçûnê were hesabandin, sinetê tebeqeyên civaka jêrîn ya hemî gelên heyî ne. Her çi çalakiyên afirînerî yên gelan in ew hemû folklor in. (Propp, 1998: 11-12).

“Ew bêje di eslê xwe de îngilîzî ye. Lê îro ketiyê hemî zimanên dinyayê. Ji lewre me jî ew xistiye zimanê xwe. Ji xwe Kurdên qefqasê beriya me ew bêje xistine zimanê me û kitêbek bi navê “folklorê kurmancî” belav kirine. Folklor tevayiya adet, çîrok û stranên miletekî ye. Ew adet, çîrok û stranên ko ji nav xelkê bi der ketine û di dora nişan de bi ser ve ketine û gihaştine nişên nû. Ji xwe bêjeya folklorê bêjeke bihevketiyê û bi mana zanîn an zanistiya xelkê ye (Ferhengvan, 2012).

Digel pênaseyên jor ên folklorê dema beşên folklorê Kurdî rastî tesnîfatekê tê kirin em dibînin ku adet û tore weke sernavekî sereke cihê xwe di nav xalên din de digre: “...Li gorî taybetmendiyên çanda civaka Kurdî, berhemên beşên folklorê Kurdî bi awayekî giştî dikarin wiha bîn rêzkirin: Edebiyata Gelêrî, Adet û Tore, Bîr û Baweriyên Gel, Zanyariyên Gelêrî” (Yıldırım, K, Pertev, R ve Aslan, M 2013: 143).

Eger mirov ji agahiyên zanyarên li jor derkeve rê, mirov dikare çend adet û toreyên herêma Dêrikê digel pratîkên wan wiha rêz bikin:

1.1. Dada Urî û Çareserkirina Kêşeyên Civakî

Gelê Kurd heta niha jî gelek kêşeyên navxweyî yên civakî bêyî ku herin dadgehan di nav xwe de safî dikin û hukman lê dibirin. Bi navbeynkariya hinek kesên bixatir, gelek mijar bi awayekî urfî tî çareserkirin. Li herêmê ji vê şeweya çareserkirina da'weyan re dibêjin "Heqî". Dema hinek kes di mijarên cûr be cûr de li hev nekin, hevûdu dibin vê heqiyê. Yan bi gotineke din diçin "Şerîetê". Sebeba ku dibêjin "Şerîet" ew e ku carinan ev mijar li gorî rê û rêbazên îslamî ji hêla hinek zanyarên olî tî çareserkirin. Em ji çavkaniyan fam dikin ku demên beriya niha axayan ev kêşe safî dikirin:

Ji daweyên ko axê bi xwe şerîeta wan dikir heqê qazîtiyê ji wan distand. Axê mala xwînî talan dikir û dida xwediyê kuştî û ji xwe re tiştêk dibir, axê heqê birîne ji carinan distand û dida birîndar. Tiştêk ji xwe re radihişt (Ezîzan, 2012: 580).

Weke ji çavkaniyan tê fêmkirin di demên borî de axe diket dawê, piştî dawê safî dikir ewî jî radihişt heqê xwe. Niha pergala axetiyê hilweşiyaye. Li herêmê yên daweyan bi şeweya urfî safî dikin yan hinek alim in, yan jî hinek malmezînan herêmê ne. Lê ne qabil e ku ev kes di bedêla da'we safîkirinê de tu heqekî ji kesên hevûdu gilî kirin bîstînin. Li Dêrik û gundên wê hin kesên ku di dadmendiya urfî de navê wan derdikevin pêş ev in:

Li navenda Dêrikê: Hecî Fikret Vural, Hesîbê Eyo, Şêxmûsê Eyo;

Li mintîqa Metînan û çiyê: Şîrîfê Silêman, Hecî Ehmedê Qerewarî, Mele Seydoyê Metînan û Hikmetê Tilwerî;

Li berriya Dêrikê: Mistefayê Evdirihîm, Mele Ademê Hecî Brahîmê Ebo (Li Qoserê rûdinê), Mele Teharê Sorikî (li Qindefiyê rûdinê) û Hecî Izet (Li Heboşiyê rûdinê).

Da'weyên di mijarên bêexlaqiyê de bin û li ser xirabiyê bin kes naxwaze têkeve wan cure da'weyan. Li Dêrik û derdora wê da'weyên ku bi urfî tîne safîkirin çend mînak jê ev in: Mêr kuştin û birîndar kirin, keç revandin, şer û pevçûn,

lihevnekirina jin û mêran, lihevnekirinên wekî din ên weke dan û sitendinê, parvêkirina mîratê, meseleyên mal û milkan.

1.1.1. Mêrkuştin

Mêrkuştin yek ji sûcekî herî giran ê beşerîyê ye. Di zagonan de heta darvekirina kesê qesas, gelek cezayên giran tên xwestin û dayin. Gelê Kurd niha ji xeynî zagonan bi riyên wekî din gelek meseleyên kuştinê safî dikin. Ev kevneşopiyê ji bav û kalan maye. Şerefxan li ser qesasê ku di nav Kurdan de adet e di Şerefnamê de wiha dibêje:

“... Piştî di hember yekê kuştî de xwîné qebûl dikin; ev xwîna han ya keçeke yan hespek, an jî çend heb bizin in. Guhên xwe nadin xwîna ûzûwên piçûk ên weke dest, pê û diranan” (Bedlîsî, 2007: 106).

Li herêmê ev sûcê giran bi awayê urfî ku di bingehe de hinek qaîdeyên şer'î hene tê çareserkirin. Di derbarê vê mijarê de agahiyên kesên çavkanî dane me bi vî rengî ne:

Însanê mêrekî bikûje pîrekên wan ne, le zîlamê wan xwe didin rexeke. Mala meqtul dest pîrekê xwîniyên xwe nadin. Germa germa pê heyfê jî nakevin. Heta azaya xwe dikin, mêvanê wan bela dibin û pê ve îca ji xwe re dikevin hesaba. Di van salên dawî de pîranî ji kuştina ewil û pêve kes xwîne najo, li hev tên. Çimkî kes hew kare weke berê dijmanatiyê bajo (M. Ê. Hemê 2015)

Hêla mala qesas, piştî çendakî xwe davêjin dextê kesên rîhsipî, malmezin û bixatir. Wan dixin nevbeyna xwe, rica dikin, bila herin cem xwîniyên wan. (F. Deniz 2016)

Wexta em di da'wekê de rûdinên ewil em dahrin cem hêla mezlûm, em li wan guhdarî dikin. Em bivêjin mêrekî wan hatiye kuştin, îja em xwe davêjin wan û em dibêjin biraqe bi pê dijmanatiyê nekevin. Heger qebûl bikin em dipirsin, em dibêjin ka hûn çi dixwazin? Ew jî bi perê îro tişteki dixwazin. Ji xeynî pereyan tiştên din jî hebin wan jî dibêjin. Carinan qîzekê

ya jî tiving ya jî devançekê jî dixwazin. Di pê re em vedigerin cem xwîniyên wan, heger mîqdarê hatibe xwestin giran were, evên din dibêjin bira li me werin rihmê û tiştêkî kêr bikin. Lê piranî hêla mezlûm çî bixwaze dibe weke wan. (M. Seydo 2016)

Heger şexsek bi derba yekî bê kuştin gerek ê qesas jî wer kuştin. Di şerîeta Îslamê de xwînek bi sed deveyî ye. Lê li cem me bazarek cîhê heye. Çimkî mîqdarî sed deveyî gelek e. Herkes nikare bide. (M. Mehmûd 2016)

Niha li Dêrikê xwînek bi 150-200 milyarî safî dibe. Le tu dakeve berriyê 300-400 milyarî jî da'we safî dibin. Ji berdêla pereyan erd jî tê stendin. Li gundekî ji bo xwîne derdora 70 donimî stendin. Da'wên bi dayina qîza jî safî dibin henin. Li Dêrikê vaye du heb xwehên hevdu, dane du birayên kalikê wan hatibû kuştin. (F. Ekinci 2016)

Di hinek meseleyên kuştinê de merivên meqtûl şînê danînin. Ev tê wê maneyê yanî ew ê lihevhatinê qebûl nekin û xwîniyên xwe bikujin. (M. Mehmûd 2016)

Carina du cahil li hev bixin, lê ne bi dujminatî be û bi darekî li hev bixin û yek yekî bikuje wê çaxê xwîn siviktir dibe. Çimkî ne bi qesta kuştinê li hev danin. Ya pir ya hindik hevdu razî dikin. Kuştina bi qeza be ji xwe xwîna wê tune ye. Kes da'wê li kesî nake. Le ji bo dilxweşkirina dinyê tiştêkî bidin mala meqtûl baş e. (H. Evdirihman 2016)

Çavê yekî rijiyabe mere nikare çavê qesas derxîne. Çimkî bi qezayî ye. Bedêla çavekî, nivê qesasa mêrekî ye. (M. Vural 2016)

Carna ji bo dilê wan li hev vebe keçika didin hev. Ya jî tiving, devançekê didin mala meqtûl. Xwîna mêrekî niha li cem me heta pênsed milyarî û carina jî hîn zêdetir e. (N. Ertekin 2015)

Hinek jê da'wê çênakin. Bi deh sala bi vî hawî dimînin. Carina hinek jî xwîniyên xwe dikujin. (E. Remo 2016)

Ev jî heye, hinek di hev de dibuhirin. Jê re dibêjin “Sem” wek yanî em pê heyfê nakevin. (M. Sönmez 2015)

Îja hinek kuştin hene ku kes guhê xwe nade wan cure kuştinan. Ew kuştinên di mewzûyên namûsê de ne. Ji bo meseleya namûsê kuştina keçekê bi destê bav, bira

yan jî pismamê wê mînakên van kuştina ne. Kêm be jî carinan mêrên bêexlaqî kiribin û dest avêtibin namûsa xizmên xwe, ew jî ji hêla malbatên xwe hatinin cezakirin. Di van kuştinan de adeta Kurda hê neguheriyê. Mela Mehmûdê Bazîdî di vê mijarê de wiha dibêje:

“Lakin ji boy namûsê jin, keç, dê û xwehên xwe dixeniqînin yan jehrî dikin. Axa û rîspî nabêjin te çima kuşt. (Bazîdî, 2012: 48)

1.1.2. Keçrevandin

Herçiqaş navê wê “revandin” be jî, bûyer bi qebûl û peymanan herdu aliyan bi cih tê. Dilketina keç û xortekî tişteki asayî ye. Dema ku malbat ji ber sedemên cur be cur destûrê nedin zewaca wan keç û xortan, ew jî hevdu digirin û bi hev re diçin warekî din. Heta ku malbatên wan li wan bipirsin û bûyerê safî bikin. Ev yek herwiha di metnên kevin de jî wek adeteke kurdan tê nîşan dayin.

“Keç revandin di nav Ekradan de ‘eyb nîne, lakin bi riza. Bê riza keçê nabî, wekû keç û kurî hevdu hebandin û bab, da keçê nedane wî kurî, îcarê ewê keçê direvîne, dibine mala axayekî û yanê şêxekî û xwediyên keçê bi pey dikevin. Eger li rê rast hatî, keçê û kurî herduyan dikujin. Eger rastî nehatî, selamet çûn, êdî xwediyê keçê nikare tişteki bike” (Bazîdî, 2012: 55) .

Li gorî agahiyên me ji çavkaniyên sehayê sitendine keç revandin li gundan gelekî çêdibe. Lê li vir keç û law werin girtin jî qet nayên kuştin. Di keç revandinê de ji xeynî çend bûyerên berê, van salên dawî kuştin hema bêjin neqewimiye. Lewma herdu aliyan ji hev hezkirine. Êrişeke bal bi namûsê ve tune ye. Agahiyên di derbarê keç revandinê de ji herêma hatine berhev kirin wiha ne:

Em bivêjin xortek keçikekê dixwaze û nadinê, heger bi dilê keçikê be jî îca hevdu direvînin. (E. Remo 2016)

Dirûma hineka tune ye gedê xwe bizewicînin, xortên wan jî ji xwe re yekê dibîne û direvîne. (Y. Dengiz 2016)

Heger dilê herduya hebe, hevdu direvînin. Jixwe gelek car em dibêjin hevdu revandine. Yanî çawa lawik dixwaze keçik jî bi wî şiklî dixwazin. Ê hevdu revandine heger qîz û xort bin de'wa wan safî dibe. Heger pîreka zewicî dev ji mêrê xwe berde û bi yekî din re bireve, ew da'we zû bi zû safî nabe. (Q. Güler 2016)

Lawik jî keçik jî piranî ji kesî re nabêjin mê birevin. Lê lawik ji bo bi rihetî xwe xelas bike û cî bivîne hewce bike dirûma xwe ji hinek heval û eqrûbê xwe re dibêje. (N. Tur 2016)

Asas revandina keçikê barê lêwik girantir dike. Çimkî em bivêjin qelenê keçikê pazde milyar e, heger ew keçik wer revandin, ji bo dewa wan çêbive mala bavê keçikê 40-50 milyar pere daxwazin. Ji wî perî jî bi qasî misqalekê ji keçikê re xera nakin. Mala bavê wê, wî perî dixwe. (M. Mehmûd 2016)

Di revandina keçika de ji ber ku bi dilê herduya ye kuştin pir kêr çêdibe. Hîna wexta ez qîz bûm yekî ji biniya xetê²⁰ keçik revandibû û anîbû mala bavê mi. Birayê keçikê cehelek bû çûbû bavê lêwik kuştibû. Jixwe revandin ne bi dilê herduya be, ew dibe de'wa namûsê ew jî bêyî kuştinê ne mimkûne safî bive. (E. Remo 2016)

Yekî keçikekê birevîne ya dibe cem malmezinekî, rîsîpiyekî; ya jî melakî. Pîştî çend roja bîna mala keçikê fire dibe û hêrsa wan dahre ew malmezin çend hebê li peyva wan tê guhdarkirin dişîne mala keçikê, ya jî ew bixwe di da'wê de rûdinê. (F. Ekincî 2016)

Carina hinek mal da'wê çêdikin lê keçika xwe hew dihewînin, vê jî dixin bazarê. (M. Vural 2016)

Aniha tu keçikekê ji gunda jî birevîne, tu ji hûndirê Dêrikê jî birevîne tu mecbûr bive gundekî ya jî bajarekî xerîb. Lê gund çêtir e. Çimkî sînorê gund belû ye. Xerîb nikare têkevê. Keçik û lawikê reviyane di wî gundî de ewle ne. (S. Yücel 2016)

Da'we li ser destê kê çêbive gerek ew ji serî heta binî de di da'wê de be. (V. Tüfek 2016)

Berê bi hespê hevdu direvandin, piştîre bi cêbê. Salê dawiyê îca bi mekîna hevdu direvînin. (S. Sulhan 2016)

²⁰ Şênîyên herêmê ji axa di nav tixûbê Sûrî re dimîne dibêjin "Biniya Xetê"

Di revandinê de keçik û lawik xwe xelas bikin, xwe davêjin dextlê yekî. Mecbûr ew şexs berî her tiştî mara wan bibire. Ji xwe ji keçikê dipirsin bê bi dilê wê ye ya na? Jê re dibêjin:

-Heger ne bi dilê te be em ê te ji lêwîk bistînin û vegeînin mala bavê te. (M. A. Ece 2015)

Wexta keçik û lawik xwe bavêje dextlê yekî, nabe ew şexsa bivêje ez we venahewînim. Çimkî di ûrf û adetên me de yek xwe bavêje dextlê te nabe tu wî vegeîne. Hinek xwe davêjin dextlê nasên xwe û hinek jî beyî nasitiyê xwe davêjin dextlê kesekî bixatir û xwedî hikûm. (Y. Dengiz 2016)

Ez zewicîbûm û mi kufleta xwe a duduya jî revand. Mala bavê kufleta mi zû bi zû da'w çênekirin. Îca xelkê ji wan re got: "Law ma aniha bi dilê keçika we ye, hûn çima meselê dirêj dikin." Mecbûr man çêkin. (H. Şêxmûs 2015)

Heta niha bi deha da'wên qîzrevandinê ez ketimê û bi îzna Xwedê li ser destê me saffibûne. Ma wextê em dikevin da'wa em bi bêrîka xwe dixesirin. Îja te dît ji bo Xwedê ye ha. (M. Seydo 2016)

Birayê mi û keçikek ji Tilbisim ji hev hez kirin. Îja pismamê keçikê ketin devê rê, dozmana xwe nedan me. Birê mi jî keçik revand. Pismamê wê di rê de bûn, da'w li me giran kirin. Sê sal berê me bi 35 milyara xwe ji da'wê pak kir. (F. Deniz 2016)

1.1.3. Sonddayin

Sond dayin bêhtir weke adeteke gundan tê dîtin. Çimkî di bûyerên weke dizîyê, zad çêrandinê, bêbextiyekê, kuştin û tiştên weke van meseleyên civakî de kesên ji hev dikevin gûmanan ewil hevûdu sond didin. Sond gerek di nav civatê de be û piranî li ser Quranê bê xwarin. Ji xeynê Quranê hinek hevûdu bi ûcax û ziyaretan jî sond didin. Awayê sond dayinê li herêma bi vî rengî ye:

Hinek dikevin bax û bîstanê hev, ya tiştêkî hev didizin hevdu sûnd didin. Ew şexsê wê sûnd bixwe desmêj digire. Ya li camiyê, ya li mala mele di nav cimaata hazir de destê xwe li Quranê dixin û sûnd dixwin. (Q. Güler 2016)

Sûnd li camiyê li nav cimaeta tê xwarin. Li ser Quranê sûnd tê xwarin. Kî were sûnd dayin destê xwe dide ser Quranê, dibêje “Bi vê Quranê mi pezê te nedizîye. Ya bi vê Quranê mi zadê te neçêrandiye. Mi filan tişt nekiriye ya mi nedîtiye, nebihîstiye.” (M. Selçuk 2016)

Li gundê derdora Ziyareta Dodê Şeda bi ziyaretê sûnd dixwin. Dibêjin sê gava ber bi Dodê Şeda bavêje û sûndê bixwe. Gelek heb newêrin bi vê ziyaretê sond bixwin. Heger tişteki ku kiribin hebe li xwe mikur tên. (H. Evdirihman 2016)

Em bivêjin te pere bi dehîn daye mi. Hinek wext di ortê re derbas dibe. Îja tu perê xwe dixwaze ez ji te re dibêjim “Mi perê te daye te” Ya mi ji bîr kiriye, ya jî mi bi rastî jî daye te, le nayê bîra te. Îca em hevdu sûnd didin. Em ê herdu jî sûndê bixwin. Carina hinek dikevin ortê û dibêjin sûnd guneh e. Ji devila hûnê sûndê bixwin, ew pereyê hûn qal dikan her yek ji we di nêvî de bibihurin û sûnd nexwin. (E. Remo 2016)

Di çêrandina zadan de jî em hevdu sûnd didin. Em bivêjin zad gîhaştiye. Serik girtîye, bi simil e û seridîye û hinek wî zadî diçêrne. Dilê xwediyê wî zadî li kê xera bive, wî sond dide. Heger lê tespît bike, xisara xwe jê distîne. Çar camêr dahrin ser erd, dibêjin xisar hew qas e û safî dibe. Berê ji cahilî me zadê hev gelekî diçêrand. Niha çêrandin kêmbûye. (Î. Çeviren 2016)

Carina em di nav xwe de sûndê dixwin. Em bivêjin tu û yekî di li hev nakin yek ji yekî re dibêje de ka sûnd bixwe, yê di jî hema li wir bi qewl sûndê dixwe. Yanî da'wêyê zêde najon, tê de dibuhurin. (Ş. Silêman 2016)

Ji Şêxamedê hinek hevdu dibin Qerejdax, bi Bul'ê sûnd dixwin. Bul' şêxekî Qerejdaxê ye. Hesinekî di nav tirafê de germ dike û îja wîya di zimanê mere dide. Wexta sûndê bixwe tê bivêje “Bi wî Bul'î mi filan tişt ya nediye, ya nekiriye” ka sûnda te li ser çibe tê wî tiştî bivêje. (D. Özer 2016)

Zilamê bi sûnda xwe ne bawer be, ya jî bi derewa sond xwaribe, di paşiya sûndê de qurbanekê şerjê dike. Yanî ev qurban dikeve ber wê sûnda derewîn. Melê me dibêjin heger sûnda we bi ûcaxan be hewceyî kefarete nake. Çimkî sûnd hew bi navê Xwedê ye. Sûndên dinê giş betal in. (M. A. Ece 2015)

1.2. Çend Mînak ji Kevneşopiyên Herêmê

Kevneşopiyên miletan beşek ji folklorê wan e. Cara ewil ev kevneşopî kengî rast bûne, kê qaîdeyên wan serast kirine? Elbet ev ji me ne malûm in. Ji xwe ji ber vê jî ew bûne malê folklorê. Her nîfşê ku ev kevneşopî ji yên pêşiya xwe sitendine yan qaîdenin nû lê zêde kirine, yan jî tiştin jê kêmkirine. Elbet ne mimkûn e ku cih û demên wan zêdekirin û kêmkirinan werin zanîn.

Di lêkolînên li sehayê tê dîtîn ku şênîyên hêrêma Dêrikê bi rabûn û rûniştin; bi ziman û edebiyata xwe gelek kevneşopiyên kurdan hê dişopînin. Çend mînak ji kevneşopiyên herêmê digel pratîkên îro yên di derbarê wan de ku ji kesên çavkanî hatine girtin wiha ne:

2.2.1. Berdêlî

Zêwacên “pê-guhurk” (berdêlî) ew in ku herî kêmkirî bi nîşanbûna du kesan û bi zewacên hemwext, pevguhertina jinan e. Daweta herdu cotan, gelek car di heman rojê de yan jî li pey hev çêdibin (Heckmann, 2012: 328).

Li gorî agahiyên çavkaniyan daye berdêlî di çanda Dêrikê de beriya niha hîn zêdetir berbelav bû. Hem ji ber giraniya qelenê bûkan, bi riya pevguherînê zewac hêsantir dibûn. Hem jî malbat bêhtir nêzîkî hevûdu dibûn. Lewma carinan hin kes dibêjin “Filankesê ji xwe re bikim berdêlî” bi vî awayî ji barê giran yê zewacê xelas dibe. Di salên dawî de ji ber pêşveçûnên cur be cur ên civakî, zewacên bi vê şêweyê êdî kêmkirî bûne.

Zewacên bi awayê berdêlîyê carinan dibin sedema pîrsgirêkan. Weke mînak heger jin û mêrek li hev nekin û bi berdêlîyê zewicîbin nikarin zû bi zû ji hev biqetin û pîrsgirêkên xwe bi hêsanî çareser bikin. Gelo ew ji hev biqetin wê rewşa berdêliya din çawa bibe? Digel pîrsgirêkên wiha li herêmê zewacên bi vî awayî ji hêla hin kesan ve jî weke siûdekê tê qebûl kirin. Strana li jêr ku li dawetên herêmê tê gotin, piştgiriya bi vê şêwe zewacê re nîşanî me dide:

*“Çi darika li kepirê Qîz û
xorta xar dibirê Xweziya mi
bi dilê wê keçkê*

Bû berdêliya bav û birê” (E. Remo 2016)

Awayê vê toreyê li herêmê wiha ye:

Yek xweha xwe dide yekî din, di berdêlê de xweha ewê di jê distîne. Carina jî hinan keçikê xwe ji xwe re dikirin berdêlî. Lê asas piranî bira, xwehên xwe ji xwe re dikin berdêlî. Apê mi jî biraziya xwe ji xwe re kiriye berdêlî. (S. Yücel 2016)

Mi keçika xwe ji torinê xwe re kiriye berdêlî. (N. Tur 2016)

Wexta em berdêlî didin hev em her kê qîza xwe siwar dikin û li ciyekî di ortê de hev dibînin û bûka bi hev re digûherin. Kes tiştekî ji kesî nastîne. Yanî em keçika ser bi ser didin hev. (E. Remo 2016)

Heger ji keçikê dibin berdêliyê hev yek ji wan ne di wextê zewacê de be, wanê dinê bûka xwe derdixin, a biçûk dihêlin. Çi seeta bikeve wextê zewacê wê jî derdixin. (A. Deniz 2016)

Zewacê hinek mala ê bi berdêlî zêdeyî yekê ne. Em bivêjin di bavîkekî de şeş heft zewacê wan ê bi berdêlî henin. Îja ji wan yek li hev neke û bixwaze hev berdîn, ê dinê nahêlin. Dibêjin heger em yekê berdîn, gerek em gişa berdîn. (S. Vural 2016)

Du heb berdêliyê hev hebin û hewî were ser wan yekê, gerek îja hewiyê bînin ser berdêliya di jî. Pîreka hewî hatibe ser bixwaze ji mêrê xwe biqete, mala bavê wê nahêlê. Çimkî ew were malê, gerek mecbûrî evana jî jina xwe berdîn. (B. Erol 2016)

Ez berdêliya birê xwe me. Hinek berdêlî wexta hevdu berdidin dibêjin biraqe ewên dinê jî berdîn. Gede hebe tune be wan berdidin. (Q. Güler 2016)

Berdêlî li hêla çiyê dewam dike. Li hundirê bajêr zêde berdêlî tune ye. (F. Deniz 2016)

Li hev nakin. Adetek nexweş e. Pir xeyd û kuştin çêdibe. (F. Ekinci 2016)

Tevî ku hinek kesên çavkaniyên me yên bi riya berdêliyê zewicîne, li herêmê bi gelemperî nerazîbûnek li hemberî vê şêwe zewacê heye. Li gorî me li sehayê bi nêrînen xwe û bi agahiyên çavkaniyên li sehayê tesbît kir, li hêla beriyê û li navenda

Dêrikê berdêlî niha daketiye asta herî jêr. Gundên çiyê vê adetê ji gundên beriyê bêhtir diajon.

1.2.2. Kirîvantî

Ji metnên berê tê famkirin ku di nav gelê Kurd de kirîvantî adedeke kevn û bicîhbûyî ye. Herwiha hinek pratîk û qaîdeyên vê adetê yê dihatin tetbîq kirin li Dêrik û derdora wê bi şeweyên wekî din tê bicihanîn.

“Ekra dawa kirîwayî dîkin û dibine kirîvêd yekûdû. Ew jî adet wisan wekî yekî mirad dîkitin ko mirovekî ji boy xwe bikîtin kirîw, eger ew herdu mirov jora jorîn e (malmezî in) tînin berê hespekî dixemilînin bi rext û taxim verêdîkin mala wî mirovî ko bilane bibite kirîwê min. Ew jî qebûl dîkitin û bexşîşekî didine wî mirovê ko hesp birine û cewabê dide ko belê ez dê bibime kirîw. Û eger ew herdu mirovêd ko kirîwayî dîkin ji qismê ewset (navîn) û yaxod edna ne (hejar, feqîr) ew jî beranekî dixemilînin û dişînin mala kirîwî. Îcarê ew dibin kirîw” (Bazîdî, 2012: 73).

Kesên ku bi tayê kirîvantiyê digêhêjin hev, zû bi zû êdî hew ji hev vediqetin. Herwiha kirîvantî di nav malbatan de hezkirinê jî zêde dike. Lê hinek astengiyan jî bi xwe re tîne. Astengiya herî mezin baweriya nedurîstbûna zewaca kirîvan e. “Kirîvnin me li Sûsikê (gundekî Dêrikê) hebûn. Me dikira qîzek wan bixwesta. Xelkê em hetikandin, ji mere gotin: Kuro ma ne eyb e ji we re! Hûnê çawa bibin xwestiyên keçika kirîvên xwe.” (M. Û. Hemê 2016)

Li Dêrik û derdora wê ev kevneşopî wiha bi cih bûye:

Kirîvantî ne merîvantî ye. Tenê dostayîyek e. Însanê ji hev hez dîkin ji bo ji hev neqetin, kirîvantiyê datînin. Kirîb di ber hev re xwîne nadin. Di ber hev re mêra nakujin. (M. Seydo 2016)

Du heb ji berê de merîvê hevbin nabin kirîb. Heger ji eşîrekê bin jî nabin. Du eşîrê cihê bi hev re karin bîvin kirîb. Lê eşîr giş nabe kirîbê hev, hew her du malê kirîvantiyê datînin dibin kirîb. (M. Selçuk 2016)

Jixwe mere û merivê xwe ji xwînekê ne. Îja şexsek ya malek wexta kêfa me û wan ji hev re were, mere dixwaze wê dostaya xwe daîm bike. Lewma mere kirîvantiyê datîne. (M. Vural 2016)

Yekî mere dixwaze pê re kirîvantiyê deyne, berî sunnetê çendakî mere jê re meselê dibêje. Heger ew jî kirîvantiyê qebûl bike, îca mere di nav xwe de wextekî tayin dike. (V. Tüfek 2016)

Di sunetê normal de kes nê çênake. Le heger sunet, bi kirîbantî be nan tê çêkirin û wek dawetekê ê; hatine giş nan dixwin. Suhbet tê kirin, her kes bi kêf û henek e. (R. Vural 2016)

Me û Sarxwaniya kirîvantî danî. Mi çar lawê xwe xist dawa wan, wan jî sisêyê xwe xistin dawa mi. Me ji wan her yekî re cotek qondere, gumleg, bedil kirîn. Wan jî ji pîrekê mere zêr, sol, kiras anîn. (H. Evdirihman 2016)

Ji berê de dibêjin zewaca kirîba nabe. Me dikira yek ji Wêranşarê bixwesta mala keçikê go:

-Ma em û hûn bûnin kirîbê hev. Hûn radibin keçika me dixwazin. (E. Selçuk 2015)

Şer'en zewaca kirîba helal e. Miletê me ji xwe re heram kiriye. (M. Mehmûd 2016)

Xwîna mere li dawa hev dikeve, ji wê seetê û pêve zewaca kirîba li hev nabe. (M. Selçuk 2016)

Li cem me kirîb bi hev re dizewicin. Me metika mi daye kirîbê xwe. (M. Bûbê 2016)

Li gor baweriya civakî ya herêmê kirîv bi hev re nazewicin. Tenê du kes ji çavkaniyên me ku ilmê Îslamî xwendine û mela ne zewaca kirîvan minasîb qebûl dikin. Bi rastî jî di Îslamê de tu qedexeyeke di vî warî de tune ye. Di Qurana pîroz de kesên zewaca wan heram in Xwedê Teala di sûretê Nîsa de wiha rêz kiriye:

“Li ser we hate heramkirin ku hûn va jinka li xwe mehir bikin: Dayikên we û kiçên we û xûşkên we û metên we û xaletên we û kiçên birayên we û kiçên xûşkên we û dayikên we yên şîrî û xûşkên we yên şîrî û dayikên kevaniyên we û nevîsiyên we ewên ku di malên we de kiçên wa kevaniyên we ewên ku hûn çûne nîvîna dayikên wa,

belê hege hûn neçûbine nivînê dayikên wa, hingê bo we tu guneh nîne ku hûn wa kiçka li xwe mehir bikin û kevaniyên kurên we bi xwe li ser we heram in û her dîsa heram e ku hûn du xûşka bi hev re li bin mehrekê kom biken, ewa borî ew çû, ew çûne. Xudê Teala gelekî efîker e û gele yî bi rehm e". (Hakkarî, 2007: Sûretê Nîsa/23).

Saziyek an jî tîkiliyê civakî ya bi navê "kirîvantî"yê di vir de nehatiye jimartin û zewaca wan nehatiye qedexe kirin. Di baweriya Êzîdiyan de kirîvantî bêhtir bi awayekî rîk û pêk, bi hin qaîdeyên rûnîştî cih digire. Herwiha li gorî wan zewaca kirîvan jî qedexe ye.

Ji bo sunnetê amadekariyê mezîna tî çêkirin û nanekî mezîna didine mêvanan. Piştî kirîvekî minasib tî dîtin. Kirîv di Êzîdiyan de ji nav alimên dînî tî bijartin. Çimkî zewaca kesên dibin kirîv heta pênc nîşa qedexe ye. Ev jî dibe sebeba kêmbûna serjimara Êzîdiyan. Ji ber vê jî carinan bi misilmanan re kirîvantiyê datînin. (Taşgîn, 2007: 185).

Hege em ji vê agahiyê derkevin rê em dikarin bêjin ku di nav Kurdên Misilman de jî hebûna qedexeya zewaca kirîvan, dibe ku ji baweriya Kurdên Êzîdî hatibe û bi cih bûbe. Îhtimala duduyan jî ew e ku qedexeya zewaca kirîvan di adetên Kurdan de ji mêj ve heye. Kurd ku bûne misilman jî ev adet ji nav wan hilnehatiye. Ji bo ev îhtimal werin piştrast kirin divê dîroka kirîvantiyê baş were zanîn. Weke di vir de jî tî dîtin di Îslamiyê de qedexeyek bi vê şeweyê tune ye. Jixwe Kurdên Misilman nabêjin: Zewaca bi kirîvan re heram e, dibêjin: "Ne rast e, yan jî bi kirîvan re zewac nabe."

1.2.3. Bêşkirin

"Bêş" di kevneşopîya Kurdan de cureyekî hevkarîyê ye. *Bêş* ew e ku di nava malbat, tax, êl, gund an jî eşîrekê de ji bo rewşeke awarte û hin bûyerên din, bi mebesta pîbarî hevderketinê hevdayina hêzeke maddî ye. Her kes û malbat bêşa ku li wan hatibe birrîn didin û bi alîkariyê civakî heq ji pîrsgirêkên xwe derdikevin.

Bêş carinan tenê ji malbatekê, carinan ji gundekî û heke bûyer mezîna be ji gundên eşîrê giştikan û endamên eşîrê yê li bajaran tî berhevkin. Bêşên ku eşîrî

bin, piranî ji kesên ku ji bavikekî tên berhev dibe. Li Colemêrgê jî di mînakeke bêşê de em dibînin ku ew kesên *bêş* li wan hatine birrîn, giş mensûbê heman eşîrê ne. (Heckmann, 2012: 37). Ev kevneşopî li herêma Dêrikê aniha hîna tê meşandin. Li Dêrik û derdora wê agahiyên di derbarê vê mijarê de ev in:

Bêş bi du hawa tê hevdan. A ewil: Heger tiştêkî nexweş hebe; afatek qewimîbe, xwînek ketibe hustê eşîrê û ji bo meselê wekî din bêş tê hevdan. A duduya: Lazimiyê tiştên din hebin, wek camî ya jî rê ji gund û mehelê re çêbibe bêş tê hevdan. Qeysa bêşê gelek car ji hêla mezin û rîsîpiya li gorî halê mala tê birrîn. (Y. Dengiz 2015)

Heger merivekî me mexdûr bibe, jinekê bixwaze û qeweta wî negihêjê, ya jî jinekê birevîne, dûrî van dera xwîn bi ser de were kî ji me karibe çî biqedîne em di nav xwe de top dikin û didinê. (M. Sönmez 2015)

Heger bêş were ser te mecbûr tu wê bêşê bide. Aniha vaye Meleyê me yê gund xaniyê wî şewitiye. Em ê jê re xaniyekî ava bikin. Serê malê herkê 750 milyon li me birrîne. Ez ê bidim. Gundiyê me ê li bajêr (Wêranşar-Qoser) jî herkê 200 milyon xistine bêşê. (M. A. Ece 2015)

Şîne me çêdibûn, me diçû konê gundê dinê tanî vedikir. Salê çûnî me herkê tiştêk di nav xwe de da hev, me ji xwe re konekî şîne kirî. (C. Çeviren 2015)

Carina li gorî halê herkesî herkê tiştêkî li wan dibirrin. Carina jî serbest e, kî karibe çî biqedîne wî dide. Ê me sala çûnî merivnin me ketin ber hev û derbek wan li çavê yekî navbêncî ket. 70 milyar ji bo wî çavî me di nav merivên xwe ê li Qezê, Wêranşar û Maşmaşkê da hev. Ê mi 2 milyar li mi birî bûn. (İ. Ece 2015)

Di hinek mijarên siyasî de jî gelê herêmê bi hev re dibin alîkar û vê yekê jî weke mînaka bêşê nîşan didin:

Ji eşîrekê hinek ji bo reîstiya belediyê ya ji bo herin miçlisê dikevin partiya. Wê çaxê jî ahlê wê eşîrê herkê tiştêkî didin wî yê ketiye partiyê. (S. Sulhan 2016)

Li herêmê bi riya “bêş”ê alîkariyeke xurt di nav civakê de sazûye. Herçiqas carinan belengazî ji ber pergala eşîrtiyê çêbibe jî yek aliyekî xweş ê eşîran jî li hev xwedî derketin e. Bi saya bêşkirinê, gelê herêmê barên hev sivik dikin; hêza jiyana hevpar zêdetir dikin.

1.2.4. Palûte

Bi taybetî li gundan ji ber sedemên weke jiyana bi hev re ya ji mêj ve û kêmaniya derfetan, pêwistiya hevkarîya mirovan bi hev re zêdetir çêdibe. Di çandiniyan de, di avakirin û îmara qadên hevpar ên li gundan de yan jî di kar û barên rojane yê malî de ev hevkarî bêtir derdikeve pêş. Ji xeynî gundan li navenda bajaran jî di hinek qadên hewce de mirov diçin palûta hevûdu. Li herêmê hinek şênî ji palûte re bi navekî dinê dibêjin “fezi’ danîn”.

Di demên borî de di dahnkutanê de, di paletîya çandinî û çinînê de, di hevdayina zeytûnan de, di avakirin û seyandina xaniyan de gelek caran gelê herêmê bi hev re dişuxulîn. Niha di hinek aliyên de palûte rabûbe jî di hinek warên din de didome.

Em dibêjin “fezi’ danîn” mesela em nîskê yekî bi hev re diçin. Wekî din li cem me kevir di erdê de gelek in. Salê carekê gerek em wan kevira ji erd vedin. Îja em çend heb dibin hevalê hev û em bi hev re kevira ji nav erd vedidin. (H. Evdirihman 2016)

Gelek heb zeytûnê xwe bi hev re didin hev. Em bivêjin îro em ê bi hev re zeytûnê mi bidin hev, sibê jî em ê zeytûnê yekî din bidin hev. Di kutana zeytûna de jî em pîbarî hev dibin. Pîrek û gede li malekê kom dibin û zeytûnê wan ji wan re dikutin. Çimkî piraniya zeytûnê xwe em dikutin, dixin siravkê û difroşin. (F. Deniz 2016)

Mele nuh hat gûndê me, me gundiya jê re xaniyê wî bi axê seyand. Ya jî ji bo zivtanî em ji malekê her yek bi hev re dahrin qîtikê pembo ji melê re didin hev. (D. Özer 2016)

Di cotkirina erda de xortê me bi hev re cot dikin. Bi du sê terextora li erdê yekî dicivin xelas dikin, îja dahrin ê hevalê xwe yê din cot dikin. (N. Yurtgöl 2016)

Tu bivê nebêje em karê hev di nav xwe de dimeşînin, em direvin îşê hev. Em yek bi yekî em giş bi Xwedê ne berxê mino. (Z. M. Qado 2015)

Di daweta de, di taziya de em dibin hevalê hev û nê çêdikin. Heçî xort wî nanî bela dikan di pê re jî didin hev. Keçikê me dikevin ber firaxê gemarî û dişon. Îca wexta dora me yekî din were herkes pîbarî wî dibin. (M.A. Ece 2015)

1.2.5. Şopgerandin/Şopajotin

Şopajotin ew e ku bi dapêyina hin îşaret û elametan lêgerîna tişteki wendayî, kişfkirina tişteki veşartî yan jî tişteki hatibe dizîn. Îro şopajotin, di mijarên cihê cihê de bi awayên teknolojîk ji hêla pisporên vî karî digel rê û rêbaz û amûrên vî karî tê meşandin. Digel qadên wekî din, di jiyana bejahî de hewcedariya bi şopajotinê gelekî zêde ye. Pez û dewarên tîn dizîn, zadên tîn çêrandin ew mijarên sereke ne ku ji bo kişfkirina wan pêdivî bi şopajotinê heye.

Li Dêrikê şopajotin, ku karekî ji bav û kalan maye, bi taybetî ji hêla şênîyên gundan ve tê kirin. “Seydo” ku li Kevirşîna Metînan e şopgerêkî bi nav û deng e herêmê ye. Temenê wî derdora heftêyî ye. Digel temenê xwe yê derbasbûyî hê jî şopê digerîne. Di hevdişinê de ji me re got ku ew çend roj berê çûye deşta Mûşê wî li wir şop gerandiye. Dîsa Sêlimê Heno, li gundê bi navê “Selmê” rûdinê, şopgerêkî naskirî ye. Çavkaniyên me awayê şopajotinê wiha veguhastine:

Em şopê pirranî di diziya pez û dewêr de dajon. Şopçiyê baş ‘eyn zane bê çend serî terş hatiye birin û diz çend hebin. (M. C. Tüfek 2016)

Ceh, genim ya ji nîskê me serik girtibe û stewyabe, le hineka çêrandibe ev dibe dijminatî. Îjarê em ji bo wê jî şopê digerînin. (E. Tekin 2016)

Em bivêjin nigê te li kevirêkî ketiye ew kevir ji ciyê xwe bileqe ew dibe nîşanek. Ya jî em bivêjin te arek vêxistiye teniya wî arî heta dunya hebe li wî kevirî dimîne. Şopa niga bi roj û bi şev ji hev cihê ye. Bi şev laşê mere giran dibe, çavê însên li xew e; şopa niga bi şev bêtir bi erdê ve dahre. Bi ro beden sivik e, şopa niga ne zêde kûr e. Wekî din em bivêjin, ser meselê tu şopekê

dajo, kevirek herî lêketibe ew ya heriya simê pez û dewêr e; ya jî heriya nigê wanê em li pê wan e. (S. Kevirşînî 2016)

Şopçiyê berê Hemê Şexmûsa û Teharê Ubêd gelekî baş bûn. Niha şopçiyê zêde baş nemane. (H. Evdirihman 2016)

Şopçî wexta li pê şopekê be ewil gerek li derdora wê mentîqê giroverekê çêdike û li çar hawîrdor bizîvire. Heta çav li nîşanekê bikeve, di pê re li wê dewesê dimeşe. (S. Sönmez 2015)

Me ji Eynteriyê heta Maşmaşkê şopa tivinga xwe yî wendayî ajot. ‘Eyn em gîhaştin ber mala tivinga me dizîbû. Me tivinga xwe bi dîwêr ve aliqî dît. (Y. Dengiz 2015)

Carekê em li pê şopa zilamnan bûn. Şopger çû şop li ser gundekî danî. Le go: “Dibe li vî gundî nesekinîbin.” Îjarê li dora wî gundî jî zîvirî. Go: “Heger li hêla dinê a gund şop hebe ji vir derketinin. Heger şop tune be li vî gundî sekinînin, ji vir veneqetiyân in. (E. Remo 2016)

Herkes nikare şopê bigerîne. Carina em dahrin ji derê dûr tînin. Pezê mi hat dîzin mi çû şopçî anî. Me şop ajot heta ser riya reş. Ji wir û pêve şop wendabû. Qey pez li wir li mekîne kiribûn. (S. Sulhan 2016)

Tiştekî me ji malê were dizîn em şopê digerînin. Mesele biçûk be em wer dikin. Le heger mezin be em dahrin li cem hikûmetê gilî dikin. (N. Ertekin 2015)

Niha şopgerandin li gorî berê kêmbûye. Berê şopçiyê meşûr, bi nav û deng hebûn. Weleh hinek hebûn hingî pez û dewarê xelkê vedigerandin, îja dizeka ew dikuştin. Mamedê şopçî ji Mîlanê bû. Şopajot çû ser şikeftê. Ewê wî şopa wan diajot bera iniyê danê, kuştin. (D. Özer 2016)

Şopgerandina diziyê nuha jî heye. Şopgerandina kuştina mêra û revandina keçika va salê dawî me nebihîstiyê. (M. Seydo 2016)

Şexsê şopê digerîne tu tiştek vê re tune ye. Şopê bi şûna solekê, bi çavê xwe û bi erdê derdixin. (X. Xatûn 2016)

Li gorî agahiyên çavkaniyan dane me niha şopajotin kêmbûye. Disa jî digel pêşveçûn û teknolojiya îro û krîmînalê hê jî şopajotin di nav gel de dewam dike. Xala sereke di dewamkirina vê kevneşopiyê de ew e ku hinek bûyer veşartî dimîne û qet

eşkere nabin. Lewma gel jî li gorî xwe hin rêç û rêbazan dimeşînin. Ya di jî ew e ku gel dixwaze meseleyên xwe bi rê û rêbazên xwe, bi riya bav û kalan safî bikin.

1.2.6. Pêşwazîkirin û Birêkirina Mêvanan

Qedirnasî û mêvanperweriya Kurdan ji mêj ve meşhûr e. Di Şerefnamê de ev yek wiha hatiye destnîşankirin:

“Mirovên sade, bêkar û nexwendewarên Kurd ji bo kar, emekdarî û rêzlêgirtina dê û babên xwe û mêvanperweriyê, di cîhanê de tekesiwarên meydane ne. Di her warî de çavtêr û destvekirî ne.” (Bedlîsî, 2007: 103)

Digel dîtinên me yên berê, di dema gera li sehayê li derên ku em bûne mêvan ên weke dawet, şîn, odayên malmezinan û mêvandariyên din me di warê mêvandariya herêmê de bi awayekî zelal rewş wiha dît:

Weke mêvanek were civatê cih didinê. Heger temen mezin yan jî zanayek be wî derbasî serê civatê dikan. Kesên rûniştî yek bi yek jê re dibêjin:

-“Merheba!” yan jî dibêjin: “Tu bi xêr hatî”.

Eger hevnas bin, jixwe sohbetê dikan. Nenas bin li gund, eşîr û êlên hev dipirsin û hevûdu nas dikan. Mêvandarî nêzî wextê nê be, bêyî jê bipirsin haziriya nanê mêvên dikan. Eger ne wextê nan be dîsa jê dipirsin “Tu bi nan û bi av e?”. Xwarin çibe para xweş didin ber mêvên, jê re goşt bi destên xwe hur dikan. Mêvan jî divê wî goştî bixwe. Pez serjê kiribin serê sewala serjêkirî datînin ser mersefa xwarinê. Di xwarinê de mazûban tu carî beriya mêvên ji ser sifrê ranabe, têr xwaribe jî xwe diştexilîne ji bo mêvan ber fediyê nekeve û nanê xwe bi rihetî bixwe. Mêvan ji ser nê rabe, xortek misînê avê di dest de û xewliyek li ser milê wî li bende mêvên sekiniye. Avê li destê mêvanê xwe dike. Ger êvar be bira û pismamên mazûbên jî têne cem mêvanan. Paşê qutiya tûtina xwe derdixin, dirêjî mêvanê xwe dikan da ku ew jî ji xwe re cixareyekê bipêçe. Havîn be û germ zêde be xortekî malê radihêle xewliyekê û bawêşîne li mêvanê xwe dike ji bo hênik bive.

Wekî din eger di nav civatê de av were ji wan yekî re, ne mimkûn e ku ew kes avê vexwe. Îlla dirêjî yê dora xwe teva dike. Heta îro ne qabil e ku bi vî rengî tu kesî av ji destê hev girtibe, lê dîsa jî ev adet berdewam e. Kesên din dibêjin:

-“Şifa be” Paşê ava xwe vedixê. Dema jin û zilam bi hev re li civatê bin û jin avê vexwin berê xwe ji zilaman diguherînin û avê vedixun. Ji xeynî civînên weke şîn û dawetan, di mêvandariyan de zilam û jin di odeyekê de rûdinên. Jinên Dêrikî cahûd û mêvanperwer in. Ger zilam ne li malê bin jî dikarin weke mazûban gelek mêvanan birê bikin.

Mazûban, gelek car ji mêvanan re dibêje “We em îro xenê kirin” bi vî awayî dixwaze bide hizirkirin ku ji ber hatina mêvên bi kêf e. Eger mêvan bixwaze biçe derve xortên malê çeng dibin, berî wî radibin solên wî datînin ber nigê wî û hewce be haziriyên din jî dikin. Mazûban dema mêvanê wî ji mal vediqete ger hin gumanên wî hebin mêvanê xwe xewle dike, dibêje: “Tu lazimiyê te hene, emrê xwe bivêje, tu ji xwe hatibû?” Ger hewcedariyek mêvên hebe jê re dibêje. Tunebe jî ji mazûban re dibêje: “Bira tu û gedekê xwe sax bin”. Herî dawî de mazûban dibêje:

- “Te ji wir heta vir pê li ser çavê mi kiriyê.” Ahlê malbata mêvên çî nas bin, çî jî nenas bin bi gotinên weke “Silava li geda bike, silava li xweha mi bike” yan “Silava li kufletê xwe bike”. Mêvan jî li wir dibêje: ”Êlêkûm silam, ser çavê mi.“ û bi riya xwe ve diçe.

2. SERDEMÊN JIYANÊ

Kurd yek ji gelê niştecih ên Mezopotomyayê ne. Weke erdnîgariyek pirçandî û piretnîkî Mezopotamya bandor li ser şiklgiirtina çanda kurdan hiştiye. Kurd bi Ereb, Ecem, Ermen û Tirkan re cîran in. Herwiha milletên din ên çî bi riyên bazirganiyê xwe gîhandibin erdnîgariya Kurdan çî jî ji bo şer û gerê hatine vê axê elbet di avabûna vê çandê de xwedî rolên mezin in.

Li herêmê çawa di gelek warên jiyane de çandê hevpar ava bûye herwiha di serencamên mirovan de jî gelek qaîde û adetên hevpar bi cih bûne. Di serê van serencamên mirovan de serdemên jiyana mirovan tê. Her mirov di jiyana xwe de qet nebe carekê di zayin, zewac û mirinê de dibe “kesê navend” ê van serdeman. Niha em ê bi agahiyên teorîk û agahiyên ku ji çavkaniyên herêma Dêrikê hatine bidest xistin li ser van serdeman rawestin.

2.1. Zayin

Êwra sereke ya jiyana mirovan bêgûman zayin e. Zayin bi serdemên beriya xwe û di pê xwe re êwreke berfireh e. Gelek merhaleyên vê êwrê hene. Niha em ê yek bi yek li van merhaleyan binerin.

2.1.1. Dermankirina Kordûndetiyê

Di roja me de ku tiba modern gelekî pêşde çûye kesên ku nabin xwedî zarok ewil hêviyê ji bijîşk û nexweşxaneyan dikin. Lê di ber re jî, rê û rêbazên tedawiyên gelêrî jî diceribînin. Çavkaniyan ev rê û rêbaz wiha neqilkin:

Pîrekên gedê wan çênabin berê çelê wan tê birrîn. Çelê pîrekê bi şimayê dibirrin. Di pê re jî xwe bi ava wê şimayê dişon. Sebeba birrîna çel ew e ku belkî çelê şexsekî mirî ya jî jinikek zêstanî li wê pîrekê geriyabe. (Q. Güler 2016)

Hinek xenîm li ser wan henin. Gerek xenîm ji ser wan rabin. Ya na gedê wan çênabin. Gelek cara gede ji ber wan dahre. Şêx xenîmê wan radikin. Dermana didin wan, dixwin. (Z.M. Qado 2015)

Pîreka Xwedê derguşê nadê belkî malgedeya wê ne rast be. Wê dibin cem pîrika. Malgeda wê rast dikin. (S. Yücel 2016)

Pîrekê me yê Xwedê geda nadin wan, em wan dibin cem Şêx Seyfulla, cem Şêx Qedrî, Şêx Badîn bi îzna Xwedê li ser destê wan pîrekê me bi halekî dimînin. Vanê ez dibêjim şêxê Ciyarbekir²¹ in. Îca gedekê li ser destê wa şêxa çêdibe gerek şêx nav li wan bike. (A. Deniz 2015)

Ji bo pîrek bi halekî bimînin goştê kîrgo bi wan didin xwarin. Gerek kîrgoyê bejî be. Bûka me gedekê wê çenedibû, çend cara goştê kîrgo xwar, bi halekî ma. (Y. Ş. Eysê 2015)

Pîreka dibin ziyareta Kosewelî. Êvara înyê dahrin ber ziyaretê, şevêkê li ber ziyaretê rakeve, ji bo himlê pîrekê baş e. (V. Tüfek 2016)

²¹ Diyarbekir

Gelê herêmê ji bo çareserkirina Kordûndetiyê tedawiyên hekîmiya gelêrî bi kar tînin. Digel vê yekê bi taybetî bawerî û hêviya bi şêxan jî di asteke bilind de ye.

2.1.2. Pîreka Zêstanî û Dergûşa wê

Zayin li nexweşxanê be, du sê saetan pitikê û dayika wê li wir digirin di pê re dişînin malê. Eger jinika biheml li mala xwe bi alîkariya pîrikan ji hemlê xwe xelas bûbe, nivînê wê radixin û dergûşa wê jî didin ber wê. Derhal pitikê şîr didin. Niha digel zayinên li nexweşxaneyan, li mala û bi alîkariya pîrikan jî zayin çêdibin. Eger bi silametî zarok biwelide îca merhaleyek nû dest pê dike. Agahiyên di vî warî de wiha ne:

Piştî Xwedê wan herduya bi silametî ji hev xelas dike, dergûşa dê didin kêleka wê. Du sê cara dest û nigê wê difirkînin. Çimkî movik û mefselê pîrekê gîş ji hev derdikevin. Di pê re sênîkek dims û hêk didin ber, dixwe. Ew cebbar e. Mefsela dicebirîne. (Q. Güler 2016)

Pîreka Xwedê dergûşê didê, gerek mere çend cara çelê wê bibire. (A. Deniz 2015)

Em çelê pîrekê dibirrin û pê ve, wê ava çelê wê pê hatiye birrîn, her carê piçekî dixin xwarin û vexwarina wê. (E. Remo 2016)

Xwedê gedeka me ji mere bihêle, çarşema ewil li ser serê dergûşê şima tê girtin. Şimayê dixin nav avê. Sê cara dixin nav avê û dixin nav yaxê, di ser serê dergûşê re digrin. Sê çarşema gerek mere wer bike. (F. Deniz 2016)

Ji bo keçika yek û ji bo lawika em du qurbana şerjê dikin. (M. Mehmûd 2016)
Heta çel royî gerek mere li wan miqatebe, jinika çelînî gerek tu carî tenê nemîne. (V. Tüfek 2016)

Berê heta çelê pîreka dernekata gava xwe nedavêtin ji derve. Aniha ne wa ye. Ruya sisiya çara hema derdikevin ji derve. (H. Şêxmûs 2011)

Pîrekê zêstanî gerek derzîya wan di destê wan de be. Her carê wê derziyê di xwarin û vexwarina xwe dadikin dûre dixwin û vedixwin. Bira ê ji me çêtir zirarekê nede jinika zêstanî. (Y. Ş. Eysê 2016)

2.1.3. Navikberrîn

Dema zarok diwelidin, yek ji karên ewil ku gerek were kirin berrîna navikê ye. Li gorî derfet û baweriyên bi amûrên cur be cur navik tîna berrîn. Kevir, kêr, meqes, jilêt hinek amûr in ku navika zarokan bi wan tîna berrîn. Bazîdî îfade dike ku bi şûr û amûrên zêr jî navik hatine berrîn:

“Wekû dinê ku li nik ekradan wisanî meşhûr û bawer e ko wekû zarok tîna dinyayê û ji dayê diwelide, me’lûm ko paşê navika wî dibirin, goya bi çî navika zarokî bibirrin, goya ew zarok wekî mezin dibitin di wê şolê de qewî mahir dibin. Mesela wekû navika kuran bi şîrî bibirin, ew kur şervan û camêr dibî. Eger navika kuran bi qelemê bibirrin, ew kur paşê ehl qelem û mela û katib dibî. Navika keçan jî eger bi zêr û amûrên zêran bibirin, goya ew keçê dibite xanim û xatûn û xweyî cil û nî’met dibe” (Bazîdî, 2012: 101).

Di derbarê navika zarokên nûzayî de baweriyên ji hev cuda henin. Li Dêrikê navika tîna berrîn dibin davêjin dibistanekê ya jî mizgeftê. Ji vê bawerî ew e ku wê ew zarok bibe xwende û zana. Herwiha hinek qebûlên din di derbarê amûra navik pê tîna berrîn hene. Pratîkên derbarê navikberrînê de li herêma Dêrikê wiha ne:

Ez bi meqesê navikê dibirim. Meqesa em pê navikê dibirrin em dixin qulekê û vedişêrin. Gerek ew meqes bes bê şixulandin. Ya na birîn rihet nabe. Bi kêrê navik nayê berrîn. (Q. Güler 2016)

Bi jilêt jî navik tîna birîn. (X. Xatûnê 2016)

Ez navikê dibirrim û pêve hinek qehwe ya jî kil bera ser didim. (R. Vural 2016)

Pîşo ji navikê re baş e. Navika tîna berrîn hinek pîşo bera didinê. Navikê îşk dike. (E. Remo 2016)

Navik were berrîn û pêve, di çend roya de ya maye hişk dibe û dikeve. (Z. M. Qado 2015)

Em navikê davêjin odê²² biraqe bive beg û axe. Berê me dibir nav keriyê pez, me digot bira bive şivan. (N. Tur 2016)

Navikê davêjin camiya, mekteba. (S. Vural 2016)

Li herêmê di nava gel de ew hêvî û bawerî heye ku navikê bavêjin kîderê, di pêşeroja zarokan de wê bandora vî karî derkeve holê. Herwiha bi tedawiyên gelêrî jî dixwazin rê li ber nerihetiyên ku piştî birrîna navikê derkeve holê bigirin.

2.1.4. Heftek

Hefteya ewil ji bo siheta zarokên nûçêbûyî gelekî girîng e. Li gorî baweriyê eger zarok hefteya ewil bi silametî derbas bikin, êdî wê bi silametî mezin bibin. Çîmkî di salên borî de hinek zarok di hefta xwe yî ewil de dimirin. Li herêmê ji zarokên ku di hefteya ewil de mirine, dibêjin: “Heftekê lê xistiye”. Eger zarok piştî diwelidîn hefteya ewil bi sax û silametî derbas bikin, malbatên wan qurbanan ser jê dikin.

Li gorî baweriya Îslamê û hedîsên cenabê Pêxember ji bo lawikan du heb, ji bo keçikan jî serjêkirina qurbanekê sunnet e. Li herêmê herçiqas rasterast ne li gorî vê sunnetê be jî, yên ku bikaribin, qurbanan ji bo zarokên xwe serjê dikin.

Di şeva hefta de em pir ji “heftekê” ditirsîn. Gerek wê şevê heta sibê hinek li ber serê dergûşê şiyar bimînin. (F. Deniz 2016)

Derzî, kêr, meqes yanî tiştêkî hesin dixin pêçeka gedeka. Heta heftek derbas bive ew di wir de dimîne. (E. Qubilmî 2016)

Piştî Xwedê dergûşê dide pîrekê, heger gede bi silametî bimîne em nan çêdikin û ban dost û mûhibên xwe dikin, tèn ser nên. Ya kahr ya jî berxa şerjê dikin. Gelek car em mewlûdê jî dixwînin. (Y.Ş. Eysê 2016)

Asas qurban ji bo keçika ye jî, le piranî em ji bo lawika şerjê dikin. (A. Deniz 2015)

Mi ji bo keçikê xwe jî; ji bo lawikê xwe jî qurban şerjê kir. (M. Selçuk 2016)

²² Odeya gundan ku êvaran malmezin û rîhsipiyên gund lê rûdinên.

Heger roja Xwedê gede daye qurban wer şerjêkirin ew goşt tê belakirin. Heger roja hefta wer şerjêkirin wê çaxê goştê xwe dikin nan û ban mêvana dikin, bi hev re dixwin. Zilam tenê dahrin ser nê. (S. Sulhan 2016)

2.1.5. Navlêkirin

Navlêkirin bi rewresmeke ku kêmanî dê, bav û kesên din ên nêzî malbatê tê de amade bin çêdibe. Mebesta her malbatê navekî xweş e. Ev xweşbûn carinan di wateyê de ye, carinan jî di gotinê de ye. Herwiha hinek nav, ne ew navên ku malbatan bijartibin jî malbatên zarokan ji ber ku adet e wan navan li zarokên xwe dikin. “Di Kurdistanê de adet e, dema ku kesek hê di salên xwe yê zaroktiyê de babê xwe winda bike, navê babê wî lê dikin” (Bedlîsî, 2007: 227).

Li Dêrikê piraniya navan, bi taybetî jî yê lawan, navên ewliyayên ku ucax û qebrên wan li herêmê nin. Weke mînak ji ber ûcaxê *Sîn û Seydoş* “Sîno û Seydo”; ji ber ûcaxê *Dodê Şeda* “Dodo”; ji ber *Pîrxetab* “Pîro/Pîran û Xetîb”; ji ber *Siltan Şêxmûs* “Siltan/Siltanê û Şêxmûs”; ji ber *Şêx Osman*, “Osman”; ji ber Mala *Şêx Bûbê* ku li Akziyareta Qoserê ne “Bûbê” li heremê navên gelekî berbelav in. Li hinek deran em bûne şahid ku navên du birayan wiha bû: “Siltan û Şêxmûs”, “Sîno û Seydo” yan jî xwişk û bira “Siltan û Siltanê”

Li Dêrikê şêwe û demên navlêkirina zarokan wiha ye:

Xwedê dergûşa mere bide, roja hefta gerek mere nav lê bike. Le carna bîst roja, mehekê jî hinek gede bê nav dimînin. (N. Tur 2016)

Ya mezinekî malê, ya jî dê û bav nava li gedê xwe dikin. Heger dê û bav nava lê bikin, di va salê dawiyê de navê kurmançî li wan dikin. (F. Deniz 2016)

Bav ya jî ap, di guhê çepê de qametê û di guhê rastê de jî azana şîrîf dixwîne û di pê re sê cara nav di guhê rastê de dibêje. Îjarê bi wî navê ban dikinê. (X. Xatûnê 2016)

Bav, ya pîrika gede welidandiye nava li gedeka dikin. Ê me kalikê wan nav li wan kirine. (Ş. Temel 2016)

Zilamê mi navê qumitanê xwe yê eskeriyê û dixtorekî li Mêrdîn li gedekê mi kirin. Aniha îja millet navê sîte mûtê televizyona li geda dikin. (Z. M. Qado 2015)

Nav ne mekrûh be, çi nav be mere kare li zarokê xwe bike. (M. Mehmûd 2016)

Ê me li ser destê şêx çêbû, şêx nav lê kir. Jixwe ewil em dahrin cem wî, şêx ji mere dibêje: “Wexta Xwedê dergûş da we hûn nav lê nekin, bînin cem mi ez ê nav lê bikim.” (R. Vural 2016)

Em şeş keçik bûn. Xwedê lawik neda ciya mi. Îja bavê mi navê me hilnedida, wexta ban me dikir digo: “Lawê mi”. (S. Yücel 2016)

Li herêmê bi taybetî li gundan û gelek caran jî li navenda Dêrikê paşnavê fermî ku devletê daye hemwelatîyan di nav gel de ji xeynî karûbarên fermî zêde nayê bilêvkirin. Ji bedêla wê herkes xwe bi navê pêşiyên xwe didin nasîn. Dema hinek xwe dide nasîn navê bavê xwe an jî dû bavikê pêşiya xwe dijmêrin: “Eliyê Silêman, Hesenê Elîyê Hecî Hemê, Qadê Remê Neyto, Mistefayê Ênisê Hecî Sînan...” Hinek kes nîspetî bal bi bavê û hinek jî nîspetî bal bi dê tene nasîn û wiha tene bangkirin: “Salimê Hemo, Cemîlê Hiznê, Siltanê Şêxo, Remê Gewrê, Dodê Xezalê.” Li herêmê weke ku Mela Mehmudê Bazîdî²³ berê jî nîşan kiriye û çawa di mînakên jor de jî tene dîtin hemwelatî weke adeteke di nav Kurdan de navên hevûdu kurt dikin û dibêjin.

2.1.6. Diranên ewil

Di jiyana zarokan de ji pêvajoyên sereke yek jê derxistina diranan e. Bi derxistina diranan êdî ûzûw li laşê wan zêde dibin, rewşên nû di jiyana wan de diqewimin. Îca ji xeynî şîr bimijin, dikarin xwarinê jî bicûn û bixwin. Yanî dibin xwedî hêzeke dirinde.

“Diranên şîr ji meha şeşemîn û pêve hêdî hêdî derdikevin. Heta sê saliya zarokan ev pêvajo didome. Hema bêjin her ji mehekê diranek derdikeve. Ewil herdu diranên jêr derdikevin” (“Diş çikarma” 1993:110). Pêvajoya derxistina diranan berî ku diran derkevin bi çendakî dest pê dike. Zarok bi emel dikevin û bêkêf in. Laşê wan disincire. Diranên xwe derdixin û pê ve êdî rihet dibin. Li Dêrikê bi taybetî jî jin, dema zarok diranan derdixin weke şahî û pîrozbahiyekê heval û xizmên xwe

²³ Binerin: Mela Mehmûdê Bazîdî, (2010). Cami'eya Risaleyan û Hikayetan Bi Zimanê Kurmancî, Stenbol: Weşanên lîsê.

vedixwîne malê û dahnûya diranan çêdike. Ev şahî piranî di nav jinan de were li darxistin jî zilamên malê jî gelek car tevlê dibin. Pratîkên di vî warî de li herêmê wiha nin:

Gedekên ew ê dirana derxin bi emel dikevin û şûna diranê wan gelekî dixure. Hinek pîrekê me dibêjin: “Heger we zanîba diranê gedeka çuqasî dixure û dişewite we yê goştê laşê xwe bida ber diranê wan.” Ji bo wî hawî goştê sor ê xwêkirî mere di pidê wan bide, baş e. (Z. M. Qado 2015)

Gede wexta nuh dirana derdixin dahnûya wan tê çêkirin. Herkê hinek dahnû dixin tasekê, sênîkekê li cîran û meriva bela dikan. (Y. Dengiz 2015)

Yekî dahnûya gedeka her jê re, ew jî pere û tiştê din dixê tasikê û li xwediyê tasikê vedigerîne. (H. Evdirihman 2016)

Hinek kutayê jî çêdikan. Hinkî bi mêvanê xwe re dixwin, ê di jî li cîrana bela dikan. (A. Deniz 2015)

Ahlê malê û mêvan tilîkên xwe didin ber diranê gedeka û dibêjin “gez bike, gezê” yanî bi geda şa dibin. (S. Vural 2016)

Ev xwarina ku li herêmê jê re dibêjin “dahnû” bi dahn û nokan tê çêkirin. “Dahnû” bêjeyekê bihevketiye. Lewma bi wateya “dahn-nok” ê, di bilêvkirina herêmî de jê re dibêjin “dahnû”

2.1.7. Meşa Ewil û Kostekberrîn

Gîhiştina zarokan ji hev cuda ye lê merhaleyên tê re derbas dibin yek in: Weke bi çarpîka xwe bi erdê re bikêşin, diranan derxînin, bimeşin û hinek rewşên din. Zarok ku piştî bi çarpîkan herin îca mezinên wan dixwazin ku zaroyên wan bimeşin. Bi destê wan digirin û hewl didin ku wan bimeşînin. Ku zarok bi tena serê xwe bikaribe çend gavan bavêje êdî ev merhale jî digihêje kemalê.

Bi destpêka meşê divê rewresmeke pîrozbahiyê were lidarxistin. Li Dêrikê ji vê rewresmê re dibêjin “Kostekberrîn”. Pratîkên di vê mijarê de li herêmê ev in:

Gedekê nuh bimeşin, gerek kosteka wan wer qetandin. (F. Ekinçi 2016)

Kostek tê birrîn û pê ve îja riya gedeka vedibe, êdî bi rihetî karin bimeşin. (M. Selçuk 2015)

Gede wexta tena dimeşin kosteka wan tê birrîn. Kostek çawa ye? Tayekî zirav li nigê gedekê digêrin. Koma gedenin di jî hazir disekin. Yek ji wan destê xwe davêje wî tayî û diqetîne. Wanê din jî bera pê wî didin. Kîjan ji wan ewî bigrin şekir, pere ya jî tiştêkî din didinê. (N. Tur 2016)

Tayekî xav, ji bo mere destê xwe bavêjê derhal biqete, li serê tilîkê herdu nigê gedeka girê didin. Şekir dixin nav nigê wan. Ji zarokê li wir yek ji wan wî tayî diqetîne, di pê re jî dadidin wî şekrî. (V. Tüfek 2016)

2.1.8. Şîrvekirin

Weke tîba modern jî dide zanîn qûtê herî girîng ji bo zarokan şîrê dê ye. Piştî zayinê ku zarok çavên xwe li vê dinyê vedikin, karê ewil ê dayikan hewla şîrdayina wan e. Hinek zarok çend mehan hinek jî çend salan şîrê dê dimijin. Elbet zarokên ku şîrê diya wan tune be û bê şîr dimînin jî henin. Îca zarokên şîrê dê dimijin, piştî demekê dayikên wan biryarê didin ku wan şîrvekin.

“Şîrvekirin, tê wateya dayina zarokan a toza şîr, şîrê çêlekan an jî xwarinên wekî din ku ew zarok tenê bi şîrê dê tîn xwedî kirin; yan jî bi kêmkirina şîr, ku qûtê sereke yê zarokan e, derbasbûna qûtên wekî dinê îfade dike”(Nuhrat,1993: 35). Şîrvekirina zarokan, ku berê di derdora du salîyan de çêdibû niha li gorî rewşa zarok, dê û malbatan di demên jihevcihê de diqewime.

Şîrvekirina zarokan karekî bi zehmet e. Çimkî zarokên hînbûne pêsîra dayika xwe, her dem doza mijandina şîr dikin. Jinên bi dergûş ji ber vê zehmetiyê hinek rêbazên balkêş jî diceribînin:

Berê me gedekê xwe du sala şîr dida. Ferqa keçik û lawika tune ye, herdu jî wek hev dimijîn. Aniha mama derketine. Şeş meha, salekê tenê şîr didin gedeka. (X. Xatûn 2016)

Hinek pîrekê dixwazin gedê xwe şîrvekin, tiştêkî ta'1 ya jî tuj di serê pêsîra xwe didin. Wer dikin û pê ve dergûş hew pêsîrê digre. (R. Vural 2016)

Bûkê xwe, mi mirrûse daye wan. Di serê pêsîra xwe didin gede pêsîrê hew dimije. (Ş. Temel 2016)

2.1.9. Sinetkirin

Sinetkirin, jêkirina hawîrdorê” çermê serê bilikê lawan e. Bi gotineke dinê “Jêvekirina çermkê zêde ji endamê mirovan yê nêrînê yê mîzî” (Botî, 2007: 579). Li gorî Îslamiyetê divê her kesê law were sinetkirin. Herwiha li cem Kurdên Êzîdî jî sinet bûyerek girîng e. Sinet ji xeynî Îslamiyetê di Cihûtiyê jî de heye. Li hinek deran kesên nesinetkîrî di nav civakê de him dibe mijara qerfan û him jî weke necis tên sifetkirin. Hinek kes ji ber xemsariya dê û bavan an ji ber ku ditirsin, dereng sinet dibin.

Li navenda Dêrikê piraniya sinetan di salên zarotiyê de çêdibin. Ji xeynî Îsewiyên vê dawiyê bûne misilman, kesê ku wê bizewice divê berî zewacê teqez sinet bûbe. Îsewiyên ku di wextê navoseretiyê de bûne misilman jî li ser daxwaza wan, li gorî adetên Îslamê hatine sinetkirin: “Bavê mi vê dawiyê bûye musulman, dereng dereng sunet bû. Ez li destê ciya xwe bûm bavê mi sunet bûye” (A. Deniz 2016)

Sinetên ku berê ji hêla şêxan an jî berberan ve dihatin kirin, niha cih daye pisporên ku di vî warê de perwerdeya modern dîtine. Di sinetkirinê de gelek car gelê herêmê kirîvantiyê jî datînin. Ji ber ku ev mijar di beşa kirîvantiyê de hatiye îzahkirin em li vir li ser nasekinin. Li herêmê pratîkên derbarê sinetê ev in:

Em gedekê xwe dibin Qezê²⁴ li xestexanê sunet dikin. (M. C. Tüfek 2016)

Berê şêxê Tilloyê dihatin li gunda digeriyan, wan gedê me sunet dikirin. Di ber re dûrîk jî digotin. (Q. Güler 2016)

Li Qezê Şêx Sadulla heye, em gedê xwe li cem wî sunet dikin. Aniha makîne derketine, pê sunet dikin. (Y. Dengiz 2015)

Şekir didin destê geda ji bo negrîn. Ya wexta wê sunet bikin, em dibêjin: “Hela li filan derê binere.” Bi vî hawî mere bala wan dikşîne derek dinê. (N. Ertekin 2016)

Mi lawkê xwe hema çelê wî xilas bû sunet kir. (D. Özer 2015)

Ez û birayê xwe em bi hev re sinet bûn. Ez yazde bûm, ew jî heft salî bû. (C. Çeviren 2016)

²⁴ Navê Qosera Mêrdînê li seranserê herêmê weke “Qeze/a” tê bilêvkirin.

Gedekê sinet dibe ji bo rihet tevbigere kirasê keçika li wan dikin, wekî di tu kincî em li wan nakin. (N. Tur 2016)

Hewa germ ji sinetê re nebaş e. Goşt xera dike. Di hênkayê de mere zaroka sinet bike baştir e. (E. Selçuk 2016)

Heger yekî halê wî xweş be ya jî kirîbantî danîbe, ji mêvanê xwe re nê çêdike. Heger ne kirîvantî be û halê wî nexweş be hema dibe cem sunetçî, hayê kesî jî jê çênake. (B. Tur 2016)

2.2. Zewac

Zewac ji serdemên jiyana mirovan yeka sereke ye. Êdî bihevrebûna xort û keçekê vedigûhere bûk û zavatiyê. Zewac bi kontrol û destûra zanayekî xwedî ilm, an jî bi awayê hemdem bi riya rayadarên fermî di hizûra du şahidan de lihevkerin û peyman a jin û mêrekî ye. Di pê re rola wan a di civakê de û nêrîn û nêzîkbûna civatê ya li hemberî wan diguhere. Bi gotineke bav û kalan ew jî dibin “Xwedî mal û eyal, xwedî zar û zêç”.

Civakê di nava salan de li gora xwe hinek qaîde, rê û rêbazên vê rewresmê bi cih kirine. Li gorî herêm û deveran ev qaîde, rê û rêbaz ne bi heman şêweyê bin jî bi giştî merhale dişibin hevûdû. Li Dêrik û derdora wê, ev rewresm bi merhaleyên weke berî zewacê, dema zewacê û piştî zewacê digêje encamê:

2.2.1. Pêvajoya Berî Dawetê û Hinek Şêweyên Zewacê

Kurd heta çar jinan tînin (Bedlîsî, 2007:105). Ekserêd ekra dan yek jin heye. Nadir ji axayên wan du sê jin dibin (Bazîdî, 2012: 67). Bi rastî li herêmê di dema lêkolînê xwe de me kesekî xwedî çar jin nedît, lê me yê bi du jinan çend heb dît. Ew jî piranî kesên temênê wan mezin bûn. Weke mînak li Maşmaşkê du mêrên temênê wan 51 û 65, hinek ji wan kesên bi du jin bûn.

Zewacên niha piranî ew zewac in ku bi dilê keç û xortan in û bi jinekê tenê re ye. Lê dîsa jî şêweyên zewacên wekî din jî henin. Li herêmê di encama lêkolînan de mînakên zewacên bi van awayan hatine tesbîtkirin:

-Zewacên ku bi destê malbatan, yanî bi peyman a dê û bavê herdu aliyan çêbûne,

- Zewacên bi dilketina hev a keç û xortan çêbûne,
- Zewacên bi riya berdêltiyê çêbûne,
- Zewacên ku piştî mirina mêrê jinekê, markirina wê ya bi tiyê wê yan jî bi lawê tiyê wê re,
- Zewacên di bedêla xwîna mêrekî de çêbûne,
- Zewacên bi awayê revandina keçekê çêbûne,

2.2.1. Temenê Zewacê

“Li Dêrikê lawikê emrê wî bigêhêje hîjda û keçika bigihêje şazda êdî ketine emrê zewacê” (F. Ekinci 2016). Piraniya lawika eskeriyê dikin, di pê re tèn zewicandin. Çimkî eskerî herdem weke astengiyekê li hember mirovên herêmê disekine. Xortekî ku eskerî qedandibe weke kevneşopiyekê îja dema wî û zewacê hatiye. Lê ev temen ji bo kesên xwendekar ne derbasdar e. Dibe ku ew hîn derengtir bizewicin. Xortên wextê zewaca wan hatibin, derdora wan her daîm bi qesda şabûnê û henekan ji wan re dibêjin: “Ka em ê kengî tîrşika te bixwin?” Bi vê gotinê nîşanî nanê roja dawetê dikin ku heta demên nêz jî di piraniya dawetan de tîrşik ji berbûkan re dihat çêkirin. Di zewacan de herkes xwediyê dora xwe ye. Yanî kî mezinê malê be, ewil ew xwedî heqê zewacê ye. Carinan jî hinek kes dorê ji hev distînin.

2.2.2. Lêgerîna li Bûkekê

Li herêmê ji xortên nezewicî re dibêjin “azib” û ji keçikên nezewicî re jî “qîz” yan jî “keçik” tê gotin. Dê û xwişkên aziban ji her hêlê ji azibên xwe re çavên xwe digerînin. Herçiqas hêla xortê azib çavê xwe bigerînin jî, malbatên keçikan jî vala nasekinin. Malbatên xwedî keçika temenzewac di rojên weke hine, şêranî, newroz û dawetên xizm û cîranan de keçên xwe bi xwe re derdixin dibin van şahiyên. Xort jî dîsa di rojên wiha de ji xwe re li qismetekê digerin. Ji ber ku di rojên wiha de nêzîkayî û bihevre lîstina dîlanê ya keç û xortan xerab nayê dîtin, gelek zewac netîceya hevdîtinên van şahiyên e. Hinek şênîyên herêmê di salên borî de bi şeweyên balkêş li bûka digeriyan:

“Berê li cem me, qereçiya dihatin konê xwe li dora gund vedikirin. Îja li her malê digeriyan. Wexta ciya mi wê ji mi re keçik bixwesta, ji hinek pîrekê qereçî ê naskirî keçik dipirsî. Çimkî qereçî li her malê digeriyan. Her halê mala û keçikê wan mala didîtin. Keçika jî, ji qereçiya fedî nedikirin û xwe ji wan venedişartin, qereçiya bi her hawê wan zanîbûn. Qereçiyê meşhûr “*Alya Qereçî, Binefşa Qereçî*” hebûn” (H. Evdirihman 2016).

2.2.4. Xwestina Keçikê

Malbata ku bixwaze keçekê bixwazin, ewil hinek pîrek ji wan diçin mala keçikê. Hevûdu nas dikin. Ji jinên wan re dibêjin: “Dilê me di merivantiya we de heye.” Hêla lêwik ji bo xuyê keçikê baş fêm bikin tiştinan jê dipirsin wê dipeyivînin. Baş bala xwe didin rabûn, rûniştin û gotinên keçikê. Malbata keçikê jî pirsên weke:

- Gelo lawikê we çî karî dike, eskeriya xwe kiriye, wexta bizewicin wê tev malê bimînin ya veqetin?” û hin pirsên wekî din dikin. Hêla zavê jî li gorî rewşê bersivên xwe didin.

“Mala keçikê jî dibêje “De hela em ê bi hev re bişêwirin”. Xwedê kiribe qismet wê çêbive, heger nekiribe jî nabe. Hûnê kevirêkî rakin û vî îşî têxin binî, bira kes nebihîze.” (A. Deniz 2015)

“Mere xwestiyê keçika be, gerek bîna mere fire be. Çimkî mala keçikê ji der û dora xwe, zavê û mala wî dipirsin. Xuyê wan, malê wan, halê wan ê navmalî û gelek tiştê din. Heger malikê neecibînin ciwabê diştin û dibêjin:

- “Qey ne qismet e. Hûn li mala xwe, em li mala xwe.” Heger ketibe serê wan dibêjin:
- “Ser sera û ser çava, werin em li bende we nin.” (R. Vural 2016)

2.2.5. Çûna Xwazgîniyê

Bi çûna xwazgîniyê êdî zewac dikeve pêvajoyeke fermî ku zû bi zû ji wê pêvajoyê vege tune ye. Beriya xwazgîniyê jinên navosere yê herdu aliyan li hev

rûdinên. Mijarên weke ka wê çi ji bûkê re çêbikin, qelen û berderî heye tune ye û hin meseleyên din dipeyivin.

Mala keçikê dibêje em ê kirasê we li we bibirin. Ji bo bûkê, xwestinên xwe rêz dikin. Ya ciya bûkê, ya jî xaltîka wê lîstakê hazir dike û dide hêla lêwik. Carina dikevin bazarê, heta bigêjin hev. (M. Ertekin 2015)

Hêla lêwik lîstê dixwazi. Mere jî lîsta xwe çêdiki. Em dişînin ji wan re. Di pê re îja ciwabê didin dibên: “Mesela filan tişt we gelek xwestiye, filan tiştî kêmbikin. Qeweta me digêje hewqasî.” Em jî tiştêkî jê datînin. (Q. Güler 2016)

Di van mijaran de li hev dikin û pêve îja bûka xwe dixwazin. Mala zavê radihêlin şêraniya xwe, ap û xalanên zavê û çend rihsipîyên malbatê yan jî yên eşîrê bi xwe re dibin û diçin. Roja xwestinê xal û apên bûkê divê hazir bin. Carinan melayekî ku xizmê zavê be jî bi xwe re dibin. Yek ji hêla zavê bi qewl û Resûlê Xwedê keçikê dixwaze. Bavê bûkê jî dibêje:

- “Hûn ser çava re hatine.” Bavê bûkê ne hazir be ev wezîfe dimîne ji apê wê re. Paşê hege hatibe mela; ger nehatibe jî yekî di fatîhê dixwîne. Xwendina fatîhê biqede namzetê zavê radibe destê xezûrê xwe, bavê xwe û yê mezinên din maç dike. Ew jî wî pîroz dikin. Şêranî ji hêla xortan ve tê belavkirin.

2.2.6. Qelen

“Qelen” ku di ferhengên kurdî de weke “*qelend*” (Farqînî, 2007: 512) “*qelind*” (Îzolî, 2000: 337) jî derbas dibe şert û heqên jinê yên ku ji bo zewacê dide pêşiya wî kesê wê dixwaze. Bi wateya li herêmê: “Tiştêkî nirxdar e ku di zewacê de xwazgînî didin ahlê malbata bûkê.” Qelen heta salên dawiyê jî weke barekî giran li ser milê xortan sekinîbû. Ji bav û birayên bûkê re jî hatineke baş bû. Ji ber giranî û girîngiya xwe, qelen bûye mijara helbestên Kurdî jî:

“Çavê bavê te li peran e

Qelenê te pir giran e

Ez û darê tembûrê ne

Te nadin mi, te nadin mi”²⁵

Qelen ne ji bo keçan tenê ye. Herwiha pîrekên bî jî di zewacên ji ya ewil û pêve qelenên wan tînd stendin. Di helbesteke herêmê de ji devê jinbîyekê ew rewş wiha tê neqlkirin:

“Wexta mîrê mi bimire

Wa birakê mi heye

Xwediyê qelenê xwe ye

Çavê wî li hezarkî zêde ye”²⁶

Qelenê her keçikê jî ne wekhev e. Di pêşgotinekê de ev rewş wiha tê teswîrkirin: *“Keça mîra bi qelenê gavana nayê.”* Yanî li gorî pozîsyona keçikê û malbata wê qelen kêm û zêde dibe. Agahiyên di derbarê qelen de li herêmê wiha ye:

Qelen bi wê nêta mereyê jî lawê xwe bizewicîne tê stendin. Ew jî barê me sivik dike. (X. Xatûnê 2016)

Niha li hundirê bajêr ji heyşta heta deha, li hêla gundê beriyê jî panzde milyar qelenê bûkekê ye. (S. Vural 2016)

Nîvê qelen berî nîşanê dişînin ji mala keçikê re. Ê maye jî di pê re dişînin. (R. Çakıl 2015)

Va salê dawî êdî kes hew jê re dibêje “qelen”. Bi rastî berê, me ew pere dixwar, le nuha em kes hew wî perî dixwin. Ji keçikê xwe re xera dikin. (S. Sönmez 2015)

Mala bavê mi, qelenê amojina mi wê çaxê deh hezar baxnot dane. Qelen zêdeyî qeweta wan bû, loma bi parsê ketine. Tiştê ez dibêjim kevn e ha. Va pêncî sal qediya ye. (M. A. Ece 2015)

Qelen, di nav çanda dawetên me de cihekî pir mezin digire. Tu keç ji mala bavê xwe bêyî qelen dernakeve. Çi yên dewlemend, çi jî yên feqîr. Lê belê qelenê

²⁵ “*Te nadin mi*”, Tajdin Karaca, m.youtube.com/watch. Dema gihîştinê: 28.08.2016

²⁶ “*Oy cîranê*”, Huseynê Omerî, m.youtube.com/watch. Dema gihîştinê: 28.08.2016

dewlemendan her dem bi nav û deng e (Barik, 2003: 17). Lê bi guherîna gelek tiştên din qelen jî êdî hew weke berê pirsgirêkek mezin e. Qelen ku tê gotin wextekî mirov bi parsê dixist, aniha daketiye asta miqabilê wî diravê ku çend hewcedariyên bûkê bi cih bîne. Ev rewş li deverên din ên kurd lê dijîn jî bi vî rengî ye: “Li herêma Mûşê nextê keçikan di navbêra 10-20 zêran de ye. Lê ev qelend piranî ji bo cihazê bûkê tê serfkirin” (Aktekîn,2016). Berê keçik bê qelen ji malê dernediketin, niha zewacên bi dilê keç û xortan bin qelen nayê xwestin jî.

2.2.7. Xelat

Di lîteratûra dawetan de xelat jî xwedî cihekî girîng e. Em dikarin bivêjin *xelat*, diyariyeke ji bo dilxweşkirinê ye ku di pêvajoya zewacê de didin xalan yan jî apanên bûkê. “Mala bavê bûkê xelatekê didin xal û xaltîka bûkê. Bêyî xelatê bûk ji mal dernakeve. Heger xelat neyê dayin ji mala bûkê re kêmasî ye. Ji ber vê yekê gava ku qelen tê birîn xelata xal û xaltîkê jî tê birîn. Yan bi qelen re yan jî ji xeynî qelen” (Barik, 2003: 19).

Weke tê famkirin xelat ji hêla bûkê re ye, lê ne ji malbata wê bixwe re ye. Mala zavê, xelatê didin xalanên bûkê. Xelata apê bûkê jî, li bavê bûkê bixwe dikeve.

Qaîdeyên xelatê li herêma Dêrikê wiha ne:

Bavê keçikê ji taloqê xwe re dibêje “Herin xalê keçikê razî bikin.” Hêla lêwîk jî hinek pere didin xalê bûkê. Bi vî hawî xalê razî dikin. (E. Qubilmî 2016)

Berê devançe didan xalê bûkê, le aniha hinek pere didinê. (C. Çeviren 2016)

Bi qeysa ji deha yekê qelen, ji bo xalê bûkê ji mala zavê distînin. Xelat ji bo xalê mezin e. Xelat ji xerîba tê stendin. Wexta hinek keçika xwe bi xwe bidin hev, tu xelat jî tune ye. (V. Tüfek 2016)

Bavê bûkê heger qelen stendibe, ji wî qelenî parekê dide birayê xwe û wî xelat dike. (D. Özer 2016)

Herkes xelatê nade û nastîne. Hinekê ji hev hez bikin xelatê didin hevdu. (B. Tur 2016)

Li gor agahiyên me ji herêmê sitendine di van salên dawî de dayina xelatê li gorî berê kêr bûye. Gelek kes, hew li xwe dafînin ku xelatê bigrin.

2.2.8. Şêranî/ Dergîstîbûnî

Şêranî: Cûreke şahiyê berî zemawendê ku nas û xizmên zava û bûkê tîn him şêranî li wan tê belakirin û him jî kêf û dîlanê dîkin. (WQFerheng, 2016) Bi reûresma şêraniyê êdî keç û xortên wê bizewicin dibin dergîstiyên hevûdu. Herçiqaqas niha hinek malbat beriya dawetê mara keç û xortan bibirin jî, realîteya vê pêvajoyê sist nebûye. Jixwe li herêmê marbirînên beriya gerdekê jî zêde nayên dîtin.

Carinan hinek malbat xwazgînî û şêraniyê dîkin yek. Lê li gorî kevneşopiyê ewil xwazgînî ye, di pê re şêranî ye. Niha li herêmê di şêraniyan de beqlawe û qolayê pêşkêşê mêvanan dîkin. Li gorî hin çavkaniyan agahî dane me di salên borî de di reûresmên şêraniyê de loqim, piskuwît û şerbet didan mêvanan. Heta ji ber şerbeta ku didan mêvanan gelek caran navê vê reûresmê weke “Şerbet” dihat bilêvkin. Awayê şêraniyan niha li Dêrik û derdora wê wiha ye:

Şêranî li mala keçikê ya jî li ciyekî din ê minasib çêdibe. Di nîşanê vir de hêla lêwik şêraniya xwe hazir dîkin, dibin ciyê nîşanê. (B. Erol 2016)

Hinek nîşanê xwe ‘eyn weke dawetê çêdîkin. Hinek jî hew ban dost û merivê xwe dîkin, şêraniya xwe çêdîkin. (R. Çakıl 2015)

Şêraniyê me gelekî xweş in. Em li saz dixin, direqisin. Sê çar seeta dewam dîkin. (Ş. Temel 2016)

Beriyê niha bîst sala, di nîşana de nanik, loqim û şerbet didan ber mêvana. Bi qutiya nanik û loqim dîkirîn. Şûşê şerbetê bera sîtilê mezin didan, av û şeker lê zêde dîkin. Me dîgo “Vê heftê şerbeta filankeso ye.” (Ş. Zerga 2015)

Li gunda heta dawetê, keçik û lawikê dergîstî bin nayên cem hev û hev nabînin. Le li hundirê Dêrikê çûnûhatina lêwik çêdibe. (Z. M. Qado 2015)

Di îdiya de xelk dahrin cem xwestiya xwe, ciya lêwik ji keçikê re ya seetekê, ribekî ya jî bazinekî dibe û dixê destê wê. (Q. Güler 2016)

Li gorî agahiyên çavkaniyên me dane, di awayê çêkirina şêraniyan de di nav salan de hinek guherînên berbiçav çêbûne.

2.2.9. Awayê Dawetan

Dawet di çanda Kurdan de xwedî cihekî girîng û taybet e. Bi dawetê pêvajoya dergîstîbûnê diqede û êdî herdû alî dibin jin û mêrên hevûdu. Di van rojên taybet de hemû dost û meriv li hev kom dibin û kêfa wê şahiyê li hev par vedikin. Yekitî û tifaqa xwe nîşanî derve didin. Bihevrebûnên xwe li dawetan pêş ve dibin, nîfşên nû mezinên xwe li wan qadan nas dikin. Herwiha keç û xortên azib jî di rojên wiha de ji xwe re li qîsmetan digerin.

Gelê Kurd di warê dîlanê de zîrek in û gelek cureyên dîlanê dizanin. Di van şahiyên de ji heft saliyên bigirin heta heftê saliyên dikevin destê hev û govendê digerin. Di heman demê de bi hev re dixun û vedixun. Mînakeke vê şahiya kevnare ya gelê Kurd di Şerefnamê de wiha derbas dibe:

Wê çaxê heft roj û heft şevan dawetek gelek mezin hatibû kirin. Di esnayê vê dawetê de, dema ku meclîsa şerîetê li Gokmeydanê ji bo mehrê berhevbû, leyîstikên wekî tewlê û şahiyên din ên di nav xelkê de belav bûn û li gor qanûnên dînî qedexa û herambûn nehatin leyîstin... Di dawîya dawetê de, ziyafetek mezin hat dan ku hemî awa şêrinahî, xwarin û vexwarinên xweş tê de hebûn. (Bedlîsî, 2007: 533)

Li Herêma Dêrikê dawetên bi govend, weke adetek rûniştî du şev û sê rojan dom dikin. Bi gelemperî roja îne berêvarê dest bi dawetê dikin. Di dawetên herêmê de bi taybetî li gundan bi awayekî bêhed çekan diteqînin. Şênîyên gundan derdikevin ser xaniyan û weke di çeperê de bin, heta nivê şevê çekan berdidin hewa. Ji xeynî yê bi vî rengî hinek dawetên wan carinan jî bêyî govend û çekberdanê tenê bi dayîna nan a ji mêvanan re çêdibin. Ji van cure dawetan re li herêmê dibêjin “Mewlûd”. Dema dawetên bi vê şeweyê li gorî yê din kurt in. Ji xeynî agahiyên li jor, awayê dawetan li herêma Dêrikê, me wiha ji çavkaniyan veguhastiye:

Berî dawetê çend roja gêncê me li nav dost û meriva digerin. Dibêjin “Filan rojê li filan derê daweta me heye, em li bende we ne jî”. Ew jî dibêjin “Ser xêrê be. Qismet be îşalle em ê werin.” (A. Deniz 2015)

Dawetê me roja înyê, piştî esir dest pê dike û roja bazarê bi nanê nîro re diqede. Em dawetê xwe li gund çêdikin. Sazbenda ji Dêrikê ya jî ji Qezê tînin. Qîz û xort; pîrek û zilam dikevin destê hev û baz didin. Hinek def û zurnê jî tînin. Mezinê me berê li bilûrê dixistin û li ber baz didan. (E. Selçuk 2016)

Ya yekî ji mala zavê, ya jî sazbandek li ser navê mala zavê ji mêvana re dibêje: “Gelfî mêvana hûn tevde bixêr hatinin, ser sera û ser çava re hatinin”. Sazband û mitrib ji zîlamê direqisin re şabaşiyê dikin. Mesela dibêjin “Şabaş ji bavê zavê re. Ya ji birê zavê, ya ji apê zavê re” navê kê bivêjin gerek ewiya ji bêrika xwe tişteki derxîne û şabaşê bide sazbanda. (V. Tüfek 2016)

Dawet ya li hewşa mekteba ya jî li ber deriyê mala çêdibin. Hinek dawet li tesîsê çêdibe. Salona dawetê li Dêrikê tune ye. Hinek li vî hawûzê avê çêdibin. Ê li hêwiz bin şevê tenê li dawetê dixin. (F. Deniz 2016)

Em du şev û sê ruya li dawetê dixin. Xwarin her sê ruya çêdibe. Xwarina mezin li mala şûnê didin. (Y. Dengiz 2015)

Li gunda hêla mala bûkê narin daweta. Ew li mala xwe ne, heta berbû werin bûkê derxînin. Va salê dawiyê mîletê me jî hêdî hedî dahrin dawetê qîzê xwe. (E. Remo 2016)

Di daweta de em ji bûk û zavê re her kê çend denga dilîrînin. Xort ya jî sazband, her tim ban dikin, dibêjin “Kî zava, kî zava?” Em jî dibêjin:

- Filankes zava, mala Xwedê ava.

Ya dibêjin “A kê ye, a kê ye? Em jî dibêjin: “A Kurda ye.” (Ş. Temel 2016)

Xwehên zavê li dora wî dicivin, dibêjin: “Zava zava kekê min o zava” Em pîrek her kê çend denga dilîrînin. Lîrandin adeta me ji bav û kala de dîtiye. (N. Tur 2016)

2.2.10. Hine

Şeva beriya gerdekê ye. Ji ber ku di vê rojê de hinê li destê bûk û zavê dikin û herwiha hinê li berbûyan belav dikin jê re dibêjin “Hine”. Şeva berî gerdekê, dema dawet li mala zavê dewam e, komek mirovên nêzî zavê ku piraniya wan ji jinan pêk tên ji dawetê vediqetin û diçin mala bûkê. Zave jî bi wan re diçe. Bi lîlandin û şahî, hinê li destê bûk û zavê dikin. Li dora wan zîz dibin û dûrika ji van re dibêjin. Hine, derdora du seetan dewam dike. Hine biqede û pê ve vedigerin tên tevî daweta xwe dibin.

Bûk û zavê didin kêleka hevdu. Çarika davêjin dora hustê wan û ji wan re distrên. (Z.M. Qado 2016)

Bîstekê distrên û pê ve bala xwe didin bûkê. Bûk wa hebekî kelogirî bive îja çarika ser serê wê radikin. (S. Yucel 2016)

Hina baş ji Sûrî tê. Mere dixê kîsaka li berbûyê xwe bela dike. (Q. Güler 2016)

Wexta hinê di destê bûkê didin, ya kemaliyakî ya jî nîvekî dixin destê wê. (Y. Dengiz 2015)

2.2.11. Nanê Dawetê

Çi maldar çî feqîr, şênîyên herêmê di dawetan de nan çêdikin û didin mêvanên xwe. Nanê dawetê roja dawiyê nîvro ye. Kêm kêm jî nanê dawetê dibe şîv. Ji ber ku di dawetan de nan pir tê çêkirin, gelek car nanê maye li cîran û merivan belav dikin. Eger dawetan bibin salonên Qoserê, carinan nan çênakin. Dawet li Dêrikê yan jî li gundên wê be, tu kes berbûyên xwe bê nan nahêlin. Daweteke em tevîbûn li navenda Dêrikê ya du mamosteyan bû. Dawet li hewşa dibistanekê çêbibû. Ji êvara iniyê dest pê kir û yekşemê bi nanê nîvro qediya. Di roja sisiyan de bi navê xwe yê herêmî “Hemîs” dan mêvanên xwe.

Di daweta de ya goşt û birinc û tirşika fasûliya; ya jî hemîs tê çêkirin. Heger goşt û birinc be, goştê berxa didin ser birincê û heger hemîs be canga şerjêdikin. (Z. M. Qado 2016)

Pîrekê me ê ji nê nê fê m dîkin henin, ew nanê me çêdikin. Ê bi çêkirina pîreka qayil nabin, ji xwe re ji bajêr aşçiya tînin bi wan didin çêkirin. (M. Selçuk 2016)

Heger cî hebe zîlam li hêlekê û pîrek jî li hêlekê nê dixwin. Heger cî tune be, ewil zîlam dixwin dûre jî pîrek dixwin. (R. Vural 2016)

Ya em çadîra vedîkin di wan de nanê xwe datînin, ya jî em li çend malê gundiye xwe cihê cihê nanê xwe datînin. (M. Bûb 2016)

Hinekê xerîb jî tê rûdinên, nanê xwe dixwin û dahrin. Tu kes ji wan re nabêjin gelo hûn kînin û hûn hatînin çî, hûn li çî digerin? (M. A. Ece 2016)

Li Dêrik û gundên wê çêkirina nanê dawetan kevneşopîyeke bicîhbûyî ye. Daweteke bê nan nayê texayulkirin. Tegez divê nanê dawetan gerek bi goştê sor be û tu mêvan bê nan ji dawetê veneqetin.

2.2.12. Dema Dawetê

Li Dêrik û derdora wê wextekî xisûsî ku îlla dawet tê de çêbibe tune ye. Lê li dijî vê yekê hin demên ku çêkirina dawetan minasib nayê dîtin hene. Weke mînak heta çelê miriyekî dernekeve, yan jî heta herdu cejn paş nekevin hinek kes dawetên xwe çênakin. Ji ber ku ji bo çêkirina dawetan tu destûreke fermî nayê sitendin û herwiha nîkaha fermî jî di wextên xwe de çênabe, di derbarê demên dawetên li herêmê tu qeyd di dest de tune ne. Lêbelê li gorî agahiyên şênîyên bajêr û gundên wê dane rêjeya dawetên zivistanan li herêmê ne zêde ne. Dawet bêhtir havînan tê çêkirin. Ji bo roja dawetê jî rojên rêjeya wan di pêşde yekşem û pêncşem in. Li gorî rewşê, di rojên din ên hefteyê jî dawet çêdibin.

Kesên cotyar bin benderên xwe radîkin û pê ve havînan li dawetan dixin. Ji xeynî havîne ji ber ku gelê herêmê diçin xebatên demsalî, gelek dawet payizî çêdibin. Çimkî wê demê xebatkar vedigerin. Herkes li hev kom dibe. Ji hêla aborî ve jî destê

wan fireh dibe. Gelek malbat ji bo ku bikaribin zaroyên xwe bizewicînin, diçin dixebitin û bi keda xwe ya wê salê dawetên xwe çêdikin.

Berxê mino ma em nerin wî welatî em nikarin gedekê xwe bizewicînin. Her sal em dahrin. Ji du sê sala carekê jî em xortekî xwe dizewicînin. (S. Yücel 2016)

Berê me dawetê xwe tevde êvara înyê çêdikirin. Aniha îja millet kirine bazarê²⁷. Di zemanê me de dawetê me bi def û zurnê bin, hinek jî li ber bilûrê bûn. Ê anha li saz dixin. (M. Seydo, 2016)

2.2.13. Peza Aziban

Adeteke rengîn û zengîniyê dide rewresma dawetan peza aziba ye. Yên vê adetê dimeşînin weke ji navê wê jî tê famkirin xortên azib in. Gava ku berbûyê werin bûkê ji malbavê derxin, xort xwe didin ser hev û derdikevin pêşiya berbûyan. Heqê xwe dixwazin. Gelê herêmê ji ber ku ji vê adetê hayidar in, dema ew diçin bûka xwe derxin, haziriya xwe dikin û diçin. Peza aziban, li hinek deveran weke “kara ezaban” jî tê binavkirin:

“Di anîna bûkê de *kara ezaban* jî cihekî digire. Gava bûk ne ji gund be, xortên gund xwe didin hev û li derveyê gund xwe didin hev û li derveyê gund derdikevin pêşiya bûkê” (Barık, 2003: 30)

Agahiyên wekî din di derbarê vê mijarê de kesên çavkanî wiha neqlî me kirine:

Heger zave ne ji gund be yanî xerîb be, xortê azib roya bûkê wer derxistin tîn dibêjin gerek zava pezekê bid me. (M.Û. Hemê 2016)

Ê adetê zanibin berê haziriya xwe dikin û wextê ew ê herin bûka xwe derxin, tişteki bi xwe re dibin. Ya pezekê, ya jî heqê pezekê didin xorta. Heger pere be, xort wî pereyi di nav xwe de li hev par dikin. Heger pez be, wê li malekê şerjê dikin û bi hev re dixwin. (Q. Güler 2016)

Asasê vê adetê pez e. Aniha erê navê wê maye peza aziba, le ê dixwazin doza pera dikin. (S. Sulhan 2016)

²⁷ Yekşemê

Carna xort, mezinekî malê ji xwe re dikin ricacî. Ew ji bo wan ji mala zavê peza aziba dixwazin. Ê navbêynçî tişteki ranahêlê. Hew di orta wan de dibin navbêynçî. Alîkariyekê bi xorta re dikin. (Ş. Silêman 2016)

Ji ber ku beriya niha sewaldarî zêde bû û bidestxistina diravan jî zehmet bû, pez didan xortan. Lê ji ber rewşa aniha ya aboriya herêmê diravan didin wan ku ev hîna hêsantir e. Divê were zanîn ku adeta bi navê “Peza Aziba” li gundan û li cem gundiyan li navenda bajêr bicîh bûnin bêhtir tê dîtin. Niştecihên navendê zêde vê kevneşopiya najon.

2.2.14. Berderî

Dema ku bûkê ji malbavan derdixin ji rexê nasê bûkê ve derî tê girtin. Ji bo ku derî vekin ji zava diravan dixwazin. Heta zave hinek dirav nede, derî lê venakin. Li herêmê piranî xwişk û birayên bûkê dikevin berderî. Kesên heqê berderî dide jî gelek caran ya zave bixwe ye, yan jî bira û diya wî ne. Kesên çavkanî di vî warî de ev agahî dane me:

Wextê wê werin bûkê bivin, xweh ya jî birayê bûkê dikeve ber deriyê malê. Nahêle bûkê derkeve. Dibêje: “Ez îznê nadim hûn xweha mi bivin, îlleh gerek hûn tişteki bidin mi.” (A. Aras 2015)

Berderî carna wextê xwazgînî dikeve bazarê. Hêla lêwik bazara xwe bi mala keçikê re dike û dibêje “Gerek berderî tunebe.” Carna jî bê bazar e, ê dikevin berderî, dikevinê. (Y. Ş. Eysê 2015)

Hinek heqê berderî ji ewil de didin. Dibêjin roja em hatin bûka xwe derxin, biraqê derî ji mere vekirîbe. Ê mi birayê bûkê ketin berderî, mi pênsid milyon da wan. (M. C. Tüfek 2016)

Ê herin bûka xwe derxin gerek berê haziriya xwe bikin. Ji hêla mala bûkê yek têkeve berderî û îja pere bi mere tune be merê bihetike. Gerek li wir mere wan razî bike û tişteki bide wan. (M. Ertekin 2015)

2.2.15. Mehrberrîn

Mehr, rîtueleke dînî ye. Eqdekî semawî ye ku di navbeyna jin û mêr de dibe peyman bihevrebûnê. Di sûreta Nîsa di ayeta bîst û çarem de Xwedê Teala wiha ferman dike: "Li ser we ev emrê Xudê Teala ye, ji bilî ewên ku navên wa borîn, ew jinikên bi namûs ewên ku xwe ji zîneyê diparêzin, ji bo we helal in ku hûn wan li xwe mehr bikin." Ev karê ku ji hêla zanyarên dînî ve tê kirin, di salên dawî de li salonên dawetan weke nîşaniya modernîteyê ji hêla rayadarên fermî yê şaredariyan tê bicihanîn. Elbet digel ya fermî, ew kes mehra dînî jî dibirrin. Li Dêrikê çend nimûne jê were derxistin, bi gelemperî hîna ji hêla zanyarê dînî ve ev kar tê kirin. Awayê vê reûresmê wiha ye:

Li cem me mele marê dibire. Gerek bûk û zave, bi şahidiya du hebê dinê rûnên û mele mara wan bibire. Gelek cara bûkê nabin cem mele û cimaetê. Hema wekîltiya wê didin yekî û ew dahre li ser navê wê marê ji mele qebûl dike. (D. Özer 2016)

Berî dawetê mar nayê berrîn. Kîjan roja bûka xwe derxin a wê rojê mara xwe dibirrin. (E. Remo 2016)

Hinek heger wê di orta herdu îdiya de daweta xwe çêbikin, berî îdiya bicûk marê dibirin. (M. Bûb 2016)

Carina milletê me hema piştî bûkê dixwazin yanî berî dawetê mara xwe dibirrin. Hinek jî dihêlin, piştî daweta wan xelas dibe marê dibirrin. (S. Sulhan 2016)

2.2.16. Şeva Zavatiyê

Şeva zavatiyê gêncên hevalê zavê li hev kom dibin. Bi listikên herêmî dilîzin, ku piranî jî ev listik, ya bi navê "Hingulîskê" ye. Zave jî bi wan re ye. Heta derengiya şevê dimînin. Xwarin û vexwarin pir e. Kêf û şahî ye. Paşê zavê dibin malê, li piştî zavê dixin. Ban dikin, dibêjin "Kî zava, kî paşa?" Di heman demê de jî bersiva xwe didin û bi navê zavê dibêjin: "Filankeso zava". Zave û heval malavaya hev dikin.

Zava diçe cem bûkê. Yê bûkê jî hevalên wê li cem wê nin. Beriya zava were cem bûkê hevalên wê xatir jê dixwazin û ji hev belav dibin.

Di gelek mînakên dawetên herêmê de bûk û zava li mala bavê zavê dikevin gerdekê. Bi taybetî li gundan û li navenda bajêr jî piraniya keç û xortên dizewicin dernakevin xaniyekî cihê, diçin teva malê.

Heger ne mamûr bin, tukes dernakeve xaniyê cihê. Wê şevê xortê malê, ji bo bûk zava rihet tevbigerin, dahrin şevder li cîkî dibin mêvan. (Y. Ekinci 2016)

2.2.17. Sebahî

Pêvajoya sebahiyê, ji sibeha piştî gerdekê dest pê dike û heta bûk here zeyî dewam dike. Di vê demê de xizm û dost ên jin bi keç û bûkên xwe re diçin dîtina bûk û zavê. Weke serxêrêbûnekê û bixêr derbasbûna gerdekê tên cem bûk û zavê. Li gor hin deverên herêmê cudahî di vê adetê heye. Li hin deveran sibeha piştî gerdekê û li hinek deveran jî çend rojan li pey gerdekê diçin vê ziyaretê. Li Dêrikê ev kevneşopî wiha tê tedbîq kirin:

Roja sisiya mala zavê şêraniyê dikirin. Hevalê zavê û cîran tên dixwin, hediye xwe tînin. (F. Deniz 2016)

Di sebahiyê de em destvala narin. Em herkî tiştêkî li gor qiweta xwe di dest xwe de dibin. (X. Xatûnê 72)

Heger hinek dawet em neçûbinê ji bo dilxweşkirinê em siba piştî dawetê dahrin cem bûkê. Bûk û zava çendakî li mal dimînin. Çimkî mêvanê wan tên û dahrin. (Î. Xoce 2016)

Sebahî ne ji hêlekê re tenê ye. Hêla bûkê jî û hêla zavê jî yanî pîrekê herdu aliya jî dahrin sebahiyê. Lê piranî siba ewil hew hêla zavê dahrin sebahiyê. Hêla bûkê roja sisiya dahrin. (S. Yücel 2016)

2.2.18. Zeyî

Zewac, ji bo jiyana her mirovî pêvajoyeke sereke ye. Ji ber vê jî berî zewacan gelek amadekariyên mezin, bikêf tên kirin. Herwiha di rojên dawetan de jî kêf û şahî

tên lidarxistin. Elbet ev rewresma rengîn bi dawî dibe û pê ve divê aktorên rewresmê werin pîrozkirin.

Me li jor nîşan da ku li pêy zewacê xizm û dost tên serxêrêbûna bûk û zavê. Ahlê malbatên bûk û zavê jî divê wan herdûyan pîroz bikin. Li Dêrikê sibeha piştî gerdekê ewil zava diçe destê dê û bavê xwe maç dike. Herwiha bûk jî diçe destê xezûr û xwesiya xwe. Bi vî rengî xezûr û xwesî wan pîroz dikin, ji wan re diayan dikin. Rewşa bûkê û malbata wê di vê mijarê de hebekî cihê ye:

Bûk heftakê li malê li cem zilamê xwe dimîne. Hefta duduya birayekî wê tê û wê dibe mala bavê wê, destê dê û bavê xwe maçî dike. Çend roya li mala bavê xwe dimîne. Di pê re zave dahre mala xezûrê xwe û bûkê tîne malê. Yanî bûk dahre zê û vedigere. (V. Tüfek 2016)

2.3. Mirin

Hema bêjin her mirov di jiyana xwe ya li ser ruyê erdê de sê caran dibe navenda rewresman. Ya ewil û sereke zayin, ya navînê zewac û ya herî dawî jî mirin e. Ji vana mirin ew sefheye ku dawiyê li jiyana candaran tîne. Heçî xwedî nefis e teqez di vê riyê re derbas dibe.

Çawa di zayin û zewacê de hin qaîde û ûsûlên rûniştî hebûn herwiha di demên mirina mirovan de jî hinek adet û ûsûl henin. Peyveke Kurdî heye, dibêjin: “Mirin ta’l e”. Elbet ji ber vê ta’lbûnê adet û ûsûlên di mirinê de ne wek ên zayin û zewacê bi kêf û şahî ne. Weke mînak şêraniya ku di zewacê de pêşkêşî mêvanan tê kirin, di mirinê de cih dide qehweya tal. Lê dîsa jî qonaxên pêvajoyan dişibin hevûdu. Yanî em dikarin mirinê jî weke beriya mirinê, dema mirinê û piştî mirinê bi sê sefheyên bidin ber çavan. Li Dêrikê bi bandora baweriyên dînî û qaîdeyên kevneşopîya herêmî rewşên di demên mirinan de tên tetbîqkirin ev in:

2.3.1. Berî Mirinê

Elbet tu kes nizane bê wê kî, kengî, çawa û li kuderê bimre. Lê hinên bi nexweşiyên giran bin, umrê wan bihurîbe, yan birînên wan ên nacebire hebin li gorî

ceribandinên jiyane mirina wan ji mirovên din nêzîktir tê dîtin. Ji ber vê jî xizm û dostên van kesan li wan miqate ne. Herdem saxtiya wan dikin, li halê wan dipirsin. Heger kesên nexweş di eziyetê de bin ên derdora wan bi duayên weke “Xwedê te ji vî halî xelas bike.” “Xwedê li te were rihmê.” “Xwedê ji du rihma rihmekê lê bike.” xêrxwaziya wan dikin. Li Dêrik û gundên wê ji bo kesên di ber sikratê de ne hin wezîfeyên tên kirin henin. Bi gelemperî ev wezîfe û karûbar ev in:

Ê li ber sikratê kêr zêde ew jî hesabê xwe û mirinê dikin. Mere jî fam dike. Îja heger gede ya bira, dê, jin her kî yê ne li wir be, ban wan dikin ji bo werin li hev helal bikin. (Q. Ece 2015)

Nexweşekî giran ya jî birîndarek hebe, gerek mere miradê wan bicî bîne. Gerek tu kes dilê wan nehêle. Bivêje çi bi a wan bive. Heger dirûma wan gelekî giran be, mere jê re dua bike û bivêje: ”Ya Rebî tu ji herdu rihma rihmekê lê bike” baş e. (M. A. Ece 2015)

Ê di ber sikratê de be, heger karibe bipeyive, wesiyetên wî jê dipirsin. Wesiyet ne li ser parkirina mal û milkê dinyê ye. Ya ji ê mayî re şîret in, ya ciyê dixwaze lê were veşartin e. Kêr kêr carina hinek li ser parkirina mîratê jî wesiyeta dikin. Di wesiyeta de heger mele hazir be, wî dikin şahid. (F. Ekinci 2016)

Kî zanibe Quranê bixwîne, li ser serê wan disekine û Yasîna Şîrîf ji wan re dixwîne. (M. Vural 2016)

Em ji wan re dibêjin “Heqê xwe li me helal bike.” Hişê wan li serê wan be, helal dikin; heger hişê wan ne li serê wan be ya jî nikaribin bepeyivin ew ji Xwedê ma’lûm e. Carina hinek bi çava bi mere dipeyivin. (E. Selçuk 2015)

Mere hinek ava îmanê li devê wan bike baş e. Te dît carina ji hineka re dibêjin “Av jî negîhaştîye ser.” Yanî biraqê bê av nerin dinya wî alî. (A. Aras 2016)

Weke tê dîtin ew kesê li ber mirinê ye divê wesiyetên xwe bike û li gor baweriyê ji bo li ser îmanê ruhê xwe teslîm bike gerek Eşheda xwe bîne. Yê derdorê jî Quranê bixwînin xêr e. Sedema ku li herêmê di wesiyetan de behsa mîrate tune ye

ew e ku, malê dimîne jixwe wekhev wê li lawan bê parkirin. Li herêmê dayina mîrata bavê ya ji keçan re di asteke gelek nizm de ye.

2.3.2. Dema mirinê

Di dema mirina kesekî de piranî tiştên ku bingeha xwe ji baweriyên Îslamî digire tên kirin. Çend pratîkên di vî warî de wiha ne:

Mi bavê xwe xist himêza xwe, ji mere go: “Lawê mi berê mi bid qublê.” Mi berê wî da qublê û emrê xwe da hazira. (N. Ertekin 2015)

Kî li ser yekî hazir be û bivîne ruhê xwe teslîm dike, bira jê re dua bike. Hinek *ava îmanê*²⁸ li dora devê wî bike. (Z. M. Qado 2015)

Heçê li ber serê yekî ketiye ber mirinê de be, gerek jê re bivêje “Ka eşheda xwe bîne.” (M. Bûb 2016)

2.3.3. Definkirin

Piştî mirinê mijara herî girîng veşartina meyt e. Lewra him ji ber baweriyên dînî him ji ber şertên civakî û tenduristî ev mecbûriyetek e. Li ba Kurdan û bi taybetî jî li herêmê meyt nayê sekinandin. Gava ku yek ruhê xwe teslîm dike û pê ve xizmên wî hay ji derdora xwe çêdikin. Li Dêrikê qaîdeyeke nayê guhertin heye ku divê her dost û meriv çî jin, çî jî mêr herin goristanê û tevî rewresma veşartinê bibin. Agahiyên derbarê piştî mirinê me ji herêmê dane hev wiha ne:

Mi meytê birayê xwe nixumand, cîranê me jî li ser wî xwend (Quranê qest dike) (R. Tur 2016)

Li çarşiyê kîjan camî nêzîkî me be, em ji vir selayê didin xwendin. Esnafê çarşiyê tevde wefatê dibihîzin. (F. Deniz 2016)

Heger yek bimre, millet tên cem mi. Dibêjin ji mere selakê bixwîne. Ez jî selayekê dixwînim û di pê re dibêjim “Filankesê filankeso çûye rihmetê, Xwedê bi rihma xwe şa bike.” Hayê herkesî jê çêdibe. (M. Seydo 2016)

²⁸ Li herêmê ji ber taybetî û girîngiya avê, weke gotinek qalibgirtî dibêjin “ava îmanê”. Dibe ku di bingeha sedemên vê gotinê de hinek razên din jî hebin.

Şexsê wefat kiribe extiyar be, mere digrî le tu kes nake gazî û hewar. Le tu bivêje nebêje mirin ta'1 e. Hayê cîrana bi dengê girî û hawarê ji mirinê çêdibe. Tê cem mere. Gelek carî ew ciwabê dişînin ji derdorê re. Heger yekî ciwan miribe, ya jî hatibe kuştin herkes dike gazî û hewar; hinek pîrek bi tepa bi xwe dikevin, hutika li ser sînga xwe dixin. (R. Çakıl 2015)

Meyt tu carî nayê sekinandin. Berî bicemide gerek wer veşartin. (Y. Ş. Eysê 2015)

Berî meyt wer veşartin, mecbûr tiştê aidî rihmetî çî hebin wek kinc, sol ji malê bîn derxistin. (F. Deniz 2016)

Ewil tidarika şuştinê tê kirin. Kefen jê re hazir dikin. Gerek meyt derhal bê veşartin. Heger merivên ji bajarê dûr werin hebe, ya jî li derve bin; li bende wan disekin. Ji bo ew jî bigehêjin ser dîtina meyt û veşartinê. (S. Sönmez 2015)

Li ser kuçik avê germ dikin. Şuştina miriya li xwediyê wan dikeve. Le heger ew nizanibin, nikaribin ya jî nexwazin bişon meleyek ya jî şexsekî zanibe li gorî usûla, bi ava şîrgermî meyt paqij dişo. Heger guharek di guh de hebe, ya jî xizemek di pozde be; ya jî hingulîskek di tiliyê de be, heger rihmetî wesiyet kiribe, wan didin wanê meyt dişon. (Z. M. Qado 2015)

Hinek carina li ser mezel diçin ruyên hevdu. Le pîranî piştî mirinê sê roja li ser hev em dahrin şunê. (M. Seydo 2016)

Ewil tirbê kolan. Heger hebe, kepçe dikole; ciyê kepçe nikaribe têkevê, xort bi qazma tirbê dikolin. (M. C. Tüfek 2016)

Meyt dixin nav sê perçe kefenê sipî, ê nedirûtî. Datîninin ser darbestê û li gunda bi meşê, li bajêr bi mekînakê tînin ser mezel. (Î. Xoçe 2016)

Gerek aqrûbê meyt dakevin qebrê. Heger pîrek be, gerek ê desmêja wê ji wan neşkê dakevin qebrê. Ez, lawê xalê mi û birayê mi me pîrika mi veşart. (E. Selçuk 2016)

Wexta veşartinê pîrekê dost û mûhib li xwe dixin û digrîn. Dûrika davêjin ser meyt. Hew pîrek werê dikin, zilam ne werê ne. (N. Tur 2016)

Heger di tabûtê de be, meyt ji tabûtê tê derxistin. Tev kefen dadixin qebrê. Wexta defin dikin girêkê kefen sist dikin. Li ser piyê rastê cinaze dadixin qebrê. Çend kevir ya jî betonê pahn datînin ser meyt û di pê re îja axê

davêjine ser. Mele telqînê dixwîne. Telqîn bi navê dê ya jî bi navê bavê tê xwendin, ferq nake. (M. Mehmûd 2016)

Vedişêrin û pê ve cimaet bela dibe. Le teq û reqa nigê cimaetê dahre ê di gorê de. Gerek ji aqrûbê rihmetî yek li ser qebrê bimîne. Çimkî milyaketê qebrê wê werin hesêb jê bipirsin, biraqe ne bi tenê be, netirse. Bi rihetî îfadê bide milyaketa. (M. Seydo 2016)

Piştî veşartinê êvara îniya ewil em dahrin ser gorê yasîna dixwînin. (V. Tüfek 2016)

Di esnaya veşartinê de qaîdeyên rûniştî hene. Gelê herêmê van rîtuelan li gorî usûlan bi cîh tînin. Di çanda herêmê de ev usul hevbeş in, zêde nayên guhertin. Piraniya van usulan li gor emr û ferzên dînê Îslamê ne. Bêyî ku ev ferz ji çavkaniyên nivîskî werin xwendin, ji nifşekî derbasî yê din dibe û wiha tînetbîqirin.

2.3.4. Şîn/Azayî

Şîn, pêvajoya li pêy veşartina meyt e. Bi saya çûnûhatinên di şîne de êş û elema malbatên hiznî kêmtir dibe. Bi dîtina heval û hogiran bêhna wan tê ber wan. Çanda şîne li gorî kevneşopîya mîletan dibe ku ji hev cihê be. Li herêma Dêrikê niha şîn sê rojan dom dike. Roja sisiyan nan tê çêkirin an jî helaw tê belavkirin û şîn diqede.

Li her mehelê malê şunê hene. Di mesrefa şunê de herkes pîbarî hev dibe. Di şunên xwe de em qehwa ta'î didin mêvanê xwe. Fîncana qahwê gerek bê çemil be. Di şûna rihmetiyê kalikê mi de em geriyên negeriyên me fîncana bê çemil peyde nekir. (F. Deniz 2016)

Xwediyê azayê, piranî jî pîrek kincê reş li xwe dikin. (B. Tur 2016)

Şûnê berê gelekî dewam dikir. Aniha bûne sê ro. Wexta hinek dahrin ser gorê meyt vedişêrin, xort jî dahrin konê şûnê vedikin. Li vir jî û li gunda jî van salên dawîyê malê şûnê hatin çêkirin. Dera ew lê hebin, çadir nayên vekirin. (R. Çakıl 2016)

Heçê meriv gerek her ro li şîne rûnên çimkî mîlet dahrin û tînet. Pîrek jî li malek cihê rûdinên. Heger mele hebe ji bo herkesê tê rûdinê fatîhê dide

xwendin, mele ne hazir be yekî din; ya jî mêvan bixwe dibêjin: “Li ser al û eshabê pêxember, li ser mirîyê me û we tevde û bi xisûsî jî li ser vî/vê rihmetiyê el fatîha” di pê re herkes fatîhê dixwîne. Îca ahlê malbata rihmetî tê cem mêvanê xwe, dibêjin “Hûn bi xêr hatinin. Ser serê me, ser çavê mere hatine. Xwedê xêra we qebûl bike.” Bîskekê li cem hev rûdinên. Mêvan jî qala sebrê û xêr û bereket û nametbûyina mirinê dikan. Gotinê weke: “Serê we sax be, Xwedê bi rihma xwe şa bike, Xwedê ‘ef û mexfîret bike, ciyê wî/wê cinet be” dikan. Ya jî dipirsin: “Ma tu nexweşîya rihmetî hebû, çend salî bû, bi emrê Xwedê bû ya wekî dinê bû, kengî çû rihmetê? (H. Evdirihman 2016)

Di şînê de çay, qehwa ta’l û cixarê didin ber miletê hazir. Va sala miletê me hinek jê cixarê dernaxin ji mêvanê xwe re. Adeta cixarê rakirine. (M. Sönmez 2015)

Mêvan ji mala şunê kêr nabin. Nîro û êvarî çî kahr çî berx tîn şerjêkirin û heçê hazir be nêr dixwin. (A. Aras 2016)

Roja sisiya xêra miriya tê dayin. Ya goşt û birinc, ya jî hemîs çêdibe. Di şîna rihmetiya pîrka mi de salê çûn di rojîyê de me fitarek da miletê xwe. Me cangak şerjêkir. Mêvanê me pîrek û zilam gellek bûn. Ê nanê xwe dixwe, dibêje: “Xwedê bigihêjîne ber destê rihmetî” yanî jê re dua dikan. (M. A. Ece 2015)

Xelkê xerîb ne, le em ê meriv ya kêsek birinc, ya telîsek şekir ya jî tenekak rûn dibin taziyê. (M. C. Tüfek 2016)

Piştî nanê sê rokiyê, helawê çêdikin û bela dikan. Helaw bi rûn, arvan û qinê gûza ye. Wan dixin nav hev, li ser kuçik çêdikin. Ê helawê li derdora xwe bela dikan jî henin, hinek jî helawa xwe tînin li orta çarşiyê bela dikan. Piştî nan û helawê êdî şûn bi dawî dibe. Yekî bixwaze carna serdanekê dide mala rihmetî. (F. Ekinci 2016)

Di her sê rojê şînê de em li gund televizyonê xwe venakin. Heger kesê rihmet kiribe gênc be, em rîya xwe çend roya jê nakin. Asas rî neyê jêkirin baş e. Çimkî xelqê tîn şînê, yekî bi rî bivîne zane be ew xwediyê azayê ye. Mezinê me dibêjin zemanê berê me çel rojî rîya xwe jê nedikir û pîreka jî reş girê didan. (Î. Xoce 2016)

2.3.5. Îsqat

Kefareta nimêj û rojiyê ye. Sondxwarina bi derewan jî gerek ji bo wê îsqat were dayin. Piranî piştî kesek dimire û di pê re ahlê malbata wî îsqatê didin. Dema îsqat tê dayin ewî mîqdarê ku tê dayin, çend caran didin hinekan û dîsa ji wan distînin. Ji vê re jî dibêjin “Xweşkirin” an jî bi gotineke din “Dewr”. Dayina îsqatê herçiqas rîtuelek Îslamî be jî bûye perçeyek ji kevneşopiya herêmê.

Asas îsqat gerek ne piştî mirinê be, a xweş bi saxî mere li xwe bide. (Ş. Temel 2016)

Heger şexsê bimre deyndar be, ewil gerek ji malê wî deynî wî wer dayin. Îja li ser meselê bi derewa sond xwaribe, ji dêvila sondên wî ji îsqat tê dayin. (S. Sulhan 2016)

Şexsekî wefat bike kufletê wî gerek bi melakî re rûnên, bihesibînin: “Gelo limêj û rojiya wî lê qeza çûyî, sondê wî henin, tune nin?” Hesibandin û pê ve îja karin kefareta wî bidin. Gerek wextê bidin wer bivêjin: “Ji te re ev di ber limêja filankeso re ye.” (S. Sönmez 2015)

Îja îsqat gerek hîna meyt li erdê be wer dayin haa. Yanî berî meyt wer veşartin gerek îsqata wî wer dayin. Ji bo di qebrê de karibe hesêb bivîne. (H. Evdirrihman 2016)

Mezhebê me dibêje ji bo her ferzekê kulmekê (genim, garis, ceh û tiştên din) bidin. Pere hebe hîn çêtir e. Ma me rê bi kulma genim bide kê? (M. Seydo 2016)

Wexta îsqat tê dayin kefareta sondê kêmanî gerek bigêje deh feqîra. Ji bo rihmetiyê bavê xwe, me genim derxist. (M. Selçuk 2016)

Rihmetî wesiyet kiribe û gotibe “Malê mi li mi bidin” mecbûr bi qeysa wî wesiyet kiribe bê dayin. Malê rihmetî tune be gerek zarokê di ber wî re bidin. (V. Tüfek 2016)

3. CEJN Û REWRESM

3.1. Newroz

Eger ji bo gelê Kurd behsa rojekê ku niha weke cejn tê pîroz kirin bibe bêgûman ewil Newroz tê hişê mirov. Newroz ji mêj ve di kevneşopiya gelê Kurd de xwedî cihekî taybet e. Digel gotegotên cur be cur ên di derbarê Newrozê de agahiya herî muteber ev e: Kesekî bi navê Dehaq zordarî li gelê Kurd dikir. Roja zilma wî hilweşiya û gel jê azad bû, ew roj bûye Newroz. Zanyarên beriya me ev roj weke “rojeke millî” dîtine:

“Îro ev cejna me a milî û nijadî di nav me de kêr kiribe jî dîsa di hin bajarên Kurdistanê de wê şahînet dikin. Newrûz di nav Kurdan de kêr kiri be jî li milê din di welatê rohelatê nîzing de ji bo milletên nearî jî di çaxên salê de bûye destpêka biharê” (Ezîzan, 2012). Bi bandora tevgerên millî û siyasî xwedîderketina li Newrozê 30-40 salên dawî zêdetir bûye. Newroz elbet di serdemên berê de jî rojeke bi nîşan, herwiha bi qedr û qîmet bû. “Mirin ji mere roja Newrozê ye” (Nursî, 2004 a:126). Di berhemên serdemên klasîk de em dibînin ku roleke mezin ya Newrozê di nav Kurdan de heye. Ehmedê Xanî derheqê Newrozê de, di Mem û Zînê de wiha dibêje:

“Go ‘adetê pêşiyê zemanan

Ev bû li hemû cih û meknan

Weqtê wekû şehsewarê xawer

Te ‘hwîl dikir di mahê azer²⁹

Ye ‘nî ku dihate burcê sersal

Qet kes nedima di mesken û mal

Bilcumle diçûn der ji malan

²⁹ Meha adarê

Hetta digehîşte pîr û kalan

Roja ku dibûye 'eydê Newrûz

Te'izîm ji bo dema dilefrûz “

Se'hra û çemen dikirne mesken

Beyda û deman dikirine gulşen” (Xanî, 2010: 345-346).

Di dewama van beytan de dibêje ku di Newrozê de keç û xortên azib ji bo zewacê li gorî şerîet û sunnetê dikarin li qadên Newrozan hev bibînin û herkes kifûvê xwe bicibîne. Ev jî hêleke din ya vê cejnê ye. Weke tê dîtin Ehmedê Xanî Newroz û sersalê bi hev re di meha adarê de nîşan dide. Herwiha ji bo Newrozê dibêje: “*Eyd*” yanî vê rojê weke “cejnê” dibîne. Newroz di roja me de dikeve 21ê Adara Mîladî. Ev tarîx jî beramberî 9ê Adara Rûmî tê. Di çavkaniyan de, sersala Kurdî jî 9ê Adara Rûmî tê nîşandan. Li gorî agahiyên me ji temenmezînan herêmê girtine, li herêma Dêrikê pîrozkirina Newrozê di 30-40 salê dawî de bêhtir bicih bûye. Mijareke vê gotinê hebekî piştrast dike ew e ku sehayên em lê geriyan me hinek kesên bi navê “Newroz” tesbît kirin. Temenê wan kesan ne di ser çil salî re bû. Sê kes jê jin bûn û yek jî mêr bû. Elbet navên zarokên wekî di jî Newroz hebûn. Sedema ku em li ser vanên behsa wan tê kirin disekinin ew e ku, ew destpêka bandora Newrozê ya li herêmê nîşan didin. Van kesan gotin ku ew roja Newrozê çêbûne, lewma navê vê cejnê li wan bûye. Xuyaye ku ji çil salî û vir de hişyariya di derbarê Newrozê li herêmê zêdetir bûye.

Ji xeynî nêrîn û tesbîtan, agahiyên çavkaniyan ên di derbarê Newrozê de wiha ne:

Newroz roja nuh e. Sersala me ye. Du îdiyê mezin di nav Kurda de heye: Yek “Newroz” e, bihar e. A dinê jî “Mihrîcan” e ew jî payiz e. Ma Newroz ne ji îro de heye, ji berê de hebû. Dibêjin roja Fîr'ewn û Hz. Mûsa hatine qarşî hev, ew ro Newroz bû. (M. Seydo 2016)

Wextê em gedebûn Newroz ne weke aniha bû. Kilam tune bûn. Hineka agir vêdixist. Digotin “Nehroz” yanî roja nehê adarê bû. (M. Bûb 2016)

Li nêzikî girê Qîjot, vaye bi ser Dêrikê ve ye, meydana Newrozê heye. Li nav mehela ye. Milet li wir agir vêdixin, govenda xwe digrin. (F. Deniz 2015)

Em li ser girê Heramiyê êgir vêdixin. Sê roja, çar roja em vêdixin. ‘Eyn wek dawetê qîz û xortê me bi hev re direqisin. (V. Tüfek 2016)

Pîrek ji çarşiyê ji xwe re hibrî û kitanê nuh dikirin. Kincê xisûsî ji bo Newrozê em tînin dikanê xwe. Bajar giş wê rojê ber bi meydana Newrozê diherike, Dêrik vala dibe. (E. Özgen 2016)

Newrozê de gende li serê qerma tekera vêdixin, li dorê dilîzin, xwe di ser êgir re davêjin. (X. Xatûn 2016)

Ahlê gunda jî û gelek Dêrikî jî di Newrozê de dahrin Diyarbekir û Qezê. (Y. Dengiz 2016)

Di awayê pîrozkirina Newrozên serdemên borî de û awayê pîrozkirinên îro de hinek cudahî çêbûbin jî dîsa Newroz ji hêla herkesî ve weke cejnêkê tê zanîn. Şênîyên Dêrik û derdora wê roja Newrozê weke sersala Kurdî bihesibînin jî niha li herêmê, îhtimal e ji ber bikaranîna salnameya mîladî, pîrozbahiyên sersalê ne di roja Newrozê de ye. Bêhtir di dawiya meha kanunê de bi mîletên din re sersal tê pîroz kirin. Ev jî bandoreke neyînî ya li ser çanda gel e ku kevneşopî berovacî kiriye.

3.2. Cejnên Dînî

Li herêmê digel navên “Îdiya Remezanê û Îdiya Qurbanê” hinek kes wan weke “Îdiya biçûk û Îdiya Mezin” jî binav dikin. Rojên cejnan li Dêrik û derdora wê bi kêf û şahî derbas dibe. Bi taybetî jî zarokên kû ji êvar de kincên xwe didin ber serê xwe û radikevin, dema sibeha îdiyê li kuçe û kolanan digerin vê şahiyê derdixin asta herî bilind. Di Cejna Qurbanê ya sala 2016an em çûn gundên Maşmaşkê û Heramiyê. Weke ûsûlê, cejnê bi kirina nimêjê dest pê kir. Di pê re zarok derketin kolanan. Zarok diçûn serdana gelek malan. Piraniya deriyê malan roja cejnê vekiriye. Zarok bi gotinên weke: “Malê siba we bi xêr; îdiya we bimbarek be.” yan “Eyd û Erefatê we bimbarek be.” îdiya ahlê malê dikin. Ahlê malê jî dibêjin: “Hûn gelek îdiya bivînin.” û şekir didin zarokan. Ev rewresm li Dêrik û derdora wê tevî pêvajoya beriya xwe wiha diqewime:

Rojê beriya îdiyê ev in: Du ro berî îdiyê roja kinca ye, yanî wê rê mere serê xwe û kincê xwe dişo. Berî îdiyê bi rokê jî, roja kulîça (kilor) ye. Hinek dibêjin roja mezela jî. Di vê rojê de kulîçe tê çêkirin. Ê miriyê wan hebin, êvarî dahrin ser mezela. (F. Ekinci 2016)

Êvara Erefê gede dahrin ser mezela. Herkes li wir ji bo xêra miriyê xwe şekir bela dike. (M. Sönmez 2015)

Şeva berî îdiyê dahrin ser mezela. Ê miriyê wan nûh bin, siba îdiyê jî dahrin ser gorrê. (M. Selçuk 2016)

Pîrekê teva malê bin, şevêkê du şeva berî îdiyê dahrin mala bavê xwe. Ê malê wan cihê bin, roja îdiyê heta nîro li malê dimînin, mêvanê xwe bi rê dikin. Vê taliyê bi zilamê xwe re dahrin mala bavê xwe, li wir dimînin. (F. Deniz 2015)

Heger berî wê îdiyê di hundirê wê salê de ferdekî malekê rihmet kiribe, ewil herkes dahre wê malê. Rûdinin û heta hinekî din neyên sersaxiyê ji wir ranabin, ahlê malê tenê nahêlin. (F. Ekinci 2016)

Zilam dahrin limêja îdiyê. Heta zilam bela nebin gede li îdiyê nagerin. Zilam ji camiyê derdikevin û pê ve gede mal bi mal digerin û dibêjin: “Malê siba we bi xêr îdiya we bimbarek be.” xwediyê malê jî li wan vedigerîne dibêje: “Beroxudarek be, hûn gelek îdiya bivînin.” û şekir didin wan. Heger nasê hev bin pera jî didin geda. Gede heta seet deha digerin. Di pê re îja zilam dest bi gerê dikin. Heta limêja nîro û derengtir zilam digerin. Wextê nîro li kîjan malê bin li wir nanê xwe dixwin. Piştî nîro îja pîrek derdikevin îdaniyê. Dahnê esir dahrin mêvandariyên dûr. (E. Özgen 2016)

Îdiya me gunda hew rokê ye. Roja dudu û sisiya kes zêde nare cem kesî. Ji xwe gund biçûk e. (C. Çeviren 2016)

Gundiya ne lihevbin zêde narin cem hev. Hew herkes dahre derdora xwe û vedigerin malê. Heger gundiya nê çêbike û ban zilama bike, berî nîro zilamê me dahrin ser nê. (V. Tüfek 2016)

Di îdiya qurbanê de em piştî limêjê, ewil tên malê. Me îdaniya ahlê mala xwe kir û pê ve em qurbanê xwe şerjê dikin, goştê xwe bela dikin. Berê heçê Şafîî, qurban şerjê nedikirin. Va salê dawiyê ew jî gelek şerjê dikin. (M. Û. Hemê 2016)

Xwarinê rua îdiyê tirşika fasûla, goşt û birinc e. Va salê dawîyê hinek goştê berxa dixin kuzika û davêjin firmê. Di pê nê re bi çayê re kulîça jî dixwin. (S. Yücel 2016)

Berovacî bajarên mezin, li Dêrik û gundên wê cejn bi awayekî rengîn û li gorî qaîdeyên kevneşopiya herêmî tê pîrozkirin. Rola cejnên ya ku ferdên civakê digihêjêne hevudû û hêzeke navcivakî ava dike, li vir bi awayekî xurt wezîfeya xwe bicîh tîne. Digel rîtuêlên Îslamî, bicîhbûna kar û kiryarên adetî û zemanî sentezeke Îslamî-Kurd di cejnên herêmî de nîşanî me dide.

3.3. Sersal

“Çend cure rojên taybet ên netewan hene. Netewî, dînî, civakî... her wekî din. Roja Kurda ya netewî: Roja ku Kawe zilma Dehak şikand; weke rojên Silahedînê Eyubî hatiye dinyê û bûye siltan. Rojên me yê dînî ji xwe ma'lûm in. Îca Sersala Kurda heye. Ev roja 9an ya Adara Rûmî ye ku tevahiya Kurda vê roja civakî ya taybet cejneke dizanin, despêka jiyaneke nû dihesibînin, bilez ziyareta hev dikan, hevûdu pîroz dikan, diyariya ji hev re bi rê dikan. Welhasil di nava rojên ji rêzê yê jiyane de xatirê taybet yê vê rojê heye.” (Jîn, 1985: 599) Bêgûman ev roja taybet weke hatê zanîn 9ê Adara Rûmî, sersala Kurdî ye. Ev roj weke di mijara Newrozê de jî hatibû îfadekirin beramberî 21ê Adara Mîladî tê. Niha gelê Kurd herçiqas di vê rojê de Newrozê pîroz dikan jî, ji ber bikaranîna salnameya mîladî pîrozkirina sersalê, ne di vê rojê de bêhtir weke mîletên din di roja dawî ya berfanbara mîladî de pîroz dikan. Weke encam Newroz û sersal ku bihevre ne, ji ber bikaranîna salnameya Mîladî ji hev qetiyane.

Li Dêrik û gundên wê ji xeynî hinek kesên temenmezin, mirovên din guh nadin vê rastiyê û ew jî sersala mîladî, weke sersala xwe qebûl dikan. Herçiqas sersal li gor salnameya mîladî were pîroz kirin jî dîsa awayê pîrozkirina sersalê li gorî kevneşopiya herêmî ye. Bi taybetî jî lîstika bi navê “qirdik” an jî “kose” bi hêmanên xwe yê folklorê Kurdî ji mêj ve di şevên sersalê de tên lidarxistin. Li herêmî awayê pîrozkirina sersalê wiha ye:

Di meha adarê de mezinê me dibêjin îro “Sersala Kurmancî ye”. Le di wa roja de kes li sersalê nagere. Xort û gede, bi Noela Fila re meha aralixê derdikevin sersalê. (A. Deniz 2015)

Çend heb xort hevdu digrin. Yek ji wan xwe dike zave. Kincê pîreka jî li yekî dinê dikin, wî jî dikin bûk. Ê sisiya jî Kose ye. Kose em bivêjin ew jî wek parêzvanê bûkê ye. Îca li deriyê mala dixin. Xwediyê malê derî vedike, bi heneka dest davêje bûkê. Kose û zave jî li wî dixin, pera jê distînin. (M. Bûb 2016)

Ê hatin sersala me elbet dest vala nayên vegerandin. Tasek nîsk, genim, mewîj ya jî hinek pere gerek tu bide wan. Ahlê çiyê gwîz, bastêq û bihîva didin wan. (F. Deniz 2015)

Hinek xwe di sersalê de dikin “Qirdik”, xwe dikin “Kose”. Te dît aniha di televizyonê de derdikevin: Kincê sor li xwe dikin, hiriya sipî didin ber pozê xwe, yanî dikin rî û simêl. Zilamê me jî berê xwe wer dikirin. (Z. M. Qado 2015)

13ê meha yekê sersala Kurmancî ye. Aniha tenê “Kose” digere. Le berê em çar heb bûn:

“Kose: werîs li nava xwe digerland, hirî dida ber wecê xwe wek rihê çêdikir û tenî di ser çavê xwe dida.

Bûk: Ew jî zilamek bû. Kinc li xwe dikir, xwe dikir weke bûkê.

Berkose: Ew jî gerek yekî hebekî girs bûya. Li bûkê xwedî derdiket.

Zixam: Wî jî li evên din xwedîtî dikir. (H. Evdirrihman 2016)

Pez, pere, bulxur hema çi hebe mere dide wan. Xortê me carina “Kose” gund bi gund digerlandin. (R. Çakıl 2015)

Mîweyên wextê çibin em didin wan. (§. Temel 2016)

Herkes kare xwe bike kose. Xizan, maldar ferq nake. Wexta em gede bûn xorta kerê xwe bi xwe re digerlandin, tiştê didan hev dixistin têrrê. (E. Remo 2015)

Li nav bajêr li hêla Mehela Çiyê gede li sersalê digerin. Dibêjin: “*Serê malê, binê malê/Serê salê, binê salê Xwedê kurekî*³⁰ *bide vê malê*” (R. Vural 2016)

Teşbîha di navbeyna Koseyê Kurdan û Kalikê Sersalê yê miletên din xaleke girîng e. Çimkî xeml û girêdana wan gelekî dişibe hevûdu. Ev mînaekeke muhîm e ku wekhewî û têkiliya di navbeyna çanda gelê Kurd û çanda miletên din nîşan dide.

3.4. Çûnûhatina Hecaciyan

Heçî kesê misilman, qe nebe hema carekê jî timaya çûyina hecê dikin. Ên vê siûdê bidest dixin xwe gelekî bextewar dibînin. Weke kevneşopiyek bicihbûyî xizm û nasên hecaciyan di çûnûhatina Hecê de divê herin ziyareta wan. Di çûyinê de herin oxira wan û di hatinê de jî herin bixêrhatinê.

Li herêmê digel hecaciyan bi şîrketan re dahrin, ên xwe weke karker nîşan didin û Heca xwe dikin jî ne kêr in. Niha bi balafiran dahrin Erebaştanê. Hin kesên temenê wan mezin behs kirin ku bav an jî bapîrên wan bi deveyan çûnin Hecê. Awayê oxirkirin û pêşwazîkirina hecaciyan li herêmê wiha ye:

Yekî here Mala Xwedê gerek mere di çûnê jî û di hatinê jî her cem. (E. Qubilmî 2016)

Berî çûnê hecaci û mêvanê tîn cem wan li hev helal dikin. Mêvan ji hecaciya dua dixwazin. (M. Mehmûd 2015)

Hecaciyan vedigerin, ji hineka re dibêjin “Mi li ber Mala Xwedê destê xwe vekir û ji te re dua kir.” (M. Ertekin 2015)

Ewil di çûnê de mêvanê me tîn cem me. Em çayê, qehwê û tiştê din didin ber wan. Îja piştî mere vedigere, darikê sîwakê, hingulîska, bêhnê xweş, kumê limêjê datînin ser temsîkekê û li ber mêvana digerin. Ew çî dil bikin radihelin wan. (N. Tur 2016)

³⁰ Li navendê û li gundên Dêrikê ji zarokan re dibêjin “gede”. Lê em di vir de dibînin ku di vê mamika sersalê de dibêjin: “Xwedê *kurekî* bide vê malê” di vir de *kur* bi wateya zarokê law e. Çimkî weke diayên berbelav li herêmê her daîm daxwaza çêbûna zaroyên law ji bo dê û bavan tê kirin.

Hecacî bi xwe re ji Mala Xwedê ava zemzemê tînin. Ava vir jî bera ser didin, pê zêde dikin. Him li malê hecaciya mere vedixwe û him jî yekî bixwaze hinekî didinê, dibe ji kufletê xwe yê malê re. (R. Vural 2016)

Ava zemzemê gerek di sê qurta de wer vexwarin. Berê mere jî bi qubla şirîf ve be xêra wê mezintir e. (S. Sönmez 2015)

Yek here Hecê û were gerek mere îja jê re bivêje “Hecî/Heciyê.” (Ş. Zerga 2015)

Ev çûnûhatin, qedirgirtin û ciwamêriya nijadî ya gelê herêmê eşkere nîşanî me dide. Herwiha di çûnûhatina eskeriyê de, di çûnûhatina karên demsalî de jî gelê herêmê weke ya hecaciyan di çûnê de û di hatinê de cihê cihê dahrin serdana hevudû. Bi vî awayî têkiliyên wan ên civakî bihêz dibe.

3.5. Nimêj û Dua Baranê

Baran ava heyatê ya hemû candaran e. Dema ku ev bûyera siruştî kêmbibe, yan jî baran di wextê hewcedariyê de nebare mirovên Misilman derdikevin ji Xweda re lava dikin. Nimêja baranê sinetêke cenabê Pêxember e. Herçiqas nimêja baranê karekî Îslamî be jî bi taybetî li gundên Dêrikê bi bandora baweriyên gel ketiye rengê herêmî. Weke mînak şênîyên gundên Dêrikê ji bo vê nimêj û diayê bikin, carinan li qadeke taybet û bi tevlêbûna gelek gundan di meheke ku ji berê de ji herkesî ve diyar e li hev kom dibin.

Ji bo dua baranê di serê nîsanê de em dahrin Girê Dod. Gundê dinê jî giş bi terextora ya bi mekîne wekî din tîn wir. Li wî girî gorra ûcêx heye. Navê wî Dod e. Em dahrin wir limêj dikin, destê xwe ji Xwedê re vedikin. (M. Selçuk 2016)

Wexta em limêj dikin, mele çakête xwe ji xwe dike û vajî li xwe dike. Em bi wî hawî limêj dikin. Yanî qey wek teslîmîyetek ji Xwedê re ye. (D. Özer 2016)

Her kî yê here limêja baranê, gerek berê sê roja rojiyê bigre. Le bi Xwedê ez bivêjim em digrin, derew e. Hew belkî mele tenê bi rojî be. Îja ji ber şertê wê hebki giran e, em narin limêja baranê. (E. Selçuk 2016)

Gerek însan; geda, extiyara û pezê xwe tevde bi xwe re bive ciyê dua baranê.
Bi vî hawî Xwedê li mere tê rihmê. (M. Bûb 2016)

Li herêmê ji bo baran bibare ji xeynî rewresma dînî, hinek rewresmên herêmî û millî jî henin:

Ji bo baran bibare hinek “Bûka baranê” digerînin. (Q. Güler 2016)

Çend textika bi ser hev dikutin. Kincê kevin li wa textika dikin. Li mala digerînin. Ê digerînin dibêje: “Waye bûka baranê hat, avê lêbikin.” Malî jî avê lêdikin. Dibêjin biraqe baran bibare. (A. Aras 2016)

Şênîyên Dêrikê ji bo baran bibare digel wezîfeyên xwe yên dînî, ji kevneşopiyên xwe yên netewî jî kêr namînin. Ji ber ku sondajên avê hatine vekirin û bendavên avdanê hatine çêkirin, hewcedariya bi baranê weke salên borî ne zêde be jî, dîsa ne mimkun e ku gel bê av bidebire. Ji ber vê jî gelek salan gelê herêmê derdikevin nimêja baranê dikin.

4. ZANYARIYÊN GELÊRÎ

4.1. Hekîmtiya Gelêrî

Beriya tîba modern a îro pêşde here, mirovan xwe bi xwe tedawî dikirin. Herwiha hinek kesên bi hekîmtiya xwe yî gelêrî derdiketin pêş hebûn. Di roja me de herçiqas derfetên tedawîbûnê zêde bûne jî kesên ku ji nexweşxaneyan şifaya xwe nabînin, yan jî carinan ji ber ku naxwazin biçin bijîşkan wekî din li şêweyên dermankirinê digerin. Tedawî û dermankirina bi vî awayî weke “Hekîmtiya gelêrî” tê binavkirin. Beriya tîba modern, hekîmtiya gelêrî piranî ji ber bê derfetiye dihate tetbîqkirin. Îro digel tîba modern, ev cure hekîmtî hê jî nehatiye terkkirin. Tevî nexweşiyên wekî din, li gorî hinekan, nerihetiyên bi çûyina nexweşxaneyan nayên dermankirin henin. Dîsa li gorî wan, jixwe ne ew nexweşî e ku bijîşk bikaribin wan derman bikin. Ev hemû nerihetî dikevin sîwana hekîmtiya gelêrî.

Tenduristiya xweparastinê; di dema nexweşiyên de ji bo başbûn û şîfadîtîne hewldayin erkeke mirovbûnê ye. Hemî ol û çandên kevnar û qedîm tedawîbûnê emir

dikin. Siruştê hemû tiştên afirandî pêşkêşî mirovan kiriye, da ku pê bedena xwe biparêzin. Heke em bedena xwe neparêzin dê curmê wê jî, bi êş, nexweşî û bi bêhizûrî bikşînin. (Hekkarî, 2012: 15)

Di hekimiya gelêrî de peyva “nexweşiyê” wateyeke ji ya ku em hîn bûnê firehtir di xwe de dihevine. Bi vê ne tenê kulekiyên di rewşa siheta mirovan de, ji kordûndetiyê bigrin heta nerihetiyên ji ber nezerê, nerihetiyên ji ber tirsê û hêzên derasayî derdikevin holê, dîsa nerihetiyên cihê cihê divê were famkirin (Boratav, 1978: 149).

Ev cure hekîmî ji mêj ve li seranserê cîhanê heye. Herwiha pêşiyên Kurdan jî ev hekîmî ji bo tedawiya nerihetiyên xwe ceribandinin. Ewil nexweşî tesbît kirine, paşê jî li gorî zanînen xwe bi derfetên heyî ew tedawî kirine:

Ji bo qenckirina nexweşiyên cuda cuda yên merivan û heywanan hesinê sincirî datanîn birînê û ew dişewitandin. Gelek hêşinahî û pincara çolê, rûnê zeytê bi kar dianîn (Orbellî, 2011: 95). Lakîn cerahine qewî qenc ji wan de peyda dibin. Lewra daim şolêd wan birîndarbûn e (Bazîdî, 2012: 127). Calînûsê hekîm gotiye: Herçî nexweşê tama devê wî şor bit ji ‘illeta sewdayê ye. Herçî şêrîn bit xwûn e; tirs bit belxem e; tehl bit sefra ye. Eger gijnîjê digel şekirî bikutin bixwin sewdayê dibit feqet şehwetê dibirit. Eger kesî ne’na’ê bixwit, belxemê dibirit û hem bayê jî (Erwasî, 2013: 35-37).

Li sehaya me ya lêkolînê, li Dêrikê jî, hekimiya gelêrî xwedî cihekî girîng e. Bi ceribandinên di nav sedsalan de gelê herêmê li gor zanînen xwe qeneet bi hin derman û şeweyên tedawiyê anîne, wan bikar tînin. Gelê herêmê vê şewe tedawiyê weke “Dermanê/dermakirina Kurmancî” binav dikin. Digel nexweşxane û dermanên hemdem li cem hinek kesan baweriya bi “Dermanê/dermankirina Kurmancî” gelekî hêz e. Ji van dermankirina hinek jê herkes dikare li mala xwe çê bike û tetbîq bike. Lê hinên wan tenê li cem kesên ku di wî warî de nav dane û pispor tînen çêdibin.

4.1.1. Hekîmên Gelêrî ên Herêmê

Gelê herêmê di tedawîkirina nesaxiyên xwe de piranî baweriya xwe bi derman û şîretên şêx û mela tînin. Tirb û ûcax jî ji bo nerihetiyên cihê lêgerîna şifayê ne. Ji xeynî wan, hin kes û malbatên naskirî henin ku di hekîmtiya gelêrî de gelê herêmê bi wan ewle ne. Li Dêrik û derdora wê piraniya hekîmên gelêrî heqdestê xwe nastînin. Lê bi taybetî di tedawiya kordûndetiyê heqê tedawî û dermankirinê tê sitendin. Hege li Dêrikê em ji xeynî tîba modern cih û kesên di tedawiyan de rolê digrin rêz bikin, wê tiştêkî wiha derkeve pêş me:

- I. Bi destê şêxan
- II. Bi destê hin kesên ku bi tedawî û dermankirinê navên wan derketine pêş
- III. Ew şêwe tedawî ye ku kesek bi serê xwe çêdike
- IV. Hêviya ji tirb û ûcaxan tê kirin

Hekîmên gel ên Dêrik û derdora wê ku me tespîtkirine li gorî beşa wan a nexweşiyê ev in:

Pîriktiya (ebetî) zarokan: Pîra Sorê, Pîra Leylê, Hecî Ebîde (Her sê li navenda Dêrikê ne.)

Ji bo cîderketin û şikestinê: Hesenê Mezrêyî, Xaltiya Xeco, Xalê Receb (Li Rebetê)

Zerik: Mala Hemîdê Terzî (Navenda bajêr)

Tedawiya Kordundetiyê: Pîra Sorê, Hecî Yazîya Şêxê Eysê (Eynterî). Ji xeynî van hekîmên herêmê, şênîyên bajêr jî bo kordûndetiyê dahrin cem şêxên Qosera Mêrdînê û yên derdora Amedê

Bîrov: Mala Xelo, Tirkanê (Herdu li navendê ne)

Rîş: Malbateke ji Banqîra Metînan

Ji bo heyinên derasayî û mijarên efsûnî (Cin-xenîm): Aynûr (Li navenda Dêrikê)

Nexweşiyên cur be cur: Nûrê Tur (Li Qizilê)

Ji xeynî vanên li jor ku navdar bûnin, li her taxên bajêr û li gundan gelek mirovên nexweşiyên derman dîkin henin.

4.1.2. Cureyên Nexweşiyên û Tedawiya Wan

Bayê sor: Bayê sor di nig, dest ya jî derên din de tê “Dermanê mala melê” em jê re dibêjin, pincarekî me heye. Kulîlkek zer e. Em ji çiyê didin hev. Ez wî pincarî

hişk dikim, di pê re di hawên de hûrhûrî dikutim. Ez sê çar hêka dişkînim û sipîka wan derdixim. Vî dermanî bi sipîka hêka tevhev dikim, di ciyê bayê sor tê de hatiye didim. Li gor nerihetiyê du sê cara ez tê didim, baş dibe. (Q. Güler 2016)

Wexta nig ya jî dest biwerime, sor bive û gelekî biêşe û bişewite ew bayê sor e. Însan ji ber nadebire. Ji xwe pîranî di nig û dest de tê. Wexta mere tiliya xwe datîne ser birînê sipî dibe û mere tiliya xwe radike ew der dîsa sor dibe. Bavê mi bayê sor dibirî. Ez jî, hewce bike dibirrim. Kulîlka biharî ji çem û newala em didin hev. Ciyê birînê em jilêt dikin, xwîna reş û tîr ji wir diherike. Du sê pîvaza mere dişkîne û dişo. Bi ava wan pîvaza, wê kulîlkê di birînê didim û dipêçim. (E. Remo 2016)

Şewat: Ev derman ê rihmetiyê bavê mi bû. Bavê mi Ermenî bû. Wek wî rê me daye derman werê çêdibe: Tertê kilsê em ji çiyê tînin. Em wê kilsê bi heft ava dişon. Heft cara avê bera ser didin û avê dirjînin. Di pê re yaxa zeytûna bera nav didin û îja bi perîkê mirîşka lihevduxin. Dibe wek melhemê. Tu li kudera xwe yî şewitî bide rihet dike. (A. Deniz 2015)

Heger ne şewateke pir giran be, em boyaxa qondera tê de didin. Birînê işk dike. Mast jî tê didin, ew jî şewatê baş dike. (D. Özer 2016)

Kunêr: “Pelewêz” ew jî giha ye, buharî şîn tê. Bi şînî em şil dikin, di birînê didin. Wê birînê der dike. Di pê re ciyê birînê xwe nuh dike. (S. Vural 2016)

Sîmuzît: “Petîşok” di nav bîstana ya jî di nav garisa de şîn tê. Tu wê der bike û çend niqût ava wê bera pozê xwe bide, pozê te wê biherike biherike heta tişteke tê de nemîne. Elema poz gişî derdixîne. (Ş. Zerga 2015)

Bûkik: Heger bûk di çav de hatibe, gerek jinikek bi pismamê xwe re zewicî be serê biskê xwe di çêv bide, baş dike. (N. Tur 2016)

Bûk di çav de derketa, jinikek pismamê xwe kiribe û jinbirê wê tune be serê gulîkê porê xwe di bûkê dide. (M. Ê. Hemê 2016)

Guhêş: Guhê gedekê biçûk biêşe, em şîrê dê bera guhê wan didin. (N. Tur 2016)

Heger li gundê me guhê yekî lê biare derziyekê di êgir de sor dikin û guhê wî piçikekî dax dikin. Êşa wî qut dibe. (D. Özer 2016)

Şekir: “Merwend” pincarekî tal e. Em işk dikin û dikutin, hûrhûrî dikin. Dixin şûşê û hiltînin. Carê kevçiyekî em dixwin. Ji bo şekir û nerihetiyê wekî din şifa ye. (R. Tur 2016)

Hinek jê re dibêjin “kasim otu” li vî çiyayê me yê Dêrikê pir e. Vî nîrî mere dide hev. Tu pincêr dixwe û avê bi ser de vedixwe. Ev pincar ji bo şekir pir baş e. (Ş. Silêman 2016)

Bapêş: Beybûnatê³¹ em tînin, em ‘işk dikin û di pê re di avê de dikelînin, vedixwin. Ji ixlamûrê çêtir e. (Z. M. Qado 2015)

Werima pêsîrê: Pîrekê bişîr, carina pêsîrê wan diwerimin. Em dibêjin “Mû li ber geryaye.” Em wan dibin cem pîrekek gurçika gur bi xavî xwaribe. Hinek pîrek ji bo vê nexweşiyê baş bikin, gurçika gur bi xavî dixwin. Wanê gurçika gur xwarinin, sê cara wek gur “’eb” dikin a nexweş. Dibêjin “’eb ‘eb ‘eb.” Nexweşa me baş dibin. (N. Tur 2016)

Weşîna por: Kulmek qalikê guza têxê nav avê. Heta sibê biraqe bimîne, ji bo dema xwe vede û avê zer bike. Bi wê avê serê xwe bişo. Tu ava dinê li serê xwe neke. Him por hew diweşe û him porê nuh derdixe. (Z. M. Qado 2015)

Agirê şevê: Gerek şexsekî heft sala şivanî ya jî gavanî kiribe dera agirê şevê lê hatiye bi heste agir di ser re bigre, wê rihet bike. (M. Û. Hemê 2016)

Tansiyon: Ji bo tansiyonê ez goştê rêviya dixwim. Gelekî ji tansiyonê re baş e. Ez her sal dixwim. Îsal hîna dest mi neketiye. (N. Tur 2016)

“Bajang” nebateke li vî zînarê³² me şîn tê. Em didin hev û hişk dikin. Bajang tansiyonê serast dike. Nahêle tansiyon derkeve. (Ş. Silêman 2016)

³¹ Beybûn

³² Zînarê ku Dêrikê pala xwe dayê nîşan dike.

Bronşît: Yekî bronşît vê re hebe kîwroşkekî serjê bike û eyarê (post) wî kîwroşkî yê hêla çermê hundir bide ser sînga xwe, bi potekî bipêçe heta sibê ew bronşîta lê qels dibe. Heger du sê cara mere wer bike, wê ji bronşîtê pak bive. (Z. M. Qado 2015)

Bîrov: Gerek sê çarşema li ser hev dahnê sibê werin cem mi ez ji wan re bişom. Ya jî ava ez ê li ser bixwînim wê bi xwe re bivin û sê çarşema li ser hev bi wê avê bîrova xwe bişon. (Y. Ş. Eysê 2016)

Ê bîrovê dibirrin gelek in. Gerek sê çarşema li ser hev wer birrîn. Ew jî dişon û tif dîkinê. (R. Çakıl 2016)

Virik (emel): Ya hinek nokê şor mere bixwe, ya jî piçek dema çayê xavî mere daqurtîni ji emel re baş e. Qehwa toz jî hinek davêjin devê xwe. (Z. M. Qado 2015)

Zerik: Zerik bi du hawa ye. Yek a mezina ye, yek jî a zaroka ye:

A mezina, mere zerika wan dibire. Bi jilêt, du sê cara paş guhê wan tê veçirandin. Di pê re çendakî îja parêzê digrin. Şênayê bixwin, wek tolikê, ji wan re baş e.

A zaroka, ew wexta nuh çêdibin bi zerikê ne. Paçikekî zer bi ser serê wan mere binixumîne wê baş bivin. (V. Tüfek 2016)

Rîş: Rîş bi du şikla ye. Ya mê heye û ya nêr heye. Îro dixor ji rîşê re dibêjin “Qansêr”. Ya mê nebaş e. Xewr dibe, xwe bera damara dide; êgir dide ber xwe û dişewitîne. Şeş meh, salekê devam dike wî şexsî dikuje. Le a nêr, ne xerab e vedigere, baş dibe. Xwe bera hundirê laş nade. Em herduya jî dibirrin, şifa bi Xwedê ye. (E. Remo 2016)

Wexta ez gedê bûm, ciya mi nexweş bû. Li hundirê Dêrikê Mala Bero hebû. Em diçûn cem wan. Ji nav xerzikê Dêrikê gîhayek tanin. Ew derman bidana kê, ew rihet dibû. Dibêjin pêşiyê Mala Bero bi vê nexweşiyê ketine û di xewnê de ev giha dîtine. Nuha jî hinek ji hev re dibêjin: “Tu bi rîşa Mala Bero bikeve.” (M. Mehmûd 2016)

Nigê mirîşka û simê karika li ser êgir dişewitînin. Di pê re hûrhûrî dikin, dibe wek ariyê. Ew şexsê rîş di wan de hatibe didin wan li gor qeysekê her carê dixwin. (A. Deniz 2015)

Birînên vekirî: Em Dermanê Çilo³³ ji şe'aran didin hev, hişk dikin. Timî li malê li cem me heye. Wexta derek me bive birîn, em wî dermanî bera birînê didin. Derhal xwîna birînê disekinîne. Le heger birîn zêde vebûbe ev derman tesîr nake, derman ji bo birînê biçûk baş e. (Z. M. Qado 2015)

Pelê “gezgezkê” mere dide hev û ‘işk dike. Di pê re hûrhûrî tê kutan. Îca wê tozê bera birînê didin di birînê de işk dibe. Xwîna di cî de disekinîne. (S. Vural 2016)

Wexta derek geda xwîn bive ez paçîkekî biçûk dişewitînim. Ew paç gerek ya campol ya jî hîzar be. Naylon nabe ha! Îja ez wî pîşotî bi hinek rûn lihev dixim û didim ser birînê. Çend roja li ser dimîne. (E. Remo 2016)

Peq û pizik: Ji bo pirzîk û peqê bi elem derbive, mere hinek hevîr û rûn tevlihev dike. Hinek loqim jî tevê dikin. Wê şîmarûnê datînin ser birînê û dipêçin. Şevêkê li ser bimîne, wê xwîn û elêma di birînê de dikşîne wê der dike. (Y. Ş. Eysê 2016)

Sorbûna çavan: Tîfilek goştê bi reh û dûvê pez bihev dikutin. Di pê re datînin ser çavê sorbûyî û bi paçekî girê didin. Şevêkê li ser çav dimîne. Xwîna ketiye çêv dikşîne. (Z. M. Qado 2015)

Birînên bi elem: Mere xwê, rûn û hevîr bera nav hev dide. Ji bo kişandin û derkirina elemê gerek xwê tê de hebe. Hat lihevixistin û pê ve ew dibe “Şîmarûn” Şîmarûnê li ser potekî datînin û wî potikî li birînê dipêçin. Heta sibê ew birîn der dibe; xwîn û elêma wê diherike, derdikeve tiştek tê de namîne. (M. Ê. Hemê 2016)

Cebirandin: Çend heb hêkê xav û mûyê bizina tevhev dikin. Li ciyê ji cî derketiye didin. Ser wir dipêçin, çendakî pêçayî dimîne. Wexta bicebire vedikin. (M. Ê. Hemê 2016)

³³ Çavkaniya me dibêje Çilo jineke gundî ye. Ji ber ku wê ev derman li nav wan belav kiriye ji dermên re dibêjin: “Dermanê Çilo” (“Ç” nerm tê xwendin weke -çêlek, çêlik)

Parastina ji zingarê: Birînê bizmar ya jî hesinê wekî dinê tê re çûbe, yek pê dimîze.³⁴ Urîk asît û amonyak tê de heye. Le ev tedawî piranî di nav geda de heye. Kesê gîhaştî wernakin. (R. Tur 2016)

Em mîzê weke dermanekî di tiba Melayê Erwasî de jî dibînin. Lê bi ferqekê, Mela, mîzê ji bo nebatan weke derman pêşniyar dike. Mela dibêje “*Eger darê ber negirt, bewla ademiyan (mîza însanan) bixne bin rehê wê, ber digrit.* (Erwasî, 2013: 25)

Dirankêşî: Diranê zarokê biçûk gelek car em radikin, tayekî davêjinê û dikşînin. Çimkî diranê wan teze ye, xwe bera nav çengê nedaye. Îca rihmetiyê bavê mi kelbetan davêt diranê mezina jî û diranê wan dikşand. (E.Remo 2016)

Êşa dî laş de: Ez campol li serê derziyekê dipêçim yanî wî campolî wek fitîlekê li serê derziya ‘eba digerînim. Êgir bi wî campolî dixim û didim ser damara bi êş, êş û şewtê kêr dike. (E. Remo 2016)

Nepixîn: Însan ya jî heywanek binepîxe, hinek sabûn tê kefkirin û kefa sabûnê ji tabûtê (ji qûnê) berdidinê. Ew nepixa der dibe. (M. Bûb 2016)

Kurmikên di rêvîyê mirovan de: Çiloyê dara mazî ji bo kurmê di rêvîyê însên de biqelîhîne baş e. (S. Vural 2016)

Di dermankirina nexweşiyên de xala herî girîng teşxîsa rast a nexweşiyên e. Piştî teşxîsê heger hewce be, nexweşî tê dermankirin. Li gor agahiyên me ji herêmê sitendine çî sivik çî jî giran gelek nexweşî, bi rê û rêbazên gelêrî tînin dermankirin. Herçiqas di amadekirina dermanan de nebat di rêza serî de bin jî ji hêkan bigrin heta kilsê, sabûnê û heta dûvê heywanan tiştên cûr bi cûr weke derman tînin bikaranîn. Amûrên di tedawiyê de hewce ne, her daîm li cem wan kesên di dermankirinê derketine pêş de peyde dibe. Xaleke balkêş e donê zeytûnan ku di roja me de ji hêla gelek zanyaran ve ji bo parastina siheta mirovan tê tawsiyekirin, digel zêdebûna wê ya li herêmê, zêde di warê tedawiyê de nayê bikaranîn.

³⁴ Li herêmê di nav gel de gotineke bi vî şiklî heye “Mîza filankeso derman be jî, bi nigê me re de namîze”.

Weke tê dîtin gelê herêmê bi derfetên ku di destê wan de heye, bi zanînên xwe dermanan çêdikin û tetbîq dikin. Piraniya dermanan li gorî şert û mercên erdnîgariya herêmê ji amûr û nebatên di dest te hene hatine çêkirin. Weke mînak nebatên li herêmê zêde tîn dîtin ên weke pelewêz, petîşok, merwend, gezgezk, beybûn û bajang di gelek warên tedawiyê de tîn bikaranîn. Şêweya çêkirina dermanan û tetbîqkirina wan a li herêmê, bi gelek awayan dişibe tîba ku Melayê Erwasê nîşan daye. Ji xwe tiştêkî asayî ye ku civak tesîrê li hev bikin.

4.2. Beytariya Gelêrî

“Baytâr” bêjeyeke Erebi ye, wateya vê bêjeyê “hekîmê sewalan” e (Devellioğlu, 2005: 74) Di Kurdî de weke “Beytar” tê bilêvkirin, Çawa ku mirov bi derman û şêweyên xwe tedawiya hev dikin, ji xeynî wê hinek mirov dermankirin û tedawiya sewalan jî dikin. Ji vê mijûliyê re “Beytariya gelêrî” tê gotin. Ji xeynî tedawiya nerihetiyên, gelek pirsgerêkên wekî din jî hene ku beytarên gelêrî wan çareser dikin. Ji ber ku gelê Kurd hema em bêjin di her serdemê de bi sewalvaniyê re mijûl bûye û beytarên bi zanistên modern perwede bûne li sehayê wan kêma, heta salên dawiyê jî sewalên xwe bi xwe tedawî kirine. “Îlla ji Ekradan barûtpêj û sewrecî û beytar heyîn. Lakîn ew barûtpêj û sewrecî û beytarêd Ekradan qewî zêde di emelêd xwedanî haziq û mahir in... û beytarêd bê mîsl heyîn û qewî mu’teber in. Û di Ekradan da pispor heyîn. Ko hezar berxan tevî hevdû dikin, ew pispor têtin û li wan berxan yeko yeko vediqetînin û davêne ber dayê, yekî naxelitin. Lakîn ew pispor nadîr heyîn” (Bazîdî, 2012: 85-91).

Xaleke din ku beytariya gelêrî hê bi awayekî çalak zindewar e ew e ku sewal ne weke mirovan e ku bi hêsanî li nexweşxaneyan werin gerandin û bi lez werin tedawîkirin. Yanî beytariya gelêrî hebekî ji ber mecbûriyetê jî derdikeve holê.

Li herêmê niha heft kilînikên taybet xizmetê didin. Çend heb jî veterîner hekîmên zîraatê henin. Gelê herêmê ji bo stendina dermanan ji van der û kesan alîkariyê distînin. Lê dîsa jî bi rê û rêbazên xwe tedawiya heywanên xwe dikin û pirsgerêken derdikevin heta ji wan hebe çareser dikin. Him dermanên xwe amade dikin û him wan dermanan di tedawiyên de bikar tînin. Beytarên gelêrî ji xwe û rê û rêbazên xwe yêd tedawîkirinê amin in.

4.2.1. Beytarên Gelêrî ên Herêmê

Li Dêrik û gundên wê sewalên weke mîh, bizin, çêlek, ker, qantir, mirîşk, qaz, elok, werdek, kîvroşk, mêşên hingiv li ber deriyê gelek kesan tên xwedîkirin. Dîsa gelek cure heywanên bejî li bejahiya bajêr dijîn. Lê weke tê zanîn beytariya gelêrî bi taybetî li ser sewalên kedî ye.

Li herêmê çawa ku hekîmên gelêrî ên meşhûr hebûn, beytarên gelêrî yê navdar bûnin henin ku carinan ji deverên wekî din ji bo tedawiyê dişînin pey wan. Li Dêrik û gundên wê beytarên gelêrî yê navdar ku me tespît kirine ev in: Ji Eynteriyê Arif Beg û Cemîl Beg, ji Maşmaşkê Ezîzê Neyto ji Qesra Hisênê Qenco Necê Xelefê Delalê beytarên gelêrî yê bi nav û deng in. Li gorî agahiyên me ji kesên çavkanî dane hev, rê û rêbazên tedawî û dermankirinê bi vî rengî ne:

4.2.2. Rê û rêbazên ji bo parastina siheta sewalan

Hebandina li makê: Berx û karikên mak xwe li wan nake xwedî, em wan li hev dibahînin. Li ser meselê em xwê li ser piştta berxikê dîkin ji bo maka wê, wê bialêse û di pe rê bihêle guhanê wê bigire. (R. Çakıl 2016)

Hinek hirîya mîhê jêdîkin. Dû re kemêlê wê di wê hiriyê didin û xwê jî bi ser werdîkin. Wê hiriyê di piştta berxikê didin. Di pêre bi zorê devê mîhê didin ser piştta berxikê. Yanî wexta wê xwêyê bialêse, vê re ew ê berxê jî bialêse û wê li hev bihanin. Ewil çend cara nih nihîya dike, le di pê re dihêle berx guhanê wê bigire. (E. Remo 2016)

Mîha xwe li erdê vedixînim û devê berx, kahr her çi be dixim guhanê wê. Ji hêla di jî pozê makê didim ser piştta berxikê/kahrikê li hev dibahînin. (M. Sönmez 2015)

Miayeneya mirîşkan: Ji bo mere zanibe bê ka mirîşka mere bi hêk e ya ne bi hêk e, mere wê bi destê xwe dipelîne. Mere werê fêm dike bê bi hêk e ya na. (Ş. Zerga 2016)

Parastina ji seqemê: Ji bo berx zivtanî seqemê nestînin, pozê wan bi hesinekî sincirî dax dîkin. (D. Özer 2016)

Daxkirina bi hesin şêweyeke kevn ya tedawiya sewalan e: “Yek ji dermankirina birînên heywanana ya meşhûr kewandin e.” (Orbelli, 2011: 95)

Birrîna pez: Li bêlga me pez di bîstê nîsanê de tê birrîn. Berî wê em nabirrin. Çimkî sar e. (R. Çakıl 2016)

Peza tê birrîn şîrê wê çendakî kêmbibe. Hema xwîn jî lêdikeve, qelew dibe, rihet dibe. (D. Özer 2016)

Şîrvekirin: Ji bo berx ya jî karik maka xwe bes bimijin, yanî em bivêjin şîrve bin, em ya bizmikê li devê wan dixin û ya jî çendakî wan tev keriyê cîranê xwe dikin. (D. Özer 2016)

Ji bo nezerê: Ji bo beran çavînokî nebin zingilekî bi hustê berana vedikin. Yanî bi wî hawî hinek li berên binerîn, bala wanê here ser zingil wê berên jibîr bikin. (H. Evdirihman 2016)

Cangeyên kedî û gadana çêlekên: Cange wextê gadanê çend desta li çêleka dixê dadiwerive, kîloyê wî kêmbibe. Ji bo wî hawî ji xêndî çêlekê xwe yê malê, em nahêlin kes bi cangê me çêlekên xwe rakşînin. (M. A. Ece 2016)

4.2.3. Tedawiyên Nexweşî û Birînan:

Birînen vekirî: Terşên bi qelişandinê birîn di derek wan de vebe, em mîza hinek heywanê din li birînen dikin û hinek hirîya wan datînin ser birînen û dipêçin. Hêdî hêdî wê birînen dikewîne. (M. Selçuk 2016)

Pezê me yê birînen wan hebin em yaxa mekîna di wan didin, yax birînen nerm dike. (Q. Güler 2016)

Dawa mîh û beranan: Beran ya jî mîha dawa wan biweşe, gerek bi sabûn û ava germ were şuştin, kurm nakeve birînen. (D. Özer 2106)

Beranê kulaba wî yanî dawa wî dirêj dibe îja wî nerihet dike. Ez dawa wî ji movikek berjor ve girê didim, kêra di êgir de sorkirî ji movikek di binî re jêdikim. Ew kêr wê dawa wê dikewîne. Xwîn jî zêde jê nayê. (R. Çakıl 2016)

Heywana ku pizan lê biawiqe: Ji bo heywana pizanê xwe neavêtibe em avê germ dikin, kulmek du kulm arvan davêjin wê avê û lihev dixin. Di pê re destek xwê davijin wê pelûlê, ew dixwe û pizanê xwe davêje. (N. Ertekin 2015)

Cebirandin: Dera şikestî tê rastkirin û herdu hêlê ciyê şikestî her kê textekî didin vî alî û wî alîyê din. Em hêkê xav jî di ser wan texta didin. Ferq nake bê hêka çi be. Bi qinabekî girê didin. Di pê re bi paçekî ser wan texta dipêçin. Deh roya wer dimîne. Piştî deh roya em wî paçikî û qinabî sist dikin. Heta mere qineet tîne cebirîbe îca em vedikin û wan textika davêjin. (R. Tur 2016)

Şikestin heger ji navê û berjor di pîla de be hebkî zor dicebire. Heger di çongê wan de be neh deh hêkê xav dişkînin, li ser campolekî didin. Li ciyê şikestî dîgerînin, baş dipêçin û çar textîka didin dorê. Baş dibe. (Q. Güler 2016)

Zayin: Heywanê li ber zanê bi û îjar nezê, li ser meselê em bivêjin mîhek, em destê xwe radidin hundir wê. Ciyê berxika wê rast dikin, heta bi silametî ew heywan bizê. (M. C. Tüfek 2016)

Şewba mirîşkan: Wê salê hinek mirîşkê mi bi êşê ketin. Mi sêniya mêt da ber mirîşka, nikilê xwe xistinê û xwarin. Welle pê baş bûn. Me çend carê di jî ceriband, me fêde jê dît. (E. Remo 2016)

Virika pez: Pez bi virikê bikeve, em jê re dibêjin virikreş, bikeve nav kerî qirra wan tîne. Çare lê nabe. Le va sala dermanê hikûmetê derketine, ew baş in. Ya na tu çare ji virika pez re tunebû. Berê heywanê me giş mirar dibûn. (Î. Çeviren 2016)

Zerika Sewalan: Terşê bi zerikê bikevin xwe bellî dikin. Tu rihetiya zerikê tune ye. Goştê wan jî nayê xwarin. Zerik aniha bi dermanê zîreetê hebekî baş dibe. (N. Tur 2016)

Tebek: Heywanê me yê bi tebekê dikevin, dikulin. Simê wan kul dibe, ji wan diweşin. Her roj bi ava germ em nigê wan dişon û ji du roja rojekê em dermanê sipiya li simê wan dikin. Gerek dernekevin ber tavê. (M. Mehmûd 2016)

Li cem me hinek boyaxa qondera di simê pez didin; ji bo tebekê baş e, işk dike. (Y. Ş. Eyšê 2015)

Peza nepixî: Pezên me carina bi ceh dinepixin ya jî li pirêza zêde diçêrin û dinepixin. Wê çaxê em xwînê ji guhê wan digrin. Şivan gerek kêra wî vêre be. Kêr tune be bi du kevira jî tu kari xwînê ji guhê wan bigre. (Ş. Temel 2016)

Pezê dinepixe di tabûta wan re hinek kefa sabûnê berdidinê, nepixê der dike. Weke fitîlê ye. Ez bixwe wer dikim. (M. Bûb 2016)

4.3. Salnameya Gelêrî

Berî komar ava bibe di serdema Osmaniyan de salnameya rûmî û hîcrî bi hev re dihatin bikaranîn. Piştî komara Tirkîyê avabû û di pê re bi hin îngîlaban pergala salnameyê jî hat guherandin. “Li gorî zagona ku di 1925 an de hatiye qebûl kirin ya bi navê *Guherîna dîrok û sersala salnameyê* li Tirkîyê weke salnameya fermî *salnameya mîladî* ya li gorî esasê Gregoryen, hat pejirandin” (Öztürk, 2005:214). Heta îro jî ev pergal didome.

Di nava Kurdan de rewş hebekî cuda ye. Çimkî gelê Kurd dev ji bikaranîna salnameya rûmî bernedaye. Bi taybetî jî ji kesên di nav pergala çanda gel de mezin bûne, ji xeynî karûbarên fermî, gelemperî bi salnameya rûmî emel dikin. Kesên temenê wan di ser çil salî re ne, gelek caran meh û demsalan li gorî vê salnamê dişopînin û diyar dikin. Lewra pergala salnameyê ku ji bav û kalan hîn bûnin zû bi zû naterikînin.

Ekserêd hesabêd ekradan bi hisaba şemsiye ye. Qewî hîsaba qemerî naemilînin. Meger îlla ko ji boy remezan û ‘îd û mewlûdan, wekû dinê hesabêd wan Romiye ye (Bazîdî, 2012: 98).

Herçiqas bi fermî neyê bikaranîn jî, ji ber ku di nav gel de heyamên rojbûnê û rewşên din li gora wê diyar dibe di salnameyan de cih didin salnameya rûmî jî. Di salnama rûmî de sersal meha adarê ye û sibat jî meha dawî ye. Di diroka vê salnamê de ji bo ku bi salnameyên din re hemwext bibe hin caran guherîn pêk hatine.³⁵

Li Dêrikê salnama rûmî, weke “hesabê kurmancî” tê binavkirin. Navên hinek mehan jî hîna bi navê wan ên salnameya rûmî tên bikaranîn. Salnameya rûmî li gor salên rojê tê hesibandin. Di nav hesabê gel ê bi salnameya rûmî û salnameya fermî ya mîladî de 13 roj ferq derdikeve holê. Gelê herêmê sêzdeh rojan ji paşê salnameya mîladî dişopînin. Em dikarin vê rewşê bi mînaekeke wiha nîşan bidin:

“Mîladî 21ê Adara 2017an, beramberî Rûmî 8ê Adara 1433 yan tê.”³⁶

4.3.1. Binavkirina Roj, Meh û Demsalan

a. Gelê herêmê rojên hefteyê wiha binav dikin:

Bazar

Duşem

Sêşem

Çarşem

Pêrşem

Înî

Sebt

b. Binavkirina mehan: Binavkirina mehan li gor salnameya rûmî ku meha yekem Adar e û ya dawî jî Sibat e li herêmê wiha ye:

Adar

Nîsan

³⁵ www.takvîm.com/dema_gihîştinê 01.08.2016

³⁶ Salnameya Nûbiharê ya 2017an

Gulan
Meha çinînê, hezîran
Temûz
Tebax
Serê payizê
Meha cot, Cotmeh
Qasim
Kanûn
Çele
Sibat

c. Binavkirina demsalan:

Buhar
Havîn
Payiz
Zivtan

4.3.2. Heyamên Nav Salê de

Digel sehayên din ên Kurdan gelê herêmê jî di hundirê salê de bi gelek rê û rêbazan wextên diyar tayin kirine. Di çandiniyên xwe de, di karû barên sewalvaniyê û di rewşên demsalî de li gorî van wextan tevdigerin. Li herêmê sê serdem hene ku bi serma û seqemê gelekî dijwar derbas dibin weke “gît” hatine binavkirin. Ji van a ewil “Eynter” di çelê zivistanê de, “Gîskê Pîrê” di dawiya zivistanê û serê biharê de, “Camûsqîran” jî di nav biharê de derbas dibin. Heyamên din ên di hundirê salê de wekî din hatine binavkirin. *Xidirîlyas*, *Kanûnkiş*, *Qurix*, *Behûrat* û *Korko* demên din ên bi nîşan in. Agahî û baweriyên di derbarê van demên diyar de li herêma Dêrikê bi dor wiha ne:

Eynter: Gît, di ferhengan de weke rewşên nexweş û giran, halên awarte û bi zehmet tê biwatekirin. Gîta ewil a di sala nû de Eynter e. Wextê vê gîtê çelê zivistanê ye. Roja dawiyê ya çelê zivistanê roja Eynter e. Bûyera di van rojan de qewimîye

navê xwe dayê vê serdemê. Bûyer kengî û li kuderê qewimîye nayê zanîn. Dema em li gundê Dêrikê digeriyan em ji gundekî bi navê “Eynteriyê” hayidar bûn. Mixabin tu kesî agahiya hebûna têkiliyeke di navbêra “Eynter” û gundê “Eynteriyê” piştrast nekir. Eynter û agahiyên di derbarê vê heyamê di nava gelê herêmê de berbelav e. Di vegotinan de gûhertoyên piçûk hebin jî agahiyên di derbarê vê mijarê de gelekî nêzî hev in.

Dibêjin zilamekî bi navê Eynter hebû. Ji bo hesabê xwe yê çele zanibe, çel mewîjê wî hebûn û her ruyê yek dixwar. Qey rokê du heba bi hev re dixwe û hesabê xwe şaş dike; derdikeve rê. Lê dibe berf û pûk. Heft cara dibe ewr û heft cara dibe sayî. Deva xwe şerjê dike û xwe dixwe hûndir eyarê devê. Xwe bi wî hawî xelas dike, vedigere malê. Îja du jinê wî henin. Yek dozmama wî ye, ya din jî xerîb e. Ji wan dipirse, dibêje “Gelo wexta ez ne li malê bûm hewa ewr bû, ya sayî bû ?” Jinika xerîb pê dernaxe, dozmama wî dibêje: Heft cara bû ewr û heft cara jî bû sayî. Fêma dike bê jinika xerîb guh nedayiyê û raketiye. Dozmama wî jî baldarî wî bûye û wê şevê raneketiye. Jê û pê ve qedrê dozmama xwe bêtir digre. (M. Seydo 2016)

Me ji çend kesên din jî ev çîrok guhdar kir. Nîvisandina vê guhartoyê me minasibtir dît. Di guhartoyan de di binavkirinê de cudahî hene. Çavkaniyên me sê varyantên navê lehengê çîrokê bilêvkirin:

“Eynter” (M. Seydo 2016/ guhartoya herêma Metînan)

“Eynterê Bilîzîvî” (N. Tur 2016/ guhertoyê Qizilê)

“Eynter Binî Izbîb” (M. Vural 2016/ guhertoya navenda Dêrikê)

Herwiha di hinek guhartoyên li herêmê de beşa “Serjêkirina deveyê” jî tune ye. (Z.M. Qado 2015/Guhertoya Maşmaşkê) Digel navên ji hev cihê yên li jor, me weke sernav hew “Eynter” minasib dît. Çimkî ev nav li herêmê bêhtir derdikeve pêş.

Di vê çîrokê de ji xeynî heyama demsalê xala balkêş di naveroka çîrokê de ye ku hezkirina dotmamê ya li hember pismam nîşan dide. Herwiha teşwîqew zewaca dotmam û pismaman jî di vir de heye. Weke tê zanîn di kevneşopiya Kurdan de

zewaca van herdu kesan gelek caran bi cih hatiye. Hê jî li herêmê zewacên bi vî rengî çêdibin.

Kanûnkiş: Kanûnkiş heyameke di zivistanê de ye. Çawa di havînê de bi hilatina “Xurixê” germa dişkê û dinya hênik dibe, herwiha di zivistanê de jî bi kanûnkişê re êdî serma kêmbê; av û hewa hebekî ber bi germbûnê ve diçe.

Li gorî hasabê me kurmancî deh rojê beriya sibatê kanûnkiş e. (X. Xatûnê 2016)

Em dibêjin “kanûnkiş” yanî avroj hebekî germ dibe. (Z.M. Qado 2015)

Di va roja de serma û seqem hebekî dişkê. Însan xwe ji ber êgir dide alî. Lewma dibêjin: “Kanûnkiş.” Yanî xwe ji ber kanûnê kiş dikin, yanî vedikişin. (M. Seydo 2016)

Gîskê Pîrê: Dema vê gîtê roj û danek ji dawiya zivistanê ye. Dikeve dawiya çelê xav. Çelê ewil jî weke çelê işk tê binavkirin. Li gorî ku ji agahiyan tê fêmkirin di dawiya çelê ewil de “Eynter” û di dawiya çelê duyem de jî ev gît diqewime. Mijara vê gîtê wiha ye:

Pîrek heye xwedî çend heb gîsk e. Di dawiya zivistanê de dinya hebekî germ dibe. Ew jî dibêje qey zivistan xelas bûye. Hewa xweş wê dixapîne û mûyê gîskê xwe -li gorî hasabê wê serê adarê ye- dibire. Pîrê gîskê xwe dibirre û pêv meha sibatê li Pîrê tê xezebê. Sibatê ji adarê re gotiye:

“ Xweha min a adarê
Tu bid mi roj û danekî xedarî
Ez ê gîskê Pîrê ji latê bînim xwarê”

Îca biharê, ji meha adarê roj û dahnek daye zivistanê. Roj û dahnekî di jî sar dibe, tofan li Pîrê û gîskê wê radibe. Gîskê wê tevde dimrin. (Z. M. Qado 2015)

Herdu gît (Eynter û Gîskê Pîrê) bingehên xwe ji du bûyerên ku tê bawerkirin qewimîne distînin. Ji vê hêlê gît û heyamên din ên demsalê ji hevûdu vediqetin.

Herwiha ev herdu bûyer ji ber ku xwedî çîrok in li herêmê ji hêla gelek kesan ve tên zanîn. Şênîyên herêmê pîranî ji wan hayîdar in.

Camûsqiran: Navê vê gîtê bihev ketiye. Ji bêjeyên “Camûs/gamêş” û “qiranê” pêk tê. Weke çavkaniyên me jî gotine camûsqiran yanî “gamêş-qiran e”. Ji ber serma û seqema gelekî dijwar qirra gameşan tê. Dema vê gîtê serê meha duduyan a biharê ye.

Camûsqiran 7ê nîsanê ye. Yanî heftê nîsanê dest pê dike. Seqem û pûk e. (D. Özer 2016)

Camûsqiran jî wek gîskê pîrê ye. Sê çar roja dewam dike. Gerek mere berî camûsqiranê pezê xwe nebirre. Ya na seqemê li wan bixe. (R. Çakıl 2016)

Camûsqiran yanî gamêş qiran e. Qira gamêşa tîne. Wan roya gelekî sar e. Pûk tê. Li gorî hesabê me kurmancî dikeve 6 ê Nîsanê. (Ş. Temel 2016)

Camûsqiran ne rojek tenê ye 3 ruya dewam dike. (M. C. Tûfek 2016)

Camûsqiran roj û dahnekî ye. Serma û baran e. 7ê Nîsanê ye. (Y. Dengiz 2015)

Agahiyên kesên çavkanî dane me yê li ser dema camûsqiranê, kêm zêde em karin bivêjin wekhev in. Lê camûsqiran çend rojan dom dike? Di wê mijarê de kesên çavkanî bersivên ji hev cihê dane.

Tablo 1: Heyamên Nav Salê û Demên Wan

Heyamên salê	Dema Heyamê
Eynter	Roja dawî ya çelê zivistanê
Kanûnkiş	Deh roj berî sibatê ye
Gîsko	Roj û danek ji sibatê - roj û danek ji adarê
Camûsqiran	7 ê Nîsanê
Qurix	1-30 Tebax
Behûrat	1-7 Tebax
Korko	Ketina barana ewil a payizê

Qurix: Qurix bi eslê xwe navê stêrkekê ye. Ev stêrk di serê meha sisiyan a havînê de li esmanan xuya dibe. Qurix hil tê û pê ve êdî tê hêvîkirin ku germa havînê bişkê û hewa hênîk bibe. Navê vê stêrkê ji ber girîngiya wê, ji serdemeke salê re bûye navekî taybet. Herçiqas Qurix bi navê xwe derketibe pêş, beriya wê jî heye. Di meha ewil a havînê de komstêrkên bi navê “komik” di serê meha duduyan de çend heb stêrkên bi navê “mêzîn” û di serê meha dawî de îja “Qurix” hil tê. Gelê herêmê bi vî awayî sê mehên havînê ji hev veqetandine û wextên xwe tayin kirine. Agahiyên di derbarê vê mijarê de wiha ne:

Roja tu bivêje îro havîn e stêrk li ezmana kom dibin. Em ji wan re dibêjin “Komik”. Komik mehekê li wir dimîne. Komik: “Deh yazde stêrkên di ber hevde ne.” (S. Sulhan 2016)

Ewil komik hil tê. Komik heft stêrk in. Li dû wan Mêzîn û dawiyê jî Qurix hil tê. Qurix du stêrkên dibiriqînin. (Y. Dengiz 2015)

Meha havînê a duduya de koma sterka hil tê. Ji ber şiklê wê komstêrka weke mêzînê ye em dibêjin “Mêzîn.” Stêrkek mezin li ortê ye û çendên din jî li derdorê ne. (Z. M. Qado 2015)

Mêzîn û komik hîna wenda nebûne “Qurix” hil tê. Stêrkek bi tena serê xwe ye. Di 7-8ê meha havînê ya dawiyê de hil tê. Qurix stêrkeke bi şewq e û li rojhilat hil tê. Wa dileqe û şewqa wê diçûrisîne. Li pê hilatina Qurixê dinya hênîk dibe, payiz tê. Her sê jî: Yanî Komik, Mêzîn û Qurix bi hev re di carekê de, di şevê de jî dahrin, wenda dibin. (M. Seydo 2016)

Qurix, dawiya havînê ye û serê payizê ye. Qurix pişt keve û wê de, îca dinya hênîk dibe. (M. A. Ece 2015)

Di mijara hejmara stêrkên Komik û Mêzînê de çavkaniyên me tiştên ji hev cuda gotin. Me gotinên hemûyan di vir de tesnîf kirin. Di vî warî de bi taybetî ji çavkaniyên me Mele Seydo ji Dêra Metînan û Sultan Sulhan ê ji Heramiyê stêrnasên xwedî agahiyên girîng bûn. Ji şiklê stêrkan bigirin, heta li kuderê hil tîn û li kuderê dahrin ava, bi hilatin û avabûna wan re çî guherîn diqewimin û di gelek bûyerên asîmanî de xwedî agahiyên girîng bûn.

Behûrat (Behûre): Behûrat an jî bi gotineke din “*behûre*” hesabekî balkêş ê astrolojîk e. Çimkî li gorî baweriyê di behûratê de miqaderata tevahiya rewşa hewayê ya sala pêşiyê tê famkirin. Dema wê havîn e. Di rojên Behûratê de gelê herêmê bi şev li asîmanan dinerin û li gorî ewr û sayîbûna hewayê hesabê sala pêşiya xwe derdixînin. Agahiyên di derbarê vê mijarê de wiha ne:

Behûrat meha heyşta, roja ewil dest pê dike. Heft roja dewam dike. Ew her heft roj, her mehek li pêşiya xwe temsîl dike. Heger şeva ewil bi qasî hustê deveyekê ewr li ezmanan wer dîtin, tê wê ma'neyê ku wê meha pêşiyê şilî be. (D. Özer 2016)

Di Behûratê de wexm çêdibe, carina jî baran dibare. Tu di wan heft roja kîjanê de li ‘ezmên ewr bibîne, meha ew roj miqabilê wê tê bi xêr û bereket derbas bibe. (M. Selçuk 2016)

Behûre di meha havînê ya dawiyê de ye. Wextê wê heft roj in. Li gorî hesabê me ew ro ev in: Du mehê payizê, sisiyê zivtanê û du mehê biharê ne. Heger di rojê Behûrê de hewa germ be, wê ew mehê pêşî jî germ bin. Na, heger rojê behûrê hênîk derbas bivin, mehê pêşî jî wê hênîk bin. Yanî dendika heft meha di heft roja de veşartî ye. (S. Sönmez 2016)

Di bingeha vî hesabî de rastî heye an na? Mixabin em nikarin bersiva vê pirsê bidin. Lêbelê gelê herêmê bi zanîn û nêrînên xwe ev hesab kemilandine û niha tetbîq dikin. Hinek çavkaniyên me bi vî hesabî gelekî bawer in:

Ê mi bixwe ez gelek car behûrê diceribînim. ‘Eyn rast derdikeve. Li ser meselê di behûrê de roa ez ewr dibînim, di meha miqabilê wê de şilî çêdibe. (Z. M. Qado 2015)

Korko: Korko serdemeke meha payizê ye. Di pê Qurixê re bi çendakî ye. Gelê herêmê îro korko bêhtir ji bo wextê çandiniyên xwe diyar bikin bikar tînin. Çimkî divê zad beriya korko neyên çandin.

Barana di korko de dibare hinek jê re dibêjin “Payizxêrk”. Heta payizxêrkek nekeve gelê herêmê dest bi çandiniyan nakin. Agahiyên derbarê korko ev in:

Zadên berî korko hatine çandin, di korko de baran li wan dixê. Hebekî şîn dibin û di pê re hişk dibin. (D. Özer 2016)

Korko di payizê de ye. Di korko de baran dibare. Heger zad berî wê barana korko hatibin çandin, ew di erdê de dirizin. Ewil gerek payizxêrkek bikeve, di pê re çandinî dest pê dike. (S. Sulhan 2016)

Korko ew jî di payizê de ye. Em çandiniyên xwe her tim dihêlin pê korko. (R. Çakıl 2016)

Heger ceh, nîsk û genim berê payizxêrkê werin çandin dirizin, xera dibin. Gerek li pê wê werin çandin. (M. Seydo 2016)

Zadê korko pişt ket û pê ve were çandin, bi meha jî bê av û baran di erdê de bimîne tişt pê nayê. (E. Remo 2016)

Tê dîtin ku ev heyam ji bo çandiniyan serdemeke gelekî girîng e. Ji ber vê jî gelê herême xwe didin bende vê serdemê û li gora wê erdên xwe dajon û diçînin.

Xidirîlyas (Xidirnebî): Ev nav, ji bihevketina navên Xidir/Xizir û Îlyas pêxember pêk hatiye. Bi navê xwe yê bêhtir tê zanîn jî Xidirnebî di çanda Kurdên Êzîdî, Azerî, Tirk û milêtên din de jî xwedî cihekî taybet e. Kurdên Êzîdî vê rojê weke cejnêkê pîroz dikin.

*Di vê cejna ku bi navê du îlahan ên bi navê Xidir Nebî û Xidir Elyas tê bibîranîn, Êzîdî tên ba hev û bi komî vê cejnê pîroz dikin. Di vê cejna ku di înfîya sêyemîn ya heftêya sibatê de tê pîrozkirin de, gelemperî kincên paqij û sipî li xwe tê kirin.*³⁷

Elbet Kurdên Misilman jî qedr û qîmetê didin vê rojê. Di serê biharê de hinek çalakî ji bo vê rojê çêdibin. Li Dêrik û derdora wê ev serdem ji du hêlan ve balê dikşîne ser xwe:

Ya ewil: Bi dawîbûna zivistanê û bi hatina biharê re xêr û bereket dadikeve erdê.

³⁷ www.politikars.com-news_detail Lênerîna dawî: 20 Îlon 2016.

Ya duyem: “Keç û lawên ketine wextê zewacê di şevên Xidirîlyasê de qismetên xwe di xewnê de dibînin.” Agahiyên berfirehtir ên di vî warî de wiha ne:

Xidirilyas wa'dê zivistan û bihar ji hev vediqetin, bi gotinek dinê ji hevdu xelas dibin. Her sê koz³⁸ bi dor dikevin erdê, bayê û avê. Tu gît namînin, dinya germ dibe. (S. Sulhan 2016)

Em dibêjin “Xidirilyas qereqotik xelas.” Yanî mere hew tişt miştika dişewitîne û xwe li ber germ dike. (A. Deniz 2015)

Di pê sermê re heywan tên qusandin. Ê gayê xwe, ê pezê xwe û pîrça hespê xwe diqusînin jî henin. Di Xidirilyasê de porê geda jî meqes dikin. Teriya terşê xwe bi hevlingê nîşan dikin. (M. Seydo 2016)

Di Xidirîlyasê de berê xwarinek çêdikirin. Diçûn ziyaretekê û li wir him dixwarin û him jî didan xwarin. Li Qizilê jî gundî diçûn ziyareta Şêx Evdilqadir nanê xwe li wir çêdikirin. Xidirilyas xêr û bêrê bi xwe re tîne. (M. Ê. Hemê 2016)

Çele xilas dibe, îja Xidirilyas e. Em berxê xwe bera zada didin, yanî em li zada diçêrînin. Hinek porê zarê xwe jê dikin. (C. Çeviren 2016)

Di Xidirîlyasê de dibêjin mere qismetê xwe nas dike. Yanî ew çawa ye? Ez ji te re bivêjim: *Hevîrekî şor şor distrên, dikin nan. Xortê azib wê şevê wî hevîrî dixwin. Gerek mere avê venexwe. Îca bişev hinek wê were xewna mere û wê avê bide mere. Kîjan keçik were xewnê, ew qismetê xwediyê xewnê ye. Berî ez bizewicim ciya mi ji mi re çêkir, mi jî xwar.* (M. A. Ece 2015)

Em dibêjin Xidirilyasê kela Mêrdînê. Em di rona de porê geda, hiriya berxikê xwe jê dikin. Berê me pîrça kehêlê xwe jî jê dikir. Hinka teriya wan meqes dikirin. (Q. Güler 2016)

Xidirilyas bêhtir di nav gundiyan de tê zanîn. Bi taybetî jî hêla wê ya despêka biharê ji bo kesên bi sewalvanîyê re mijûl dibin girîng e. Ji milê din ve rîtuela ku ji bo diyarbûna qismetê keç û xortan tê lidarxistin ji ciwanan re çalakiyeke bihêvî ye.

³⁸ Cemre, sotik

4.3.3. Stêrknasiya Gelêrî

Heta aniha jî girseyeke gelê Kurd bi çandinî û sewalvaniyê debara xwe dikin. Herwiha ji mêj ve koçerî jî perçeyekî jiyana vî miletî bû. Ji ber vê yekê bi siruştê re hevaltiyek û unsîyetek Kurdan a dewamî çêbûye. Şivanên ku şevder li ber pez manin şevînê, cotyarên ku xwe dane bende baranê, koçerên ku xwestine riyên xwe nas bikin û wextên xwe bizanibin di warê asîmanî û stêrnasiyê de agahiyên bêhempa bidest xistine.

“Ekserêd Ekradan isterkan nas dikin û bi şevan îqtiza bikitin, ew li istêrkan difikirin û riyan û etrafan dizaninin bidertînin. Ji seyra wan istêrkan, meselên bûyina berf û baranê fêhm dikin” (Bazîdî, 2012: 134). Roj, heyv û stêr xwedanê girîngiyeke taybet in di mîtolojiya Kurdan de. Di vê kontekstê de em dibînin ku Kurd gelekî zû bi feleknasiyê û herwiha matematîk û zanistên siruştî daketine. Çend rasatxaneyên heyv û stêran hebûn li Kurdistanê. Ya herî naskirî li ser çiyayê Gilezerdeyê bû li dorûberên Silêmaniyê (Nebez, 2007: 20-21).

Bi rastî sehayek fireh a ku Kurd lê dijîn weke rasatxaneyek berfireh û bêsînor e. Li bajarên weke Mêrdîn, Amed, Êlih û Riha havînan gelê li ser xaniyan radikevin, her şeva wan bi stêrkan re mijûlî ye. Li Dêrik û derdora wê, ji ber germa ku ji gulanê dest pê dike û heta dawiya îlonê dom dike, şênîyên bajêr ya li ser xaniyan yan jî li hewşên xwe radikevin. Welhasil bi asîmên re nêzîkatiyekê bidest dixin. Lê ji agahiyên ku di warê stêrnasiyê de em hîn bûne tê famkirin ku stêrnasiya Kurdan ji demên kevn destpê kiriye û di bingeha wan de bîr û baweriyên demên borî hene. Agahiyên di warê asîman û stêrnasiyê de yên me ji çavkaniyên xwe stendine wiha ne:

Stêrka Cedî: Her tim Bakur rê me dide. Bi saya wê mere riya xwe wenda nake. (Y. Ş. Eyşê 2015)

Termê Adem: Heft stêrk in. Her tim û daîm dizîvirin. Li ciyekî ne misteqîm in. (C. Meşkînî 2015)

Termê Adem li Bakûr e. Heft stêrk in. Çar heb li hev in. Sisê jî li qoziyê ne. (S. Sulhan 2016)

Stêrka Sibê: Ev histêrk hew sibeya derdikeve. Şewqa wê hûr e. Wexta azana melê sibê û derketina vê histêrkê hema bivêje bi hev re ye. Wê çaxê limêja sibê jî tê kirin. (Y. Dengiz 2015)

Stêrka Şivanan: Dinya hebekî ronî dibe û pê ve hema li pê stêrka sibê hil tê. Şewqa wê gelek e. (Ş. Zerga 2015)

Wexta ew hilê, êdî wextê pezcêrandinê ye. Zer e wa gemarokî ye. Li destê rohilat hil tê. (S. Sulhan 2016)

Riya Kadizan: Riya kadizan xêzeke Quble û çiya ye.³⁹ (M. Sönmez 2015)

Li ezmanan çixêzeke hebekî bi xûman e. Xwedêgiravî ew xûman ka ye. Dibêjin yekê ka diziye. Kaya xwe dixê şalekê û wexta vedigere kaya wê li pê wê rijiyaye. (S. Vural 2016)

Girtina Heyvê: Wextê heyv dihat girtin, Melakî me hebû, bi darekî li teneka dixist. Bi vî hawî digo heyv ê vebe. (Î. Çeviren 2015)

Li herêmê hinek mijarên mecazî di nav gel de weke rastiyekê hatine qebûl kirin û wiha bi cih bûne. Weke mînak: “Girtina heyvê û Riya kadizan.” Meseleyên asîmanî û yên wekî din ên mecaz ji demên berê de di nav Kurdan de rast hatine fam kirin:

“Di zarotiya min de carekê heyv hatibû girtin. Min ji diya xwe pirsî. Wê ji min re got:

- Mar ew daqurtandiye. Min pirsî: “Çima hê jî (heyv) xuya dike? “ Wê got:

-Marên asîmanan zelal in. (Nursî, 2004 b: 25)

4.3.4. Awayê Diyarkirina Rojbûnên Mirovan

Şêniyên Dêrikê û derdora wê ji bo ku sal, meh an jî rojbûna zarokên xwe di hişê xwe de bigirin gelek rê û rêbazên cuda şopandine. Herçiqaq gelê herêmê di hundirê salê de gelek wextên binîşan diyar kiribin û ew dem binav kiribin jî me nedît

³⁹ Yanî bakûr û başûr e.

ku tu kesî rojbûna zarokên xwe bi wan demên diyarkirî bibîr anîne. Jixwe li herêmê kesên di ser sî salî re hinek ji wan, dev ji meh û rojê berdîn, sala ku tê de hatine dinyê jî carinan baş nizanin. Lewma di nasnameyên gelê herêmê de meh û rojbûna gelek kesan “01.01.” hatine qeydkirin. Lewra yê rojbûna zarokên xwe di hiş de girtine û ew di wext de qeyd kirine gelek kêmiyên.

Gelê herêmê piranî rojbûna zarokên xwe li gorî demsalan, merhale û meseleyên girîng ên weke kuştin, girtin, çînîn û çandiniyan bibîr tînin. Çavkaniyên me yê li sehaya xebatê li hemberî pirsê “Kengî Xwedê zarok dane we?” bersivên wiha dane me:

Cahîde li destê ciya xwe bû Xwedê dergûşa mi da mi. (N. Tur 2016)

Apê mi hat kuştin lawikê mi li destê mi bû. (A. Deniz 2015)

Di meha ewil a zivtanî de ew çêbûye. (X. Xatûn 2016)

Di meha rojiyê de bû. (S. Yücel 2016)

Ê hema çelê lawkê mi û ketiye tev de. Ka îja ew kengî çêbûbe, ew û ê mi hevalê hev in. (R. Vural 2016)

Em li ser mahsera bûn, Xwedê ew da mi. (S. Yücel 2016)

Em li ser medrebê bûn. (N. Ertekin 2015)

Ez li eskeriyê bûm ev keçik çêbûye. (M. Mehmûd 2016)

Hema bîçer nuh ketibû nav genim. (V. Tüfek 2016)

Hijîr stewyabûn. (M. Vural 2016)

Me xerzikê xwe mer fikir ew çê bibû. (S. Yücel 2016)

Meha buharî a dawiyê ne, di a duda de bû. (E. Remo 2016)

Sala ceryan hat gund. (H. Evdirihman 2016)

Sala dewrimê. (Z. M. Qado 2015)

Sala em li Bûrsayê bûn. (A. Deniz 2015)

Sala gundê me hat valakirin. (H. Evdirihman 2016)

Sala hatin riya gund çêkirin. (Z. M. Qado 2015)

Sala qumil. (Q. Güler 2016)

Sala xelayê. (Q. Güler 2016)

Wextê zilamê mi hat kuştin, keçka mi di zikê mi de bû. (V. Tüfek 2016)

Wextê paleyê bû. (Q. Güler 2016)

Wextê qirimçî çûn ser nîska. (Z. M. Qado 2015)

Bi gelemperî jinan, rojbûna zarokên xwe bi rê û rêbazên li gorî xwe di hiş de girtine. Ji ber ku roja bûyinê teqez nizanin, heta ji wan hebe bi bîranîna hin bûyerên din ên xwedî bandor xwe nêzîktirî dema rojbûnê dikan. Piştî salên nodî ku pêla koçê ya gundiyên Kurd ber bi bajaran ve çêbû êdî zarokên hatine dinyê gelek car di wextê xwe de hatine qeydkirin. Dîsa ji ber mijarên weke pîrozkirina rojbûnê û zarûriyeta qeydên dibistanan, dê û bavan hewl dane ku di nasnameyan de rojbûnên zarokên xwe biwext deynin. Herwiha gelek zayinên salên dawî ji ber ku li nexweşxaneyan çêdibin, hînbûna dîroka rojbûnan hêsantir dike.

5. AWAYÊN XEMLÊ Û CILÛBERG

Di sehayê xebatê de em bêhtir li ser xeml û cilûbergên herêmî sekinîn. Çimkî di wan cureyan de folklorê herêmî ya resen bêhtir xwe nîşanî me dide. Em ê niha di bin du sernavên cihê de awayên xemlê û cilûbergan bidin ber çavan.

5.1. Awayê Xemlên Gelêrî

Di dîroka mirovahiyê de însanan çî mêr çî jin ji bo hîna xweştir û baştir xwe nîşanî derve bidin gelek awayên xemlê ceribandinin. Ji xeynî hêviya xweşikbûnê dibe ku carinan hinek xeml ji ber rewşên wekî din jî derketibin holê. Li herêma Dêrikê xemlên bi herdu awayan jî hene. Me li sehayê sê xemlên sereke esas girtin û me di derbarê wan de agahî berhev kirin. Elbet ji xeynî wan, şêwe û awayên xemilandinê yên esrî jî li herêmê tên tetbîqkirin. Lê ev her sê awayên xemlê di çanda herêmê de kevintirîn şêweyên xemlê ne. Herwiha di çanda herêmê de bi cî bûne. Kê m zêde hîna di nav gel de ev xeml didomin. Bi navên herêmî ew xeml ev in:

-Deqandin

-Diranzêrkirin

-Xizêm

Ji vana herduyên ewil xemlên hevpar ên jin û mêrên Dêrikî ne. Lê ya dawiyê yanî Xizêm, xemleke xasî jinan e.

Deqandin: Çêkirina cure cure motîfan e ku bi derzîyê li ser laşê mirovan bi tenî û şîrê jinan tê çêkirin. Digel ku deq, xemla jin û mêran herduyan e jî motîfên deqê jinan ji yê zilaman mezintir û her wisa zêdetir in. “Di zilaman de bêhtir li poz, çeng û hestiyê hinarikê bi awayê xalekê deq tên çêkirin. Yê jinan jî dest, zend, nig, enî, çeng, lêv, dêm û ser sîngê tên deqandin.” (Hazar, 2007. 352)

Çavkaniyên em bi wan re peyivîn gelek jî wan gotin ku wan xwe bi zarokantî deqandine. Dîsa li gorî agahiyên wan dane me, dê û bavên wan jî bo vê deqandinê bertekên neyînî nîşanî wan nedane. Heman çavkaniyan da zanîn ku ev adetek Ereba bû û eşîrên Ereba ya di koçeriyê de yan jî di demên wekî din de didîtin û xwe weke wan deq dikirin. Agahiyê Mela Mehmûdê Bazîdî neqlî me dike vê îdiayê piştrast dike:

Jin û keçên ekradan ekserî wekû jinêd Ereban rûyêd xwe û ‘enî û lêvêd xwe deq didin. (Bayezîdî, 2012: 106)

Niha li herêmê bi şeweyên berê deqandin di nav ciwanan de zêde tune ye. Di encama lêkolînên xwe de ji kesên bi şeweyên berê xwe deq kiribû yê ku me tesbît kir zilamekî 51 salî jî gundê Kufurlê bû. Kesên din ên deqandî di ser vî temenî re bûn. Çavkaniyên me dibêjin niha jî hinek kes xwe deq dikin. Agahiyên din ên di derbarê deq û deqkirinê bi vî rengî ne:

Şîr û teniya sêlê tevhev dikin û bi serê derzîyê li laşê xwe dixin. Hinek bi teniya beroşê jî çêdikin. Va sala îja dibêjin deq guneh in. (S. Sönmez 2016)

Deq bi şîrê pîrekê bi derguş çêdibe. Teniya lampa bi dîwêr dikeve, ya jî teniyek dinê bi hawekî bi dest dixin û tev şîrê dê dikin. Bi serê derziya dirûnê kiderê bixwazin wir deq dikin. (M. Vural 2016)

Bi derziyakê ya bi tişteki din li ser çerm neqşê wan tê çixêzkirin. Di pê re şîr û teniya tevhevkirî bi derzîyê hûrik hûrik di ber hevde dikutin. Heta wêya bi

wî çermî didin xwarin werê dewam dikan. Tu kengî deqa çêbike tu kare çêbike. (R. Vural 2015)

Ji bo deqkirinê şîrê pîreka dergûşa wê keçik lazim e. Çimkî şîrê keçika û lawika ne wek hev in. Şîrê keçika hîn bêtir şîn dike. Tu kare bi şîrê jinika dergûşa wê lawik jî çêbike, le nabe wek a xwedî keçik. Loma bi ê keçika çêdibe. (E. Remo 2016)

Zilam jî pîrek jî karin deqa li xwe çêbikin. Şiklekî wanî mere li ser wan li hev bike tune ye. Carina niqtikek e. Carina rêzikê ji hev cihê cihê tèn çêkin. Hinek deq giroverin. Hinek jê di şiklê çiçeka de ne. Hinekê wan jî di şiklê shekî de ne. Ez çî zanim, şiklê wan pir in. (Ş. Zerga 2016)

Piranî pîrek deqa çêdikan. Deq li poz, gep, lêv, çeng û desta tê çêkin. Em ji bo xemlê çêdikan. Wekî din tu sebaba çêkirina deqa li cem me tune. Xemla me ye. Ez bi şev perçak teneke datînim ser lampê. Heta sibê çuqas dû û tenî pêdikeve îca tev şîr dikim. Sê derziyê dirûnê ez didim ber hev, dikim qevdek, bi tayekî girê didim. Bi sê derzîya ez wê xercê bi laş ve dikutim. (Q. Güler 2016)

Pirraniya deqa bi zarotî em çêdikan. Însan bîr dibe û pêve ji ber guneha kes zêde xwe nadeqîn. (A. Deniz 2015)

Îro li herêmê deqandina bi şêweya berê yanî bi tenî, derzî û şîrê pîrekan kême e. Lê bi awayê modern û bi mekîneyan deqandin ku weke “dövmê” tê gotin li cem ciwanan heye. Dîsa jî çend çavkaniyên me gotin ku, carinan hinek kes dixwazin û ew wan li gorî rê û rêbazên berê dideqîn:

Çend ro berê du keçik hatin û gotin: Xaltîkê bi Xwedê hema em di ber te re derbas bûn û me deqê destê te dîtin. Ji bo Xwedê ka tu yê ji me jî re çêbike. Mi go: “Qîzno guneh e.” Wan go: “Îlle tê çêbike.” Rabû mi jî ji wan re wan kîder û çawa xwestin, mi bi dilê wan ji wan re çêkir. (Q. Güler 2016)

Nêrînek heye ku tê gotin: “Deqên jinan ji bo were zanîn ku bê ew jin jî kîjan eşîrê ne û her eşîrek û şêweyek a wanî deqandinê hey e.” Dibe ku di bingeha deqandinê de rewşek wiha hebe. Mixabin li Dêrikê tu çavkaniyên me ev îddîa piştrast nekirin. Dibe ku ev adet di nav eşîrên Ereba de hebe, derbasî eşîrên Kurd nebûbe.

Diranzêrkirin: Diranzêrkirin bi wî awayî ye ku kirasekî ji zêr bi hawîrdor derbasî ser diranan dikin. Yên bixwazin diranên xwe zêr bikin divê xwedî aboriyeke baş bin. Çimkî amûra sereke ya vê xemlê zêr e. Li navenda Mêrdîn û navçeya wê Midyadê diransazên Îsewî hosteyên vî karî bûn. Dema me li Dêrik û gundên wê lêkolînên xwe dikir me kesekî teze diranê xwe zêr kiribe nedît. Li gorî agahiyan diranzêrkirin piştî salên nodî pir kêr bûye. Di warê diransaziyê de pêşveçûnên teknolojîk û guherîna şeweya xeml û girêdana mirovan di vê pêvajoyê de xwedî rolên girîng in. Dîsa koçkirina Îsewîyan ya ji herêmê jî ev xeml xistiye asta nemanê. Lewra kesên diran zêr dikirin Îsewîyên herêmê bûn. Kesên çavkanî di vê mijarê de ev agahî dane me:

Berê Fila diranê me zêr dikirin. Aniha ew nemanin, kes hew zêde zêr dike. (Ş. Zerga 2016)

Mi diranê xwe yê pêşiyê giş zêr kirine. Yê jor jê ketin, ê jêr hîna saxlem in. (Z. M. Qado 2015)

Ma wexta mere dirana zêr dike, diranê mere ne kurmî û riziyayî ne. Çimkî tu dest dirana nade. Hew kirasekî ji zêr dikşîne ser diranê xwe. (X. Xatûn 2015)

Vane ê mi ev sî sal in diranê mi zêrkirî ne. Zirara zêr ji laşê mere re tune ye. Ew jî weke xizemê ye. (M. C. Tüfek 2016)

Zilam jî pîrek jî, me herkesî diranê xwe zêr dikir. Diranê zêrkirî bîhn jî nakevê. Kirîvê Yaqûb⁴⁰ ji mi re li Mêrdîn zêr kir. (V. Tüfek 2016)

Berê wexta millet qîzê xwe dizewicandin, ji xwazgîniyê xwe re digotin: Hûnê diranê keçîka me zêr bikin, hineka çar heb, hineka şeş heb zêr dikirin. (N. Tur 2016)

Ji agahiyan wer tê fêmkirin ku diranzêrkirin di dewrekê de xemleke sereke bû. Di zewacan de şertekî hêla bûkê jî diranzêrkirina bûkê bû. Herwiha zilamên ji xwe hez kirine jî diranên xwe zêr kirine. Li herêmê weke sifetekê jî “Diranzêr” tê bikaranîn. Weke mînak: “Hecî Mihemedê Diranzêr”. Digel guherînen wekî din bi taybetî ji ber koça Îsewîyan di roja me de ev xeml ,ji xeynî yên berê, ji holê rabûye.

⁴⁰ Şênîyên herêma Dêrikê ji nemisilmanan re gelek car dibêjin “kirîv”.

Xizêm: Awayêkî resen ê xemla jinan e. Xizêm bi gelemperî bi poz ve tê daliqandin. Divê madenê wan ya ji zêr, ya jî ji zîv be. Digel jinên ku pozên xwe qul dikin û xizêmê dixinê, salên dawî bi awayên beyî qulkirinê yên wekî din jî xizêm tèn bikaranîn. Awayê vê xemlê wiha ye:

Bi gedetî poz tê qulkirin. Poz bi derziyê qul dikin. Çawa guh ji bo guhara tê qulkirin, poz jî ji bo xizêmê bi wî hawî tê qulkirin. (M. Bûb 2016)

Berê me bixwe pozê hev qul dikir. Aniha yeka bixwaze dahre cem zêrçiya, ew poz qul dikin. (Ş. Temel 2016)

Madenê xizêmê zêr ê. Jixwe di nav sala de ew qulika di poz de vebûye fire dibe. Meh bi meh, sal bi sal ew xizêm ji wê qulikê goşt dixwe. Ne zêr be, goşt wê genî bive. (M. C. Tüfek 2016)

Tu baweriya me bi xizêmê ve tune ye. Hew ji bo rewşê ye. Î(n)san bi pozê xwe vedikin. (Y. Dengiz 2015)

Ahlê gunda xizêmê dixin pozê xwe. Li hundir bajêr pîrekê bi xizêm kê in. (R. Vural 2016)

Niha keçê sêzde çarde salî jî xizêm di pozê wan de ne. Îja ne xizêmê me ê berê ne. Li gor adetê zemana ye. Gelek jê pozê xwe qul nakin. Xizêmnin bi çengel in, bi pozê xwe ve dialiqînin. Çi seeta dixwazin jî derdixin. (F. Ekinci 2016)

Ê mi pozê her şeş keçê xwe jî mi qul kirine û wa xizêm di pozê gişa de ye. Aniha bi makîna qul dikin. Hinek xizêmê zîv jî dixin pozê xwe. (V. Tüfek 2016)

Ji van her sê xemlan “diranzêrkirin” ji xeynî yên berê, aniha di asta tunebûnê de ye. “Deqkirin” jî hege em deqên bi awayên modern ku bi mekîneyan çêdibin nehesibînin, yekcarna tê çêkirin. “Xizêm” ew xeml e ku niha ji hêla jin û keçên Dêrikî ve ji nûve tê vejandin. Jin û keç yan pozên xwe qul dikin û yan jî bi awayên din xizêmê bi pozê xwe ve dialiqînin. Dewamkirina van kevneşopîyan di navbeyna çanda herêmê ya kevnare û ya nûjen de dibe pirek. Me sîh kes ji çavkaniyên xwe yên ku temenê wan di ser çil salî re bûn (15 jin-15 mêr) bijartin û me ji wan pirsî bê gelo ,qe nebe hema carekê, wan kîjan xeml ceribandine. Rêjeya bikaranîna wan ya xemlên herêmê ku tèn behskirin wiha ne:

Tablo 2: Rêjeya Bikaranîna Cureyên Xemlên Herêmi

	Deq	Xizêm	Diranzêr	Hejmara Giştî
Jin	6	3	3	15
Mêr	4	-	1	15

Ji her sê xemlên sereke yê li derdora Dêrikê ya ku herî zêde hatiye bikaranîn “deqandin” e. Çimkî xizêm û diranzêr him bi mesref in û him jî hebekî bi zehmet in. Lêbelê deqandin xemleke bê mesref e û bi hêsanî tê çêkirin. Deqandin li navenda bajêr zêde tune ye. Li gundan hîn bêhtir tê dîtîn. Dibe ku ahlê gundan ji ber nêzîkatiya erdnîgarî ya bi Ereban re û bi riyên weke sewalvanî û koçeriyê bi Ereban re têkilî danîbin û ev xeml bêhtir di nav wan de belav bûbe.

5.2. Cilûberg

Li Dêrikê herçiqas cilûbergên zemanî werin bikaranîn jî, kincên xwedî nîşaneyên kevneşopî û motîfên nasnameya Kurdî di xwe de dihevin bi taybetî ji hêla temenmezinan ve tî li xwekirin. Ev cilûberg di rojên taybet de ji hêla ciwanan jî tî li xwekirin. Digel kincên li malan ji hêla jinan ve tî dirûtin, kincên ji welatên derve tî anîn û gel wan li xwe dikin henin. Yanî çawa fistanek li malê tê dirûtin, herwiha ji Sûrî egal û kitan tî anîn.

Li herêma Dêrikê girêdana jinên navenda bajêr û gundan dişibin hevûdu. Lê girêdana mêran hebekî ji hev cihê ye. Li navenda bajêr girêdana jinan li gorî mêran bêhtir li gor kevneşopiyê ye. Li gundan jî cilûbergên ku mirov dikare wan herêmi bihesibînin ên weke şelwer, destmal ji hêla mêran ve û kitan û kiras jî ji hêla jinan ve tî li xwekirin. Cilûbergên herêmi li gorî jin û mêran wiha ne:

5.2.1. Cilûbergê Jinan

Di salên dawî de li herêmi rêjeya lixwekirina kincên modern bilind bûye. Digel vê yekê dîsa jî him li navendê û him jî li gundan di girêdana pîrekan de *kitan*

amûreke sereke ye. Gelek caran ji bo rojên taybet jî tê bikaranîn. Jinên Dêrikî beyfî kitanê bi serê xwe dakin, zêde dernakevin derve. Di dawetan, ger û geştên derveyfî bajêr de kitana xwe girê didin. Gerek em vê jî bivêjin ku ev rewş piranî ji bo jinên di ser çil salî re derbasdar e. Jinên di biniya vê temenî re bêhtir etek û gomlegan li xwe dikin. Ji ber ku jinên Dêrikî bi kitanê hatine naskirin, bi awayekî temsîlî li devê riya bajêr wêneyekî mezin ê jinek Dêrikî ku kitan bi serê xwe dakiriyê hatiye daliqandin. Li herêma Mêrdîn jinên Dêrikî û kitana wan ewqas navdar e ku hevrebûna Dêrik û kitanê bûye mijara helbestan jî:

*“Du quriş û nivê wê hebû, şuxlê dora **Dêrikê di wê kitana** xwe danî, eman eman cîranê”*⁴¹

Dîsa di hinek helbestên ku taybetmendiya navçe, gund û eşîrên Mêrdîn têne jimartin taybetmendiya Dêrikê ya derdikeve pêş kitan e:

*“...Tûtin firoş in Xursî, xwediyê dimsê Aqresî, koçeriyê re Cewzatî, mişmişan re Eferî, xencer bel in Bilokî, tembûrvan in Erbanî, faîz xwar in Berîvanî, sofîtiyê re Goldarî, **kitan sipî Dêrikî**...”*⁴²

Divê were zanîn ku kitan tenê ne xasî jinên Kurd ên Dêrikî ne. Çimkî kitan cileke Dêrikanî ye. Li bajêr niha jinên bi eslê xwe Ermenî nin û bav an bapîrên wan bûne misilman, ew jî kitanê girê didin. Digel ku kitan ewqas navdar bûye jî, di hinek çavkaniyan de di derbarê girêdana jinên Dêrikî de agahiyên cuda hene: “Jin weke *Tirkên berê yên Asya’ya navîn*; mêr jî çakêt, êleg, pantor û qerewatê li xwe dikin” (Günçal ve Saygın, 1987). Niha li herêmê tu nîşaneyên vê îddiaya derbarê girêdana jinan de piştrast bike tune ye.

Bi awayekî giştî di derbarê cilûbergên jinan de agahiyên kesên çavkanî dane bi vî rengî ne:

Em kitan û hibriya ji binxetê tînin. Kitan a Helebê ye. Hebîmamo kitana en baş e. Her topek kitanê 50-52 metre ye. Em her çar metreyê ji bo kitanekê jêdikin. Ji her topekê 10-12 kitan derdikevin. Îca kîyê wê kitanê bide serê

⁴¹ <https://www.google.com.tr/search?q=oy+cirane&oq>. Dema gihîştinê: 28.08.2016

⁴² <https://www.google.com.tr/search?q=tobedarim&oq> Dema gihîştinê: 28.08.2016

xwe, ew li gorî kêfa xwe kitanê li cem terzî didirû. Kitanek baş, mere lê miqate be, kêmanî pênc sala dimîne. Ji ber aniha li Sûrî herb e kitan gelekî buha bûye. Berî herba Sûrî me kitanek bi deha-pazda difrot. Niha kitanek çûye 50-60 milyoni⁴³. (E. Özgen 2016)

Pîrek kitanê didin serê xwe, keçik jî leçekekê ya jî çarîkekê didin serê xwe. Heger tu yeka kitan pêdakirî bivîne ew pîrek e, ne keçik e. (F. Deniz 2016)

Pîrekê File jî kitan girê didan. Kitana wan kin bû. A Kurmanca dirêj bû. (A. Deniz 2015)

Pîrek çawa bê kitan derkeve ji derve law, ma tiştê wer dibe qey? Heger kitana pîrekekê erdê nemalê, ew ne kitan e. Kitan gerek bi erdê re bikşe. (R. Vural 2016)

Kincê pîrekê li derve bi vî hawî ye: Bêceme, di ser bêcemere kirasê binî, ew kiras jî gerek ji reng û qûmaşê bêceme be. Li ser vî kirasî jî kirasê ser li xwe dikin. Yanî pîrekê me sê qat kinc li xwe dikin. (Ş. Zerga 2015)

Pîrekê navosere bi kitan û kiras in. Di ser kitanê re jî hibriyê girê didin. Pîrekê cehel xavîkekê ya jî yazmakê davêjin ser serê xwe. (Q. Güler 2106)

Keçik pantor û tîşorta li xwe dikin. Keçik û pîrekê ciwan wexta dişixulin, karekî dikin şelwer li xwe dikin û ser çavê xwe jî vedişêrin. (Ş. Temel 2015)

5.2.2. Cilûbergê Mêran

Li herêmê tevî cilûbergên esrî, kincên nîşaneyên çandî û herêmî di xwe de dihûndirînin jî tîn bikaranîn. Hinek çavkaniyên me neqil kirin ku salên berê wan eba li xwe dikirin û çarox dixistin nigên xwe. Lê di gerên xwe de me ev tişt nedîtin. Awayê girêdana zilamên Dêrikî di roja me de wiha ye:

Heçê xort, pantor û komlega li xwe dikin. Mezinê me jî ya bi şelwer in, ya bi fîstan in. (M. Selçuk 2016)

Fîstan piranî ji mala Xwedê tê ji mere. Yanî em tu kes xisûsî fîstana nadirûn. Ya hecacî tînin ji mere, ya jî hinekê çûbin umrê bi xwe re tînin. (Y. Dengiz 2016)

⁴³ Bi wateya lîreyê Tirkî

Şelwerê me delingê wan ne zêde fire nin. Em dawa şelwerê xwe jî weke ê Sêwregiya zêde bernadin. Hebekî li jor dihêlin. Dawa şelwera gerek bi erdê re nekişê. (M. Vural 2016)

Ermeniyê li vir jî wek me şelwer li xwe dikirin. Ew jî giş çûn. (S. Vural 2016)
Dirûtina şelwerekî bi 25-30 baxnotî ye. Qumaşê wî jî aîdî te be gerek. (Ş. Silêman 2016)

Extiyarê bajêr şewqa didin serê xwe. Xort tiştêkî nadin serê xwe. Li gunda zilamê navosere çefiyê didin serê xwe. Hinek jî egalê didin ser çefiya xwe. Le li hundirê bajêr tu kes ‘egalê nade serê xwe. ‘Egal a Ereba ye, le gelek Kurmancê me jî didin serê xwe. (E. Özgen 2016)

Ji dêvila zilamê navosere serqot bigerin, hema şewqe be, destmal be biraqe tiştêkî bidin serê xwe. (M. Bûb 2016)

Berê çek tunebû me li xwe bikira. Sol tunebû me têxista nigê xwe. Li gundekî bedlekî yekî heba ya jî qonderak heba, kî biçûya ku ewana li xwe dikir û diçû. Em gundek tevde bi bedlekî û bi cotek qondere bûn. (M. Mehmûd 2016)

Ji bo ku rewşa girêdana mêrên herêmê baş were famkirin, em ê encama lêkolînekê bi awayê tabloyekê nîşan bidin. Ji sehaya ku em lê geriyan li Maşmaşkê di Tîrmeha 2016an de li cimaeteke hazir, me bi riya çavnêriyê lêkolînek kir. Li cimaetê 28 zilam tê de rûniştibûn û temenê wan yê piçûk 22 û yê mezin 74 bû. Rewşa cilûbergan bi vî hawî bû⁴⁴:

Tablo 3: Rewşa Cilûbergên Mêrên Dêrikî

Hejmara Mêran	Kinc/cil		
	Mêrên bi Şelwer	Mêrên bi Fîstan	Mêrên bi Pantor
28	6	2	20

Hejmara Mêran	Serpûş		
	Mêrên bi Desmal	Mêrên bi Egal	Mêrên Serqot
28	4	1	23

⁴⁴ 02 /07/ 2016 Maşmaşkê. Odeya gundiyeke ku civat ji bo dawetê kom bûbûn.

Li gorî vê rejeyê teqrîben ji mêran sedî % 21 bi şelwer bûn, ku şelwer kincekî netewî yê Kurdan tê qebûlkirin. Yê bi pantor bi ser de ya tîşort an jî gomleg li xwe kiribûn. Yê bi şelwer giş bi gomleg bûn. Li gorî demsalan rewşa şêweya girêdanê jî guherbar e. Zivastanê rêjeya zilamên desmalê didin serê xwe bilindtir dibe. Herwiha lixwekirina fîstên a zilaman jî, havînan bêhtir e ji demên sar û sermayê.

Li gorî agahiyên di dest de di demên ku Ermenên Îsewî li Dêrikê rûdiniştin girêdana jin û mêrên Ermenî û Kurd gelekî nêzî hev bûn. Şelwer û kitan di girêdana jin û mêrên herdu netewan de cîh digirt.

6. BÎR Û BAWERİYÊN GELÊRÎ

Di nav civakan de gelek bîr û baweriyên cihê henin. Baweriyên derbarê ajalan, baweriyên derbarê tîrb û ûcaxan, baweriyên derbarê sal û mehan, baweriyên derbarê hêzên derasayî çend cure ji wan baweriyên e.

6.1. Baweriyên Derbarê Nezerê

Bêjeya “Nezerê” bi eslê xwe Erebi ye. Hemwateya vê bêjeyê ya zimanê me “çavînî kirin/bûn” e ku hin mirov temaşeyî tişteki, kesekî yan zarokekî xweşik bikin dibe sebaba nesaxbûn yan mirina wan. Nezer di ferhengên de wiha hatiye bi watekirin: “Têkdana mal, kargeh û hwd.” (Botî, 2007:144) “Nêrîn, lênêrîn, çav avêtin, çav lêketin” (Pala, 2009: 350) “Hêzeke mêrkuj û awirên bandorker e ku tê bawerkirin di hin kesên diyar de heye û bi taybetî zîyanê dide zarokan, heywanên kedî, xaniyan, mal û milkan, heta bigêje nesneyên bêruh.” (Tdk, 1998) Wateya nezerê fireh e. Carinan bi nêrînê, carinan jî bi nêrîn û behskirinê tişt çavînî dibin. Yanî nezerkirin ne tenê ku bi çavlênêrînê mirovan û nesneyan di bin bandora xwe dihêle. Ji xeynê nêrînê, behskirin û dilbijandina bi tişteki ve dibe sebaba qezayekê, nexweşiyê, kulekî, mirin, şikestin, xerabûn, bêbereketî, bêtifaqî û gelek halên neyînî yê din. Ji bo hemîyan dibêjin çavînî bû/çav lê ket/nezerî bû.

Li gorî qeneeta giştî ji bo rewşek an jî tişteke were çavînîkirin, ne şert e ku ew tişt an jî rewş xwedî taybetiyên erênî yê weke xweşikbûn, bedewbûn, girsbûn,

bibereketbûn, pîrbûn û hin taybetiyên din be. Bes nêrîn, behskirin û dilbijandina kesên ku çavînî dikin ji bo çavînbûnê sedema sereke ye. Çimkî li gorî baweriya giştî hêzeke wan kesan ya çavînî kirinê heye û dilê wan bibije, yan jî têkeve tişteki ew tişt nezerî dibe. Li herêmê ji bo kesên wihane dibêjin: “*Ê wan ne çav in, tiving in.*”

Çavînkirin, çawa ji hestên neyînî yên weke dexesîyê çêbibe jî, bi taybetî ji ber hezkirin û heyraniya xizman ya li hemberî hinek kesan jî tê. Di vê cure nezerê de herî zêde zarok di bin bandorê de dimînin. Ji ber vê jî pêvebûna dê û bavan a bi zarokan re baş nayê dîtin. (Boratav, 2003:134) Belkî ji ber vê baweriyê be ku di nava Kurdan de dema ji zarokan hez dikin meşhûr e ku nav û nûçikan li wan dikin û gotinên nexweş ji wan re tên gotin. Yanî ji bo pêşî li nezera xwe bi xwe bigrin, sifet û leqabên nexweş li zarokan dikin. “Ekrad nezerê rast dizanin û gelek jê îhtirazî dikin û hasila xwe û malê xwe nîşanî kesekî nadin ko nezer dihengivê.” (Bazîdî, 2012: 66)

Ji xeynî van em bêjin dareke mîweddar ku hişk bibe, çêlekeke bişîr ji şîr bikeve û stewr bibe, bûkeke nû nexweş bikeve, jin û mêrên nava wan xera bibe, kesekî xizanî bi ser de were û gelek rewşên bi vî halî ku ji xweşiyê ber bi nexweşiyê ve herin. Ji bo van hemû rewşên neyînî “Nezer/çavînî” tê hişê mirov. Hinek kes dibêjin nezer rast e û Hz. Pêxember rastiya wê xeber daye, çareya wê jî nîşan kiriye: “Resûlê Xwedê ferman daye ku ji bo nezerê bila rukye⁴⁵ were kirin” (Kocaer, 2004: 715).

Li Dêrikê di jiyana rojane de baweriya bi nezerê gelekî xurt e. Tê bawerkirin ku gelek tişt nezerî dibin. Li hember vê jî gelê herêmê hinek teknîkên ji bo xwe ji nezerê biparêzin bikar tînin. Li herêmê baweriya bi nezerê û xweparastina jê bi vî awayî ye:

Qismekî însana bi çavê xwe tên naskirin. Em hevza xwe ji wan dikin. Însanê çavşînî nezera wan bêtir e. Pîrekê me jî dilê xwe dibijînin her tiştî. (F. Deniz 2015)

Piraniya nezerê bi çav dibe. Nezer xwe bera çî bide wî tiştî xera dike. (N. Ertekin 2015)

Ji berê de meleyê me dibêjin “Ew mezelanê hûn di ber re derbas dibin, nîvê wan bi nezerê li erdê ketine.” (S. Sulhan 2016)

⁴⁵ Tedawîkirin a bi xwendina Qurana Pîroz

Çav bi herkesî re tune ye. Le hinekê meşhûr henin em dibêjin çavê wan henin. Ew însana çavnokî dikin. Em gedekê xwe rê wan nadin. Em ji wan vedişêrin. Mezinê me digotin: “Mirîşkê bi hêkî jî tê nezerkirin.” (Y. Dengiz 2015)

Heger nezer li hestî bixe wî şexsî dikuje. Heger li goşt bixe, goşt dihillîne; le belkî ê nezerî bûbe baş bive. (Q. Güler 2016)

Çawa di derbarê nezerê de baweriyên li jor hene gelê herêmê li hemberî nezerê hinek rê û rêbazên parastina ji wê jî bikar tînin. Çavkaniyan ev rê û rêbaz wiha neql kirine:

Hermelê dişewitînin. Hermel li hewşê malê me, li her derê şîn tê. Hinek qalikê pîvazê û xwê tevhev dikin, bi hermêlê re dişewitînin. (E. Remo 2016)

Risas tê hilandin. Di pê re ew risas dicemide, derziya çeloka pêv dialiqînin bi xwe vedikin. (N. Tur 2016)

Yeka mere ji nezera wê bitirse, bêyî ew pê bihise mere qeysa nigê wê bi tayekî digire. Îca wî tayê pê qeysa şîna nig hatiye girtin, heft girêka lê dixin û dişewitînin. Nezer û sêhra wan betal dibe. (Q. Güler 2016)

Em morîkê şîn, ya jî çavşînkê bi tiştê mere ji nezerbûna wan bitirse vedikin. Tartawik û hermêlê dişewitînin. (M. Seydo 2016)

Wexta yek tiştêkî bicibîne gerek gotinê weke: “Bênezer, Maşele ya jî Xwedê ji nezerê bistrîne.” bikin. Îca yek dilê xwe bibijîne tiştêkî, jê re dibêjin: “Çavê te li qûna pisîkê be.” ya jî “Çavê te li kevirê reş be.” bi vî hawî hevî dikin çav li wî tiştî nekeve. (M. A. Ece 2015)

Tayekî di qulika kevirêkî reş re radikin û bi tiştê xwe dialiqînin. (Î. Xoce 2016)

Hermela şîn bi dîwarê hundir ve dadiliqînin. (F. Ekinci 2016)

Hinek insan solek kevin bi xaniyê xwe ya jî bi texsiyê xwe vedikin. Yanî ji bo bala mere her ser solê, mere ê din ji bîr bike. (M. Bûb 2016)

Em ji bo heywanê wek beran, cange ya jî nêrî nêyên çavnokî kirin tartihokê⁴⁶ bi wan vedikin. (X. Xatûn 2015)

Wextê wanê mere ji nezera wan ditirse li mere rast werin gerek çavê wan li ê me nekevin û mere “Qulhûwellahê” bixwîne. (R. Vural 2016)

Însanê me carina pîvazê, nalê bergîra, qiloçê heywana bi xaniya vedikin. (M. Û. Hemê 2016)

Ê hifza xwe ji çava dikin temeriya gedekê xwe meqes dikin. Yanî wan bê biçim dikin, êdî dilê kesekî nabijê. (M. Selçuk 2016)

Li gundê me pîreknin hebûn mezinê me digotin: “Çavê wan heye.” Îca wexta me ew didîtin pîraka mi digo: “Xwe li cem wan gêj bikin, xwe tewşo mewşo bikin, bira dilê wan nebije we.” (M. A. Ece 2015)

Gelê herêmê him ji ber baweriya xwe ya olî, him ji ber ceribandinên bav û kalan hesaban ji nezerê dikin û hifza xwe jê dikin. Weke me li jor jî dît gelek rê û rêbazên wan ên li hember nezerê henin. Dema em bala xwe didin rê û rêbazên li herêmê tên tetbîqkirin, em dibînin ku tiştên tên kirin piranî ew tişt in ku tê bawer kirin ew ê rê li ber nezerê bigrin. Çimkî ya girîng ew e ku tişt nezerê nebin. Lewra nezer lê bikeve veqera wî îşî gelek car tune ye. Yanî beranê çavîni bibe dimre, dara çavîni bibe hişk dibe, saetek çavîni bibe dikeve dişkê û wekî din. Herçiqas têkiliya di navbera nezerê û van rewşên neyîni bi awayekî eşkere neyê zanîni jî, ji ber ku mirov wan bi hev re girê didin baweriya li hember nezerê zû bi zû qels nabe.

6.2. Baweriyên Derbarê Ûcax, Tirbe û Cihên Ziyaretê

Li Dêrikê çî li navendê û çî jî li gundan tirb û meqamên ku ji hêla gel ve weke ûcax tên binavkirin û pîroz tên qebûl kirin henin. Gelê herêmê ji bo tedawiya nexweşî û astengiyên bedenî, def’a qeda û belayan, bi hêviya bicîhatina mirazan û her wiha bibin xwedî zarok bi hêviyên mezin nêzî van deran dibin. Gelek caran sondxwarin û hevsonddayîna wan jî bi navê van ûcaxan e. Ger zarokên wan, li gorî qeneeta wan, bi wesîla van ûcaxan çêbibe navê wan kesên di ûcêx de veşartî li zarokên xwe dikin.

⁴⁶ Cureyeke daran e ku li herêmê ji wê darê motif tên çêkirin û dixin hustê sewalan an bi kincê zarokan vedikin.

Piştî ku mirazeke wan bi cîh tê weke spasî û şukrekê dîçin van deran û qurbanan di riya Xwedê de serjê dîkin. Adetên wiha ji berê de di nav Kurdan de heye. Mela Mehmûdê Beyazîdî vê rewşê bi van gotinan neqlî me dike:

Ekrad zaf îtibar bi ziyaret û belkû bi dar û beran heyîn. Darekî û yaxo berekî ziyaret dizanin û qurbanan dibin û serjêdîkin û şemalan dibin vêdixin. Wekû nexweşekî wan dibitin, ehd dîkin ko bilanî şifa bibîne ez pêxwasîn biçime filan ziyaretê û qurban û şemalan bibim. Wekû ew nexweş şifayê dibînitin elbette wî ehdî dê bi cih bîni. (Bazîdî, 2012: 82).

Ûcax û tirbên li herêmê her yek xwedî xisûsiyetekê ye. Hinek ji wan bawiyar bi şifa dike, bi saya wan hinekan jin dibin xwedî law. Tê bawerkirin ku hinek ûcax şîrê dê zêde dîkin û baweriyên wekî din. Her rojên hefteyê ji bo çûyinê ev der guncav bin jî her yek ji wan û rojeke taybet a wan heye. Çûna wê rojê xêrtir tê dîtin ji rojên din. Carinan xwarinên mexsûsî ziyaretan jî çêdibin. Di van salên dawî de çûna hinek ziyaretan ji bo hinekan weke ger û geşteke jî tê dîtin. Ev jî nîşaneyê kêmbûna hêz û bandora manewî ya van ûcaxan a li ser civakê ye. Li Dêrik û gundên wê cihên ku me tesbît kirine û ji hêla gel ve herî tîn naskirin ev in:

Kalê Şêx Osman: Li navenda Dêrikê di nav goristanê de ye. Di vir de Kalê Şêx Osman veşartî ye. Gelê herêmê gelek caran ji ber rêzgirtinê navê wî hilnadin û jê re dibêjin “Kaliko”.

Kî bawî be ya jî mirazekî wî hebe tê Şêx Osman. (R. Vural 2016)

Wextê mere dahre, herke li gorî halê xwe mirîşkekê ya jî tişteke dinê serjê dîkin. (Ş. Temel 2016)

Êvarê îniya ser tirba Kaliko tije dibe, herkes ji bo xwe tişteke jê dixwazin. (A. Deniz 2016)

Dara Keçikê: Li vê ziyaretê tu gor tune ye. Yanî tenê meqamek e. “Kanîka Miho” jî jê re dibêjin. Dêrdorên ku gor lê tune ye û weke ûcax tîn zanîn li derên din jî henin. Weke mînak li gundê Zinarê yê Mêrdînê cihekî pîroz tê zanin heye. Li vê derê darek mezin û keviyek li ber heye ku jê re dibêjin “kevrê ziyaretê.”

Di nav gelê herêmê de ew bawerî heye ku dema mirov here “Dara Keçikê” divê “hêrayî”⁴⁷ were çêkirin.

Pîrekê Xwedê nuh dergûşê dide wan, heger şîrê wan tunebe ya jî kêmbê, radihêjin pêçeka xwe û dibin ziyaretê. Heta ew pêçek bigirî li wir disekin. Dibêjin bi vî hawî wê Xwedê şîrê wê jinikê zêde bike. (A. Deniz 2016)

Êrgo baba: Li ser zinarekî bilind yê rojavayê bajêr e. Çûnûhatina wir bi zehmet e. Nayê zanîn bê kî li wir veşartî ye.

Çi nexweşiyê wan hebe tînin Êrgo Baba. Em nizanin kî tê de veşartî ye. (F. Ekinci 2016)

Lê di vir de xaleke balkêş heye: Digel rêz û xatirê ji Êrgo Baba re tê nîşandan, me tu kes nedît ku wan ev nav li zarokên xwe kiribin. Lêbelê weke me berê jî destnîşan kiribû şênîyên herêmê navê kesên di ûcaxan de veşartîne li zarokên xwe dikin. Hinek kesan gotin ku Êrgo ne navê misilmanan e, lewma ew li zarokên xwe nakin.

Kalê Şêx Hesên: Ev ûcax li Çildizê ye. Çildiz gundekî nêzî Dêrikê ye. Di qebrê de Kalê Şêx Hesên veşartî ye. Ji navenda Dêrikê û gundên derdorê gelê herêmê vir tewaf dikin.

Pîrekê lawê wan çênabe ji bo Xwedê lawikekî bide wan tîn ber vî ziyaretê. (Ş. Silêman 2016)

Girê dod: Li gorî baweriyê kesê bi navê “Dod” ji zuruyeta Hz. Pêxember tê. Ev ûcax li ser girekî ye. Darek û gorek lê heye. Dara li ser gir her daîm hêşin e. Nayê zanîn bê ka ew dar ji kengî de hatiye çandin.

Ûcaxekî mezin e. Navê wî ûcaxî Dod e. Di her meha nîsanê de tîn tewaf dikin. Bi terextora ji her gundî milletê me ber bi ûcêx ve dahrin: Zilam, pîrek, qîz, xort û gede tevaya gundiya dahrin. (H. Evdirihman 2016)

Sala zuhayî be Mele Tehar⁴⁸ çakêtê xwe vajî li xwe dike; yanî wek gemara di qelbê xwe de der dike û li pêşiya cimatê dua baranê li ser girê Dodê Şeda dike. (D. Özer 2016)

⁴⁷ Cureyekî savara hûrik e.

Sîn û Seydoş: Du ziyaret in ku gelemperî navê wan her daîm bi hev re tên hilatin. Nêzî gundê Bixûrê ne.

Kaniya Sîn carina zuha dibe, carina ji ava wê gûr dibe. Çiloyê dara Seydoş dixin şîr, dimeyinînin dikin penêr. (F. Ekinçi 2016)

Ji bo bawîtî û nexweşiyê wekî dinê însan tên ber ûcaxê Sîn. (M. Seydo 2016)

Baba Emer: 15 km dûrî bajêr e. Di nav tixûbê gundê Zorava de ye. 2-3 tîrb henin. Cihêkî bi av û baxçe ye.

Ê bi nêta tewafê herin gerek roja pêrşemê herin. Marên reş li vê ziyaretê henin. Bi kesî venadin. Kuştina wan jî ne dirust e. Marê ziyaretê ne. (R. Vural 2016)

Ziyareta Kosewelî: Gundê ku ziyaret lê ye jî bi heman navê ye. Gelê herêmê ji bo her tiştî diçin ber vê ziyaretê. Gelek caran şevder li ziyaretê dimînin û dia dikin.

Ji bo nezerê, ji bo çebûna gedeka û ji bo nexweşiyê wekî din em dahrin wir. (Y. Dengiz 2015)

Sehabeyê Xirarê: Ziyareteke di nav Xirarê de ye. Bi taybetî ji hêla şênîyên vî gundî pîroz tê zanîn.

Gedê nîvçe, ê laşê wan zêde naşixule dibin ber vî sehabî. (X. Xatûn 2016)

Sala ez çûbûm eskeriyê yekî gundiyê me ji dest û niga ketibû. Çend şeva ew anîbûn ber vî sehabê me. Sipîsaxlem bibû. (M. Bûb 2016)

6.3. Baweriyên derbarê Ajalan de

Agahiyên derbarê ajalan de ji hêla kesên çavkanî wiha hatine neqlkirin:

Hinek dibêjin **kew**, **kund** û **kîroşk** bêyom in. (R. Çakıl 2016)

Carina **teyrek** ya **kundek** li pêşiya me bixwîne em dibên veya bêyomî ye. (D. Özer 2016)

⁴⁸ Li Dêrikê melayekî navdar e

Rêviyek wer dîtin gerek wer kuştin. Ya na tişteke wer serê mere. (Y. Dengiz 2015)

Marên li nav mezela nayên kuştin. (Y. Dengiz 2015)

Çêleka cotika bîne ew bê yom e. Her kî çêleka wan cot bîne, gerek derkeve ser xênî û ban bike bivêje çêleka me cot aniyê. (M.C. Tüfek 2016)

Dibêjin **kewa** xwedî nekin, ew bê yom in. (B. Erol 2015)

Dest **pisîka** nedin, ew guneh in. (M. Û. Hemê 2015)

Hehecik û **legleg** bimbarek in. Hehecik li hundirê mala, di nav beşta de hêlînê xwe çêdikin. (M. Û. Hemê 2015)

Heçî kesê di emrê xwe de heft **gumgumoka** bikuje wê her cinnete. (R. Çakıl 2016)

Duaya devê **gur** girê dide heyê: Berê çêlekê me li çiyê tenê diman. “Duaya devê gur” bihata xwendin, çêlekê me bi silametî dihatin malê. Wê duayê devê gur girê dida. (F. Deniz 2016)

Kî di derba ewil de **gumgumokê** bikuje xêr e. Le kuştina marmarokê ne rast e. (E.Remo 2016)

Wadê Nemrût, Pêxemberê Xwedê avêtiye êgir, **marmarokê** xwestiye bi niqutê ava devê xwe êgir vemrîne. **Gumgumokê** jî ji bona agir gûr bike pif êgir kiriye. (A. Deniz 2016)

Jijo nekujin, çimkî kuştina bê sebeb ya vî heywanî guneh e. (D. Özer 2016)

Biraqe **gumgumok** diranê we nejimêrin. Heger hûn diranê xwe rê wan bidin, diranê we giş wê biweşin. (A. Deniz 2016)

Mar carê kirasê xwe davêjin. Însan wî kirasî di çavê xwe bide baş e, şifa ye. (M. A. Ece 2016)

Gumgumokê ji Fatma Nebiya re gotiye: Hela ka sînga xwe derxe, bê a te mezin e ya jî a mi mezin e. Fatma Nebiya sînga xwe rê gumgumokê daye, le gumgumokê sînga xwe dernexistiye. Çi wexta gumgumok tên kuştin bi ser sîngê dikevin. (Z. M. Qado 2015)

Gumgumok ajaleke li bejahiya Dêrikê gelekî zêde tê dîtin. Baweriyên derbarê gumgumokan li herêmê him zêdetir in û him li temamê herêmê belav bûne. Ev bawerî piranî bingeha xwe ji baweriyên Îslamî digrin.

6.4. Baweriyên Derbarê Jiyana Rojane de

Kirîna kevçiya li hineka nayê. Perê xwe didin xelkê, ew ji wan re kevçiya dikirrin. (D. Özer 2016)

Ji mixurbe û şûnde melkesê bi hundir nexin. Biraqe hûrikê xwarinê li erdê bimînin, ew ji bo miriya ne. (R. Vural 2016)

Bê derpî di ser xaniyê kirîvê xwe re derbas nebin. (M. A. Ece2016)

Li pispiskê nexin, bangi şeytên nekin. (M. Û. Hemê 2015)

Ser gedê xwe re gav nekin, bejna wan dirêj nabe, kin dimînin. Heger tu carekê xwe di ser re bavêje gerek dîsa ters bizîvire. (F. Deniz 2016)

Tiliyê kê ê niga ji tiliya serî dirêjtir be, ew bisiûd in. (D. Özer 2016)

Carina tîfilek dem bi ser çayê dikeve. Wê çaxê em dibêjin mêvanê werin malê. (C. Çeviren 2016)

Tiştêkî pîs û nebaş wer dîtin gerek mere tîfkê û bivêje “Neuzû billah” wecê xwe jê biguhere. (M. A. Ece2016)

Çarşem bêyom e. Gerek çarşemê însan xwe neşon. (M. Û. Hemê 2015)

Ê ji me çêtir xwe li dara hijêrê datînin. (F. Deniz 2016)

Navê gawira li zarokê xwe nekin, wê bimrin. (M.A. Ece 2016)

Her êvara inyê şîva me çi be em ji wê şîvê didin cîranekî ya jî xizanekî. Eveya ji miriyê mere dibe xêr. Êvarê înan ruh tê qebrê û dikeve cesed. (E. Remo 2016)

Dibêjin bi melkesê li hev nexin, zaroyê we çênabin. (E. Tekin 2016).

Pîrekê bi “çel” gerek derziyek çeloka bi derek xwe vekin. Lewma navê wê li ser e. “Derziya çel roja”. (Q. Güler 2016)

Sêl û beroşê bi tenî nebin malê. (R. Vural 2016)

Bi şev nenûkê xwe jê nekin. (M. Û. Hemê 2015)

Ava germ wer rijandin bivêjin “Bisimla” (M. Sönmez 2015)

Solê vajî bikeve erdê wan rast bikin. Ya na wê musîbetek bi serê xwediyê solê ve were. (R. Çakıl 2016)

Ê pê li nan bike, çavê wî yê kor bive. (Z. M. Qado 2015)

Porê pîreka gerek neyê dîtin. Wexta porê xwe şeh dîkin, porê wan ê bi şeh dikeve, dixin qulika û vedişêrin. (Z. M. Qado 2015)

Nan li erdê wer dîtin wî radîkin û maçî dîkin, datînin ciyekî bilind. (E. Remo 2016)

Tiştêkî mere bikire, bira ne sê heb be. Çimkî sisê telaq e. (D. Özer 2016)

Em dibêjin derpiyê pîrekek jinbî şil bikin û bivin li serê zilamekî sofî bixin, wê baran bibare. (Q. Guler 2016)

Wextê heyv dihat girtin, me li teneka dixist. Heger mere wer bike wê heyv vebe. (N. Tur 2016)

Wexta bûkê ji mala bavê wê derdixin xwesiya wê destê xwe datîne ser serê wê dibêje: “Biraqê bûka me di bin ehemiyeta me de be.” (B. Erol 2015)

7. LÎSTIKÊN GELÊRÎ YÊN XORT Û ZAROKAN

Lîstikên ewil yên zarokan xwe bi xwe ne. Zarok di dergûşa xwe de yan jî dema pêşîra dê dimijin, herwiha di qadên din de bi şêweyên cur be cur ji xwe re dilîzin. Yan dengêkî derdixin, an bi mirov re dikenin. Piştî van ceribandinan bi ser niga dikevin û îca dest bi lîstikên bi hevalan re dîkin. Ne tenê zarok, herwiha ciwan û temenmezin jî bi riya lîstîkan çêjê ji jiyane distînin û demên xwe bi lîstîkan dibuhirînin. Cureyên lîstîkan û şêweyên wan gelek in. Digel lîstikên bi du alîyên dijber ên ji bo ku hêlek biser keve têne lîstin, lîstikên ku bi hev re ji bo demek xweş bê bihurandin an jî lîstikên ku bêyî bi yekî din re werin lîstin û her kes ji xwe re dilîzin jî henin.

Dema em ê behsa lîstîkan bikin weke Boratav jî gotiye “Lîstikên têkiliya wan bi kevneşopiyên xwecih re nema bin, ne di nava tixûbên lêkolînên me de ne.” (Boratav, 2003: 296). Çimkî em li ser lîstikên gelêrî disekin. Li derdora Dêrikê lîstikên gelêrî niha ketine qadeke teng. Çimkî mezin êdî ji lîstikên gelêrî bêhtir bi lîstikên teknolojîk ên weke di telefon û tablêtan de; an jî bi lîstikên ku xwedî qaîdeyên navmiletî yên weke poker, okêy û fitbolê dilîzin. Zarokên li dibistanan hînî lîstikên din dibin û êdî mamikên bi Tirkî di lîstikên xwe de bikar tînin lewma hêdî hêdî ji bandora lîstikên çandî yên herêmî dur dikevin.

7.1 Li Dêrikê Awayê Hinek Lîstikan

Li Dêrikê ji xeynê qaîdeyên hundir lîstikan, ûsûl û reûresmên berî lîstikê û piştî lîstikê jî henin. Li gorî me ji kesên çavkanî veguhastiye awayê lîstikekê li Dêrikê û gundên wê kêr zêde wiha ye:

Ewil lîstikvan li cihekî kom dibin ku piranî qadên lîstikan ev der in: Hewşa dibistanan, meydanên gund û taxan, yan jî kuçên xewle. Carinan jî nav avê dibe cihê lîstikan ku gelek lîstikên nav avê jî hene. Lîstikvan bi gotinên wiha hevdu vedixwînin lîstikê:

*“Heçê neyê lîskê
Pelpel û qalûçkê
Qalûçka dermana
Firiya çû ezmana”* (S. Sönmez 2015)

Piştî vê gotinê lîstikvanek hejmarokekê dijmêre. Komek dibe pîra lîstikê û lîstik dest pê dike. Di lîstikên ku bêyî zûgotinokan dest pê dikin de du jîrik tên hember hev, yek ji yekî re dibêje:

- *Heval bi heval...* Yê hemberê jî dibêje:

- *“Bigre heval”* Li ser vê peyvê yê dinê dest bi bijartina hevalan dike. Heval tên girtin û di pê re dilîzin. Di hûndir lîstikan de kesên lîstikvan jî gotinên wiha dibêjin:

“Heçê berê, gula zerê”, “Ez ez im, ez gurê pez im”, “Ne bi zorê, bi dorê” (S. Vural 2016) Lîstik diqede û pêve ji nav komê lîstikvanekî giregir vê zûgotinokê dibêje:

- *Çi di bin nigê mi de ye?*

“Ta û derzî”

- *Herkes here mala xwe vîz vîzî* (F. Deniz 2016) li ser vey herkes belav dibe û ber bi malê ve diçe.

7.2. Lîstikên Sereke yên Herême

Li Dêrik û gundên wê lîstikên ku di roja me de tên lîstin ev in:

DL- 1

Qunşikalk: Ji bo ev lîstik were lîstin kêmanî gerek mere sê heb bin. Heger zêdeyî sisiya be lîstik xweştir dibe. Berî lîskê⁴⁹ gede hevdû dijmêrin. Jimartin li ser kê bi dawî bive, ew çavê xwe bi simalekê girê dide. Ê maye jî şekal ya jî tişteki din li qûna wî yê çavê xwe girtiye dixin. Yanî bi şekalekê li qûna hev dixin. Hinek bi destê xwe tepa û tilîka li qûna hev dixin, ji vê re dibêjin “Tilîpînk”. Ê çavgirtî heger zanibê bê kê li wî xistiye, ya jî yekî ji wan bigre çavê xwe vedike xwe xelas dike. Di pê re îca ê hatibû girtin çavê xwe digire. Lîstik bi vî hawî dewam dike. (M. Ê. Hemê 2015)

Navê lîstikê bêjeyeke bihevketî ye. Herdu bêjeyên hêmanên sereke yên lîstikê jê re bûne nav. “Qûn” û “şikâl (şekal)”. Lîstik minasib e ku him di cihê girtî de û him jî di qadên vekirî de were lîstin.

DL- 2

Malek Mi Heye: Ev lîstikeke tederxistinokî ye. Piranî bi şev tê lîstin. Gelek car dema raketinê, di nav nivînan de tê lîstin. Lîstikek weke mamikan jî tê hesêb. Lêbelê ne bi qalibekî standard e, guherbar e. Bi şeweya xwe ne weke mamikên din e. Ji ber vê yekê me weke lîstik qebûl kir. Lîstik li ser hejmara kesên malbatên derdora meriv in. Lîstikvan bi dor ji hev pirsan dikin û li bende bersiva kesên din disekinin. Kesên me yên çavkanî ev lîstik wiha veguhastin:

“Wextê ewil mere yê bilîze, mere wa dibêje:

Malek mi tê tê,

Li ber çemê Firête

Ardek ji wê tê

Li ber bê tê”

⁴⁹ Lîstik

hinek jî wer dibêjin:
“Malek mi tê tê
Li ber qurmê Firêtê
Hûrik hûrik ardê xwe dibê tê
Canîka suklêtê” (A. Deniz 2015)

Dibe ku li hinek deveran gotinên qalibgirtî ên serê lîstikê bi awayên wekî din were gotin. Weke mînak:

“*Malek min tê tê*
Tajî bi dû kerê te tê” (Barik, 2015:40).

“Di pê re tê bipirse. Li ser meselê “Malek mi heye: Bi du keçik û sê lawik; dê û bavê wan e. Gelo ev mala kê ye?” Îja ê dinê difikire. Heger pê derxe dibêje: “Mala filankeso ye”. Pê dernexe dibêje: “Mi gurçika cinnetê da te” ya din dibêje: “Mi tasika Hecê da te”. Wê çaxê mala kê be, em ji hev re rast dibêjin. (A. Deniz 2015)

Li gorî nêrîna Boratav jî divê ev çalakî ne weke mamik, weke lîstik were qebûlkin. Li gorî Boratav xala ku mamik û lîstikê ji hev vediqetîne ev e: “Di nêrîna ewil de mamik weke cureyeke lîstikê tê zenkirin. Jixwe cureyên lîstikan yên bi mamikan jî henin. Lêbelê xala ciyawaz ku mamikê ji van lîstikan vediqetîne ew e ku di mamikê de hebûna qalibê peyvê, yê beşa pirsê ye ku bersiva bêyî li ser were nîqaşkirin ji berê de hatiye qebûlkin.” (Boratav, 2014: 125)

DL-3

Gurko Pez: Çend gede xwe didin ser hev. Yek dide pê yekî. Ê xwe bide pêşiyê ew gur e. Wanê din jî dibin pez. Yanî ewê wan av bide. Dibêje:

-Pezo avê vexwe gur tune, pezo avê vexwe gur tune.

Û îca bi carekê xwe davêje çingûrê yekî. Wî ji hevala diqetîne. Ê din jî direvin, bela dibin. (Y. Ş. Eysê 2015)

DL-4

Dengekî Bang Ke (Veşartok, Beradank): Gede ji xwe re bi şev dilîzin. Mere dibin sê çar kom. Li nav neqeb û kuça bela dibin, xwe vedişêrin. Heger havîn be li ser bêndera jî tê lîstin. Her kî pîra lîstikê be ew xwe venaşêre, ew ê bivêje:

- Dengekî bang kin, dengekî bang kin” yani deng bibihîze, ew ê ciyê wan pê derxe. Komê xwe veşartîne jî ciwabê didinê, dibêjin:

-“Em li vir in.”

Paşde li gorî texma deng li wan digere. Heta hevdu bivînin. Kîjan ewil were dîtin, gerek ew weri bivi pîra lîskê. (M. Ê. Hemê 2016)

Li herêmê sê navên ji hev cihê li lîstikê kirine. Ev jî ji ber piralîbûna lîstikê ye. Him veşartin, him şopandin û him jî bang kirin tê de heye.

DL-5

Qayiş: Bi du şexsa ya jî bi du koma tê lîstin. Ji bo lîskê gerek qayişek mere hebe. Lîsk li hundirê mala tê lîstin. Komek derdikeve derve, koma di jî li hundir dimînin. Ê manin qayişekê vedişêrin. Vedişêrin û pêv, ban koma derve dîkin. Îca koma dinê tèn li wê qayişê digerin. Heger qayişê bivînin, wan didin ber qayîşa. Yanî bi wê, li wanê qayiş veşartîbûn dixin. Heger nebînin vê carê îja koma qayiş veşartîbûn qayişê ji ciyê veşartî derdixin û li wanê dinê dixin. (N. Ertekin 2015)

DL- 6

Qîtik: Mere du kevira didi ber hev. Gerek şuxlê bihostekê dûrî hev bin. Darqîtikekî datînin ser herdu kevira. Aliyekî oyinciya ji ber kevira dur dikevin. Ê di jî bi darê xwe yî dirêj wî darqîtikî ji ser kevira bilind dike û lê dixê, davêje hêla wanê dinê. Tew hinek darqîtikê danînin ser kevira. Di destekî de darê dirêj heye, bi destê di jî darqîtikê davêjin hewa û lê dixin. Ewên din heger wî darqîtikî li hewa bigrin, ew qezenc dîkin. Ya na darqîtik li kuderê bikeve erdê îca ji wir darqîtikê radihêlin, davêjin ber wa kevira. Darqîtik çuqas nêzîkî kevira bikeve, huqasî ji wan re baş e. (N. Ertekin 2015)

DL- 7

Şaqûl: (Xar): Derbiharî de hema erd hebekî nerm bive heçê gede û xort bi şaqûla dilîzin. Berêvarî li ber mektebê ya jî li bêndera xortê gîhaştî cihê û gede jî cihê dilîzin. Ewil em keda xwe dixin erdê. Keda ya perê hesinî ye ya jî kapaxê şûşa nin. Mere du sê metra ji kedê dur dikeve û çixêzekê xêz dike. Dahrin ser xêzikê û ji wir şaqûlê xwe davêjin kedê. Ê li kedê dixê radihêle kedê, paşiyê şaqûla xwe dûr davêje. Ê din vê carê şaqûlê xwe davêjin şaqûla xwediyê kedê ji bo kedê vegehrînin, jê bistînin. (R. Çakıl 2015)

DL- 8

Qûç û Qadî: Ev lîstik bi erdnîgariyê re jî hebekî têkildar e. Çimkî ji serî heta dawî amûra sereke ya lîstikê kevir in. Kevirên reş li derdora Dêrikê gelekî zêde ne. Xortên pezê xwe diçêrînin gelek caran bi van lîstikan demên xwe dibûhirînin. Lîstik wiha tê lîstin:

Gerek ewilî mere sê qûçê kevira li kêlaka hev lê bike. Her qûçek gerek bi heft kevira be. Li ber her sê qûça kevirêkî bi tenê jî mere datîne erdê. Navê vî kevirê bi tenê “Qadî” ye. Koma qarşiya mere jî li aliyê dinê mîna mere sê qûç û qadiyekê datîne erdê. Îja mere herdu alî jî çend kevirê biçûk radihêle dest xwe. Bi dor mere wa kevirna davêje qadiyê hev. Eger mere li qadî bixe, îja mere bavêje qûça jî. Meqsed ew e yanî bi kevirê destê xwe, xerakirina qûçê aliyê dinê ye. Kî ewil bixe ê din gerek kincê xwe ji xwe bikin, mere wan tazî dike. Le li derna kes kincê hev ji hev nakin. (Y. Dengiz 2015)

DL- 9

Lîstika Şeva Dawetê: Hêla vê oyinê yî xweş, gerek hinekên berê bi vê oyinê nelîstibin di nav mere de hebin. Yek derdikeve ortê dibêje: “Oyinê dest pê kir. Ji niha û pê ve gerek tu kes ji peyva mi dernekeve.” Herkes qebûl bike, dewam dikin. Heger yekî nexwaze bi peyva wî tevbîgere hebe, ji serî de kare veqete. Kî oyinê birêve dibe ji herkesî dixwaze bê her kê navê heywanekî ew gelekî jê hez dikin bivêjin. Herkes ji kîjan heywanî gelekî hez dike, dibêje. Ew jî navê wan tevda di hişê xwe de digre. Piştî herkes dibêje û pêve vedigere serê şexsê ewil jê re dibêje:

-“Te navê filan heywanê/î gotibû. De ka îja bivêje ez lawê wî tiştî me.”

Îjarê mesela hinek dibêjin: “Ez ker lawê kera me.” Ya ez “Kûçik lawê kûçik im.” Ê berê bi vê lîskê zanibin, di serî de dibêjin “Ez ji şer hez dikim.” (Ş. Silêman 2016)

DL- 10

Hingulîsk: Ewil civatek kom dibe. Biçûk mezin ferq nake. Yekî ji nav xwe derdixin derve. Yekî dinê jî derdikeve ortê û hingulîskê dide yekî di nav civatê de. Ê rûniştî jî her kê destê xwe digrin, dikin hutik û dirêjî pêşîya xwe dikin. Ba ê li derve dikin. Jê dipirsin, dibêjin: “Ka hingulîsk di destê kê de ye?” Heger pêdernexe, bi dar lêxistinê dixwe. Îjar pê derxe, jê û pê ve ew tê ortê û oyinê dimeşîne. (M. Ertekin 2015)

Miletên li Dêrik û derdora wê bi cih bûnin mîrateke dewlemend a çandî li pey xwe hiştine. Di encama lêkolînan de hat dîtîn ku di gelek warên jiyane di encama pratîkan de tecrîbe hatine bidestxistin. Ev tecrîbe niha bûye malê tevahiya şênîyên herêmê û di riya jiyane de rêhevaltiyê bi wan re dike.

Divê were zanîn ku milletên xwedî çandên kevnar û dewlemend, nabe ku çanda wan tenê li ser mijarên civakî be. Çimkî dest û mêjiyê wê çandê ava dikin, elbet xwedî hest û ramanên edebî ne jî. Ev rewş ji bo sehaya me ya xebatê jî derbasdar e. Heta aniha di xebata xwe de em li ser hêlên jiyana civaka Dêrikê yê maddî û manevî sekinîn. Di beşa duyem de em ê hewl bidin herêmê ji hêla edebî bidin naskirin. Bi vî rengî wê wêneyê zargotina herêmê derkeve holê. Ji vê hêvî ewe ku Dêrik û derdora wê bi tevahî, bi hemû ûnsûrên xwe yê çandî were naskirin.

BEŞA SÊYEM

EDEBIYATA GELÊRÎ

Li gor merhale û serencamên jiyânê hêst, raman, xewn û xiyalên mirovan bi riya zimanên wan her car dikevin qalibên nû yên gotinê. Ev qalibên gotinê ji hev vediqetin û çeşnên edebî yên folklorê derdixin holê. Her nifş van çeşnên folklorê hildigrin, wan bikar tînin. Tiştan li wan zêde dikin; carinan jî tiştan wenda dikin û bi vî awayî neqlî nifşên li pêy xwe dikin. Bi vî awayî zargotina civakan ava dibe. Di vê beşê de em ê li ser keresteyên zargotina civaka Dêrikê bisekinin.

1. Edebiyata Gelêrî ya Dêrikê

Em dikarin beşên Edebiyata Gelêrî ya Kurdî weke cureyên pexşan û cureyên bi nezm rastî tesnîfekê bikin. Di vê xebata xwe de me ji herdu cureyan mînak ji herêma Dêrikê berhev kirin. Di dema berhevkirinê de xala balkêş ew bû ku her cureyekî vê edebiyatê bi gelek guhartoyan li nav civakê belav bibû. Ev rewş ji hêla zanyaran tişteki asayî tê dîtin: “Edebiyata devkî edebiyateke guherbar e. Afirîner ku vebêjer e û vê edebiyatê pêşkêş dike, di her pêşkêşiyê de gotinê dixwe nav guherînen piçûk an jî mezin. Ji ber vê sedemê edebiyata devkî bi şeweyên bê jimar belav dibe” (Artun, 2010: 49). 32 varyantên “Siyabendê Silvî”⁵⁰ ku ji hêla Heciyê Cindî hatine tomar kirin di Edebiyata Gelêrî ya Kurdî de mînaeke herî baş e ku vê îddîayê piştrast dike.

⁵⁰ Heciyê Cindî û Emînê Evdal, Folklorê Kurmanca, Weşanên Avesta, Stenbol, (2008)

Di derbarê vê cudatiya di nav forman de Propp wiha dibêje: “... *Di vir de ya girîng ew e ku guherbarbûna folklorê rastiyeke e, dema bi neguherbarbûna edebiyatê re were miqayesekirin. Çimkî folklor bixwe her daîm di nav guherînekê de ye*” (Prop, 1998: 73). Li ser vê bingeha jorîn, Propp di derbarê tekstên folklorîk de dibêje kesên icraker tekstê bêje bi bêje neqil nakin, hin guherînan jî di tekstê de dikin. Herçiqas folklorê herêma Dêrikê li ser bingeheke hevbeş ava bûbe jî cîyawaziya di navbeyna keresteyên devkî de gelekî zêde ye. Di vê xebata xwe de em zêde bi pey guhartoyan neketin. Formeke çeşnekê ku me bidest xist em li pêy formê wê yê din negeriyên û me tenê ew form di vir de qeyd kir. Di hinek cihên hewce de teşbîh û cudahiya di navbeyna formên ji hev cihê hatine nîşandan. Keresteyên Edebiyata devkî ya herêma Dêrikê yê me bidest xistin ev in:

1.1. Cureyên Pexşanî

Di bin vî sernavî de mînakên ji mijarên weke çîrçîrok, pêkenokên gelêrî, memorat, efsane, biwêj, gotinên pêşiya, têgehên sondxwarinê, nifir-dia, gotinên qalibgirtî û navnûçik hatine senifandin.

1.1.1 Çîrçîrok

Cureyekî pexşan e. Mijarên wan qehremanî, evîn û bûyerên din ên efsûnî ne. Hêzên derasayî, sêhr, rewşên dûrî aqlê mirov di naveroka wan de cih digrin. Tiştên di cîhana rasteqînî de ku ne mimkin e biqewim in, di çîrçîrokan de di rewşeke asayî de diqewimin. Gelek caran ji xeynî mirovan, candarên wekî din an jî objenî bîcan dibin qehremanên çîrçîrokan. Lêkolîner Çiya Mazî pênaseya çîrçîrokan wiha dike:” Bûyerên ji xeyalên gel derketine û van bûyerana di jiyana rastîn de nayê dîtî an bi tûmî an jî hinekî ji jiyana rastîn bi dûr inGelek carî bi kesayetiyên nedîtî û bûyerên nedîtî neqîşkirî nin” (Mazî, 2014:353).

Di çîrçîrokan de zanîn û tevgerên mirovan berovacî rewşa serdest dibin. Gelek caran ajal û heyinên din dipeyivin û dibin xwedî hêst û raman; şîreta li mirovan dikin. Di çîrçîrokan de cih û dem ne diyar in. Gelemperî bi zûgotinokan dest pê dikin û herwiha bi zûgotinokan jî diqedin. Di navîna çîrçîrokan de jî gelek caran

zûgotinok henin. Em dikarin bi saya naveroka çîrçîrokan di derheqê demên borî de di warên aborî, çandî û civakî agahiyên girîng bi dest bixin. Elbet ji bo ev yek baştir bi cih were divê çîrçîrok bi awayê resen were qeydkirin.

“Rêbaza baştirîn ji bo danheviya çîrokê, mayina li ser reseniya çîrokê ye. Bi çî awayî hatibe vegotinê, divê berhevkar wisa derbasî nivîsê bike. Peyvik û hevokên wê neguherîne çêtir e. Çîrokek bi gelek guhartoyên xwe, li ciyên cihê cihê, bi awayên cihê cihê, ji hêla çîrokbêjên cihê cihê dibe ku bête vegotin. Dixwazî bila di motîf û sembolên heman çîrokê de wekhevî an cihêrengî hebe, dîsa jî, ji bo çareserkirina muşkuleyan berhevkar hewceyê wan e” (Meretowar, 2014: 16).

Li sehaya Dêrikê vegotina çîrçîrokan bi taybetî jî li gundên dûrî navendên mezin hê berdewam e. Li navenda bajêr jî çîrokbêjî heye. Lê elbet çîrokbêjiya aniha ne ew cure ye ku weke demên berê gelek kes lihev diciviyên û ji devê çîrokbêjekî çîrok guhdar dikirin. Bes niha malbat piranî di şevên dirêj de, di nav xwe de çîrçîrokan ji hev re dibêjin.

Weke di çîrçîrokên Dêrikê de wê were dîtîn, nêzikaiyek gelekî xurt di navbeyna çîrçîrokên herêma Dêrikê û çîrçîrokên civaka Ewropa yên meşhûr de henin. Di berhemên edebiyata devkî de carinan li heman deverê formên cihê cihê; yan jî li deverên dûrî hevûdu formên gelekî nêzî hev derdikevin holê. Di derbarê wekheviya forman de nêrînên cuda henin “Li gorî Ratzel di bingeha teşbîhê de gelek koçên dîroka mirovahiyê yên tespîtûyî yan jî nebûyî cih digrin. Dema mirovan koç kirine berhemên çanda xwe jî bi xwe re bar kirine û di vê encamê de jî di civakên jihev cuda de derketina afirandinên wekhev bûye behsek”(Artun, 2009: 64). Yanî şêwe, form û civak gelek caran ji hev dur bikevin jî, motîfên çîrçîrokan gelek caran yek in.

Di berhevkirina çîrçîrokên herêmê de pîrsgirêka herî mezin cudahiya formên çîrçîrokan e. Lewra di gundekî de cure cure formên heman çîrçîrokê hene. Carinan kesê vebêjer bixwe ku bi çend rojên navbêr me lê guhdarî dikir di her carekê de formeke din ya çîrçîrokan ji mere digot. Vegotin di heman mijarê de carinan dirêj bû, carinan kurt dibû. Di bin sîwana çîrokbêjiya çavkaniyên me yên vebêjer, em dikarin di derheqê çîrokbêjiya Dêrikê de van tiştan bêjin:

Li navenda bajêr û li gundan piranî vebêjerê çîrokan jin in. Zilam jî çîrçîrokan dizanin lê ne bi qeysa jinan. Çîrçîrok piranî di şevên dirêj de yan jî di demên ku

cereyan tune be tèn vegotin û guhdarî kirin. Mixabin televizyon, kombers, telefon û çûyina qehwexaneyan vegotina çîrçîrokan xistine qadeke teng. Çîrçîrokên herême piranî bi vê zûgotinokê dest pê dikin:

“Hebû tunebû

Kes ji Xwedê mezintir tunebû

Carekê ... hebû” Paşê kesê vebêjer dest bi çîrçîrokê dike. Bêjeyên despêkê gelek caran gotinên bi qalibê weke *“Zemanekî, wextekî, carekî, dibêjin li bajarekî”* dest pê dikin. Çîrokbêj di nav çîrçîroka xwe de gelek car ji guhdarvanan re dibêje:

-*“Bivêj êêê “guhdarvan jî her car dibêjin:*

- *“Êêê”*. Bi vî hawî çîrokbêj dixwaze bala guhdarvanan her dem li ser çîrokê bihêle. Carinan ji ber hinek rewşên dûrî aqilan, ji bo pêşiya bertekên guhdarvanan bibire, çîrokbêj ji guhdarvanan re dibêje:

-*“De çîrçîrok e, ne me dîtîye û ne jî hûn bawer bikin.”* Guhdarvan dîsa jî carinan pirsnin di hişê xwe de ji vebêjer dipirse, bersivên xwe distîne. Çîrçîrok bi hinek gotinên qalibgirtî tèn bi dawîkirin. Mînakeke van cure gotinan yek jê ev e:

“Çîrçîroka mi çû giyara

Rihmet li dê û bavê guhdara

Ji xeynî şeytanokê ber dîwara”

Herwiha ji ber ku gelek car çîrçîrok di nav nivînan de dema raketinê tèn gotin, ji ber ku guhdarvan di xew re dahre, çîrçîrok jî gelek car nîvco dimînin. Çîrçîrokên me ji sehaya Dêrikê berhev kirine li gorî lehengên wan me bi du awayan dabeş kirin:

1.1.1.1. Çîrçîrokên Lehengên Wan Heyinên ji Xeynî Mirovan in:

Bi navekî dinê em ji van cure çîrçîrokan re dibêjin “fabl”. Weke tê zanîn qehremanên fablan ne mirov in. Lê bi riya taybetmendiyên ajelan gelek peyaman ji mirovan re bi riya fablan tèn şandin. Di zargotina me de fablên meşhûr henin: *“Şengê û Pengê, Çûk û Pîrê”* mînakên gelekî navdar in di çanda Kurdan de. “Fabil, cureyeke

wêjeyî ya dîdaktîk e ango armanca vê cureyê fêrkirin û şîretdayin e. Fabil alegorîk e ango tiştên ku dixwaze bide, pêşî dişibenîne tişteki din û paşê dide. Bi gelemperî ev cure nivîs bi navê xwe yê resen fabil belav bûye. Peyva fabil bi zimanê latinî ye û tê wateya çîrokê.” (Dîzman, 2016)

Ji wan nivîsên bûyerî ku lehengên wan ne mirov; sewal û lawir in û bi mebesta rexnekirina kesan an jî bi armanca dersdana mirovan hatine hilberînê re “fabl” tê gotin. Çeşnê fablê, ji ber sedema ku edebiyatzanan bizaf nekirine rasterast kesan rexne bikin, bi taybetmendiyên sewalan ev kes rexne kirine. Bi vî awayî ev çeşnê edebî derketiye. Bela ku hin taybetmendiyên awarte jî hene di vî çeşnê de, jê re “çîrok” jî hatiye gotinê. (Meretowar, 2014: 216)

DÇ-1 (Dîk û Pîrê)

Hebû, tunebû Pîrek hebû. Rokê Pîrê dahnê xwe dikelîne û ji bo îşk bive li ber tavê radixîne. Dîkekî birçî tê û niklê xwe li wî dahnî dixê. Pîrê bi hêrs radihêle kevirekî û davêje dîk. Çima kevîr li çavê dîk nakeve? Feqîro çavê wî dirje. Dîk radibe ser xwe û ji wir dahre û bi xwe bi xwe dibêje:

-Ez ê herim eskerekî giran

Bînim ser Pîra du diran

Ji bo hebek dahn

Çavê mi rijand⁵¹

Dîk bi rê ket û meşiya. Di rê de li kerekî rast hat. Ker bang kirê go: “Ha Dîko!” Dîk fitilî hêla ker, jê re go:

-Dîko û qizelqurt! Bivêje “Apê Dîk” Ker go:

-“Apê dîk tu bi ku derê dahre?” Dîk go:

-Ez ê herim eskerekî giran

Bînim ser pîra du diran

Ji bo hebek dahn

Çavê mi rijand

⁵¹ Di berhevokên berê ya vê çîrokê de varyanteke çarînan wiha ye:
“Ez ê herim çol û çolistan, şar û şaristan
Bînim komeke giran li ser pîra bêdiran
Çavê min dêraniye ji bo lêkdanê” (Amêdî, 2013: 266)

Ker go: Tu mi jî bi xwe re nabe? Dîk go: “Ka were.” Bi hev re bûn heval û meşyan. Çûn çûn li marekî rast hatin. Mêr jî ban kirê go:

-“Dîko, dîko!”

Dîk go: “Dîko û mirina bin dilê te, bivêje Apê Dîk.” Mêr go: “Apê dîk tu wa hêrs bûye, xêre tê bi ku de here?” Dîk go:

-Ez ê herim eskerekî giran

Bînim ser Pîra du diran

Ji bo hebek dahn

Çavê mi rijand

Mê'r go: Tu mi jî bi xwe re nabe? Dîk go: “Tu jî were.”

Her sê bi hev re meşyan û çûn. Di rê de li gindorekî rast hatin. Gindor ban dîk kir go: “Dîko!” dîk lê vegerad go:

-“Weyla bê edeb, bivêje Apê Dîk.” Gindor go:

-Apê dîk hûn ê herin kî derê? Dîk ji wî re jî go:

-“Ez ê herim eskerekî giran

Bînim ser pîra du diran

Ji bo hebek dahn

Çavê mi rijand”

Gindor go: “Apê Dîk, tu mi jî bi xwe re nabe”. Dîk go: “Ka tu jî were.”

Îjarê her çar dibin heval, radibin bi hevve vedigerin tên mala Pîrê. Mar dahre xwe li histûna malê badide. Gindor dahre li ser xênî disekine. Ker xwe dide ber deriyê mala Pîrê. Dîk jî xwe dide rexekî hewşê. Ker du sê dengê dizure. Pîrê dibêje hela ez derkevîm derve. Pîrê destê xwe davêje histûnê mar pêvedide. Dike hewar direve derve derî vedike, ker zîtokekê li ser sînga wê dixê. Dikeve erdê gindor ji ser xênî bi ser de tê xwarê. Dîk jî bi nikila li ser çavê wê dixê û çavê wê dirjîne. Heyfa xwe ji Pîrê hiltîne. (Z. M. Qado 2015)

DÇ-2 (Kew û Rêvî)

Go rêvî rokê çûye ser sergo li şekala bigere. Li wir li dîkekî rast tê. Rabû ji dîk re go:

-“Ka ez û tu em bivin birakê hev.” Dîk jî go: “Temam, em bivin.”

Bi hev re bîskeke dimeşin. Tê di nav avê de werdekekê dibînin. Rêvî ji wê re jî dibêje:

-“Ka wer tu jî bive birakê me.” Werdekê qebûl kiriye û wê jî daye pê wan. Her sê heval hatin ber camiyê kewek dîtin. Rêvî ji kewê jî re gotiye: “Ka were em bivin birakê hev.” Kew jî bûye birakê wan.

Rêvî ji wan re dibêje: “De hey em bûne birakê hev, bi Xwedê ew îro çer bive jî ez we bernadim. Hûn ê îşev werin li mala mi bivin mêvan. Ez ê şîvê ji we re çêbikim.” Her sê wê şevê li mala rêvî bûne mêvan. Êvarê rêvî ji dîk re gotiye:

- Birako ma tu li ser sergo nigê xwe li gû dixwe û tu radibe îja azana şîrîf dixwîne. Ma qetla te ne helal e? Dik gotiye:

- “Wele birako tu zane. Ma ka ez ê bivêjim çî.” Xwe çeng dike serê dîk û wî dixwe. Di pê re rêvî difitile hêla werdekê ji wê re jî dibêje:

-Ma tu xwe di nav avê de vedigevizîne, xelq jî bi wê avê destmêj digrin. Pê hevîrê xwe distrên, wê avê vedixun. Ma qey qetla te jî ne helal e? Werdekê go:

-“Birako wele rast e.” Radibe serê werdekê jî ji laşê wê diqetîne, wê jî dixwe. Îja ji kewê jî re go:

-Ev her sibe qeqeba te ye. Tu xelqê ji xewa şêrîn radike, ma qetla te jî ne helal e? Kewê gotiye:

- “Wele birako erê meletiya mi heye, le tu çêtir zane bê qetla mi helal e ya na.”

Bi çungûrê kewê digre û wê dike devê xwe. Berî wê bicû kew jê re dibêje:

- Ma birako gelo tu yê mi li ser kîjan mezhebî bixwe; ma ez nizanim ka tu Henefî ye ya tu Şafîî ye? Rêvî devê xwe vedike, dibêje:

-“Ez Şafîî me.” Wexta rêvî devê xwe vedike û dipeyive, kew difire xwe ji devê wî xelas dike. (X. Xatûn 2016)

DC-3 (Helhelîsk û Pelpelîsk)

Dibêjin carekê bizinek û du karikê wê hebûn. Bizin her ro ji karikê xwe vediqetiya, diçû çêrê. Wexta bizin ji cem wan vediqetiya digo:

“Ez ê herim zozana

Bixwim pelê qizwana

Şîr têkeve guhana

Ez ê werim dahna”

Ji karikê xwe re dîgo: Binerin heger kî were jî derî lê venekin. Ê mi ez vegerim ez ê bivêjim:

Ciya we çûye zozana

Xwarî pelê qizwana

Şîr ketiye guhana

Ciya we hat dahna

-Wexta mi wa go, hûn karin derkevin derve. We fam kir? Helhelîsk û Pelpelîsk gotin:

-“Erê yadê.” Rojekê wexta bizin ji çêrê vedigeriya malê gurekî da pê wê. Lê nerî bê bizin tê ber malê û dibêje:

Ciya we çû zozana

Xwarî pelê qizwana

Şîr ketiye guhana

Ciya we hat dahna

Li ser vê gotinê du karik ji hundir derdikevin û tîn guhanê ciya xwe dimijin. Gur go: “Tu bisekine, îjar ez ê vana bixwim.” Bû sibe. Bizênê dîsa xatir ji karikê xwe xwest û çû çêrê. Di pê wê re gur hat ber derî sekinî û ban kir, go:

Ciya we çû zozana

Xwarî pelê qizwana

Şîr ketiye guhana

Ciya we hat dahna

Helhelîsk go: “Waye ciya me hat.” Pelpelîsk go:” Na kuro ev ne dengê ciya min e.” Yekî go ez ê derî vekim, ê dinê go na. Virde wêde Helhelîsk derî vekir. Hema derî venebû, gur xwe çeng kirê û ew dabeliand. Pelpelîsk ji tirsê, xwe veşart. Gur tîr bû û vegeriya çû. Êvarî bizin vedigere malê dinere derîyê malê vekiriye. Pelpelîsk direve pêşiya ciya xwe jê re hal û meselê dibêje. Bizin dilezîne ber bi

qulika gur ve dahre. Ban dikê dibêje: “Te Helhelîsk çawa kiriye.” Gur dibêje: “Mi neditiye.” Bizin dibêje: “De binere, ez ê aniha bang bikimê hela ez binerim bê te xwariye ya na.” Ban dike:

-“Ciya we çû zozana
Xwarî pelê qizwana
Şîr ketiye guhana
Ciya we hat dahna”

Hema wer nabêje, Helhelîsk ji zikê gur ban dike dibêje: “Meee.. meee.” Bizin derhal qilochê xwe li zikê gur dixîne û Helhelîsk ji wir derdixe. Gedekê xwe dide dora xwe vedigere tê malê.

Çîroka mi çû giyara
Rihmet li dê û bavê guhdara (N. Ertekin 2015)

Weke tê zanîn gelek varyantên vê çîrokê li seranserê Kurdistanê henin. Herwiha di nav milletên Ewropa de jî guhartoyên vê çîrokê henin. Li sehaya Dêrikê çavkaniyên me bi varyantên cihê cihê ev çîrok vegotin:

Di varyantekê de navê herdu karikên leheng “*Hebîlko û Cebîlko bû*” (Z. M Qado, 2015)⁵²

Di varyanteke din de, kesekî xwediyê bizinê heye û ew ji bizinê re dibêje ku gur karika wê xwariye. (X. Xatûn, 2016)⁵³ Ji ber ku mijara me ne edîsyon-krîtîk e û avahîsaziya çîrokan e, di vê xebatê de me cih da varyantekê tenê.

2. Çîrcîrokên Lehengên Wan Mirov In

DC-4 (Gurî û Pîrê)

Hebû tunebû lawikekî Gurî hebû. Ev lawkê Gurî bêkes û bêxwedî bû; feqîr û belengaz bû. Fam kiribû bê bi xizanî û feqîriyê îş nameşe, rabû ji xwe re li karekî

⁵² Varyanta Maşmaşkê

⁵³ Varyanta Xîrarê

geriya. Bi ger û ger gihaşt gundekî, cem Pîrekê. Sê keçikê vê Pîra hebûn. Xelkê derdora wê ji wê re digotin “Pîra Sêhr”. Gurî ji Pîrê re go:

-“Pîrê ez ji xwe re li karekî digerim”

Pîrê go: “Ka were hema li cem mi bimîne.” Gurî ma li cem Pîrê û bû xizmetkarê wê. Ji wê re erd cot dikir, paletî dikir. Hema karê malê çiba tevde wî dikir.

Çendek derbas bû rokê wextê Gurî ji cot vegeriya malê, lê nerî sê zilam li hundir rûniştine. Gurî ecêbmayî ma. Miraq kir bê van zilamna çima hatine vir. Çimkî li wê derdorê heçê Pîrê nas dikirin, qet nedihatîn mala wê. Herkes ji wê ditirsiya. Bû ewar, şîv hat ber wan. Pîrê ji mêvana re sênî û kevçiyê xwe yê zêrînî danî ser sifrê. Mêvana bi kevçiyê zêrîn, xwarina di sênîkê zêr de xwarin. Piştî şîva, Pîrê ji bo nivîna raxe derket derve. Gurî bi dizî nezîkî mêvana bû, ji wan pirsî:

- “Gelî mêvana, gelo hûn li çi digerîn. Ma qey hûn nizanin bê ev Pîra me, Pîra Sêhr e û mere serjê dike?” Mêvana go:

-Na Welle! Ma em ê ji ku derê zanibin. Tu zane em rêwî ne, em kesekî li vê mintîqa nas nakin. Li me bû êvar. Me go mêvan mêvanê Xwedê ye û em ê dagerin cem vê misilmanê. Va wek tu jî dibîne şev nîvê şevê ye. Di vî wextî de jî em nikarin herin tû derek dinê. Heger çawa be jî mecbûr em îşev li vir bimînin.

Gurî go: Ê de hela ka em ê binerin û bivînin bê Xwedê çawa dike.

Bi hev re şevbêrka xwe kirin, di pê re mêvan çûn nav nivînê xwe. Pîrê nivînê her sê mêvana li ser xênî li qunceke û ê her sê keçikê xwe jî li qunceke dinê raxistibû. Pîrê wê şevê raneket, kêr li serê tilîkek xwe xist; ji bo bişewite û xewa wê neyê jî piçek xwê bera birinê da. Pisîkek reş xist himêza xwe û carê digo:

-Pisîka reşik goştê xweşik, Pisîka reşik goştê xweşik

Gurî zanîbû wê Pîrê îşev çî bobelatê rabike. Ji bo vî hawî piştî keçikê Pîrê raketin û pêve rabû ser xwe, mêvan jî şiyar kir. Ciyê mêvana û ê keçikê Pîrê bi hev re guherî. Mêvan wek tişteke nebûye ketin nav nivînê keçikê Pîra Sêhr. Keçik jî gindêr kirin xistin nav nivînê xwe.

Destê sibê berî ro zelal bive Pîrê çû ser xênî. Kêra xwe derxist di wê tariyê de, da hustê keçikê xwe. Wê digo qey mi mêvan şerjêkirine. Bêdeng daket jêr. Şivaqê lêxist, Pîrê ji bo here cot ji malê derket. Wextê derket ban kir, got:

-“Gurî, va îro ez ji dêvila te dahrim ser erd ha, tu jixwe re vekeve.” Dûre jî zîvirî hêla keçikê xwe. Navê wan yekê go û jê re go:

- “Qîza mi hinek goşt ji ciya xwe re têxe qoşxanê, bîne ser erd.” Ma feqîra keçikê ji ku deng dahrê. Pîrê ew ji êvar de şerjê kiriye. Ew çû pêve Gurî û mêvan rabûn û dîtîn bê Pîrê çi tofanî rakiriye. Gurî ji mêvana re go:

- “Ê we hûn ji vir herin. Ez ê jî ji bo Pîrê nekeve şubha û venegere ji wê re xwarinê bivim.” Mêvan li hespê xwe siwar bûn û ji wir veqetiyên. Gurî jî kincê keçikek Pîrê li xwe kir, hinek goşt xist beroşekê û çû ser erd cem Pîrê. Dengê xwe şiband ê keçika Pîrê, go:

-Yadê ava mi ji te re navroja te anî. Karê mi li malê heye ez dîsa dahrim malê.

Pîrê dibetile, birçî dibe. Tê paçikê li ser beroşê radike. Bavooo! çi bivîne... Vegeriya malê derhal çû ser xênî. Hîna nuh fam kir bê bi şev wê bi destê xwe keçikê xwe şerjê kiriye. Qarînî vêket, bi hutika li sînga xwe xist. Ma çer bike jî hewante ye.

Îca em Pîrê li wir bihêlin û werin cem Gurî û her sê mevana. Wextê ew ji mala Pîrê veqetiyên her çar bi hev re bûn mêvanê Axakî. Çendakî li wir man. Çend ro derbas bû, di şevbêrkekê de ji mêvana yekî ji Axê re go:

-“Axayê mi, Welle ez bala xwe didim qesra te her ro mêvan têne û dahrin. Ji wan re xwarin çêdibe. Tu jî ne şexsekî kêmî xelkê ye. Le ev qesra te tiştêkî dinê lê heba wê gelekî xweştir ba.” Axê go:

-Gelo ew çi ye, ka bivêje?

Mêvên jî go: Axayê mi, çend şev berê em li cem mala vî lawkê Gurî mêvan bûn. Li mala wan sênîk û kevçiyê zêrîn hebûn. Xwezî awana li qonaxa te ba û te di wana de xwarin daniya ber mêvanê xwe. Şîva vê êvarê me xwar di sênîkê zêrîn de ba û me bi wan kevçiyê zêrînî bixwara ma wê çiqas xweş ba.

Axê go:

- Gelo ji we kî yê karibe here ji mere wan sênî û kevçiyê zêrîn bîne?

Mêvan giştik zîvirîn hêla Gurî û gotin: Weleh ji Gurî pêve tu kes nikare here bîne Axa.

Gurî go:

- “Law gelî mêvana, mi hûn ji Pîra Sêhr xelas kirin. Ma qey xelata we yê bi mi vekira ev bû. Ka ez ê çawa dîsa vegerim cem Pîrê, ma bi çi wecî ez ê herim wî gundî?” Axê go:

- “Weleh tu zane. Ya tê here û ya jî sibê ez ê serê te jê bikim?” Li ser vê peyvê Gurî bê çare ma û go:

- Emrê me ji Xwedê. De hespekî bidin mi ez ê sibê herim. Ka bê Xwedê çawa dike. Destê sibê Gurî ber bi rêya mala Pîrê ve bi rê ket. Wextê gihaşt cem mala Pîrê, dît bê Pîrê diponije û digrî. Wexta Pîrê, Gurî dît lê şaş ma. Xwîn li wê cemidî û çavê wê wek tasa vebûn.

Go:

-“Hey Gurîyo! Tu bi nigê xwe hat cem mi. Nuha kî kare te ji destê mi xelas bike. Ez ê te bikeritînim û te bihêrim.” Gurî li wê vegerand, go:

-Pîrê jixwe va ez li cem te me. Ez bi nigê xwe hatime û ez narevim tu derê. Mi perçe perçe bike û bixwe. Goştê mi li te helal e. Le berî tu mi bixwe ez ê tiştêkî ji te bixwazim.

Pîrê go:

-“Tu çi dixwaze?” Gurî go:

-Pîrê hema wek rojê berê ka dîsa ji mi re girarek bi rûn çêke û di wan sênîkê zêr de bide ber mi. Berî mirina xwe ez dixwazim careke din xwarina ber destê te bixwim. Piştê tu jî mi çer bike, tu serbest e.

Pîrê go: Ez ê ji te re çêbikim. Tişt pê nayê. Tu bixwe ji bo tu hîna qelew bive, goşt li te bikeve.

Pîrê ji wî re girarek bi rûn çêkir û xist sênîkek zêrîn û kevçiyê zêrîn da ber. Gurî ket ser sênîkê û xwar. Ji Pîrê re go: “Pîrê ez tî bû me.”

Pîrê go:

-Ê lawo tu jî zane ê mi ez avê venaxwim û av li malê tune ye.

Gurî go: Pîrê hema bi xêra xwe here ji mi re ji çem firek av bîne.

Pîrê go: Ê ka ez ê têxim çi law?

Gurî go: Hema wê safoka ber xwe bive û têxe wê.

Pîrê rahişt safokê û çû ser çem. Safoka xwe di avê dakir, le av tê de nesekinî. Dîsa tê dakir, dîsa nesekinî. Sê çar cara wa kir, lê nerî tu av nakeve safokê. Dev jê berda, vegeriya hat malê. Le çi bivîne? Ne Gurî û ne jî sênî û kevçiyê zêrîn. Tiştêk li mal nemaye. Piştî Pîrê çû ser çem Gurî sênî û kevçiyê Pîrê yê zêr giş da hev, xist tûrekî û dîsa li hespa xwe siwar bû, vegeriya qonaxa Axê. Pîrê dîsa li xwe xist, le wê çer bike. Gurî ji zefta wê çû.

Gurî gihaşt qonaxê, firaxê anî da ber Axê. Go:

-“Avaye ji te re. Tiştê te xwest mi anî Axa.”

Kêfa Axê hat. Emir da xulamê xwe, ew firax kişandin metbexê. Çend rojê din derbas bû, dîsa di şevberkekê de ji her sê mêvana yekî go:

-Axa yê mi, de îjarê ev kevçî û sênîkê zêrîn kemaniyek wan heye.

Axê go: Gelo ew çî ye?

Mêvên go: Axa yê mi, Pîrek vî lawkê Gurî heye xwarina ber destê we pir xweş e. Gelek bi ekl e. Xwezî ew li vê qonaxa te ba û nan ji mevanê te re çêbikra.

Axê go: Ê ka kiyê here wê bîne?

Mêvana go: Weleh Axa ji Gurî pêve kes nikare here wê bîne.

Gurî go: “Eman zeman, ez ê çawa dîsa vegerim cem Pîre? Vê carê ew ê mi li hewa daqurtîne.” Axê jê re go: Weleh tu zane. Ya tê here û ya jî sibê serê te jê dibe.

Gurî ji xwe re fikirî, le bêçare ye mecbûr here. Gurî destê sibê rabû ji Axê re go:

-“Axa de ka eyarê pezekê bide mi. Ji mi re lazim e.” Rabûn berxek şerjê kirin û eyarê wê dan wî.

Gurî ber bi mala Pîrê ve bi rê ket. Berî bigihîje mala Pîrê, Gurî ew eyar kişand serê xwe û rapelikî ser xaniye Pîrê. Di lûla soba wê de ban kirê, go:

-Pîrê! Ez ruhistînim.

Pîrê go: Law ruhistîno gelo tu li çî digere?

-Pîrê, Welle ez hatime ruh ê te bistînim.

-Çima lawkê mi? Belê ez pîrim, le ma ne ruh şêrîn e, ez aniha naxwazim bimrim. Ma ez Pîrikek perixokî me. Tê mi çer bike? Ma tu çare tune ji bo tu nikaribe ruhê mi bistîne?

Gurî go: Erê weleh, çarek heye.

Pîrê go: De ka bivêje, çî ye ew çare?

-“Heger tu heft merşa li xwe bipêçe û tu xwe bi heft werîsa jî girê bide, ez ê nikaribim ruhê te bistînim.”

Pîra kêmaqil ji wî bawer kir û go qey bira dibêje. Rabû ba cîranek xwe kir. Heft merş li xwe pêça. Cîrana wê jî ew bi heft werîsa girê da. Gurî amin bû bê Pîrê xwe pêçaye, ji ser xênî daket hat ew danî ser piyê xwe hêdî hêdî meşiya. Hinekî meşiya û pê ve Pîrê ji xwe re go: Law weleh wek ez kil dibim. Kuro tu kî ye, tu mi dibe kî derê?

Gurî jê re go: Pîrê, ez im, Gurî!

Pîrê go: Gurî? Hey Gurîyo ma nizanim tu çî dozê li mi dike?

Pîrê hêrs bû. Xwe bir û anî ji bo ji nav heft merş û heft werîsa karibe derkeve. Hinek zor da xwe û werîsek qetand. Piçekî din jî di ber xwe da û yekî di jî qetand. Bi vî hawî şeş werîs qetand. Ji xwe wê çaxê nezîkî qesra Axê bûbûn. Gurî fam kir wê Pîrê werîsê maye jî biqetîne, hêdî ew ji ser piyê xwe danî û lezand reviya çû, xwe wenda kir. Pîrê werîsê hefta jî qetand, ji nav merşê pêçayî xwe xelas kir. Bi xezebek ecêb berê xwe da gund. Pîrê ewil her sê mêvan û Axa dû re jî tamamê gund kuşt. Le cardin jî birîna wê nekewiyabû. Hîna Gurî bidest nexistibû. Pîrê betilî û li ber deriyekî rûnişt, ponijî. Çima wê çaxê ji paş derî dengê nehat. Go:

-Pîrê, te ez naskirim?

Pîrê go: Lawo tu kî ye?

-“Pîrê ez Gurî me, Gurî”

Wextê Axê, Gurî ji bo anîna Pîrê şandibû wî zanîbû Pîrê were vî gundî tu kesî sax nahêle. Berî here, ji xwe re ev cî di paş heft deriyê hesinî de hazir kiribû. Pîrê go:

-Hey xayino! Te çî bi serê mi kir û te çî nekir. Hetta ez te nekujim ebed dilê mi rihet nabe.

Gurî go: Pîrê heger tu pir dixwaxe mi bikuje, ka were ez û tu em ê têkevin şerdeki.

Pîrê go: Çî ye şerdê te?

-Wa ez di paş derî de me. Ka ez û tu em ê herdu bi seriya li derî xin. Hela bê em kî hîn xurtir in? Heger tu derî bişkîne, mi bixwe goştê mi li te helal e.

Pîrê go: Jixwe tu çara min î din tune ye. De binere Gurî, heger ez deriya bişkînim ji xwe ez ê te bixwim. Le eger berî derî bişkê ez bimrim, wê çaxê tê serê mi veçire. Şûşak biçûk di hundirê serê mi de heye. Tê wê derxîne. Di wê şûşê de dermanek heye. Dermanê di wê şûşê de ye, tu di kîjan şexsê mi ew kuştiye bide ew ê rabe ser xwe sipîsax bive.

Gurî go: Dibe Pîrê, de ka em dest pê bikin.

Di pê re Gurî dest pê kir, bi nigê xwe li derî xist. Le Pîrê bi seriya li derî dixist. Hîna deriyek ne şikestibû xwîn ji serê Pîrê pijiqî serê wê tev pelçiqî, mejîyê wê bela bû. Gurî zanîbû Pîrê bêhal ketiye erdê. Ji paş derî derket. Ew qutîka di serê Pîrê de ye derxist, ava tê de ji xêndî Axê û her sê mêvana di serê gundiya tevda da. Av di serê kê dida, ew şexs sipîsaxlem dibû û radibû ser xwe. Îca gundî tev de rabûn

ser xwe û Gurî ji xwe re kirin Axayê xwe. Gurî bû xwedî mal û mulk. Ma li wî gundî.

Çîroka mi çû giyara

Rihme li dê û bavê guhdara

Ji xêndî şeytanokê ber diwara. (V. Tüfek 2016)

DC-5 (Hebhinarkê)

Hebû tune bû

Kes ji Xwedê mezintir tune bû

Li gundekî jin û mêrek û keçikê wan hebû. Rokê emrê Xwedê tê û ciya keçikê emanetê xwe teslîm dike. Mirin zor e, le emir emrê Xwedê ye. Mirina jinekê bi wan gelekî tahde hat, çendakî sebra Xwedê kişandin. Roj bi roj hêdî hêdî birîna wan kewiya. Le ka adet be, ka tiştêkî din be em nizanin ji berê de dibêjin: “Zilam bê jin nabin.” Mêrik bi riza keçika xwe jî mara xwe li pîrekekê birî, pê re zewicî. Jina mêrik ji roja hat mala wan, ji keçika mêrik behecî. Huqasî ji wê aciz bibû û ji wê nefret dikir, êdî nedixwest keçik li vê malê bimîne. Ji bo keçikê ji malê bişîne, dest bi fen û fûta kir. Rokê keçik û hevalê xwe çûbûn ji nav erd qirşika bidin hev. Di vegeerê de jinbava wê şerbikek tije av kir û çû pêşiya wan. Keçik giş tî bûbûn, giştika xwe dirêjî avê kirin. Le jinbavê nehişt tukes berî keçikê avê vexwe, go:

-“Na ez avê nadim kesî, wê berê keçka mi vexwe.”

Kêfa keçikê hat, digot qey jinbava mi birra jî ji mi hez dike. Jinbavê tasa avê dirêjî wê kir, kurmikekî biçûk xist nav ava wê. Keçikê tasa avê vexwar. Le wek tiştêk çû qirka vê. Go:

-“Yadê weleh ez dibêjim qey tiştêk di nav avê de bû, mi daqurtand.” Dêmariya wê baş zanibû ew kurm e, le lêvegerand go:

-“Qey qirşik bû keçê, tiştêk nabe.” Weke bi rastî jî ji wê hez dike, piştîyê qirşika ê keçikê ji wê sitend; li piştta xwe kir û hatin malê.

Li pê wê rojê, ji ber kûrmê di zikê keçikê de roj bi roj zikê wê mezin dibû, dinepixî. Dêmariya wê jî, ji xwe li benda vî tiştî bû. Rokê çû cem bavê wê, jê re go:

-Ma qey tu halê keçika xwe nabîne bê çi qebhet bi xwe de anîye. Zikê wê ro bi ro mezin dibe. Fedî bi te re tune ye, xelk û alem niha ji mere dibêjin çi? Li çara vê keçikê binere. Bavê keçikê zanîbû keçika wî xerabiyê û fêlên nebaş nake. Texmîn dikir tiliya jina wî di vî işî de heye, le nikarîbû tu tiştêkî tesbît bike. Dengê xwe dernedixist. Le jinekê dev ji wî bernedida. Her ro û saet bi ser wî de dipeyivî, dikir pit pit. Ji ber peyva wê mêrik neçar ma û şevêkê ji keçika xwe re got:

-Qîza mi sibê şivaqê rabe xwe hazir bike. Ez ê te bivim bajêr ji te re kinca bikirim, ez ê diranê te zêr bikim. Kêfa keçikê gelekî hat. Ji bo sibê bi xwe bihise, ji êvar de raket. Şivaqê rabûn, xwe hazir kirin. Bav li hespa xwe siwar bû, keçika xwe jî li piştê hespê kir. Neket rêya bajêr, ket rêya xirabsemtekê. Gelekî rê meşiyên û pê ve, mêrik hespa xwe sekinand ji keçikê re got: “Qîza mi hîna ji bajêr re gelek rê heye. Ji xwe re hinekî palde.” Keçikê kurkê bavê xwe ji xwe re kir balîf û çawa serê xwe danî di xew re çû. Bavê wê rabû desmêja xwe girt, du ruket limêj kir. Destê xwe ji Xwedayê re vekir, dua kir go:

-“Ya Rebi! Heger keçika mi ev tiştê ketiye hustê wê bi rastî jî kiribe tê hesabê wê bivîne.” Heger bêşûc û guneh be û hineka bêbextî pê re kiribe tu heqqê wê ji wan re nehêle.” Rabû kêra xwe derxist. Ew qapûtê keçikê xistibû bin serê xwe, ji bo keçik zanibe bavê wê ew ji bîr nekiriye bi zanetî li vir hiştiye, ji nêvî jêkir. Nêviyê din jî di bin serê keçikê de hişt. Bavê bêçare tev hêsirê çava ji wir veqitiya û vegeziya gund. Jina wî hat pêşiya wî, bi miraq jê pirsî:

-“Ka keçik, te ew çawa kir?” Mêrik go:

-Mi çawa kir, mi kir. Îşê te ne jê ye, te eleqeder nake.

Wextê roj bilind bû û da ser serê keçikê ew bi xwe hisya, le çi bivîne. Li çolbeyarekê ye. Ne bav û ne jî tu bajar... Çav li qapûtê binê serê xwe ket. Lê nerî di nêvî re jê kiriye. Famkir bavê wê ji ber dêmariyê ew bi zanetî aniye vir û li vir hiştiyê. Wê jî destê xwe ji Rebbê xwe re vekir û wi got: “Ya Rebi tu vê mûsîbetê û bêbextiyê ji ser mi rake, tu mi ji bextreşiya bistrîne.”

Rabû ser xwe meşiya, çemek derket pêşiya wê. Li ser vî çemî hinek av li ser çavê xwe kir. Daqûlî avê bû kurmê di zikê wê de û beq û masiyên di çem de bi hev re peyivin. Ê di nav avê de ji kurmê di zikê wê re gotin:

-Hevalo! Ma tu di wê qulika tarî, nav goşt û xwîne de çawa dike? Ka were cem me.

Kurm jî go:

-Hevalno! Cîyê mi gelekî xweş e. Nav hûr û pizûra germ e. Ka hûn werin bivin mêvanê mi.

Vanê nav avê dîsa gotin:

-“Na, na tu were. Cîyê me fire ye, paqij e, gelekî hênik e. Tê di nav wî goştî û wê xwînê de aciz bive.” Kurm hêdî hêdî ji cîyê xwe leqiya, keçikê jî xwe baş daqûlî ser avê kir. Bi emrê Xwedê ew kurmê di zikê wê de hat di devê wê re herikî, ket nav avê û di nav avê de wenda bû. Wexta rabû ser xwe lê nerî ew nepxa zikê wê tev çû ye, tiştêk nemaye. Hîna nuh bîna wê hat ber wê, hemd ji Xwedayê xwe re kir. Li dora xwe nerî dît waye darek bilind di devê çem de heye. Hebhinarkê rapelikî ser wê darê, ji xwe re li ser wê rûnişt.

Bîstek din lawê Axayê wê mintîqê, bi hespa xwe hat ser wî çemî. Hespa xwe ajot ser avê ji bo av bide. Le hesp ji şewqa ji jor dida ser avê tirsîya û paşde vekşiya. Lêwik serê xwe rakir. Biraqe çi bivîne? Keçikek mîna xezalekê li ser darê rûniştiye û şewqa wê di avê de diçurusîne. Lêwik ji xwe re got: “Bi Xwedê ev kî be gerek ez wê li xwe mar bikim.” Lêwik lezand, vegeriya hat malê. Hal û meselê xwe ji dê û bavê xwe re got. Xwest herin keçkê bi qewlê Resûlê Xwedê ji wî re bixwazin. Dê û bavê wî mecbûr man herin keçikê bixwazin. Lêbelê piştî lawik vegeriya çû malê, komek cengene hatin konê xwe li dora çem danîn. Keçikek devreş û nexweşik a cengene, hat bin darê û ji keçika li ser darê re got:

-“Keçê weleh ya tê mi jî bive ser vê darê cem xwe û ya jî ez ê ban li bav û birê xwe bikim, ew ê werin bi bireka dara binê te bibirin.” Hebhinarkê jê tirsîya, ji a cengene pirsî:

-Ka ez ê çawa te bînim cem xwe? Jinikê go:

-De ka guliyê porê xwe berjêrî mi bike, ez ê xwe bi wan bigrim. Tu jî mi bikşîne cem xwe. Keçika reben jê bawer kir û gulîkên xwe berjêr kir. A aşiq çawa xwe bi guliyê wê girt, ew kişand û berjêrî nav çem kir. Hebhinarka gewr û boz di avê de wenda bû. Ji cîyê ew ketê gulek şîn hat. Bîstek derbas bû çiya lêwik û bavê wî, bi lêwik re hatin ser çem bin darê. Lê nerîn keçikek bêwec û nexweşik li ser darê ye. Le lêwik bala xwe da wê, fam kir ew keçka mîna xezala a wî dîtibû û ew devreşa hanê ne yek in. Wextê lawik ev keçika reş dît, jê pirsî:

-Keçê ma çima tu wa reş bûye? Ez ez bim tu ne wa reş bû. Cengenê go:

-Te ez li ser darê bi tenê hiştim. Hingî ez li ber rojê li hêviya te mam, ez wiha reş bûm. Lêwik dîsa pirsî:

-“Lêvê te çima wa qelişîne? Gava mi tu dîtibû ne wa bûn.” Keçika Cengene go:

-“Tu çû û pêve mi tilîka xwe di lêva xwe da û mi go, biv, biv... ka lawkê axê nehat. Lewma qîş qelişîn.” Lêwik go:

-“Ê çima panyê te qelişîne?” Cengenê go:

- Hingî mi di darê da û mi go: “Ka lawê Axê, dergîstiyê mi nehat.” Lewma giş qelişîne.

Lêwik ji wan derewa bawer nekir. Li keçkê dinere, ev ne keçka wî ewil dîtibû. Di dilê xwe de go:

-“Hey tiştêk di vî îşî de heye. De hela ez ê sebra Xwedê bikşînim, zû ya jî dereng rastiyê derkeve meydanê.” Keçik ji ser darê daket, meşiyên bi hev re çûn malê. Wadê di ber wê gula di avê de derbas bûn, lawik li gulê hayî bû. Destê xwe dirêj kirê. Gul jê kir, bîhn kir û xist bêrika xwe. Keçka Cengene go: “De ew çi ye lo, wê gulê bavêje.” Lêwik nexwest bavêje. Le wexta di ber sergoyekî re derbas dibûn, Cengenê ew gul ji destê wî derxist û avêt ser sergo û meşiyên. Çûn qonaxa lêwik, daweta xwe çêkirin.

Pîştî ew ji wir veqetiyên, bi emrê Xwedê ew gula ser sergo bû bizmarkê serê teşiyê. Pîrikek ji xwe re li ser sergo digeriya, ew bizmarka dît. Rahîştê anî malê, avêt taqa xwe. Go: “Belkî carekê lazim bive.” Vê Pîrika li mala xwe di tevnê de tejkî çêdikir. Wê şevê ew raket û pêve ew bizmarkê serê teşiyê bi emrê Xwedê dîsa bû Hebhînkê. Keçik hat ser tevna Pîrikê, tevna wê heta sibê jê re çêkir, dîsa çû ket taqê. Wek berê bû bizmarkê serê teşiyê. Pîrikê serê sibê wextê çû ser tevnê, nerî tejkî di tevnê de wek zêde çêbûye. Le nekir tiştêk, go: “Belkî mi xwe şaş kiribe.” Îja her şev piştî Pîrik radiket, keçik ji taqê derdiket li ser tevnê rûdinişt û tevn ji Pîrikê re çêdikir. Çendakî bi vî hawî êvarê dibû keçik, bi ro dibû bizmarkê serê teşiyê. Pîrê her roja diçû li tevna xwe şaş dima. Pîrikê ji xwe re go: “Bi Xwedê tiştêk di vî îşî de heye. Ma tevna mi çawa bi xwe zêde dibe? Hela ez ê îşev xwe bidim bende tevnê, qey ez ê tiştêkî jê fam bikim.”

Jinik wê şevê ket nav nivîna xwe li xew danî le raneket. Di derengiya şevê de lê nerî ji taqa wê şewqek bilind dibe. Hêdî hêdî ew şewq dibe keçikek bedew û xweşik. Ew keçik tê li ser tevnê rûdinê û ji wê re tevna vê dirêçe. Pîrik hêdîka ji nav

nivîne xwe derket, ji paşiyê çû cem wê û xwe ji nişka avêt destê wê, ew girt. Jê pirsî go:

-Tu kî ye? Tu îns e, ya jî tu cin e? Keçikê go:

-Pîrê hema tiştêkî ji mi nepirse. Heger tê qebûl bike ji nuha û pê ve tu ciya mi, ez jî qîza te. Le bi wî şertî tu ji kesî re qala mi nake û di heqî mi de tu tiştêkî jî ji kesî re nabêje. Pîrikê go:

-Ê dibe qîza mi, bira wek te be.

Gundê ew lê diman, gundê wî lawkê Hebhinarê li ser darê dîtibû. Îjarê hespê mala vî Axayî gelek bûn. Wê salê zivtan dirêj bû, çêre li gund kêmbû. Rojkê mala Axê ji qonaxê ban gundiya kirin û gotin:

-“Gundîno, malîno her malek ji we, ê karibin biraqe werin hespekê bivin ji mere çend meha xwedî bikin. Mala we tevda ava.” Deng hat keçikê û Pîrikê jî. Keçikê ji wê re go:

-“Yadê tu jî here ji mere hespekê bîne. Em ê jî xwedî bikin.” Pîrikê got:

-“Keçka mi ez bi tenê me. Ez nikarim xwedî bikim, em ê me jî tune ye. Em nikarin bivin biçêrîn jî. Ma ez bînim feqîra hespê ew ê li cem me ji birçîna bimre. Mê çawa wê xwedî bikin?” Keçikê jê re got:

-“Aniha ez ji te re dibêjim bîne. Îşê te ne ji xwedîkirina wê ye. Ez ê wê xwedî bikim. Tu miraq neke. Tu rabe here hespekê bîne.” Rebenê ji bo dilê keçika xwe nehêle rabû çû mala Axê û hespekê xwest. Xulamê Axê gotin:

-Ma tu jinbiyek bi tena serê xwe ye. Gelo tê çawa hespê biçêrîne, tê çawa wê bi em û av bike? Jinikê got:

-Îşê we çi jê ye. Niha hûn ê hespê bidin, hûn nadin? Qey ez zanim bê ez ê çawa xwedî bikim. Rabûn hespek dan Pîrikê. Pîrê ew da pêşiya xwe û vegeriya malê. Go:

-Keçika mi avaye mi anî. Keçikê go: “Ji niha û pêve îşê min e.” Her ro keçikê hespê dida dû xwe û ji bo kes wê nebîne bi dizîka derdiket dervê gund. Bi hespa xwe re dipeyivî. Ew difirkand, destê xwe di serê wê de dida. Bi heyran û bi qurban ew diçêrand û em dida. Wecê hespê roj bi roj vedibû. Wek terşa dermale qelew dibû.

Roj û meh zîvirîn zivtan di ser xwe re avêtin. Av û ro li wan germ bû, mala Axê dîsa rokê ban kirin û gotin:

-Gundîno, malîno hespê me li cem we kê be, bi xêra xwe ji mere bînin. Mala we ava, mervantî heqê we.

Îja malê hesp xwedî kiribûn tevda hespên li cem wan birin teslîm kirin. Hebhinarkê jî hespa li cem wê bû da ciya xwe. Le berî hespê bişîne di guhê hespê de jê re go: “Hespa min î delal! Wextê tu çû mala axê, li hewşê mexelê, ranebe. Kî were jî ranebe, heta ez werim.” Piştî van şîretana hespa xwe şand. Hesp ket hewşa qonaxê hema di cî de mexel hat. Çend heb hatin wê rakin, le ew ji cîyê xwe neleqiya. Kî hat kî nehat tukesî nikarîbû ew rakira. Piştî herkes di wê de betilî jina lawê Axê, ew Cengena ku keçik ji ser darê daxistibû û bi lêwîk re zewicî bû, xwe jêhatî kir go:

-“Hela xwe bidin aliyekî. Hûn nikarin hespekê rakin, xwelî li serê we be.”

Hat li paş hespê sekinî go: “Yadê, heyranê de ka rabe.” Hesp rabû ser xwe. Herkes lê şaş ma. Kêfa Cengenê jî pir hat. Lebelê kêfa wê lê bû jahr. Hesp rabû ser xwe û vîrikek bi ser çavê wê de reşand, dîsa mexel hat. Ew di nav rêxa nermokî de hat şuştin, ji halê însên derket. Ê li wê derdorê bûn giş bi kena mirin. Wê jî, ji fediya baz da çû hundir.

Hinekên li wir gotin:

-“Ka kê hesp xwedî kiribe biraqe wer vir. Nuha ew ji halê hespê fêm dike.” Rabûn Pîrik anîn cem lawê Axê. Lêwîk pirsî, go:

-Pîrê ma te çi bi vê hespê kiriye, gelo ew ê çawa rabe ser xwe? Jinikê go:

-Ez jî nikarim wê rabikim. Kê ew xwedî kiribe, ew kare wê rabike.” Lêwîk go:

-“Ma ne te ew xwedî kiribû, me dabû te.” Jinikê go:

-“Keçikek mi heye. Wê xwedî kiriye. Hew ew kare wê rake.” Pîrikê go:

-“Keçika mi wa bi rihetî ji malê dernakeve. Ancax tu ji ber deriyê mi heta vir ji zêra textekî raxe, wê dûre derkeve. Ya na keçika mi ji mal dernakeve”

Lawik rabû li gorî xwestina wan, ji ber deriyê qonaxê heta ber deriyê malê textê zêrîn raxist. Herkes bi meraq li bende bû. Ka ew keçka kî ye, çawa ye? Piştî raxistina text keçik ji malê derket. Gundiya lê nerî bavoooo... Çi keçikek bedew, çi keçikek xweşik û şêrîn. Tevde jê re bûn heyran û qurban. Keçik hat li ber hespê sekinî go:

-De ka rabe heywana Xwedê. Xwarina ber destê mi wê xenîmî te be ha.

Bi peyva wê re hesp rabû ser xwe û meşiya çû ber alifê xwe. Lêwîk jî Hebhinarkê nas kir. Go: “Bi Xwedê a mi li ser darê dîtibû ev keçika han bû.” Îja

keçikê çîroka xwe û a Cengenê ji wî re got. Hal û meselê min ji wir, heta vir e. Lêwik her tişt fam kir û pê ve ba xulamekî xwe kir. Go:

- “Hespekê sê roja tî û yekî jî sê roja birçî bihêlin û dûre wan bînin ji mi re.” Piştî sê roja ew hesp anîn cem wî. Lêwik dest û nigê Cengenê her yek bi van hespa girêda û hespê tî êm da ber; ê birçî jî av da ber. Her hespekî xwe li alifê ê dinê rakşand. Jinika Cengene di nav nigê wan de pelçiqî û perçe perçe bû. Îca lêwik ji niv de Hebbinarkê li xwe mar kir.

Çîroka mi xweş

Ka dîlimek cebeş (Z. M. Qado, 2015)

1.1.2. Pêkenokên Gelêrî

Pêkenokên Gelêrî cureyekî pexşanî ya çanda gel e. Hinekên wan dibe ku ji jiyanê hatibin sitendin. Hinekên wan jî ji hêst û xiyalên mirovan derketinin holê. Di vê cureyê de ewil bûyer tê vegotin di pê re xitma wê bi awayekî bandorker tê kirin. Jixwe gelek caran peyva bi bandor ew peyva dawî ye û dawiyê li pêkenokê tîne. Digel ku yên ji hêst û ramanan daverivîne, yên ku ji bûyerên taybet hatine girtin û di nav gel de balav bûnin jî henin. Bi gelemperî navê pêkenokan tune ye, yanî weke çîrokekê yan jî weke helbestekê bi navekê nayên bibîranîn. Di kurdî de çend pênasayên pêkenokan bi vî rengî ne:

Meselok, pêkenok, qerf gotin an nivîsarên ko meriv didin kenandin (Îzoli, 2000: 588). Pêkenok ew bire çîrokên ku ji mijareke jiyanê ya qewimiye çêbûye û di nava gotina wê de henek, gelte, qerf, hîcîw û pêkenîn hebe û mirovan biken baldar û bîrdar bike. Herwiha tiştêkî bi şeklê îmayê nîşanî mirovan bide ku mirov ji bo xwe dersekê jê bigire (Sadînî, 2012: 13).

Gelek cureyên mijarên pêkenokan hene. Hemû bûyerên qewimîne yan jî qabilê qewimînê ne dikarin ji pêkenokan re bibin mijar. Pevçûnên di civakê de, tiştên ne di rê de, bêûsûlî, neheqî, bêdaletî, qedexeyên dînî, xurafe, qeza, qeder û kesên di dîn de îtmaziyê dikin, tevgerên baş û xerab dibin mijara pêkenokan (Aslan, 2008: 293).

Pêkenok li herêma Dêrikê di jiyana rojane de pir tên gotin. Ji zarokan heta extiyaran hemû tebeqeyên civakê kêm zêde çend pêkenokan dizanin. Li ser têkiliyên navxweyî yên civakê, carinan ji bo xwe mafdar nîşan bidin, yan li ser mijarek rojane, di warê dan û stendin an jî meseleyên din, gava ku cih were pêkenok tên gotin. Carinan hinek pêkenok ji ber ku ne minasibî civatê bin nayên gotin, an jî serê wê tenê tê gotin ji bo ku dawiya wê di mejiyana de were tamamkirin. Yan jî tenê navê lehengê pêkenokê tê hilatin û pêkenok bi maneyeke îşarî wezîfa xwe dike.

Dema lêkolînên li herêmê de, me gelek kesên bi pêkenokbêjiya xwe derketibûn pêş li civatan dîtin. Piraniya pêkenokên herêmê di derbarê melayan, eşîra Surgîciyan an jî di derbarê Dêrikiyan de ne. Van pêkenokên ku me ji sehayê berhev kirine hinek jê nîspetî bal bi şênîyên herêmê tên kirin û weke serpehatiyên wan tên nîşandan. Hinek ji wan jî herçiqas li herêmê li ser zimanan digerin jî ne diyar in ku bê serpehatiyên kê ne û ew bûyer kengî qewimîne.

DP-1

Piştî dewrimê,⁵⁴ zilamek ji Maşmaşkê peya dahre gundê bi navê Dêşî. Di nîvê rê de çend zilamê bi rext û tiving xwe girê dane derdikevin pêşîya wî. Wê çaxê jî mesela Qûq (KUK) û Apociya hebû. Zilama ji mêrik pirsîne, gotine:

-“Hecî, ma tu Qûq e ya jî tu Apocî ye?” Mêrik dide bala xwe û bîskê disekine. Hema dibêje:

-“Law ez kûçik lawê kûçik im.” Vanê din dibêjin “Heşayi te apo, ma çima tu wer dibêje?” Mêrik li wan vedigerîne û dibêje:

-Ma çi heşa law. Kuro heger hûn Qûq bin û ez bêvêjim “Ez Apocî me” hûnê mi bikujin. Heger hûn Apocî bin, ez bivêjim “Ez Qûq im” hûnê dîsa mi bikujin. A baş ew e “Ez kûçik lawê kûçik û xelas.”

Li ser van gotina bi wî dikenin, wî berdidin bi riya xwe ve dahre. (Î. Ece, 2015)

DP-2

Rojekê zilamekî Dêrikî çûye çarşiya Ciyarbekir. Li hêla Deriyê Mêrdîn li aşxanakê yek derketiye ber derî û ban millet dike, dibêje:

⁵⁴ Nîspet bal bi 12ê Îlonê sala 1980yî tê kirin.

-“Buyrun, buyrun, buyrun⁵⁵” Hema mêrikê me yê Dêrikî jî dikeve aşxanê. Ka heger çî xwarin xwestiye jê re anîne. Nanê xwe xwariye û pêve berê xwe daye derî û derketiye derve. Xwediyê aşxanê pêşiya wî birrîne, gotine:

-Keko ma qey tu heqê nanê xwe nade?

Mêrik gotiye: “Heqê nanê çî kuro, teresnê heram?”

-“Heqê nan birako, ma tiştêkî belaş he ye?” Li ser vê gotina aşxanecî ê me yî Dêrikî dibêje:

- Eyb e ji we re kuro fedî bikin, fedî. Ma qey hûn ne eşîr in, hûn heqê nanê mêvanê xwe distînin. Ma ne we ban mi kir we go: “Buyrun.” Heqê nan nade û derdikeve, dimeşe. (İ. Ece, 2015)

DP-3

Li Dêrikê tolazek rokê bi dora ciya xwe ketiye, hinek araçî xistiye nav avê û pê daye vexwarin. Serê ciya wî gêj dibe, feqîra jinikê virde wêde kil dibe. Jinik kevaniya malê ye, ji bo hevîr bistrê gerek arvanê xwe moxil bike. Le gêj dibe, wî arvanî bi moxilê li hundirê mala xwe bela dike. Her derê di nav arvên de dihêle. Lawik dibêje:

“Yadê ma arvanê te li ji derveyî teştê diriye.” Ciya wî ya serê wê xweş bûye, dibêje:

-“Lawê mi, ji ciya te re her der teşt e.” (S. Vural: 2016)

DP-4

Rokê gundiyeke ji Heboşiyê li çarşiya Dêrikê dimeşe. Qey feqîro neçûye mektebê, bi Tirkî nizane. Li pêşiya wî jî jinikek Tirk, serqot û bi pantor derbas dibe. Qey jinik çentê xwe dixîne erdê. Eviyê me yê Heboşiyê jî xwe çeng dike çentê wê, ji erdê radihêlê û dirêjî jinikê dike. Jinik jê re dibêje:

-Mersî⁵⁶

Ev yê me yî Heboşiyê jî dibêje qey jinikê xwestiye wî nas bike, yanî ji wî re gotiye “Ez ji Mêrsînê me.”

Ew jî peyvê li jinikê vedigerîne û bi Tirkîya xwe ya nîvçe dibêje:

-Ben de Heboşî.⁵⁷ (R. Tur 2016)

⁵⁵ Bi Tirkî bejeyeke bi wateya “Kerem bikin.”

⁵⁶ Bi Frensî ye, di sosyeteya Tirkan de di wateya malavayiyê de. Weke “Sax be, spas.”

⁵⁷ Ez ji Heboşiyê

DP-5

Dibêjin du heval hebûn. Yek bûye mêvanê ê din. Şevder li cem wî maye. Mazûban, êvarê ji mêvanê xwe yê birçî û ji riya dûr hatiye şorbek nîska xistiye leganê û danîye ser sifrê. Mêvanê birçî çav li legana şorbê ketiye madê wî nexweş bûye, çend kevçî bê dilê xwe li şorbê xistiye û birçî rabûye. Bûye sibe xatir ji hev xwestinin û mêvan vegeyriyaye malê.

Çend ro derbas bûye îja eviyê din çûye mêvandariya hevalê xwe. Mêrik ji mêvanê xwe re şîvek weke tu bivêje çêkiriye: Goştê berxa, birinca Qerejdaxê, dew û nanê şikeva... Yanî sifreyek o biçim ji mêvanê xwe re hazir kiriye. Rûniştinin bi hev re nanê xwe xwarinin. Piştî nê çay hatiye ji mêvên re. Li ser temsîka çayê pîvazek jî heye. Vêya bala mêvên kişandiye. Mêvên ji hevalê xwe pirsîye, gotiye:

-“Law bi Xwedê mi adetê we giş fam kir, le feqet mi ev pîvaz fam nekir. Ma ev çima li ser temsîka çayê ye.” Ê dinê jî xwe naêşîne û jê re dibêje:

- Ew jî ji bo pozê te hebekî bişewite. (D. Özer 2016)

DP-6

Qey du heval bi hev re derdikevin rêwîtiyekê. Riya wan dirêj e, dibetilin. Yek ji yekî re dibêje:

-Law bi navê Xwedê bi vi hawî çênabe. Riya me direj e, ka em ê yek li yekî siwar bin, heta em bigêhêjin menzîla xwe. Ê din gotiye.

-“Tu baş dibêje, le ka em ê her kê çuqasî li hev siwar bivin?” Ê fenoke gotiye:

-“Hema her kê em ê dûrikekê bivêjin. Ê dûrika xwe xelas bike biraqe dakeve û ê din li wî siwar bive. Herdu heval li hev dikan. Ewil ê bêhiş li ê fenoke siwar dibe. Du sê cara dibêje “Şêrîne delalê” dûrika xwe diqedîne, dadikeve. Dora ê dinê tê, ew li hevalê xwe siwar dibe û distrê. Dibêje “De lê lê lê lê lê lê... bîstek du bîsta wer devam dike. Feqîrê din aciz dibe, dibetile. Xwêdan di iniyê re davêje. Hew bi xwe kare jê dipirse:

-Kuro ma qey dawîya “lê lê” nehat?

Hevalê wî dibêje:

-Kuro ma ev hîna lê lê ye. Ka tu bisekine hela, hîna lo lo heye.⁵⁸

⁵⁸ Di varyanteke vê pêkenokê de peyva dawî wiha ye: “Ev nîna ye, îja tirmîna heye.”

DP-7

Carekê li gundekî Surgîciya gayek wextê avê ji kwîz⁵⁹ vedixwe serê wî di kwîz de asê dibe, hew derdikeve. Dikin û nakin tu tiştêk fêde nake. Radibin dişînin pê jîrikê gund. Jîrik tê, li hal û wextê gê dinere. Jê pirsîne, gotine:

-“Ka em ê çawa serê gê ji kwîz derxînin.” Jîrik dibêje:

-“Weee, mala we nekeve! Ma mesela we giş ev bû. Mi jî go hela bê çi ye. Ev bi, ev rihet e.” Millet şaş maye, gotine “Hela ka tê çawa derxîne?” Jîrik gotiye:

-Em ê berê serê gê jêkin, di pêre jî kwîz bişkînin. Gayê we yê ji kwîz xelas bive. (H. Evdirihman 2016)

DP-8

Pîrekek jinbî çar cara zewiciye û her çar cara jî zilamê wê mirine. Zilamek jî ji xwe re li jinekê digere. Bi saya der û dora xwe mêrik xwe digihêjîne vêya jinbî. Hal û meselê xwe ji hev re dibêjin. Îja mêrik ji jinikê dipirse, dibêje:

-Gelo zilamê te ê berê kî bûn, çi kar dikirin?

Jinikê her sê zilamê xwe yê ewil bi nav û îşê wan jimartiye. Mêrik gotiye: “Tişt pê nayê evana hêç in, le ê dawiyê kî bû?” Jinikê gotiye:

-Rihmetiyê dawiyê jî mele bû.” Mêrik dibêje:

-“ A weleh mele îşê me xera kir. Bi Xwedê ne ji mele ba tu hîna qîz dihat hesêb.” (R. Tur, 2016)

DP-9

Otîbosek ji Mêrdîn ber bi Carbekir dahre. Di rê de esker pêşiya wê dibire. Herkesî dadixin erdê. Qûmandar dibêje:

- Bira ê Tirk xwe bidin hêla rastê û ê Kurmanc jî xwe bidin hêla çepê.

Li gorî gotina qûmandêr her kes xwe dide hêlekê. Hew şexsek tenê ji ciyê xwe naleqe, xwe dide ortê. Ne bi rast ve dahre û ne jî bi çepê ve dahre. Qûmandar şaş dimîne, hêrs dibe jê dipirse, dibêje:

- “Kuro ma qey tu ker e, çima tu xwe nade aliyekî?” Mêrik xwe naêşîne û dibêje:

- Qûmandar Beg, ê mi ez Ereb im.

⁵⁹ kûzik

Ew werê nabêje, bîna qûmandan deng dibe eyn dibe wek fitilê. Yekê di nav çavê wî de lêdixe, dibêje:

- “Êşekoxlî êşek⁶⁰ çî me kurmanc safî nekirine, îja dora we Ereba ye.⁶¹” (M. Seydo 2016)

DP-10

Dibêjin zilamekî Surgîcî bi zikêşê ketibû, çûye xestê. Tixtor ji bo nexweşiya wî hîn baştir fêhm bike, tehlîlê destmêja biçûk jê dixwaze. Çima di yûznimrê de tupê îdrarê ê mêrik û jinekek bihalkî tevlihev nabe. Berêvarî mêrik tehlîlê xwe distîne dibe cem tixtor. Tixtor wa li tehlîlê destê xwe dinere, li mêrik dinere. Şaş dimîne, dibêje:

-“Birako, weleh li gor van tehlîla tu bi halekî ye.”

Wech li mêrik diqelibe, hêrs dibe tê malê. Bi jina xwe re dixeyide, pev diçinin. Ji jinikê dibêje:

-Keçê ma mi her ro ji te re nedigo dev ji mi berde. Binere hingî her êvara Xwedê te baz dida ser mi û tu li mi siwar dihat vaye te ez bi halekî jî hiştîme. (Î. Çeviren 2016)

DP-11

Li Qizilê eskerê bigre ser gund. Herkes devançê xwe, sîlehê xwe vedişêrin. Îja Apê Elo jî qey tivingek wî heye. Wextê ciwab tê, dibêjin “Eskerê bigre ser gund.” ew diricife. Nizane bê wê tivinga xwe çer bike. Virde dahre wêde dahre tu ciyî nebîne. Dixe nav kayê dîs derdixe. Dixe govê, pê bawer nabe ji wir jî derdixe. Radibe hewşa xwe nîv bejnê dikole û tivinga xwe dixe binê axê. Wa li dorê tê û dahre, ji xwe re lê dinere. Dilê wî nakeve cî. Dibêje:

-“Law ma vaye ez zanim tivinga mi di virde ye. Îja ka dewletê çawa nizanibe di virde ye ji bo Xwedê.”

⁶⁰ Ker lawê ker

⁶¹ Pêkenokek bi heman rengî li Erxenî û derdora wê di derheqê Zazayan de tê gotin.

1.1.3. Memorat

Di çanda civakan de gelek cureyên edebiyata devkî henin. Memorat jî ji wan cureyan jê yek e. Bi taybetî di nav civakên nexwende û civakên ji jiyana bajaran dûr in ev cure bêhtîr tîn dîtin. Çimkî gelek bûyerên di memoratan de derbas dibin îzaha wan a zanistî tune ye û piraniya bûyeran di demeke kin de, gelek caran jî li derên xewle diqewimin.

“Memorat navê wan cure çîrokên hinek bûyerên metafizîk in ku tê bawer kirin di serê hin kesan re derbas bûne. Çîrok ji hêla wan kesan an jî hinekên çîrok bihîstine hatine vegotin. Hinek kes îddia dikin ku ew bi cin, şeytan, perî û pîrebokan re mihatab bûne. Vê rewşê bi tirs û kelecane ji yên derdora xwe re vedibêjin. Hinek mirov jî bîranîneke ku ji derdora xwe bihîstibe ji kesên wekî din re vediguhezînin. Giştiyê van cûre vegotinan di nava memoratan de tîn nirxandin. Ferqa memoratan a ji destan, efsane, çîrok û çîrçîrokan ew e ku bizatî di serê hinekan re derbas bûne û aidî demeke nêzîk in” (Kaya, 2010: 516).

Gelek caran mirov dibe şahid ku hinek kes bûyerên bi vî rengî vedibêjin. Carinan ew îddaa dikin ku ev bûyer di serê wan re derbas bûne, carinan jî tiştên bihîstine vediguhezînin ji mere. Digel kesên bûyerên bi vî rengî weke xewn û xeyal dibînin hebin jî kesên wan bûyeran weke rastiyeke qebûl dikin û li derdora xwe belav dikin jî henin. Ji ber ku ev cure bûyer piranî derasayî ne, bêhtir bala mirovan dikşînin û xwe didin qebûl kirin. Li Dêrik û derdora wê hinek çîrokên ji vî cureyê ku êdî bi vegotinan navdar bûnin henin. Çend heb ji wan ev in:

D.ME-1

Çelê havînê ye, dinya germ e; eyn agir dibare. Ez jî wê rûyê bi rojî me. Ez li alincê⁶² li ber pez im. Wekî din ez zêde nediçûm ber pez, piranî gende diçûn. Wê rojê tu şivanê din jî hevaltî bi mi re nekiribû. Mi tenê pezê xwe ajotibû. Mi pezê xwe li guherê mexel kir û mi xwe da ber sîdana qûçekê. Qey ez xilmaşî dibim. Hew dîtina mi dît carekê bû “*ewt ewta*” kûçikê mi. Beranekê min î wa soringî hebû. Girs û qelew bû. Kûçik bi hêla wî de dizûriya. Çavê mi li wî ket wa wek beranê mi dikuliya. Ez rabûm çûm nêzîkî wî. Hema wek heft heb bi hev re ji mi re bivêje destê xwe bavêje

⁶² Alinc: Çêrandina pez ya nîvro

gunê vî beranî. Ez daqûl bûm û mi destê xwe avêt gunê berên. Hema bidestavêtina mi, ez veciniqîm. Kuro sewtek wa qalind û bi hêrs ji mi re go:

-“Dest gunê apê xwe nede.” Qêrînî bi mi ket. Qey ez li wir ji tirsî ji ser hişê xwe çûme. Wexta mi çavê xwe vekir şev tarî bibû. Mi pezê xwe li wir hişt û revî revî ez vegeyriyam malê. Di pê re ez hew bi dora wî beranî ketim. (S. Hemo 2016)

D.ME-2

Birazê ez ji te re xilaf nabêjim û tu dehîne min î derewa jî li te tune ye. Va Xwedê li jor e, dibîne. Wextê Sedam husên hat kuştin, ez zêde zêde pê êşiyam. Ez gelekî diqehêrîm, wan zalimana ew misilman kuştibûn. Wî çendî êvara hema mi limêja xwe yî eşa dikir, ez derdiketim ji derve mi cixare vedixwar. Kuştina wî, ez ne şaş bim zivtanî bû. Gelek roja dinya ewr bû, le wê êvarê jî hevron bû. Dinya sayî bû. Carekê wa mi bala xwe da hêyvê. Bavooo! Ez çi bivînim. Suretê Sedam Husên di hêvê de xuya ye. Bi du sê denga mi ban cîranê xwe yê kêlekê jî kir. Ew jî hat wî jî lê nerî. Me telefonî meriv derê xwe kirin, wan go me nediye. Çend şevê di jî me xwe da bende le hew derket. Em jî hew bi dû ketin. (S. Sulhan, 2016)

D.ME-3

Birayê mi Cemîl di meselak gundînin me de bi neheqî hatibû kuştin. Me ew li mezêlê Aqziyaret li cem xalanê mi veşartibû⁶³. Xalê Hiznî jî ev çend salê wî ne, bi şev û roj bi xêra xwe li ber vî mezêlî dima. Li wir li qilûbekê radiket. Şevêkê ez bûm mêvanê wî. Wê şevê heta derengiya şevê qalû behsa me bêgunehbûna birayê mi bû. Derengiya şevê dengê kûçika hat, ez jî derketim derve. Dinya jî şevreş e, her der tarî ye. Çav çavê nabîne, yanî mere serê pozkê xwe nabîne. Mi carekê nerî li ser gorra birayê mi Mihemed Emîn çirak vêketiye. Ji ber çavê xalê mi Hiznî baş nedidît, mi bang nekirê. Mi bîskekê wa lê nerî, hêsir ket çavê mi. Li cem me dibêjin “Ên bêsûc û bêguneh bin, çira li ser gora wan vêdikeve. Wana bi fedla şehîda nin.” Mi go: “Ya Xwedê tu mezin e, hayê te ji her tiştî heye.” (M. Ertekin 2015)

⁶³ Di devoka Derikê de ji bo mirî definkirinê gelek caran bêjeya “veşartin” ê tê bikaranîn.

D.ME-4

Berê me bi şelê kayê ji pirêza pûş dikşand malê xwe. Îja ciya mi digo:

-Ez û bavê mi em bi hevrebûn. Hêvron e, erê şev qulipî ye destê sibê ye; le hîna şev heye. Me barê deveyê xwe bar kiriye. Bavê mi jê re gotiye:

-“Qîza mi, tu diwêre li ber şela bimîne ya tê her malê?” Ciya mi dibêje:

-“Bavo va hêvron e, sibe ye. Ma çi heye?” Îja ciya mi tenê li wir dimîne. Rihma Xwedê li miriyê we jî be û li wê jî be. Ciya mi yeka ahlê Xwedê bû, ûcaxzede bû. Go:

-“Ez rabûm mi şelê xwe yê zêde dan hev. Carekê mi dî reşekî dirêj, dirêj, dirêj... Nigê wî hebû, le mi serê wî nedidît.” Ciya mi go bi mi re xeyidî. Gotiye:

-“Tu li vir li çi digere? Welleh ez ê te bi heft tebekê erdê de xwar kim.”

Gelek tiştê din ji ciya mi re gotine. Aniha nayê bîra mi. Nêta wî bi ciya mi dada û ew bikuşt. Dikira destê xwe bavêta ciya mi. Ka bê wê çawa bikira. Ciya mi go:

-Mi dî hema kalikê te xwe di ortami û wî rakir eyn dengê baskê bavê mi hat, go: Gurt gurt. Gurtîniya baskê wî hat guhê mi. Ne xewn e ha eyn ciya mi bi çavê xwe dîtiye. Bavê wê gotiye:

-Zero, navê ciya mi zero bû, bivê “La Îlahe îllelah Muhamed Resûlellah û eşheda xwe bîne.” Devê ciya mi ketiye tev, hema di dilê xwe de eşheda xwe aniye. Go: “Reşikê mi wenda bû.” Rebenê li wir pûç dibe. Ne dev dimîne, nalive. Bavê mi tê ban dikê. Ciya mi napeyive. Heta çend roja hîna nuh bi ser xwe ve tê. (Q. Güler 2016)

D.ME-5

Di navbeyna gundê me Eynteriyê û Qesra Hisênê Qenco de, di qermeyekî de mar henin. Van marên di vir de bi mere venadin. Îja gerek kes wan nekujin. Çimkî ew her tim hifza me ji tiştê nebaş dikin. Li wê derdorê xerabiyek, dizek, gur ya jî tişteki din hebin, ev mar me hayidar dikin. Hema ê mi ez bixwe çend cara di wir de derbas bûme, timî wan mara qencî bi mi kirine. Tê bivêje çawa qenciye bi we dike? Ez ji efendimê xwe re bivêjim: “Rokê em dîsa li wê hêlê bûn, kazkaza mara hat me. Dengê wan nola dengê karika bû. Me go: “Bi Xwedê tişteki heye.” Em vegeyriya em

neçûn wê hêlê. Dû re me bihîst gur pezê hineka li wê derê xwaribûn. (Y. Dengiz 2015)

1.1.4. Efsane

Cureyeke edebiyata gelêrî ya bi pexşanên kurt in. Di efsaneyan de weke di mînakên li jêr jî wê were dîtin, leheng û cihê bûyer lê qewimîne diyar in. Digel efsaneyên ku xwe bi civakê dane bawerkirin û qebûlkirin, efsaneyên dûrî aqilan jî henin.

Taybetiya sereke ya efsaneyan ew e ku mijarên baweriyê ne. Efsane weke tiştên qewimîne û rast tîne qebûlkirin. Ji vê hêlê efsane ji çîrçîrokan vediqetin. Nêzî çîrok û destanan dibin. (Boratav, 2014: 111) Di çanda Kurdan de ji mêjve mînakên efsaneyên Kurdî li ser zimanan digere. Ji Dêrik û derdora wê çend mînakên vê cureyî ev in:

D.E-1. (Gola Xwînê)

Li gundê me li Zorava Gola Xwînê heye. Tê gotin zemanekî jin û mêrek hebû. Jinik ji mê rê xwe hez nake. Bêbextiyê bi mêrê xwe re dike. Ji xwe re dostikekî digre. Carê dostê xwe tîne malê. Mêrik fam dike bê tiştê li hêla jinikê heye. Bi xwe bi xwe dibêje gerek ez vî tiştî fam bikim. Rokê mêrik mexsûs dibêje “Ez ê herim êş.” Le nare êş. Xwe vedidize dide qozîkekê. Carekê bala xwe didê, dibîne dostê jinikê tê cem wê.

Mêrik ji ciyê xwe dernakeve, dixwazê bivîne bê ka wê çawa bive. Lê mixabin bişabûna jina xwe û dostê wê bi hev re dibîne. Hêrs dibe û tê êrişî wan dike. Îca hinek dibêjin jinikê li mal dikuje û dostikê wê jî dibe li ser golê dikuje. Hinek jî dibêjin na! “Herdûyan li ser golê dikuje.” Ji ber xwîn diherike û li golê belav dibe, giş sor dibe. Ên wê demê şahidî vê qetlê dibin ji vê golê re dibêjin: “Gola Xwînê.” (S. Vural 2016)

D.E-2. (Girê Temirling)

Li Başûr-Rajavayê Dêrikê li Maşmaşkê girek heye. Gelê herêmê ji vî girî re dibêjin “Temirling”. Li gorî gotina gotinbêjan mesela Temirling⁶⁴ wiha ye:

Temirling û eskerê xwe wexta çûne seferekê di vir re derbas bûne. Bi fermana Temirling her eskerekî wî radihêlin kevirekî û didin ser hev. Ji ber jimara esker zêde ye, ew koma kevir bûye girekî biçûk. Îca Temirling gotiye wexta em ê ji seferê vegerin, dîsa herkesê ji vî girî rahêle kevirekî. Qey yanî wê çaxê wê jimara eskerê mane zanibin. Ka bê çuqasî li seferê mane kes nizane. Di vegeerê de her yekî ji wan rahiştine kevirekî. Le dîsa jî gelek kevir mane. Yanî wendahiya eskerê wî heçî kuştî, girtî ya jî firarî hewqas zêde ne. Îja ji wê ruyê û pê ve ji vî girî re dibêjin: “Temirling”. (Î. Ece 2015)

1.1.5. Biwêj

Biwêj: Ew peyv an jî kompeyvên qalibgirtî ne ku herî kêr ji du bêjeyan pêk tên. Bêjeyên ku biwêj saz kirine, gelek car ji wateya xwe ya ewil dûr dikevin. Biwêj rengîn û zîndewariyê dixin nav gotinê. Bêgûman dema em bala xwe didin zimanê devkî yê Kurdî ku behsa zengîniya wê tê kirin, di rêza pêş de dewlemendiya biwêjan derdikeve pêşberî me. Di her rewşê de biwêjên minasibî gotinê henin. Di ferhengên biwêjan de bi hezaran biwêj henin. Biwêj bi sazûn û wateyên xwe ji hev vediqetin û tên dabeşkirin. Mehmet Kômür ku lêkolînên wî li ser biwêjan hene, biwêjan bi vî awayî dabeş dike:

- a) Hinek darazên di biwêjan de, hew ji bo xatirê qafiyeyê tên gotin.
- b) Hinek biwêj bi kêmhewokî sazûne
- c) Hinek biwêj bingeha xwe ji bûyerekê yan jî ji çîrokekê digrin.
- d) Hinek biwêj xwedî taybetiyên çîrokan e. Yan jî bi awayekî sohbetî ne
- f) Hinek biwêj di derbarê kevneşop û nerîtan de agahiyan didin (Kômür, 2003)

Weke deverên din ên Kurdistanê li Dêrikê jî di jiyana rojane de, di nav peyvê de gelek biwêj tên bikaranîn. Dêrikiyên gotinên pêşiyên weke “Pîrsê pêşiya” binav dikin, me nedît ku tu navên taybet li biwêjan jî kiribin. Biwêjin ku me ji kesên

⁶⁴ Li gorî gotina şênîyên herêmê ev Temirling, qalê Moxolan yê meşhûr Tîmûrê kulek e, ku jê re dibêjin “Tîmûrlenk”.

çavkanî berhevkin, me ew li gorî naverok û teşeyên wan tesnîf kirin. Li Dêrikê biwêjên ku herî zêde berbelav in ev in:

Biwêjên bi navê netew, mezheb û etnîsîteyan çêbûne: Di bin vê xalê de me biwêjên bi navê hin komên olî yan jî etnîk senifandine. Hejmara biwêjên bi vî rengî ne gelekî zêde ne. Di sazkirina van biwêjên de şêniyên herêmê ji ceribandînan jîyanê yên bi komên bi wan re têkildarin derketine rê. Di van biwêjan de nêrînan şêniyên herêmê yê li hember van koman jî bi awayekî zelal derdikeve holê.

DB-1

Mere ji **Ereba** re nebêje merheba (A. Aras 2016)

DB-2

Nola **Erebê** çav li gilûrê keve (Î. Xoce 2016)

DB-3

Qiz **qereçî** xatûn olmaz⁶⁵ (D. Özer 2016)

DB-4

Wek elbika **qereçiya** (D. Özer 2016)

DB-5

Wek **Filehê** di xwesiya xwe ne (Î. Xoce 2016)

DB-6

Weke eskerê **Tirka** nan û ava wî li ser çonga wî ye (Î. Xoce 2016)

DB-7

Wek şevbihêrka **Cilîniya**⁶⁶ (E. Selçuk 2016)

Biwêjên bi aheng: Ew cure biwêjên bi alîkariya nêzdengan bi ahenk hatine hûnandin. Elbet digel ahenga peyvê, wateyên kûr di xwe de dihewînin.

⁶⁵ Biwêj bi Tirkî hatiye gotin, wate: “Keçika qereçî nabe xatûn”

⁶⁶ Gundekî eşîra Surgîciyan e

DB-8

- Ez dibêjim çortan, tu dibêje bortan (M. Vural 2016)

DB-9

- Ji bo nefsê ket hefsê (F. Deniz 2016)

DB-10

- Ka ne a te ye; kadîn jî ne a te ye (F. Deniz 2016)

DB-11

- Kî aş be, ew qeraş e (F. Deniz 2016)

DB-12

- Ne dibêje him, ne dibêje gim (F. Deniz 2016)

DB-13

-Heta qirikê, ket pirrikê (M. A. Ece 2015)

DB-14

-Ji şîrî heta pîrî (F. Deniz 2016)

DB-15

-Ji we re adet e, ji mere qebhet e (Î. Çeviren 2016)

DB-16

-Kero, wek hero (M. A. Ece 2015)

DB-17

-Peyv heye, emel tune ye (F. Deniz 2016)

DB-18

-Tenê, xenê (M. Vural 2016)

DB-19

-Ya li êş e, ya li kêş e (F. Deniz 2016)

Biwêjên Argo: Ew cure biwêj herçiqas argowarî bin jî di jiyana rojane de ji hêla şênîyên herêmê ve di têkiliyên navxweyî de bi hêsanî tên bikaranîn.

DB-20

Çîroka gunê ker (R. Çakıl 2016)

DB-21

Ço, ço ye; hoş, hoş e (M. Seydo 2016)

DB-22

Dibêje “Qûnê bi min re neyê” (F. Ekinci 2016)

DB-23

Diranê qûnê avêtiye (Y. Dengiz 2015)

DB-24

Ez zanim çend ta mû bi qûna te ve heye (R. Çakıl 2016)

DB-25

Gû birê rêxê ye (Q. Güler 2016)

DB-26

Hêk hatiye qûna mirîşkê (Z.M. Qado 2015)

DB-27

Hekê/Tirê hesinî kirin (M. Ê. Hemê 2016)

DB-28

Ji tira xwe re dibêje “Qaçî” (M. Ê. Hemê 2016)

DB-29

Ker ji hev dielimin tir û fisa (B. Tur 2016)

DB-30

Kîrê wî hew li golika garana me radibe (M. Ê. Hemê 2016)

DB-31

Kîrê xwe û gêzera/masiya ji hev nas nake (M. Ê. Hemê 2016)

DB-32

Kûçikê ser kormekê ne (Z. M. Qado 2015)

DB-33

Miriya zêde neşon, wê tira bikin (Q. Güler 2016)

DB-34

Mûyê qûnê sipî bûye (Y. Dengiz 2015)

DB-35

Nanê bê xwê dixwe, tirê şor dike (Q. Güler 2016)

DB-36

Nizane qûna xwe bişo (M. Ê. Hemê 2016)

DB-37

Qûna xwe belot dike (Ş. Temel 2016)

DB-38

Qûna xwe li avê xe (M. Ê. Hemê 2016)

DB-39

Qûnqetandin ji kîs çû (M. Ê. Hemê 2016)

DB-40

Roj bi rîtinê nare ava (V. Tüfek 2016)

DB-41

Ruyê xwe bi mîza xwe şuştîye (M. Ê. Hemê 2016)

DB-42

Serê çö bi gû ye, binê çö bi gû ye (R. Çakıl 2016)

DB-43

Tir di qûnê de nasekine (R. Çakıl 2016)

DB-44

Xwe dikşîne (Ş. Silêman 2016)

Biwêjên bi navê sewalan saz bûne: Ji van biwêjan tê famkirin ku gelê herêmê van sewalan nas dikin. Ger ew nedîtîbin jî di derbarê wan de xwedî agahî ne. Ji gelek hêlan ve taybetmendiyên sewalan hatine tesbîtkirin. Bi riya teşbîhê û bi riyên din di navbeyna teybetmendiyên sewalan û tevgerên mirovan de têkilî hatiye danîn.

DB-45

Bera **pinpinika** dide. (M. C. Tüfek 2016)

DB-46

Berx tune ye, kozê çê dîke (Ş. Zerga 2015)

DB-47

Çû ber **golika** (Ş. Zerga 2015)

DB-48

De were û vî **kerî** di vî bihurî re derbas bike (N. Tur 2015)

DB-49

Di guhê **gê** de ye (E. Qubilmî 2016)

DB-50

Golik tune ye alif çêdike (C. Çeviren 2016)

DB-51

Goştê **berxa** ye, li ber çava ye (A. Deniz 2016)

DB-52

Gumgumok lê tayê digrin (S. Sönmez 2015)

DB-53

Gur li kîjan newalê miriye (S. Sönmez 2015)

DB-54

Heft **tajiyê** we nikare bi kîrgoyekî mi (Ş. Zerga 2015)

DB-55

Ji nesîbê me, **deve** radibin reqsê (E. Qubilmî 2016)

DB-56

Kuliya ziman xwariye (Ş. Zerga 2015)

DB-57

Kurmê xwe dawşandin (Z. M. Qado 2015)

DB-58

Kurmê xwe şikenandin (Z. M. Qado 2015)

DB-59

Li **kerê** mirarbûyî digere ji bo nala jêbike (S. Sönmez 2015)

DB-60

Meseleya **gayê** wê salê (N. Tur 2015)

DB-61

Mêşa girî li dorê dahre (F. Deniz 2016)

DB-62

Şahidê **revî** teriya wî ye (Y. Ş. Eysê 2015)

DB-63

Tajiyê bi zorê here seyde (Z. M. Qado 2015)

DB-64

Tirs mêrga **rêvî** ye (S. Sönmez 2015)

DB-65

Xeta, ji **gayê** pîr de ye (İ. Ece 2015)

Biwêjên bi navê hinek kes û bajaran saz bûne: Îhtimal e ku ev biwêj bi eslê xwe ji bo hinek bûyerên diyar hatine bikaranîn û di pê re bûne malê tevahiya civakê. Sazûmankarê van biwêjan di nav gel de wenda bûne. Jixwe çanda gel wiha ava dibe.

DB-67

Birîna **Çeto** li kêlekê, dermanê wî rêxa çêlekê (M. Ertekin 2015)

DB-68

Derdê **Hemo** garis e (C. Çeviren 2016)

DB-69

Ez li vir, xelîfe li **Bexdê** (M. Ertekin 2015)

DB-70

Gurî navê mi li te, kumê mi li serê te (C. Çeviren 2016)

DB-71

Hasil çûye **Mûsilê** (C. Çeviren 2016)

DB-72

Kes li mala bavê min nema, **Gurî** bû axa (E. Qubilmî 2016)

DB-73

Kumê **Elo** li serê **Celo** dike (M. Ê. Hemê 2016)

DB-74

Mala **Caf**o xwe bi xwe ne (M. Ertekin 2015)

DB-75

Silaba li **Hesenê Mûsa** (bi)ke. (C. Çeviren 2016)

DB-76

Şam dûr e, le mişar li vir e (C. Çeviren 2016)

DB-77

Şeytên li **Dêrikê** gon xwariye, li **Xursê** zaye (M. Ertekin 2015)

Biwêjên bi wateyên dijber ava bûne:

DB-78

Aqilê **sivik**, barê **giran** (Î. Ece 2015)

DB-79

Du **henek** bi **rastiyekê** ye (Î. Ece 2015)

DB-80

Em ê **rohn** bikin, ya jî **tîr** bikin? (Î. Ece 2015)

DB-81

Ken lê bû **girî** (M. Güneş 2016)

DB-82

Kerra bi **guh** neke (Q. Güler 2016)

DB-83

Xêr û **guneh** di hustu de (Î. Ece 2015)

DB-84

Ne **serî** heye ne **binî** (S. Kevirşînî 2016)

Biwêjên bi awayê teşbîhê saz bûne: Ev cure biwêj ya bi teşbîhkirina sewalekê yan jî bi teşbîha heyinên li siruştê hatine çêkirin. Di vê cureyê de piranî hinek hêlên mirovan dişibînin taybetmendiyên sewalan. Di sazkirana wan de teqez bêjêyên teşbîhê yê weke “*mîna, nola, wek(i)*” hatine bikaranîn. Mînak: “Çavê **wek** tivingê”

DB-85

Mîna beqê avis (E. Remo 2016)

DB-86

Nola tira ser mîrku (Ş. Temel 2016)

DB-87

Wek ava binê kayê (M. Ê. Hemê 2015)

DB-88

Wek cilbuê nav kayê (S. Yücel 2016)

DB-89

Wek cinê ji hesin bitirse (M. Ê. Hemê 2015)

DB-90

Wek kûçikê ji dengê tivinga bireve (M. Ê. Hemê 2015)

DB-91

Wek meleyê diwazde ilm (R. Çakıl 2015)

DB-92

Wek mîza kîso (Y. Dengiz 2015)

DB-93

Wek şarmarê tu tif bikê (E. Tekin 2016)

DB-94

Wek tavê biharê (Î. Ece 2015)

DB-95

Wek terşa ji beriyê bazde (E. Tekin 2016)

DB-96

Wek trêna Sirguciya (E. Tekin 2016)

Biwêjên wekî din: Biwêjên cur be cur ên di jiyana rojane de ne. Li gorî rêza alfabetîk hatine tesnîfkirin.

DB-97

Agir bi erdê ketiye (B. Tur 2016)

DB-98

Agir dibare (A. Aras 2016)

DB-99

Aş û baş dipeyive (N. Ertekin 2015)

DB-100

Bê minet kirin (X. Xatûn 2016)

DB-101

Bêhn çikandin (B. Tur 2016)

DB-102

Benîştê devê xelkê (B. Tur 2016)

DB-103

Bi heft ava bişo (M. Vural 2016)

DB-104

Bi heft tebekê erdê ve xwar kir (A. Deniz 2015)

DB-105

Bi zimanê xwe karibe (M. Vural 2016)

DB-106

Biraqe feqîr ji xwe re bimrin (R. Vural 2016)

DB-107

Bizmar xistiye avê (B. Tur 2016)

DB-108

Çavê bi kul derman kiriye (S. Kevirşînî 2016)

DB-109

Çav bera dayê

DB-110

Çonga xwe xistiye piştê (N. Tur 2016)

DB-111

Darê ji binî ve dibirre (Y. Ş. Eyšê 2015)

DB-112

De em bi hev re namirin (Î. Ece 2015)

DB-113

De'wa îmana me dike (Y. Ş. Eyšê 2015)

DB-114

Dendika jê berdide (Y. Ş. Eyšê 2015)

DB-115

Di devê tivingê de ye (Î. Ece 2015)

DB-116

Di nigê nig de (Z. M. Qado 2015)

DB-117

Di ser guhê xwe re gêr dike (X. Xatûnê 2016)

DB-118

Di zikê dê de elimiye (Z. M. Qado 2015)

DB-119

Dide lotika (S. Sulhan 2016)

DB-120

Dilê xwe lê rihet kir (X. Xatûnê 2016)

DB-121

Diranê te di qirika te de ye (A. Deniz 2015)

DB-122

Dizê neqebekê ne (S. Sulhan 2016)

DB-123

Em dahrin ser çema, çem dimiçiqin (S. Kevirşînî 2016)

DB-124

Filankesê/o di ser pozê xwe re ye (Z. M. Qado 2015)

DB-125

Heger filan tişt wa be, biraqe navê mi ew be (S. Sulhan 2016)

DB-126

Ez dibêjim nêr e, tu dibêje bidoş (S. Kevirşînî 2016)

DB-127

Zilam zilama nas dike (S. Yücel 2016)

DB-128

Him ji camiyê; him ji dêrê bû (B. Erol 2016)

DB-129

Histêrka wî li esmana tune bû (S. Sulhan 2016)

DB-130

Hişê xwe bi ka û ceh xwariye (N. Ertekin 2015)

DB-131

Ji heq hatin (F. Ekinci 2015)

DB-132

Ji ruhê xwe aciz bûye (Î. Ece 2015)

DB-133

Ji zeftê çû (Î. Xoce 2016)

DB-134

Kaba xwe li kaba wê xist (X. Xatûnê 2016)

DB-135

Ka ev ne fen e; îja ev çi ben e (F. Ekinci 2015)

DB-136

Kêrê daye hestî (F. Ekinci 2015)

DB-137

Kes cixarakê bi ruh nade (H. Evdirihman 2016)

DB-138

Kirasê nederûtî li me re dike (Ş. Zerga 2015)

DB-139

Ya av li guzokê, ya jî guzok li avê (S. Sulhan 2016)

DB-140

Li ber tayê tolikê direqise (S. Kevirşînî 2016)

DB-141

Li emrê çûyî poşman bû (Î. Xoce 2016)

DB-142

Di ser xwe re li Xwedê binere (Ş. Zerga 2015)

DB-143

Ma te heşa tê de hişt (N. Tur 2016)

DB-144

Mala “qey” ê tune ye (Ji bo wan kesên ku ji her tiştî re dibêjin “qey/belkî” tê gotin.
(Q. Güler 2015)

DB-145

Me ruyê xwe kiriye çerm û xistiye nigê xwe (H. Evdirihman 2016)

DB-146

Merra te tê de şikestiyê (Z.M. Qado 2015)

DB-147

Mi devê xwe tije kir (weke xwestibe gotinekê bibêje, lê negotibe) (A. Deniz 2015)

DB-148

Mineta te li serê çiyê be (Z. M. Qado 2015)

DB-149

Miriyê xwe ji bîr kirin (N. Tur 2016)

DB-150

Nenûka xwe pê nade (H. Evdirihman 2016)

DB-151

Nizane berê qublê ku ye (Ş. Zerga 2015)

DB-152

Nok çû bajêr, bû leblebî (S. Kevirşînî 2016)

DB-153

Parsuyê xwe danîne erdê (Q. Güler 2015)

DB-154

Pê re nekeve heft û heşta (Ş. Zerga 2015)

DB-155

Pif ewra dike (E. Remo 2016)

DB-156

Pirêzê te ne paqij in (Ş. Silêman 2016)

DB-157

Pozê xwe daliqandiye (Y. Ş. Eysê 2015)

DB-158

Qey em sêrê saza nin (Ş. Silêman 2016)

DB-159

Rastî di qirikê re nayê (B. Tur 2016)

DB-160

Rê bi ser nexistin (S. Sulhan 2016)

DB-161

Serî li kevirê gorrê ket (M. Ê. Hemê 2015)

DB-162

Sola wî di taqê re avêtiye (M. Ê. Hemê 2015)

DB-163

Şunika li dewşê dixin (Z. M. Qado 2015)

DB-164

Şûr simêlê wî jê nake (V. Tüfek 2016)

DB-165

Tu ji ku derê hatiye bi wir de here (V. Tüfek 2016)

DB-166

Veya hîna nîna ye, îca tirnîna heye (N. Tur 2016)

DB-167

Wek heft heb bivêje (rabe ser xwe) (Z. M. Qado 2015)

DB-168

Were û safî bike/Were û pê de here (Z.M. Qado 2015)

DB-169

Xezeb ketiye çava (M. Seydo 2016)

DB-170

Xwe dide çiva (V. Tüfek 2016)

DB-171

Xwe dixe çav (R. Tur 2016)

DB-172

Xwe li xamî datîne (Ş. Zerga 2015)

DB-173

Xwe şor dike (M. Bûb 2016)

DB-174

Xwelî li serî be (M. Vural 2016)

DB-175

Xwîna me vexwarin (M. Bûb 2016)

DB-176

Zivtan kiriye kundir (M. Vural 2016)

Weke ji mînakên jî xuya dibe herêma ji hêla biwêjan dewlemend e. Di gelek warê jiyana de li gorî her rewşê biwêj henin û di jiyana rojane de tîna bikaranîn. Ewqas dewlemendî heye ku gelek biwêjên ji hev cihê, herwiha bi heman wateyê henin. Weke mînak:

- *“Golik tune ye alif çêdike / Berx tune ye kozê çêdike”*
- *“Kurmê xwe dawşandin/ Kurmê xwe şikenandin”*
- *“Kûçikê ser kormekê ne/ Dizê neqebekê ne”*
- *“Wek cinê ji hesin bitirse/ Wek kuçikê ji dengê tivinga bireve”*

Biwêjên li herêmê tîna bikaranîn û yêna li deverên din carinan hemwate bin jî di bilêvkirina bêjeyan de ji ber devokên sehayî cudahî heye:

Li Dêrikê

-“Şahidê rêvî teriya wî ye”

Li Meres -M eletîvê

-“Şahidê rovî doça wî ye”

1.1.6. Gotinên Pêşîyan

Çanda devkî ew e ku di jiyana miletekî de qebûlên mirovan ên devkî û nivîskî ku di kevneşopîya wan de cih digrin, tevahiya çalakiyên maddî û manewî yên nasnameya netewî ava dikin û digêhêjin hêza hevpariyê ye (Artun, 2009: 56). Di çanda devkî ya Kurdî de keresteyeke bi hêza hevpar ava bûye û di peyva rojane de şax vedaye bêgûman gotinên pêşîyan e. Mirovan di demên borî de ji bûyer û rewşên di serê wan re derbas bûne an jî bûne şahidê wan tiştan, piştî encamên van bûyeran bi şîroveyên xwe hinek daraz û şîret bidest xistine. Di pê re ew daraz û şîret hatine ecibandin, li ser zimanan geriyane û ji nişkê derbasî yên din bûne. Ew jî dibin “Pêşgotin” an “Gotinên pêşîyan.” Ev cure gotin hest û ramanên mirovan bi awayekî kurt û bandorker didin îfade kirin.

Gotinên pêşîyan, texlîdeke ji wêjeya gelêrî ye ku serborî, tecrîbe û rabirdûya civakan bi awayekî zargotinî û bi bandor rave dike. Gotinên pêşîyan raman û hestên rayagiştî, nexşerêya helwesta jiyana neteweyî, rengvedanên zanist û çanda gel, paşxaneyê daneheva civakî û hilberînên binehişa kolektîfî ye (Öztürk, 2015: 321). “Li ser kîjanê ji wan bi heqî lêkolîn were kirin, li ser were fikirandin tê dîtin ku di binê wan de gelek maneyên bêhed û gelek şîretên rastîn veşarî ne. Tiştê balkêş ew e ku her peyvek, ji bo bûyereke nemir û dîrokeke jîndar e; her pêvekeke wê qanûneke tabî ye ku li ser tecrûbeyan hatiye saz kirin” (Hilmî, 1986: 610).

Ne şert e ku bi giştî pêşgotin tekûz û watedar bin. Digel ku bê ehemmiyet û ji rêzê bin jî ger arziyalek piçûk, meyleke bi hest ya civakî îfade bike dîsa xwedî qîmetekê ne (Reşî, 1986). Gotinên Pêşîyan di derheqê herêma ku têne bikaranîn di warên civakî, çandî, aborî û hêlên wekî din serişteyên îzah kirî didin. Carinan bilêvkirina bêjeyên wan, an jî hinek bêje ji hev cihê bin jî dîsa heman wateyê îfade dikin:

“*Hevalê nigê şemitî tune*” di heman wateyê de “*Hevalê barê ketî tune ye*”

“*Her bizmarê ez dikutim, tu tûrekî pêve dike.*” di heman wateyê de “*Her ku ez singekî dikutim tu çeltekî pê ve dikî.*”

Xebata nivîskî ya herî kevn li ser pêşgotinên Kurdî ya ku em dizanin digihêje sê sed sal berî niha: “*Yekemîn numûneyên folklorê Kurdî yê nivîsar ku gihîştine*

destên me ji sala 1711an tên. Ev bi zimanê Kurdî û bi tîpên elfabêya Ermenî hatine nivîsar ew gotinên pêşiyar e” (Cindî û Evdal, 2008:15). Bi taybetî di serê sedsala bîstî de di kovara Jînê de ji hêla Kurdan ve xebatên bi awayên zanistî li ser pêşgotinên Kurdî hatine kirin û li gorî naveroka xwe hatinin senifandin. “Em dikarin naveroka gotinên pêşiyar ên Kurdî ji gelek aliyan ve dabeş bikin ku hinek ji wan ev in: Erd û esîman, bi giştî însan, mêr û jin, zewac û berdan, dostî û dijminî, cîran û cîrantî, aqilî û bêaqilî, heywan, nebat...”(Yıldırım, 2012: 389). “Gotinên pêşiyar ên kurmancî, ji aliyê wateyên wan ve (wateya mecazî/wateya rasteqînî) û ji aliyê taybetmendiyên vegotinên wan ve dikarin bîn senifandin” (Öztürk, 2015: 319).

Li herêma Dêrikê ji bo pêşgotinan bi devoka herêmê têgehên weke “Pirsa/ê pêşiya” yan jî “Gotina/ê pêşiya” tên bikaranîn. Li jêr me pêşgotinên Dêrik û derdora wê li gor teşeya wan û hin jî li gor naveroka wan tesnîf kirine.

Yên ji hêla teşeya xwe ve bi aheng in: Weke Law Reşîd berê jî di Jînê de îfade kiribû gelek pêşgotinên Kurdî bi aheng in.

DPÊŞ-1

Bike wek şêra, bixwe wek mêra (Z.M. Qado 2015)

DPÊŞ-2

Bira avis be, biraqe dereng be (D. Özer 2016)

DPÊŞ-3

Bira li şaristana be, ne li goristana be (M. Mehmûd 2016)

DPÊŞ-4

Bira wecê mere biêşe, sere mere neêşe (E. Selçuk 2016)

DPÊŞ-5

Bira bira ye, bazar li dera haye/hane (M. Sönmez 2015)

DPÊŞ-6

Bitirse ji zîlamê rût; ji pîreka bi pûrt (M. C. Tüfek 2016)

DPÊŞ-7

Cahiltî ye, zehmetî ye (M. Sönmez 2015)

DPÊŞ-8

Çavê li deriya, xwelî li seriya (M. A. Ece 2015)

DPÊŞ-9

Dê dibe dêmarî, bav dibe marê qarî (B. Erol 2016)

DPÊŞ-10

Ê rakevin li ciyê kaş, wê bivînin xewnên nebaş (İ. Ece 2015)

DPÊŞ-11

Êş bi şev tê laşa, bi ro dahre kaşa (M. Seydo 2016)

DPÊŞ-12

Ez rûniştî, tu rûniştî; mala me bi vî hawî şewitî (M. C. Tüfek 2016)

DPÊŞ-13

Heta mere nebe pir, mere nabe gir (M. Ertekin 2016)

DPÊŞ-14

Hûr lêxe, kûr lêxe; ga meêşîne (R. Çakıl 2016)

DPÊŞ-15

Karê xwe bike bi asas, bira dilê te neke taswas (İ. Ece 2015)

DPÊŞ-16

Kevirê havînê, bavêje binê kulînê (N. Ertekin 2015)

DPÊŞ-17

Mere namûsê nade bi lûsê (F. Ekinci 2016)

DPÊŞ-18

Neke bi serê kesa, tê serê nefsa (M. Seydo 2016)

DPÊŞ-19

Pîrê nemir bihar hat, kalo nemir qîvar hat (N. Tur 2016)

DPÊŞ-20

Xewa miriya tê, a birçiya nayê (N. Ertekin 2015)

Yên bi çîrokî: Ên bi vê şeweyê şîreta ku dixwaze bide bi awayê çîrokekê didin. Gelek car ji yênan din dirêjtir in.

DPÊŞ-21

- Bav gotiye: Kiyê ew lawê mi?

Lêwik go: Bavo diz e!

-Law dev jê berde biraqê here.

Lêwik go: Bavo ez dev ji wî berdidim, ew dev ji mi bernade (F. Deniz 2016)

DPÊŞ-22

Bavek kare heft lawa xwedî bike, heft law nikarin bavekî xwedî bikin. (A. Aras 2016)

DPÊŞ-23

Carekê ferman li deva rabûye. Rêvî berî deva reviyaye. Jê re gotine:

-“Kuro ma ferman li deva rabûye, tu çima direve? “ Wî jî gotiye:

-Ê ma hema bi hustê mi bigrin û bivêjin: “Tu jî deve ye.” Ma ez ê çer bikim. (F. Deniz 2016)

DPÊŞ-24

Heger mêrikê kurmanc têr bixwe, ya wê hewiyê bîne ser jina xwe; ya jî ew ê mêrekî bikuje. (Î. Xoce 2016)

DPÊŞ-25

Ji mêrik re gotin: “Law Ereba li talanê te xistin.” Wî jî go:

-Ma mi jî ew di nav xebera (dijun) de hiştin. (E. Qubilmî 2016)

DPÊŞ-26

Mêrê me mir, xelkê hîna nûh ji jinên xwe re gotin: “Yadê” (M. A. Ece 2015)

DPÊŞ-27

Yekî gotiye: “Melhema dermanê çava li cem mi heye.” Jê re gotinin:

-“Berê di çavê xwe bide, waye tu baş nabîne.” Wî gotiye:

-Ê mi dilê mi ji mi re naxwaze. (M. A. Ece 2015)

DPÊŞ-28

-Yekî, li yekî xistiye, ê din gotiye:

-“Ay, pišta mi!” Ê lêdixe dibêje:

-Kuro ma ez li zikê te dixim, tu dibêje “Pišta mi”. Lê vegerandiye, gotiye:

-“Birako, heger pišta mi heba te nikarîbû li zikê mi xista.” (M. Ê. Hemê 2016)

DPÊŞ-29

Yekî, ji yekî re gotiye: “Ez ê bi guhê te bigrim û te li temamê dinyê bigerînim.” Ê din gotiye:

-“Kuro ma aniha em herin kuderê, ma ne tu ê jî bi mi re be. Hema tu bê minet e. Tu mi dibe kuderê bive. (M. Ê. Hemê 2016)

Yên bi awayê şîretî: Hinekên wan ya pêşniyaz in an jî şîretên bi ferman in.

DPÊŞ-30

Başiye bike, biraqe başî were pêşiya te (B. Tur 2016)

DPÊŞ-31

Bi tayê Elo û Welo danekeve bîrê (Y. Dengiz 2015)

DPÊŞ-32

Bike û pispêre Xwedê (Y. Dengiz 2015)

DPÊŞ-33

Ji ava diherike netirse, ji a sekinî bitirse (B. Tur 2016)

DPÊŞ-34

Namûsa xwe têxe ber xelkê, le malê xwe nexer ber kesî (Y. Ş. Eysê 2015)

DPÊŞ-35

Serê naêşe paçika lê megerîne (Ş. Temel 2016)

Yên bi navê sewalan çêbûne: Tesnîfkirina gotinê pêşiyên a bi vî rengî dibe ku beriya niha zêde nehatibe kirin. Lê belê Kurd weke ji mêj ve bi heywanan re mijûl in û taybetmendiyên wan baş dizanin, îca him bi wateyên mecazî û him jî bi wateyên rasteqînî hinek rol danin heywanan. Ji van pêşgotinan tê famkirin ku bê ji kîjan taybetiyên wan derketine rê û ew kirinin mijara gotinên xwe, gelo bi kîjan taybetiyên wan peyama şandine ji mirovan re.

DPÊŞ-36

Berxê çê di kozê de kifş e (V. Tüfek 2016)

DPÊŞ-37

Berxê xelkê di koza mere de mezin nabe (V. Tüfek 2016)

DPÊŞ-38

Bi gur re dikuje, bi şivên re jî şîne dikşîne (Ş. Zerga 2015)

DPÊŞ-39

Biraqe mere biçûkê **gura** be, ne ê bira be (E. Qubilmî 2016)

DPÊŞ-40

Çêleka bi dizî **ga** bixwe, eşkere dize (E. Qubilmî 2016)

DPÊŞ-41

Çêlikê mara bê jahr nabin (Y. Ş. Eyšê 2015)

DPÊŞ-42

Dahşikekî mere hebe, mere li waran namîne (Y.Ş. Eyšê 2015)

DPÊŞ-43

Golikek navê garanekê xera dike (Ş. Zerga 2015)

DPÊŞ-44

Gur bi du pariya namire (Î. Ece 2015)

DPÊŞ-45

Gur pîr bive, dibe qeşmerê **kûçika** (M. Ertekin 2015)

DPÊŞ-46

Ji **xezalê** bezatir tune, dîsa jî ji qismetê xwe bêtir naxwe (M. Ertekin 2015)

DPÊŞ-47

Heger bi dengê bilind ba, **kerê** jî biva muxtar. (E. Remo 2016)

DPÊŞ-48

Namûs avêtine ber **kûçikê**, wechê xwe jê guheriye (S. Kevirşînî 2016)

DPÊŞ-49

Nikare bi **kerê**, dahre kurtên (S. Kevirşînî 2016)

DPÊŞ-50

Rêvî nediçû qulikê, hejikek jî bi xwe vekir (E. Tekin 2016)

Yên bi wateyên dijber sazûne:

DPÊŞ-51

Em **yek** bi yekî, em **giş** bi Xwedê ne (R. Çakıl 2015)

DPÊŞ-52

Mêrê **çê** li paş ê **xerab** nasekine (E. Remo 2016)

DPÊŞ-53

Pîrê bawer nedikir bizewice, îca de' wa **xorta** dike (Z. M. Qado 2015)

DPÊŞ-54

Rastî bi rastiyê re, xwarî jî bi **xwariyê** re dahre (M. Ertekin 2015)

DPÊŞ-55

Ter û zuha/hişk bi hev re dişewitin (B. Tur 2016)

DPÊŞ-56

Zikê **têr** hay ji yê **birçî** tune ye (M. A. Ece 2015)

Yên wekî din: Pêşgotinên di gelek warên ji hev cihê de ne.

DPÊŞ-57

Aqil taca zêrîn e, Xwedê nade serê herkesî (V. Tüfek 2016)

DPÊŞ-58

Aşê dîna bê av digere (S. Kevirşînî 2016)

DPÊŞ-59

Aşiq birçî dibin qala nanê daweta dîkin (Z. M. Qado 2015)

DPÊŞ-60

Av çiqas di gola de dimîne genî dibe (M. A. Ece 2015)

DPÊŞ-61

Bira birayekî mere hebe, bira dîn be (M. A. Ece 2015)

DPÊŞ-62

Birazê li apa; xwarzê li xala tên (Î. Xoce 2016)

DPÊŞ-63

Cî ji dila teng e (Î. Xoce 2016)

DPÊŞ-64

Çi tê serê mere, ji dest zimanê mere ye (M. Sönmez 2015)

DPÊŞ-65

Çira kesî heta sibê vexistî namîne (S. Sulhan 2016)

DPÊŞ-66

Çû heyfa bavê hilîne, qûna dê li ser kir (M. Sönmez 2015)

DPÊŞ-67

Devê xelkê ne doxîna mere ye, mere girê bide (F. Deniz 2016)

DPÊŞ-68

Diranê xizana di pelûlê de dişkê (F. Deniz 2016)

DPÊŞ-69

Ê elimî, ji ê cehemî xerabtir e (N. Ertekin 2015)

DPÊŞ-70

Ê ku araqê vexwe, şûşa najmêre (S. Sulhan 2016)

DPÊŞ-71

Gîhayê hewşê tal e (N. Ertekin 2015)

DPÊŞ-72

Her tim însanê baş dîmrin (N. Ertekin 2015)

DPÊŞ-73

Her tim serê navbênçiya şikestiya (M. Selçuk 2016)

DPÊŞ-74

Hevalê nigê şemitî tune ye (Z. M. Qado 2015)

DPÊŞ-75

Kulîna malê malxwe zane (Ş. Silêman 2016)

DPÊŞ-76

Mal qiloçê mêra ye (M. Bûb 2016)

DPÊŞ-77

Malê mêra, ji jina re bê minnet e (M. Selçuk 2016)

DPÊŞ-78

Me daye nav; ya li çongê, ya li navê (C. Çeviren 2016)

DPÊŞ-79

Mêr, mêra diajo axura (B. Tur 2016)

DPÊŞ-80

Mêrê çê nanê xwe ji kevir derdixîne (R. Çakıl 2015)

DPÊŞ-81

Mêvan ji mêvên, mazûban ji herduya aciz e (B. Tur 2016)

DPÊŞ-83

Mere diz be, şevreş pir in (E. Özgen 2016)

DPÊŞ-84

Ne mere be kes birîna mere naxurîne (R. Çakıl 2015)

DPÊŞ-85

“Nizanîbûn” rihetiya cên e. (Ji bo kesên ku ji her tiştî re dibêjin “Ez nizanim” tê gotin) (Ş. Silêman 2016)

DPÊŞ-86

Kes nabêje mastê mi tirş e (H. Evdirihman 2016)

DPÊŞ-87

Pîrek parsûya xwar e (D. Özer 2016)

DPÊŞ-88

Pîrek xemla mala ye (D. Özer 2016)

DPÊŞ-89

Qismetê dînan ,ên Salih, li Xwedê ye (E. Remo 2016)

DPÊŞ-90

Rez ne tu rez bû, îca terezê lê xist (Ş. Zerga 2016)

DPÊŞ-91

Şirîkantî tişteki baş bûya, wê Xwedê ji xwe re şirîkek çêbikra (N. Tur 2016)

DPÊŞ-92

Tu bive mîr, Xwedê neke ji bîr (E. Remo 2016)

DPÊŞ-93

Xwedê çiyê dibîne û berfê lê dibarîne (M. Û. Hemê 2016)

DPÊŞ-94

Xeyda zilama nola pêlê bahrê ne, zû derbas dibe (E. Neyto 2016)

DPÊŞ-95

Yek ta nabe, du ta jî pê ve nabe (E. Remo 2016)

DPÊŞ-96

Yek dahre cî li duduya fire dibe (M.Û. Hemê 2016)

Weke me li jor jî anîbû zimên di Kovara Jînê de gotinên pêşiyên bi awayekî zanistî û gelek ji wan digel çîrokên xwe hatibûn weşandin. Dema ku em wan, bi gotinên pêşiyên ên Dêrikê re berawird dikin em dibînin ku hinekên wan yeko yeko wekhev in; an jî ji xeynî nuansên piçûk gelekî nêzî hev in. Ji bo nêzîkatiya di navbeyna wan de rind were dîtin di tabloya jêr de digel hev hatine nîşandan.

Tablo:

Tablo 4: Berawirdkirina Gotinên Pêşiyên ên Herêmê û yên di Jînê de

Ên Herêma Dêrikê	Ên Jînê
Çavên li deriya xwelî li seriya	Yê çav li deriyan, xwelî li seriyan
Ê rakevin li ciyê kaş; wê bivîne xewnê nebaş	Meger li ciyê kaş, tu nebînî xewnê şaş
Golîkek navê garanekê xera dike	Golîkê rêxo garanê xirab dike

Bira avis bi bira dereng bi	Bira avis bi bira dereng bi
Dê dibe dêmarî, bav dibe marê qarî	Dê ku bû dêmarî, bab dibî kavarî

1.1.7. Têgehên Sondxwarinê

Di jiyana rojane de mirov di mijarên aborî, civakî û olî de; carinan ji bo tişteki bi hev bidin bawer kirin, ji bo bandora peyvê zêde bikin, ji bo tişteki bikirin an bifroşin an ji bo hevûdu mecbûrî kareki bikin sondê dixwin. Çimki sond gelek caran ê hembera xwe dixwe bin qeydê, dest û nigê wî girê dide. Hinek kes bixwe sondê dixwin, hinek kes jî ji ber ku teklîfa sondê li wan dibe vî karî ji mecbûrî dikin.

Sondxwarin ji mêj ve di têkiliyên mirovan de cih digre. Di bingeha sondê de baweriyên olî û baweriyên weki din ên gel hene. Lê ji ber ku di Qurana Pîroz de di gelek ayetan de Xweda sondê dixwe mirov dikare bivêje gelê Kurd, ku ekserê wan misilmanin, di bin tesîra Quranê de serî li sondan didin. Digel ên bi têgehên olî, hinek cure sondên ji kevneşopiyê tên jî henin. Hinekên wan ji baweriyên beriya Îslamê, hinek jî bi bandora miletên din ketine nav civakê. Li herêma Dêrikê gelek awayên sondê henin. Digel temenmezinan, di nav zarokan de jî sondxwarin berbelav e. Di sondxwarina zarokan de xaleke balkêş heye. Ji zarokên sondê dixwin dema yek dibêje “*Bi Xwedê*” yê di derhal peyvê lê vedigerîne dibêje “*Berî te bi qurbana Xwedê*”. Xwediyê vê peyvê bi vî awayî dixwaze sonda hevalê xwe betal bike û ya xwe bi ser wî bixîne. Sondên ku li herêmê tên xwarin, li gorî naveroka xwe minasibê tesnîfeke wiha ne:

Sondên bi têgehên razber tên xwarin: Ev cure sond bêhtir xasî zilaman e. Li herêma Dêrikê me tu jin neditin ku bi van têgehên sondê dixwin. Çimki li gorî baweriyaya Îslamê telaq û nîkah di destê mêran de ye. Dîsa di jiyânê de parêzvanê namûs û şerefê weke erka mêran tê qebûl kirin. Têgehên vê cureyê li Dêrik û derdora wê wiha ne:

Bi her sê telaqê bê fitû/fitwe (Y. Dengiz 2016)

Bi namûs (Y. Dengiz 2015)

Bi nîkah (F. Ekinci 2016)

Bi şeref (E. Tekin 2016)

Bi telaq (S. Kevirşînî 2016)

Sondên bi têgehên olî tîen xwarin: Ruknên Îslamê yê sereke hec, nimêj, zike û rojî bûnin têgehên sondê. Dîsa “Xweda, îman û Qur’an” di sondxwarinê de têgehên herî bi bandor in. Li herêmê pîranî di mijarên girîng de ev sond tîen xwarin. Çimkî giraniya van sondan ji cureyên din bêhtir e û ger ev sond bi derewan bîen xwarin divê kefareta wan were dayin. Li herêmê têgehên vê cure sondê yê derdikevin pêş ev in:

A bi vê qubla şerîf (E. Qubilmî 2016)

A bi vî Rebê jor (N. Tur 2016)

A bi vî Rebê bi tenê (N. Tur 2016)

Bi dîn û bi îman (Q. Güler 2016)

Bi her sê navê Xwedê (Welleh, webilleh û wetilleh) (E. Özgen 2016)

Bi hezar Qur’anî (S. Kevirşînî 2016)

Bi mala Xwedê (E. Tekin 2016)

Bi sed Qur’anî (E. Tekin 2016)

Bi vê limêjê. (F. Deniz 2016)

Bi vê rojiya mi girtiye (V. Tüfek 2016)

Bi wê heca tu çûyê (N. Tur 2016)

Bi wê Qurana te pel bi pel xwendiyê (E. Tekin 2016)

Sondên bi navê xurekan û bi têgehên siruştî, asîmanî tîen xwarin: Sondên rojane ne. Giraniyek wan a mezin tune ye. Herwiha kesê bi van têgehên sondê dixwin jî nakevin bin pîrsiyariyek mezin. Yê çavkaniyên me veguhastine ev in:

Bi erd û ezmên (B. Erol 2015)

Bi vê ava îmanê (C. Çeviren 2016)

Bi vê histûna bê ezman (İ. Çeviren 2016)

Bi vê çaya ez vedixum (B. Erol 2015)

Bi vê heyvê (E. Özgen 2016)



Bi vê histûna bê ezman (İ. Çeviren 2016)

Bi vê tavê/rojê (E. Özgen 2016)

Bi vê zinarê (M. Can Tüfek 2016)

Bi vî girî (M. Ali Ece 2015)

Bi vî nanî (R. Vural 2106)

Bi vî zewadî (M. Can Tüfek 2016)

Sonda bi nan, di tradîsyona zargotina gelê kurd de xwedî cihekî taybet e. Pêşiyên kurdan her daîm bi nan sond xwarine:

“Ekserêd cuhalayêd wan Ekradan, me’azellah nanî îman dizanin û bi nanî sûndê dixwin û goya dibêjin wekû mirov bi nanî nexwitin êdî dîn û îman nabitin” (Bazîdî, 2012: 113).

Sondên bi navê ûcax, gor û bi serê mirovan tên xwarin: Ev cureyê sondê li herêmê gelekî meqbûl e. Bêhtir jinan ev sond neqlî me kirin. Têgehên sereke li herêmê bi vî rengî ne:

A bi vî Girê Dod⁶⁷ (D. Özer 2016)

Bi gorra bavê mi (R. Vural 2016)

Bi gorra ciya mi (E. Remo 2016)

Bi gorra miriyê te (E. Remo 2016)

Bi serê birê te (E. Remo 2016)

Bi serê lawê te (N. Tur 2016)

Bi tirba kaliko (N. Tur 2016)

Dema em bala xwe didin sondxwarina rojane ya gelê herêmê em dibînin ku şêweyên cihê cihê yên wan hene. Ji sondên bi şertê Îslamê bigrin heta sondên bi teşeyên asîmanî. Di bingeha van têgehên sondan elbet wê bandora gelek tiştan hebe. Weke me di serê mijarê de jî anîbû ziman di bingeha sondên herêmê de bawerîyên dînî gelekî xurt e. Tê dîtin ku di Qurana Pîroz de Xweda jî bi têgehên cûr be cûr sondê dixwe. Her sê ayetên serê sûreta Tîn ê wiha ne:

⁶⁷ Girekî li başûr-rojhilatê Dêrikê ye. Weke ûcax tê zanîn.

“*Sûnd bi hejîrê û zeytûnê, Sûnd bi çiyayê Tor û Sîna, Sûnd bi vî bajarê emîn*” (Hakkarî, M. M: 2007). Herwekî tê dîtin di vir de berê bi xurekan, paşê bi çiyayan û herî dawî jî bi bajêr bixwe sond hatine xwarin. Awayên sondxwarina şêniyên herêma Dêrikê jî nêzîkî têgehên di van ayetan de ne.

1.1.8. Nifir-Dia

Nifir bingeha xwe ji belengazî û nerazîbûnan; dia jî bingeha xwe ji memnûniyet û kêfxweşiyê distînin. Yek bi wateya xwe erênî ye û ya di jî wateya neyînî dide. “Dia û nifir ew cure peyv in ku yan xêrxwazî yan jî xêrnexwazî ne. Dia û nifir him li wechê wan û him jî li pêy wan kesên ku mirov dixwaze ji wan re bivêje, minasibî gotinê ne” (Artun, 2009: 34). Dia û nifir di zargotina herêmê de xwedî cihekî taybet in. Gelê herêmê niş bi niş ev peyv neqlî hev kirine. Dia û nifirên bi hosteyî hatine hûnandin, kûrahiya çanda herêmê nîşanî me didin.

Nifir

Hêviya kesê nifirkêr ew e ku yê hembera wî duçarî nexweşî, xerabî û gelek tiştên din ên neyînî bibe. Ji xeynî kesên hemberî xwe, mirov carinan nifiran li xwe jî dike. Weke cureyên din, me nifirên li herêmê jî li gorî naveroka wan li jêr tesnîf kirine.

Nifirên ku hinek kes li xwe dikin: Nifir ne tenê li kesên wekî din tên kirin. Herwiha mirov carinan nifiran li xwe jî dikin. Lê nifirên ku mirov li xwe dikin, xwedî wê taybetmendiye ne ku minasib in li kesên din jî werin kirin. Ji van nifiran digel ên ku ji bo bandora peyvê zêde bikin, herwiha yên ji dil û can ve li xwe tên kirin jî henin.

DN-1

Agir bi mala mi keve (D. Özer 2016)

DN-2

Çavê mi birije (E. Remo 2016)

DN-3

Ez çêyê/xêrê ji xwe nebînim (E. Remo 2016)

DN-4

Ez ji ciyê xwe ranebim (E. Remo 2016)

DN-5

Ez xêrê ji gedê xwe nebînim (V. Tüfek 2016)

DN-6

Li min nebe sibe (R. Vural 2015)

DN-7

Mala mi bişewite (V. Tüfek 2016)

DN-8

Mala mi xera bive (R. Vural 2016)

DN-9

Xwedêyo, tu canê mi bistîne!(V. Tüfek 2016)

Nifirên li kesên din tên kirin: Ev cure nifir bêhtir li kesên din tên kirin.
Gelekên wan ne minasib in ku mirov wan li xwe bike.

DN-10

Agir bi bedenê ketê/o (S. Yücel 2016)

DN-11

Agir bi laşê te keve (Z. M. Qado 2015)

DN-12

Ava zer bi canê te de hato (Z. M. Qado 2015)

DN-13

Bazinê hustê te bişkê (S. Yücel 2016)

DN-14

Bela te ji ber nige te bê (M. Tüfek 2016)

DN-15

Biraqe tu car qirpika te hilneyê (M. Tüfek 2016)

DN-16

Di gewriya te de bimîne (S. Yücel 2016)

DN-17

Di qirika te de hato (yanî qansêr) (M. Tüfek 2016)

DN-18

Di te de hato (Weke jana zirav di te de derkeve) (Y. Ş. Eyşê 2015)

DN-19

Emir qutê (Z. M. Qado 2015)

DN-20

Ew pere ji bêrîka te bikeve (M. Tüfek 2016)

DN-21

Gerden hilyayo (Ş. Zerga 2015)

DN-22

Gulle li mejî keto (M. Tüfek 2016)

DN-23

Gulle li bin dilê te keto (Z. M. Qado 2015)

DN-24

Her û veneger (Ş. Zerga 2015)

DN-25

Hêviya mi ji Xwedê heye tu di gorê de nasitire (Ş. Silêman 2016)

DN-26

Heviya mi ji Xwedê heye tu têr naxwe (M. Tüfek 2016)

DN-27

Keda te bi te nemîne (Q. Güler 2016)

DN-28

Kevir li we bibare (M. Tüfek 2016)

DN-29

Kezeba te di devê re derkeve (Q. Güler 2016)

DN-30

Kezeba te xera bive (Ş. Zerga 2015)

DN-31

Marekî zîha⁶⁸ bi te vede (Ş. Silêman 2016)

DN-32

Mejiyê te bela bive (M. Tüfek 2016)

⁶⁸ Cûreyekî maran e ku jehra wan gelekî zêde tê zanîn.

DN-33

Meytê mezelan (Ş. Silêman 2016)

DN-34

Meyt-il hilat (Ş. Silêman 2016)

DN-35

Miradê te bi axê bûyo (Q. Güler 2016)

DN-36

Pariyê te bi te nemîne (Ş. Zerga 2015)

DN-37

Perpitiyê (Q. Güler 2016)

DN-38

Qansêr di kezeba te de were (Q. Güler 2016)

DN-39

Qirika te wek qirika qiralkê be (Ş. Zerga 2015)

DN-40

Ro bi serê te nekeve (Q. Güler 2016)

DN-41

Top li te keve (Q. Güler 2016)

DN-42

Tu her daîm motac/muhtac be (M. Tüfek 2016)

DN-43

Tu ji keda xwe nexwe (Ş. Zerga 2015)

DN-44

Tu têr nexwe, li te bi pişok be (M. Ertekin 2015)

DN-45

Tu xwîn verişe (N. Tur 2016)

DN-46

Ûcaxê te kwîr bûyo (M. Ertekin 2015)

DN-47

Umrê te qut bive (Ş. Silêman 2016)

DN-48

Wey Rebî tu nefilite (Ş. Silêman 2016)

DN-49

Xwedê bi dujminê te be (M. Tüfek 2016)

DN-50

Xwedê heqê mi ji te re nehêle (A. Deniz 2016)

DN-51

Xwedê riya çê bi ber te nexîne (R. Çakıl 2016)

DN-52

Xwedê te nehêle (R. Çakıl 2016)

DN-53

Yeka te nebe dudu (Ş. Silêman 2016)

Wekê tê dîtî digel mijarên din, hedefa gelek nifiran rasterast li ser hilweşîna beden û tenduristiya mirovan e. Ji nifirên ku li kesên din tînin kirin carinan ji bo şertek

bi cih were mirov wan li xwe jî dîke: Di nîfira “Xwedê heqê *mi ji te re nehêle*” de, xwediyê nîfirê li gorî rewşa bûyerê dibêje: “Hege filan tişt wiha be, Xwedê heqê *te ji mi re nehêle*.” Ev dibe nîfirek du alî.

Dia

Çawa me gotibû nîfir wateyên neyînî di hundirîne, li dijî vê dia bi wateyên xwe yê erênî dibe panzehîra nîfiran. Di nîfiran de hêvî ew bû ku kesên nîfir li wan dibin; bi mal, beden, rihetî û tenduristiya xwe neçar, belengaz û hîn xirabtir bibin. Bi diayan jî tê hêvîkirin ku şexsên dia ji wan re dibin îhya bibin û bi gelek awayan bigihêjin rihetî û firehiyan. “Di diayan de hêvî bi zêdebûna malê dinyê û qismetê fireh, ji rihma Xwedê pargirtin û kêfxweşiya li herdu dinyayan tê kirin.” (Dilazad, 2011: 91-93). Diayên li herêma Dêrikê tên kirin, hinek jê ev in:

DD-1

Damara te bi hezar û yek be (E. Qubilmî 2016)

DD-2

Destê Baz Evdilqadirê Geylanî li piştta te be (E. Qubilmî 2016)

DD-3

Destê Xocê Xizir li piştta we be (Ş. Zerga 2016)

DD-4

Mûyê sipî di çoka te de were (M. C Tufek 2016)

DD-5

Rihma Xwedê li dê û bavê te be (E. Qubilmî 2016)

DD-6

Riya te vekirîbe (Ş. Zerga 2016)

DD-7

Tu neke Xwedê bide te (Q. E. Neyto 2015)

DD-8

Xocê Xizir rêberê te be (E. Qubilmî 2016)

DD-9

Xwedê bigihêjîne ber destê miriyê we (R. Vural 2016)

DD-10

Xwedê bisitirîne (R. Vural 2016)

DD-11

Xwedê we/wan bi hev re kal û pîr bike (Q. E. Neyto 2015)

DD-12

Xwedê ewledê salih bide te (H. Şêxmûs 2015)

DD-13

Xwedê kesî di tengayê de nehêle (M. C. Tüfek 2016)

DD-14

Xwedê li te were rihmê (E. Qubilmî 2016)

DD-15

Xwedê ji te re bihêle (M. Bûbê 2016)

DD-16

Xwedê silametiya xêrê bidê. (Q. Güler 2015)

DD-17

Xwedê te bi dê û bav mezin bike (H. Şêxmûs 2015)

DD-18

Xwedê te bigêjîne mirad û meqседа te. (C. Meşkînî 2015)

DD-19

Xwedê te bike bavê heft lawa (C. Meşkînî 2015)

DD-20

Xwedê tifaqê bide we. (E. Qubilmî 2016)

DD-21

Xwedê û Pêxember ji te razî be (Z.M. Qado 2015)

DD-22

Xwedê emrê te dirêj bike (M. Bûbê 2016)

DD-23

Ya Rebî me kêr kir, tu zêde bike (H. Şêxmûs 2015)

Di diayên ku me ji sehayê dane hev de em dibînin gelemperî hêvî ji Xwedê ye. Herwiha hêviya xêr û bereket; siheta can û bedenê û xêrxwaziyên wekî din mijarên diayên herêmê ne. Ji xeynî wan, hinek gotin henin ku em dikarin biwêjin “Nifir-dia” nin. Him dia û him jî nifir bi hev re nin. Mînakên wan cureyan kêr in:

“Xêr û xweşî li te barî, kevir û kûçik li me barî” (Q. Güler, 2016)

1.1.9. Gotinên Qalibgirtî

Ew cure peyv in ku ji bo rewş û bûyerên di heman rengî de, bi yek şêweyê tên gotin. Wateya van cure peyvên ji herkesî re kifş e. Xwediyê van cure peyvên ne kesê ku wan dibêje, lewra di heman rewşê de, heman peyv ji hêla hemû kesî ve tê gotin. Jixwe herkes ji ber bikaranîna hevpar a van gotinan heman wateyê ji van peyvên fam dikin. Di hinek mijaran de ger ev peyv neyên gotin weke behs nîvco dimîne. Gotinên

qalibgirtî peyvê dixemilînin, bi wateya xwe ya dewlemend ji peyvên din jî vediqetin. Ji van peyvên hinek jê bi şêwe û wateya xwe di sinifa biwêjan de ne.

Di nav gelê Kurd de û bi taybetî li cihekî weke Dêrikê têkiliyên civakî gelekî xurt e. Gelê herêmê di kêf û şahiyên de, di şîr û nexweşiyên de her tim li ber serê hev in, hevûdu sax dikin, li hev dipirsin. Carinan kêfê li hev zêde dikin, yek carna êşê ji hev sivik dikin. Di van têkiliyan de ji bo rewşên cihê cihê peyvên watedar ên qalibgirtî rolên mezin dilîzin. Di warên curbecur yên jiyana civakî de li sehaya Dêrikê peyvên qalibgirtî hinek jê ev in:

Silavdayin, xatirxwestin û oxirkirin:

Emanetî Xwedê bin (R. Çakıl 2016)

Êvara we bi xêr be (Y. Ş. Eysê 2015)

Li xwe miqate be (Y. Ş. Eysê 2015)

Oxira we a xêrê be (Q. E. Neyto 2015)

Oxira we a Elî-Muhemed be (Q. E. Neyto 2015)

Şeva we bimîne xweş (R. Vural 2016)

Tu emrê te heye? (R. Çakıl 2016)

Wekîlê silaba bin (Ş. Temel 2016)

Xwedê rihetiyê bi te de (Î. Çeviren 2016)

Tu ser serê mi û ser herdu çavê mi hatiye (Î. Çeviren 2016)

Gotinên di derbarê sebr û qeneatê de

Bira têkeve ber qeza û bela (Ş. Temel 2016)

Bira li ser îmanê be (Y. Ş. Eysê 2015)

Bira xêra dê û bavê me be (R. Çakıl 2016)

Biraqê serê we sax be (S. Sulhan 2016)

Sebra Xwedê bikşîne (Î. Çeviren 2016)

Stara Xwedê lê be (Q. E. Neyto 2015)

Xwedê bi rihma xwe şa bike (Y. Ş. Eysê 2015)

Xwedê ji herdu rihma, rihmekê lêbike (Î. Çeviren 2016)



Xwedê xelesa we vegeerîne (R. Çakıl 2016)

Gotinên xêrxwazî û pîrozkirinê:

Bi xêr û silamet be (E. Remo 2016)

Bila bi navê xwe mezin bive (E. Remo 2016)

Dûrî emrê te (S. Yücel 2016)

Dûrî van dera (Y. Ş. Eysê 2015)

Ser xêrê be (R. Çakıl 2016)

Tu bi xêr biqetîne (kincekî yan solekê) (S. Yücel 2016)

Tu û gedê xwe ji mi re sax bin (M. Sönmez 2015)

Xwedê zêde bike (Q. E. Neyto 2015)

Zêdaya we bimbarek be (S. Sulhan 2016)

Gotinên wekî din ên di peyva rojane de tên bikaranîn

Bê lome be (M. Sönmez 2015)

De qey ez ji te re zanim (Ş. Temel 2106)

Duayê xasê Xwedê (Ş. Temel 2016)

Ez ê tiştêkî bivêjim (yê hemberê jî dibêje)

-Du tiştê bivêje (Ş. Temel 2016)

Filankesê bi dê û xwehê mi be (S. Sulhan 2016)

Heşayî hazira (Ş. Temel 2016)

Heşayî hizûra we (S. Sulhan 2016)

Heşayî şîr û heyvanê te (Y. Ş. Eysê 2015)

Hûn nizanin ez ê çi bivêjim (Ş. Temel 2016)

Ji me neyê xwestin (S. Yücel 2016)

Jixwe filankesê wek ciya/xweha min e (M. Sönmez 2015)

Jixwe hûn jî wek ewledê min in (Z. M. Qado 2015)

Mêvan, mêvanê Xwedê ye (Z. M. Qado 2015)

Nalet li çavê şeytên bê (Q. E. Neyto 2015)

Peyva te bi şekir dibirrim (S. Sulhan 2016)
Rast û derewê wî (Î. Çeviren 2016)
Te çawa neh meha di zikê dê de sebir kiriye (S. Yücel 2016)
Tu bi galgal e (Z.M Qado 2015)
Tu çawa zane ez jî wer zanim (E. Remo 2016)
Way lê ûcaxê te kwîr nebiyo (E. Remo 2016)
Xêr û guneh di hustu de (Z. M. Qado 2015)
Xulamê te be (M. Sönmez 2015)
Xwedê bike qismet (S. Yücel 2016)
Xwedê çi kiribe qismet (Y. Ş. Eyšê 2015)
Xwedê ji min û te re mezin e (S. Sulhan 2016)
Xweziya mi bi dilê te (S. Sulham 2016)

1.1.10. Navûnûçik

“Navûnûçik di pey navê kesan yên resen li wan hatiye kirin û pê ve di sînor û tixûbê çanda wan de li gor hin taybetiyên kesan, navê ku taliyê li wan hatiye kirin an jî li ser navê wan hatiye zêdekirin. Herçend hin navlêk di şêwe yan jî teşeyeke wisa de ne ku mirovan rencîde bikin, kêr û piçûk dibînin, heta carinan bi mebesta heqaretê tên bikaranîn jî, rastiyek heye ku di nava Kurdan de kevneşopiyek belavbûyî ye” (Mukriyanî, 2015: 3). Li Dêrik û derdora wê hema bêjin leqebê herkesî heye. Çi mezin çi piçûk; çi jin çi mêr. Herkesî para xwe ji navûnûçikan girtiye. Navûnûçik an jî bi gotineke din leqebên ku me ji sehayê berhev kirine ev in:

Yên asayî: Ew cure navûnûçikên ku ji ber taybetmendiyên fizîkî yên kesekî kû ji herkesî ve xuyanî ye derketine holê. Digel ku hinekên bi navê wan kesan tên bikaranîn, yên ku tenê jî tên bikaranîn henin.

DNN-1

Eliyê qop (Ş. Sîlêman 2016)

DNN-2

Evdê tekdiran (Ş. Silêman 2016)

DNN-3

Evdê zikmezin (Î. Xoce 2016)

DNN-4

Eyşika gurî (M. C. Tüfek 2016)

DNN-5

Fadilê kerr (R. Vural 2016)

DNN-6

Gunno (Ş. Temel 2016)

DNN-7

Kor Salih (Şêx Silêman 2016)

DNN-8

Lalo (M. Û. Hemê 2016)

DNN-9

Mesûdê simêlmezin (C. Çeviren 2016)

DNN-10

Remê piştwar (i. Xoce 2016)

Yên pesindarî: Ew cure ye ku ji ber mêranî, comerdî, fedakarî û hinek taybetmendiyên din ên hin kesan li wan hatine kirin.

DNN-11

Beranê qemer (B. Tur 2016)

DNN-12

Beranê soringî (Şêx Silêman 2016)

DNN-13

Gunikreş (Î. Xoce 2016)

DNN-14

Lokê sor (B. Tur 2016)

DNN-15

Şêrê zozana (S. Sönmez 2015)

Yên bi teşbîha ûzûwên mirovan çêbûne: Ew cureyê ku ûzûwên mirovan dişibîne tiştên din. Bêhtir ji hêlên nexweş ve ev teşbîh çêbûne.

DNN-16

Bêvil tiving (B. Tur 2016)

DNN-17

Çavbeloq (S. Sönmez 2015)

DNN-18

Çavsor (S. Sönmez 2015)

DNN-19

Çîplûle (S. Sönmez 2015)

DNN-20

Develbik (A. Aras 2015)

DNN-21

Devlolib (R. Vural 2016)

DNN-22

Devreş (Î. Xoce 2016)

DNN-23

Diranfîq (B. Tur 2016)

DNN-24

Guhbel (M. Û. Hemê 2016)

DNN-25

Pozbeluh (A. Aras 2015)

DNN-26

Pozgilûr (S. Sönmez 2015)

DNN-27

Pozkutilk (C. Çeviren 2016)

DNN-28

Pozqîvar (A. Aras 2015)

DNN-29

Poztiving (C. Çeviren 2016)

DNN-30

Serbergîr (E. Remo 2016)

DNN-31

Sercimcim (M. Û. Hemê 2016)

DNN-32

Serkundir (C. Çeviren 2016)

DNN-33

Sermazîko (Ş. Temel 2016)

DNN-34

Serşûnik (E. Remo 2016)

DNN-35

Serqûşxane (E. Remo 2016)

DNN-36

Ziktêrr (S. Sönmez 2015)

Yên bi riyên din çêbûne: Bi gelemperî ji sifetên nexweş pêk hatine. Li kesên ku mirov ji wan hez nakin tîn kirin.

DNN-37

Çavbênamûs (Ş. Temel 2016)

DNN-38

Çavqahp (M. A. Ece 2016)

DNN-39

Gewende (E. Remo 2016)

DNN-40

Jahro (M. C. Tüfek 2016)

DNN-41

Kevrê qûna (Y. Dengiz 2015)

DNN-42

Kundê kwîr (Ş. Temel 2016)

DNN-43

Marê kwîr (Y. Dengiz 2015)

DNN-44

Qujînge (M.A. Ece 2016)

DNN-45

Tirşîko (Y. Dengiz 2015)

Navûnûçîkên li hin malbatan bûne: Digel navûnûçîkên li şexsekî hatine kirin, herwiha navûnûçîkên li malbatan jî tên kirin henin.

DNN-46

Mala gûpir (M.C. Tüfek 2016)

DNN-47

Mala cango (M.C. Tüfek 2016)

DNN-48

Mala dîna (Y. Dengiz 2015)

DNN-49

Mala gazîko (R.Tur 2016)

1.2. Cureyên Bi nezm**1.2.1. Zûgotinok**

Zûgotinok, çeşnên edebiyata devkî yên bi nezm in. Ristina wan hêsan e. Hinek ji wan bi bêje û dengên nêzî hev tên sazîkirin. Ji heft salîyan, heta heftê salîyan herkes dikare peyvan bînin cem hev û wan bi nezm bikin. Boratav pênasêya zûgotinokan wiha dike:

“Zûgotinok bi berhevanîna rêwşên nebûyî û ramanên li dijî hev, gîhiştina encamnî dîrî aqîlan e ku di wan encaman de bandornî matmayî tîn afirandî. Cureyên zûgotinokan ên çîrokan, lîstîkan (hejmarok), reûresman û cambaziya peyvê hene” (Boratav,2014: 155-156).

Herêma Dêrikê ji hêla vê cureya çanda gel a Kurdî ve dewlemend e. Gelê herêmê di serê çîrokan de, di lîstîkên xwe de û ji bo rewşên din peyv bi hunerî hûnandine. Lê pîrsgirêka herî mezin ya zûgotinokên herêmê bi taybetî jî di cureyê hejmarokan zêdebûna varyanta ye. Çimkî her hejmarok bi çend şeweyên ji hev cihê ji mere hatin vegotin. Li herêmê ev rewş ji bo hinek keresteyên din ên çanda gel derbasdar e. Di vî warî de nêrîna Ensar Aslan wiha ye:

“Piraniya keresteyên folklorîk bi riya zimên ji nîşekî derbasî nîşê din bûne û gîhiştine heta roja me. Di dema veguheştinan de ji ber ciyawaziya kes, dem û deran cudatî û cihêrengî derdikeve holê. Dibe ku vebêjer bêjeyek an ristek stranê ji bîr kiribe. Dema ku ji hinekan re stranê dibêje ji bedêla risteke ji bîr kiriye ew bi xwe rîstekê dixê. Ev rewş bi taybetî ji bo çîrok û çîrçîrokan jî derbasdar e. Vê rewşê di çanda gel de bûyera varyantan derxistiye holê “(Aslan, 2005: 9). Ji xeynî zûgotinokên me di beşa lîstîkan de dabûn, zûgotinokên ku me ji sehayê berhevkirine digel naverok, peywîr û teşeya wan wiha tîn dabeş kirin:

Zûgotinokên lîstîkan: Bi gotineke din navê vî cureyî hejmarok e. “Bi eslê xwe cureyekî zûgotinokan e. Di lîstîkan de kêrî diyarkirina *Pîrika* lîstîkê tîn. Gotinên qalibgirtî ne ku ya ji serî yan jî ji dawîya peyvê bi wezn in. Beriya lîstîkê tîn gotin.” (Boratav, 2014: 156)

Ne şert e ku weznekî kiteyî yê hejmarokan hebe. Ev cure bi eslê xwe zûgotinok bin jî, ji hêla bikaranînê ji zûgotinokên din hebekî vediqetin. Li Dêrik û derdora wê zûgotinokên ji bo ku “*dora*” lîstîkvanan diyar bikin tîn gotin ev in:

DZ-1

Ho kildo/ mo kildo 4+3

Kil ji kilê/ biharê 4+3

Av ji ava/ çinarê 4+3

Qîza Ereb/ berazo 4+3

Yekî Ereb/ dixwazo 4+3
Mih(î)na Ereb/ derxîne 4+3
Zeng û zîva/ b'serxîne 4+3
Kof(i)ya hirçê/ zêrîn e 4+3
Hirç elimî/ ser texta 4+3
Çav hilnayê/ bi rexta 4+3 (A. Aras 2016)

DZ - 2

Heqnî/ deqnî 2+2
Çal û çimil
Misk û imbil
İmbil lolo
Telih tolo
Birbî fîncî
Zekî kuncî
Apan lapan “kurk”

-“kurk” li kê biketa ew dibû pîrika lîskê. (H. Evdirrihman 2016)

DZ-3

Yek û/ yek 2+1
Teyrê/ belek 2+2
Zozan bilbil
Dermanê dil
Şekr û şima
Li ber çema
Çem miçiqî
Av tê nema (Ş. Temel 2016)

DZ-4

Yekê/ yekê 2+2

Yekanakê

Da bîstanê

Gulçîzanê

Gula çepê

Çeplimizê

Xana gizê

Dosta îne

Ser kişkîne

Heba tirî

Vegindirî

Çam û çê ye

Xulxule ye

Barûte ye

Bîst li te ye (H. Şêxmûs 2015)

DZ-5

Yekê/ yekê 2+2

Du amekê

Sê hec yekê

Bîsta xemo

Ara bîngo

Pîr qulingo

Hestyê kewê

Li bin kewê

Kew firiya

Çav rijiya

Bîsta wî ya

- “Bîst” li kê keve ewil dora wî ye. (E. Remo 2016)

DZ- 6

“Yeknê duknê/ dumaza 4+3

Şemsê Qutê/ repaza

Hêkê mêkê/ qeraçî

-“Qeraçotik/ fisbirçî” li kê biketa dibû mata⁶⁹ wan. (N. Ertekin 2015)

DZ-7

Hizrî /mizrî 2+2

Bûka/ siwara 2+3

Çû bajarê/ minara 4+3

Bin(i)ya bajêr bi gwîz e

Çindik çindik dilîze Sê

siwar hat dilîze Ez’b(i)

qurbana Qasimo Qasim

bavê Neytulla

Du kevokê sipî ye Li

hucrê rûniştiye Esker

şeytan kuştiye Gul û

rihan hiştiye.

-Me veya dijmart, peyva dawiyê bihata ser kê ew dibû “pîrê” (M. Sönmez 2015)

DZ-8

Fêse fêsasê

Bê dînê bê kirasê

Heqnî deqnî

Çal û çimil

Bisk û umil

Lolê Yasîn gurçik.

⁶⁹ Di lîstikan de bi wateya “dor” ê tê bikaranîn

-“Di dawiyê de li kê keta wî çavê xwe digirt. “(S. Sönmez 2015)

DZ-9

Rêvî rêvî/ rindik 4+2

Serê dêla rêvî/ qursindik 6+3

Çi rêvîkê serê ciyara⁷⁰

Xwariye tersê dewsa wara

Bijmêr bijmêr ne bîst û çara

Qetla rêvî li mi helala (H. Evdirrihman 2016)

DZ-10

Sa/ta/xa 3

Sa/ti/la/xa 4

Qa/ta/xa 3

Qan/ti/ra/xa 4

Hilifî 3

Milifî 3

Çax çulifî 4

Ar tûtik 3

Ber war tûtik 4

Şêx Geylanî 4

Dev rûtik 3 (Z.M Qado 2015)

Zûgotinokên ji bo hevşaşkirin û hunera peyvê: Ew cure zûgotinok in ku bilêvkirin û telafuza wan hinekî dijwar e. Ji bo derbaskirina demên bikêf an jî wek cureyek pêşbirkan e ku yê bikaribe wan serast telafûz bike serkeftî dibin. Zûgotinokên ku me ji herêma Dêrikê dane hev ên di vê beşê de hinekên wan bi awayekî argowarî hatine ristin. Mînakên vê cureyê wiha ne:

DZ-11

Quz û qizwan di kevçî de

Mi qizwan xwar, quz ma di kevçî de (B. Tur 2016)

⁷⁰ Pevguherîna d-c yê di devoka Dêrikê de di virde xwe baş nîşan daye: “Diyara-ciyara”

DZ-12

Çel serçe ji virde hat

Çel serçe ji wê de hat

Vî çel serçî ji wî çel serçî re got:

-Çel serço tu çi çel serçe ye? (E. Tekîn 2016)

DZ-13

Heft hirç pirç

Her heft hirç

Nav mil pirç (S. Vural 2016)

DZ-14

Sing hat mala

Me sing xist nav kayê

Me singek da dayê (H. Evdirrihman 2016)

DZ-15

Vizî vizî bavê min kerek dizî

Kera bavê min wenda bû

Tevziya nigê min bela bû (S. Sönmez 2015)

DZ-16

Teşteş nîsk mişt

Du teş nîsk mişt

Sê teş nîsk mişt (H.Şêxmûs 2015)

DZ-17

Tir û tivir di kevçî de

Mi tivir xwar

Tir ma di kevçî de (Ş. Silêman 2016)

DZ-18

Kurm, qurm qul kiriye (N. Ertekin 2015)

DZ-19

Bi niga çû gû

Bi desta çû mû

Bi deva çû tû (D. Özer 2016)

DZ-20

Îro nîro Nûrî nêrî av da (B. Tur 2016)

DZ-21

Baqek dezî

Di qula derziya

diya min dezî (Î. Ece 2015)

DZ-22

-Silêmanê du nikûl Çû

ser darê tirek kir Hat

binê darê fisek kir Çû

cem xatûnê

pif kir qûnê (F. Deniz 2016)

DZ-23

Pîrebokê

Gûngulokê

Şev şimamokê

Bi ro pîrebokê (S. Heno 2016)

DZ-24

Gur hatiye gîskeke

Nadim te

Heb nîskekê
Golika xalo
Li paş malo
Ne gur dixwe
Ne diz dibe (Ş. Zerga 2015)

Zûgotinokên di serê çîrokan û di dawiya wan de tîn gotin

DZ-25

Çîrokê
Çîrvanokê
Berda cokê
Cok miçiqî
Rûn biriqî
Li ser benderê
Mele çûyê, bi xençerê (R. Çakıl 2015)

DZ-26

Çîrçî/rokê 2+2
Rûnê /rokê
Berda cokê
Cok miçiqî
Rûn biriqî
Gol(i)ka xala
Çû paş mala
Hirûn ketê
Hat nav mala
Golik go: urr
Diwêr go: xwirr
Kalo go: “Li ser kopikê min î gurîz” (Î. Ece 2015)

DZ-27

Hebû tunebû

Kes ji Xwedê mezintir tunebû

Rihmet li dê û bavê min û we bû (M. A. Ece 2015)

DZ-28

Çîroka mi çû giyara

Rihmet li dê û bavê guhdara

Ji xeynî şeytanokê ber dîwara (M. Vural 2016)

Zûgotinokên kurt ên di nav peyva rojane de tîn gotin: Armanca sereke ya di van peyvan de lihevanîn e. Ji bo çêjekê bidin gotinê pevxistin û lihevedilandina hinek dangan e. Piraniya gotinên wan bi wate ne. Di vî cureyî de peyv gelekî hatiye kurtkirin. Hinekên wan ên di şêweya biwêjan de jî henin. Digel ên aferîdeyên zarokan in, ên ku mezinan jî hûnandine henin. Di sazûna wan de navê hinek şexs, sewal, eşya hatine bikaranîn. Yê bi alîkariya navên hejmaran jî çêbûnin henin. Piranî di jiyana rojane, di nav peyvê de tîn bikaranîn.

DZ-29

Çilî te, erbanî te (M. Selçûk 2016)

DZ-30

Edena, bûye ciyê rebena (N. Ertekin 2015)

DZ-31

Evdo, guyê bavê xwe bi hevdo (R. Çakıl 2016)

DZ-32

Ez ez im; gurê pez im (M.A Ece 2015)

DZ-33

Girî, girî ji bo hebek tirî (A. Aras 2016)

DZ-34

Heçê bivêje bêş, lê siwarbim heta êş (B. Erol 2015)

DZ-35

Henek dibin genek (B. Tur 2016)

DZ-36

Hirça bipirç (B. Tur 2016)

DZ-37

Îşev ewr e, ciya te stewr e (S. Kevirşînî 2016)

DZ-38

Kereng şîn tê li kaşa; xwarina ker û daşa (R. Tur 2016)

DZ-39

Kurmanc têr, xew jê re xêr (B. Erol 2015)

DZ-40

Mast, taştaya rast (R. Tur 2016)

DZ-41

Mihemed Elî dims û qelî (R. Tur 2016)

DZ-42

Misto derpî sisto (M. Ê. Hemê 2015)

DZ-43

Pere pêşin, serê min neêşin (M. Sönmez 2015)

DZ-44

Reşiko, goşt xweşiko (M. Sönmez 2015)

DZ-45

Sofiya li nav deviya (M. Sönmez 2015)

DZ-46

Şeş, nave Xwedê û pêxember xweş, ruyê şeytên reş (S. Kevirşîni 2015)

DZ-47

Tat û qerewat (M. Ertekin 2015)

DZ-48

Teyare her û were cixare (A. Aras 2015)

DZ-49

Xursî, xwediyê xiyarê çilmisî, ne dixwe û ne dide kesî (M. Selçuk 2016)

DZ-50

Xwediyê fisê bi xwe dihise (A. Aras 2015)

Zûgotinokên ji bo şabûna bi zarokan: Ji bo ku zarokên piçûk aşt bibin an jî yên hinekî mezintir kêfxweş bibin ev zûgotinok tên gotin. Di hinek mînakên wan de du heb bi dor bi hev re dipeyivin, yanî danûstendinek peyvê heye:

DZ-51

-Kê destê şikenand?

-“Pîrê”

-Ji bo çi?

-Ji bo hevirtirş

-Kê xwar?

-Pisîkê

-Çi lêxist

-“Şûnik”

-Wilî wilî wilî... (Z. M. Qado 2015)

DZ-52

-(Yek dibêje) “Kînga?”

-(Ê di lê vedigerîne, dibêje) “Sala pînga”

Mi şîr û şekir xwar

Te nanê tisî xwar. (D. Özer 2016)

DZ-53

Oxir be

Şîva te bilxur be

Kevçiyê te bi qul be (E. Selçuk 2016)

Yên derbarê meh û demsalan de**DZ-54**

Adar e, bihar e

Dew li dar e

Ji şivana re xumar e

Ji kevaniya re kar û bar e (X. Xatûnê 2016)

DZ-55

Meha adarê

Mehêk xedar e

Ne zivtan e, ne bihar e (Z. M. Qado 2015)

1.2.2. Mamik

Bi gotineke dorpêçkirî em dikarin bivêjin mamik, ew pirsên ku bingeha xwe ji zanîna mirovan digrin û muhtacî bersiv û texmînên bîaqilî ne, bêyî navê tiştêkî were gotin, ew tişt digel taybetmendî û sifetên xwe tê teswîrkirin di wan pirsan de. ”Wek pênaseya wan, dewlemendiya mamikan û geşedana wan a dîrokî jî efsûnî ne. Her çiqas îro wek keresteyeke kêf û lîstikê û ji bo fêrkirina ziman amûreke kêrhatî be jî li gorî lêkolîneran di eslê xwe de mamik berê ji bo pêşbaziya zîrekiyê yê siltanan

û ji bo veşartina raz û sembolan gotinên zor û zehmet bûne” (Subaşî, 2016). Dibe ku mamikek cara ewil ji hêla kesekî hatibe gotin. Lê paşê li nav civakê belav bûye, bûne malê tevahiya civakê.

“Mamik jî weke berhemên din yê çanda gel di esasê xwe de aferîdeyên kesan in. Lêbelê dîtî û tesbîtkirina afirînerê wan yê ewil ne mimkûn e. Çimkî mamik ku were gotin û li nav gel belav bibe bêxwedîtî dibe wesfekî wê” (Boratav, 2014: 131). Li gorî zanyaran ev rewş ji bo tevahiya berhemên folklorîk derbasdar e: “Folklor ne wekî tore nivîsiye ku bi navê mirovekî ye, ji hizir û bîra wî ye, folklor berhemê mîletî ye bi carekê; eger çî ji rêve diyar e yekî gotî bi kiryarekê û bi qewmînekê ya bi rûdanekê û belav bûye û bûye sermaye mîletî” (Amêdî, 2013: 11) .

Mamikên ku me li sehayê berhevkirine bi vegotinên cur be cur in. Hinek ji wan bi qalibê “*Tiştêkî min heye*” dest pê dikin û paşê mamik tî pirsîn. Hinekên wan jî bêyî qalib, lê bi awayekî ahengî rasterast tî pirsîn. Bi gelemperî mamikên herêmê ji du rêzikan pêk hatine û herdu rêzik bi hev re bi qafiyeyê nin. Ji xeynê du rêzikan, ên dirêjtir jî henin. Ya herî kurt jî sê bêjeyan pêk hatiyê. “Di berhevkirina mamikan de jî, rêbaz hene. Lazim e em ciyê ku ew mamik lê tê zanînê diyar bikin. Heta me ew jî kê, kengê, li kê derê bidest xistiye, em diyar bikin baş e” (Meretowar, 2014: 42). Mamikên ku li Dêrik û derdora wê hatine berhevkirin ev in:

Mamikên bi qalibekî dest pê dikin: Ev cure mamik, bi qalibê “*Tiştêkî mi heye*” dest pê dikin. Digel yê bi wezna kiteyî yê serbest jî henin. Qafiyeya tevahiya wan “a a” ye.

DM-1

“*Tiştêkî mi heye:*

Di/ke/ve/ er/dê

û/ di/lî/rî/ne “ (Sêl) (M. Sönmez 2015)

DM-2

“*Tiştêkî mi heye:*

Qa/ma/ wê/ qa/ma/ ke/wê/ ye

Ba/rê/ wê/ba/rê/ de/vê/ ye “ (Qabqab) (M.C. Tüfek 2016)

DM-3

“Tişteki mi heye:
Bal/kê/ ban/gi/ya
Baz/da/ ser/ kan/ya“ (Dû) (M.A. Ece 2016)

DM-4

“Tişteki mi heye:
Dahre
Li paş xwe nanere” (Av-çem) (E.Remo 2016)

DM-5

“Tişteki mi heye:
Sibê radibe, pîna li xwe dixê” (Nanê sêlê) (Z.M. Qado 2015)

Mamikên bêyî qalibekî serê peyvê, rasterast tên pirsîn: Piraniya mamikên me ji çavkaniyan veguhastine ev cure ne û ji du rêzikan pêk hatine. Tevahiya mamikên ji du rêzikan bi qafiyeya “a a” yê hatine ristîn. Ji wan hinek jê bi kêteya serbest in. Dirêjbûn û kinbûna wan ji hev cihê ne. Ji mamikên bi sê kêteyan bigrin, heta yê bi heft kêteyan henin. Naveroka van cure mamikan guherbar e. Ûsûrên asîmanî, cureyên mîweyan, hêzên siruştî û sewal di naveroka van mamikan de derdikevin pêş.

DM-6

“Şi/va/ ter
Li/ gu/her“ (Mar) (H. Evdirihman 2016)

DM-7

“Ku/mê/ de/la/lê
Gêr/ bû/ ne/wa/lê“ (Zîpik) (H. Evdirihman 2016)

DM-8

“Si/mê/ gê
Ti/je/ xwê” (Hinar) (S. Vural 2016)

DM-9

“Hi/lin/dir/ bi/lin/dir
Law/ ji/ bav/ me/zin/tir. “ (Agir û dûxan) (M. Seydo 2016)

DM-10

“Biz/na/ ke/jik
Li/ ser/ he/jik” (Moz) (X. Xatûn 2016)

DM-11

“Ji/ Bex/da/ he/ta/ Bex/da
Ku/la/vê/ xwe/ tev/ ra/da “ (Ewr) (Ş. Zerga 2015)

DM-12

“A/pê/ cû/no
Du/ qû/no (Gindor) (Z. M. Qado 2015)

DM-13

“Çîq û çîq
Çar nig û çar çîq” (Qeysik) (E. Remo 2016)

DM-14

“Te/nû/rek/ xim/xi/mî
Ti/je/ na/nê/ ge/ni/mî “ (Gwîz) (N. Ertekin 2015)

DM-15

“Hû/no/ mû/no
Du/ qû/no” (Kundir) (Y. Dengiz 2015)

DM-16

“Qes/ra/ si/pî

Bê/ de/rî “

(Hêk) (M. Seydo 2016)

DM-17

“El/bek/ mast

Li/ gu/he/rek/ rast”

(Heyv) (Î. Xoce 2016)

DM-18

“Ku/mi/kê/ hû/tik

Ti/je/ nû/tik”

(Hejîr) (D. Özer 2016)

DM-19

“A/pê/ he/cî

Teq/le/cî “

(Kîso) (M. Sönmez 2015)

Mamikên bi awayê peyvbaziyê hatine ristîn:**DM-20**

“Şalê te şelwarê te

Zavê mala xalê te

Were mala te

Tu ê çi bidê?”

(H. Evdirihman 2016)

-Jixwe ew kesê elametên wî tê gotin bavê te bixwe ye. Yanî ji vê mamikê meqsed ew e ku kesê mamik jê tê pirsîn bifikire û têbigêhêje ewê ku wê were mala wî bavê wî bixwe ye. Li herêma Dêrikê mînakên mamikên bi vê şêweyê me zêde tesbît nekirin. Di berhevokên wekî din de jî mamikên bi awayê peyvbaziyê hatine ristîn tîn dîtin:

“Diya wî xesûya diya min e

Ez çiyê vî zilamî me” (Barîk, 2003: 80)

Ji xeynî van mamikên li jor, hinek mamikên ku ji her bersivê re vekirîne hene. Mamik ew cure ne ku bersiva wan ji berê de diyar in û ne guherbar in. Yê ne xwedî bersivek e serast û tekûz ku ji her bersivê re vekirîne mînakek jê wiha ye:

DM-21

“Gelo mirî pir in

Ya jî zindî?” (Ş. Zerga 2015)

Bi rastî çavkaniyên me bersivek ji vê mamikê re, ku li gora wan rast e, dîtine û dibêjin: “*Yekî miriya ji yê zindiya bêtir e.*” Lê weke meseleya hêk û mirîşkê carinan bersiva vê mamikê dibe sedema minaqaşeyan jî. Digel ên ku dibêjin mirî bêhtir in, hinekên dibêjin “*Zindî ji miriya bêtir in*” jî henin.

1.2.3. Dûrik

“Qewlêrk” an jî bi navekî dinê “Dûrik” helbestên bi qafiye yê çanda gel in. “Dûrik jî, cihekî wan î yaybet heye di zargotinê de. Bi piranî di dawetan de tên gotin û bi piranî jî li ser bûk û zavê tên gotin... Ne ji bo dîlanê ango ne bi dîlanê re tê gotin, ji bo rexneyekê an derbirîna ramanekê tene gotin. Carinan li ser zavê, carinan li ser bûkê, carinan li ser xesû û xezûr, carinan jî li ser tax, gund, navçe an bajarê ku bûk û zave lê dijîn tên gotin” (Mazî, 2014: 13).

Helbestên ku me ji sehayê berhev kirine ji hêla çavkaniyên me weke “Dûrik” hatin binavkirin. Piraniya dûrikên me dane hev ji bendekê pêk tînin. Ji van bendan digel ên bi kiteya serbest hatine gotin, ên bi wezn jî hatine ristin henin. Em dikarin li gorî teşe û naveroka wan, dûrikên herêmê wiha nîşan bidin:

DDÛ-1

Ev dûrik bi pergala “a a b a”yê ve hatiye ristin. Dûrik di dawetan de ji bo dilxweşkirina keçikên bûne berdêlî tê gotin.

“Çi darika li kepirê

Siwar û peya xar dibirê

Xwezîka mi bi dilê wê keçka
Bû bêrdêliya bav û bire” (E. Remo 2016)

DDÛ-2

Dûrik bi pergala “a a a”yê û bi kiteya serbest hatiye ristin. Dûrik ji hêla dilxwazên bûkê bi amanca pesndayina wê tê gotin.

“Sindoqa bûkê kesk û sor e
Bûk û zavê xwe da dor e
Bûka me sipî ye
Le zava esmer e” (E. Remo 2016)

DDÛ-3

Dûrik bi kiteya serbest û pergala “a a a”yê ve hatiye ristin. Dayikên keçikên wan diçin cem mêr, ji xemgîniyê wiha distrên.

“Xêliya bûkê bi erdê re
Gurzek derziyê hûr tê re
Tiliya mi di çavê dê re
Qîz xwedî kir ji xelkê re” (Z. M. Qado 2015)

DDÛ-4

Fîstan reşê fîstan cêfê
Sîng û berê te bi zencêfê
Dilê min û lawkê xelkê ketiye tev
Wek histêrka li hember heyvê (S. Vural 2016)

DDÛ-5

Bi kiteya serbest û pergala “a a b a”yê hatiye ristin. Wextê bûkê derdixin, dişa bûkê li ser serê wê dibêje.

“Ha li tirî ha li tirî
Heb li hebê sincirî
Xwakê birê mi miraq meke
Wek fîncana avzêkirî” (S. Vural 2016)

DDÛ-6

Şeva hinê wextê ku berbû destê bûk û zavê hine dikin vê dûrikê dibêjin.

“Lo lo lo zava
Wez heyrana birû û çava
Hinê bîne di testê ke
Kevçî bi kevçî avê lêke
Li destê bûk û zava ke
Mi’b heyrana guliyê sorke” (N. Ertekin 2015)

DDÛ-7

Bi pergala “a a a”yê û bi kiteya serbest hatiye ristin. Ji bo bûkên bê dê û hustuxwar vê dûrikê dibêjin.

“Bavê bûka me çû zozana
Jê re anî hiriya berana
Cîya wê tunebû jê re bikira
Qewlikê Qûrana, cuherê şivana” (X. Xatûnê 2016)

DDÛ-8

Bi kiteya serbest û pergala “a a b a”yê hatiye ristin.

“Me bûkek anî ji Hilêla⁷¹
Me mal û milkê xwe tev tê da
Bûka me sibê rabû
Nizanîbû serê xwe girêda” (X. Xatûnê 2016)

⁷¹ Gundekî Şemrexê ye.

DDÛ-9

Bi şêweya “a a a”yê û bi kiteya serbest hatiye ristîn.

“Riya Qubikê⁷² bi qinabe
Heb heb lê zêde nabe
Keçika me zêrê hûr e
Qet xurde nabe” (S. Vural 2016)

DDÛ-10

“Ê keçikên wan pak in
Em û ew dest birak in
Ê keçikên wan reş in
Em û ew ji hev nexweşin” (M.A Ece 2016)

DDÛ-11

Bi şêweya “a a a” yê hatiye ristîn.
Keçika me xweşik e
Qelenê wê Qeza û Sûsik⁷³ e
Bavê wê go: “Hindik e
Erdê gund li ser tapo bike” (W. Tufek 2016)

DDÛ-12

Ji xeynî dûrikên ji bendekê pêk tên, ên ku ji bendekê zêdetir pêk hatine jî henin:

“Keçê dînê keçê bê bextê
Sîng û berê te sipî ne
Mîna karîbana dor bi rextê
Dev û lêvên te şêrîn in
Mîna şekirê nav kaxetê

⁷² Gundekî Dêrika Çiyayê Mazî ye.

⁷³ Gundekî Dêrika Çiyayê Mazî ye.

Were em ê bi destê hev bigrin, birevînin
Mê herin Qamişloka binê xetê” (S. Vural 2016)

DDÛ-13

Dûrika roja hinê ye. Berbûyên dahrin bûkê tînin ya di rê de, ya jî wexta digêjin mala bûkê dibêjin.

“Her hine, du hene, sê hine

Çar hine, çarde hine

Çi hineka Ciyarbekir

Me pîva bi ‘elba şekir

Berê li destê zavê û bûkê kir

Dawîyê li destê berbûya kir

Çi hineka Mûsilê

Me anî bi barê dundilê

Berê li destê zavê û bûkê kir

Dawîyê li destê berbûya kir” (N. Tur 2016)

DDÛ-14

“Ji Şêbê heta Şêbê

Yadê Xwedê bike zimanê te jêbe

Ma çima te nedigot:

“Delalîkê dilê mi Mele ye”

Min ê qewlikek jê re çêkira

Ji Qur’anê heta kitêbê” (S. Vural 2016)

1.2.4. Lorik

Weznekî standart ên lorikan tune ye. Ji hunerên peyvê dûr in. Bi zimanekî herikbar hatine ristin. Digel ên dirêj ên kurt jî henin.

DLO-1

Lor bi lor bi berxê min lorî Wezê
berxika xwe bi lor tînim Xewn û
xiyalên xwe pê direvînim De lor
be lor be berxê min lorî
Ay de lorî de lorî de lorî
Wezê lorika xwe bi lor tînim
Wezê lora xwe li pişta xwe dikim, dijdînim
Ezê berê lora xwe bidim mala xalê
Wezê lorika xwe vêse davêjim dexlê xalê
Ay de lorî de lorî de lorî berxê min lorî (E. Remo 2016)

DLO-2

Hoy deve hoy deve milik peve
Em ê devê bînin
Em ê malê lêkin
Em ê herin welêt
Hoy deve milik peve (Î. Ece 2015)

DLO-3

Lorî lorî lorî
Berxê mi lorî
Ez ê berxê xwe di xew kim
Delala xwe di xew kim
Ez ê xem xiyalê xwe dilê di cem kim
Lorî, looorîî (Z.M. Qado 2016)

DLO-4

Lorî, lorî, lorî
Lorîka mi lorî
Ez ê lorîkê bilorînim
Wez qîz bûm, wez wezîr bûm
Erê lorîkê wez bûk bûm û ez wezîr bûm
Wezê ketim himêza mêrê xerab
Darê bê dergûşê, kal û pîr bûm (Z.M. Qado 2016)

DLO-5

Ellah hey, Ellah hey
Cilê bavîj ser berxê
Xwediyê berxê ji wê de tê (Î. Ece 2016)
Ellah hey, Ellah hey

DLO-6

Xwedêyo te têxim cemê têrêyo
Ez ê te bivim newala Şêbê yo
Ez ê te têxim bin tûmê şurtê yo
Ji bo nezera xelkê me lîtir da bi lîtira dimsêyo (X. Xatûnê 2016)

DLO-7

Qal qumandar te dixwaze
Daye min çel gayê bijî reş e
Çel mehîne cil bi nexş e
Çel beranê kurî beş e
Ber deriyê min dimeşe
Dilê min pê nexweş e (A. Deniz 2016)

ENCAM

Di vê xebata ku ûnsûrên çanda gel ê herêma Dêrika Çiyayê Mazî ji devê çavkaniyên zindî hatine qeydkirin de, ewîl li ser rewşa civakî, aborî û erdnîgariya sehayê agahî hatine dayin. Ev agahî bêhtir ji çavkaniyên nivîskî û ji lêkolînên me yên li sehayê pêk hatine. Di encama van agahiyan de hatiye dîtin ku dîrokeke kevnar ya bajêr heye. Di vê dîrokê de netew û olên cihê cihê bi hev re jiyane, di avakirina şaristaniya bajêr de rola xwe stendine. Ermenên ku yek ji van netewan bû ji sedsala bîstî û vir de ji bajêr koç kirine. Vê koçê di serî de di warê aboriyê, rewşên neyînî yên wekî din derxistiye holê. Digel sedemên wekî din aboriya bajêr niha gelekî lawaz maye. Çandinî û sewalvanî rehên sereke yên aboriya bajêr in. Erdnîgariya herêmê ji bo sewalvaniyê gelekî guncan e. Weke encam têdigiştin ku Dêrik bajarekî koçê dide derve û derfetên aboriyê li wir kêr in. Digel pêşveçûnên wekî din hêvî heye ku eger ava Ferêt were herêmê wê koça derve kêr bibe û aborî jî bi hêz bibe.

Îro li Dêrikê çanda kevnar û çanda popûler bi hev re ketine pêşbirkeke ku hêdî hêdî çandeke “kevnar popûler” derdikeve holê. Adet û Tore, Serdemên Jiyane, Cejn û Rewresm, Zanyariyên Gelêrî, Awayên Xemlê û Cilûberg, Bîr û Baweriyên Gelêrî û Lîstikên Gelêrî yên Xort û Zarokan ew mijar in ku di vê xebatê de berfirehî agahî li ser rewşa wan ya îro di nav civaka Dêrikê de hatine dayin. Di beşa çarem de jî mînakên Edebiyata Gelêrî ya herêmê ji devê kesên çavkanî hatine qeyd kirin.

Agahiyên ewil ên derbarê çanda gel a herêmê li ser adet û toreyên herêmê ne. Dema adet û toreyên di warê hevkarî û civakî de bi pratîkên çavkaniyên berê re tîr berawird kirin tê dîtin ku hîna bi nêzîkî ûsûlên çanda gel ya kurdan ev adet û tore tetbîq dibin. Li Dêrik û derdora wê gelek caran kêşeyên weke kuştina mêran, revandina keçikan û sonddayina kesekî bi awayên ûrfî tîr çareser kirin. Li gorî agahiyên çavkaniyan dane di kuştina mêran de weke salên berê kes êdî dijminatîyê zêde najon û di demek nêz de li hev tîr. Lêbelê heqê xwîna mêran hîna tê stendin. Dîsa ji bo keçika hatiye revandin diravekî zêde ji hêla lêwîk distînin û didin malbata keçikê. Tê famkirin ku malbat carinan daxwazên keç û xortên xwe piştguh dikin. Di mijara sonddayinê xala hêjayî behsê ew e ku sonddayin divê bi Quranê be. Ev jî hêz û bandora baweriya Îslamê ya li ser şênîyên herêmê nîşan dide.

Ji kevneşopiyên Kurdan berdêlî û krîvantî, di çavê şênîyên herêmê de du muesseseyên bi xatir in. Ji van muesseseyan tê hêvî kirin ku hezkirin û girêdana mirovan bi hev re zêde bikin. Ger em ji agahiyên çavkaniyan derkevin rê em dikarin bibêjin rêjeya zewacên berdêlî li gorî demên borî aniha kêmtir bûye. Gelek zewacên niha bi daxwaza keç û xortan çêdibe. Berdêlî herçiqas demên borî zêde çêbûbe jî gelek kes ji ber wê belengaz in û nerazî nin. Disa di encama lêkolînan de hat dîtîn ku gel, di şuxl û xebatan de alîkariyê didin hevûdu. Lewma herdu cureyên hevkarîyê bêşkirin û palûte têkiliyên gelê herêmê yên navxweyî xurt dike û germ dihêle. Tişteki din ku têkiliyan xurt dike mêvandarî û mazûbaniye. Belkî ji ber vê yekê be li navenda bajêr otel tune ye, mirov li gundên Dêrikê jî li qiraatxane û çayxaneyan rast nayê. Li Dêrikê û derdora wê têkilî û danûstendinên civakî hê zindî ye.

Li bajêr êwrên serdemê yên jiyana mirovan her yek ji wan xwedî pratîkên cihê cihê ne. Pratîkên derbarê zayin, zewac û mirinê bingehe xwe ji baweriyên olî û kevneşopiyên bajêr girtine. Birrîna çelê jinan, derxistina hefteka zarokan, hêviya şifayê ya ji şexan, çêkirina nivişt û bazbandan hema bêjin li seranserê Dêrikê û gundên wê xalên sereke yên serdema zayinê ne. Di çanda bajêr de berê bêhtir bapîrên zarokan, navên Îslamî li zarokan dikirin. Niha dê û bav digel navên Îslamî navên hunermendan, navên kesên navdar li zarokên xwe dikin. Herwiha rêjeya binavkirênên Kurdî jî ne kêmtir in. Yanî êdî dê û bav vî mafî ji xwe re dibînin û li gorî xwestekên xwe zarokên xwe binav dikin. Meş û diranên ewil jî li herêmê pêşveçûnên bi rewresman tîrên pîrozkirin. Di van rewresman de ji mêj ve xwarin, şeker an jî xurekên din tîrên belav kirin. Tê famkirin ku di pratîkên van serdeman de zêde guherîn çênebûne. Li Dêrikê zarokek heta têkeve du sê saliya xwe dibe navenda gelek rewresman. Serdema dijwar a zayinê şîrvekirin e. Digel pêşveçûnên teknolojîk di vê mijarê de em dibînin ku pratîkên çanda gel ên berê tîrên tetbîq kirin. Dayikên Dêrikê bêhtir mirrûsê⁷⁴ di serê pêşîrên xwe didin. Bi vî awayî zarokan ji pêşîrê sar dikin. Sinetkirin ku li bajêr û gundên wê zêdetir bi danîna krîvantîyan dihat kirin, niha gelek caran bêyî ku hayê kesî jê çêbive di nav malbatê de tê safî kirin. Di roja me de herçiqas krîvantîyên nû were danîn jî rêjeya krîvantîyan ne gelekî zêde ye.

Li Dêrikê û derdora wê ji serdemên jiyana “zewac” xwedî gelek merhale û qaîde ye. Xelat, qelen, peza aziban, berderî û adetên wekî din ew kevneşopî ne ku di

⁷⁴ Cureyekî gihaya tal e.

dawetên herêmê de girîngiya xwe diparêzin. Ji ber ku gelê herêmê dawetên xwe li malên xwe çêdikin û gelek dawetên wan sê roj û du şeva dewam dike salonên dawetan li navçê tune ye. Di dawetên herêmê de ji xeynî îstisnayan teqez nanê roja dawetê tê çêkirin û berbû nan dixwin. Eger em behsa mirinê bikin ku serdema jiyana mirovan a dawî ye, em digêjin wê encamê ku rîtuêlên beriya mirinê û yên veşartina miriyan bi giştî bingeha xwe ji dîne Îslamê digirin. Lê di mewzûya şîne de bêhtir ûrf û adetên bi kevneşopiyê re têkildar in tên meşandin. Weke mînak şîne kêmanî sê rojan dom dike. Cixare, çay û qehweya tal di şînan de tên îkram kirin. Di roja sisiyan de xwarin û helaw tên çêkirin. Hevnasên dûr û nêz diçin şînen hevûdu. Di şînan, di dawetan û di mêvandariyan de qaîdeya çêkirina xwarinê rehê xwe bera nav axa Dêrik û derdora wê daye.

Tê famkirin ku li herêma Dêrikê di warê Cejna Newrozê de di sî çil salên dawî de hişyariyek giştî çêbûye. Hinek kes beriya 21 e adarê ji bo pîrozbahiyên dest bi haziriyên dikin û bernameyan amade dikin. Herwiha li navendê û li hinek gundan qadên minasib ji bo pîrozbahiyên hatine diyarkirin hene. Herçiqa Newroz sersal û cejn were dîtin jî li herêmê sersala mîladî weke destpêka salê tê hesibandin û sersala rûmî ji xeynî kesên temenmezin nayê zanîn. Gelê herêmê di roja me de her çiqas gelek caran serî li nexweşxaneyan bidin jî bi taybetî ji bo himlê jinan û nexweşiyên giran ku şifayê ji nexweşxaneyan nabînin bi rêbazên xwe li tedawiyê digerin. Herwiha şênîyên gundên dûrî nexweşxaneyan bin, bi taybetî di nerihetiyên piçûk de bi şeweyên gelêrî li şifayê digerin. Kesên nexweşiyên tedawî dikin dermanên tedawiyê, gelek car ev derman cureyên gîha û çîçekan in, her daîm li cem xwe hazir dihêlin. Yanî zanista tibê çiqas pêşde biçê jî di çavê şênîyên herêmê de hewcedariya bi tîba gelêrî berdewam e. Mijareke din a zanyariyên gelêrî, salnameya gelêrî ye. Bi taybetî şênîyên gundan ji ber ku bi sewalvanî û çandiniyan re mijûl dibin ev hesab bi agahiyên nifşên beriya xwe kemilandin e û pergala xwe ya salnameyê ava kirin e. Ev pergala salnameyê ji ber ku li gorî avûhewa û erdnîgariya herêmê sererast bûye hêsaniyeke mezin dide şênîyên herêmê.

Ji hêlên weke xeml û girêdanê bandora Erêbên bi herêmê re ketine danûstendîne bi awayekî eşkere xuya dike. Herwiha di vî warê de Kurd û Ermenên herêmê jî tesîr li ser hevûdu hiştine. Digel çûyina dibistanan ku destûrê nade her cil li xwe were kirin, dîsa ji ber derketina bajarên derve û teknolojiyê, weke di gelek

warên din ên jiyânê, di awayê xemlê û cilûbergan de jî guherîn pêk hatine. Li herêma Dêrikê bi taybetî nîfşê di biniya çil salî re kincên herêmî zêde li xwe nakin. Ciwanên diçin bajarên mezin, ji bedêla “deqkirin” a klasîk, bêhtir bi mekîneyan şikl û motîfan li gewdê xwe didin çêkirin. Kêm kêm li hin deran deqandin bi şêweya xwe yî berê tê çêkirin. Xizem ew cure xeml e ku realîteya xwe îro jî li herêmê diparêze.

Di nav civakên der û dorên piçûk û dûrî navendên mezin de gelek baweriyên gelêrî cih digirin. Îro bingeha hinek bîr û baweriyên bi ceribandînan zanistî pûç bûnin. Ji xwe hinekên wan jî mûxalîfî baweriyaya Îslamê ye ku gelê herêmê gelek qaîdeyên xwe yên jiyânê li gorî Îslamî rûniştîkirin dane. Lê dîsa jî tesîra van baweriyên li ser civakê zêde kêm nebûye. Gelek baweriyên ku ne diyar e bê ji ber çî û kengî derketine holê hê jî tesîrê li civatê dikin. Baweriyên derbarê sewal û lawiran ji xeynî çend numûneyan gelemperî li ser parastina jiyana wan e. Dibe ku ev bawerî ji ber hewla parastina jiyana wan derketibin holê. Herwiha hêviya şifa, bereket, def’a qeda û belayan ya ji tîrb û ûcaxan li seranserê herêma Dêrikê berbelav e. Mirovahî çiqas laîk bûbe û ji ber sekulerîzmê baweriyaya bi têgihên metafîzîkê qels bûbe jî tiştê rastiya xwe di nav gelê herêmê yên çî xwende, çî nexwende wenda nake nezer e. Piraniya şênîyên herêmê hifza can, ewled û malê xwe ji nezerê dikin.

Îro tablet, telefon û compûter ew mekîne nin ku bi riya wan gelek lîstik tîstî lîstin. Dêrik û derdora wê jî bi riya van mekîneyan lîstik tîstî lîstin. Di ber re lîstikên herêmî jî tîstî lîstin. Bi taybetî di nav xort û zarokan de ger ne hemû lîstikên gelêrî bin jî ev lîstik tîstî lîstin. Yanî lîstikên teknolojîk û lîstikên sirûştî di ber hev didin. Mirov nikare texmîn bike bê kengî wê kîjana biserkeve.

Edebîyateke mûazzem ya devkî, sineetekî peyvê yê sirûştî li herêmê serdest e. Biwêj, pêşgotin, zûgotinok, nîfir û diayên bi hosteyî hatine hûnandin û herwiha bi hunerî di nav peyva rojane de tîstî bikaranîn derfetê îfadekirina mirazê xwe dide şênîyên herêmê. Belkî ji ber vê yekê ye ku li navçeyên din ên Mêrdîn carinan dibêjin:”Ma mere bi peyvê nikare bi Dêrikiya” yan “Dêrikî yeman in.” Digel vê yekê mixabin peyde kirina hinek ûnsûrên çanda gel ya herêmê zehmet e. Çend melayên ku em bi wan re rûniştin me berîteyên dema feqetiyê ji wan pirsî. Lê ewan tiştekan nedane me. Tenê gotin ku wan êvarên iniyan bi “Berûtê” dilîstin. Hinek feqeyan distra û hinekan destê xwe davêt ser piyê hev û dilîstin. Ji ber ku pergala medreseyan jî li

bajêr hilatiye, bidestxistina mînakên vê cureyî diwartir bûye. Lê dîsa jî herêma Dêrikê bi mînakên din xwedî zargotîneke bi rêk û pêk e.



Çavkanî

- Aktekîn, O. (2016). Dawetên Herêma Mûşê. *Folklor Kurdan*. J. 6, İstanbul, 48-51.
- Akyol, H. (2008). *Ji Zargotina Kurdî*. Stenbol: Weşanên Do.
- Amêdî, S.B. (2013) *Folklor Kurdî*. Ankara: Weşanên Lîsê.
- Artun, E. (2009). *Türk Halkbilimi*. İstanbul: Kitabevi yayınları.
- Aslan, E. (2005). *Halk Edebiyatı Dersleri*. Diyarbakır Dicle Üniversitesi.
- Aslan, E.(2008). *Türk Halk Edebiyatı*. Ankara: Maya Akademi Yayınları.
- Barık, M. (2003). *Kevneşopiyên Kurdan*. İstanbul: Weşanên Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê.
- Barık, M. (2015). *Lîstikên Zarokan*. İstanbul: Weşanên Şaredariya Bajarê Mezin A Amedê.
- Bayezîdî, M.M. (2012). *Adat û Rusûmatnameê Ekradiyê*. (Çapa 2.).Stenbol: Weşanên Nûbihar.
- Bazîdî, M.M. (2010).*Cami'eya Risaleyan û Hikayetan Bi Zimanê Kurmancî*. Stenbol: Weşanên lîsê.
- Bedlîsî, Ş. (2007). *Şerefname*. Stenbol: Weşanên Avesta.
- Bîtlîsî, K. (1986). “Kurdçeye Daîr “. *Jîn*. J.3. Uppsala: Weşanxana Deng 16-17.
- Boratav, P.N. (1978). *100 soruda Türk Halk Edebiyatı*. İstanbul: Gerçek Yayınevi.
- Boratav, P.N. (2003). *100 Soruda Türk Folklorü*. İstanbul: K kitaplığı.
- Boratav, P.N. (2014). *100 Soruda Türk Halk Edebiyatı*. Ankara: Bilgesu Yayınları.
- Botî, K. (2007). *Ferheng Kurdî- Kurdî*. İstanbul: Weşanên Do.
- Cemîlpaşa, Q. (2012).Gawestiyayî û Koçerên Kurdan. *Hawar* J.52, Stenbol, Weşanên Belkî
- Cindî H. û Evdal E. (2008). *Folklor Kurmanca*. Stenbol: Weşanên Avesta.
- Çobanoğlu, Ö. (2005). *Halkbilimi Kuramları ve Araştırma Yöntemleri Tarihine Giriş* (3. Baskı). Ankara: Akçağ Yayınları.
- Demîrhan, U. (2006). *Ferhenga destî Kurdî bi Kurdî*. Stenbol: Nubihar. Dilazad, (2011). Di çanda Kurdî de dawet. *Nûbihar*. J. 115. Stenbol: 91-93. Dîzman, R. (2015). Di fabilên Kurdî de rovî. *Folklor Kurdan*. J.3. Stenbol: 22-29.
- Durç, S. A. (2009). *Türkiye’de Aşiret ve Siyaset İlişkisi: Metinan Aşiret Örneği*, basılmamış yüksek lisans tezi. Ankara H.Ü Sosyal Bilimler Enstitüsü.

- Erwasî, M. (2013). *Tiba Melayê Erwasî*. Çapa 1. Stenbol: Nûbihar.
- Ezizan, H. (2010). Mil û Zil. *Ronahî* J.12, Stenbol: 212-214.
- Ezîzan, H. (2012a). Newrûz. *Hawar*. J.42. 695-697.
- Ezîzan, H.(2012b). Eşîra Jêliyan. *Hawar* J. 34. Stenbol: 572-580.
- Ferhengvan, (2012). Ferhengok. *Hawar* J.30. Stenbol.
- Güven, E. (2015). *Derik*. Stenbol: Ar yayıncılık.
- Günçal, L. ve Saygın, T. (1987). Mardin İl Yıllığı. İstanbul
- Hakkarî, M. M. (2007). *Ronahîya Qur'ana Pîroz*. Stenbol: Nûbihar.
- Hekkarî, X. (2012). *Zerzewatên Şifadar*. İstanbul: Nûbihar.
- Hazar, M. (2007) Bozhöyükte Dövmenin yapıldığı yerler ve yapılış şekli. Mardin Kültür-Edebiyat. İstanbul.
- Heckman, L. Y. (2012). *Kürtlerde Aşiret ve Akrabalık İlişkisi*. İstanbul: İletişim yayınları.
- Hilmî, S. (1986). Kurdlerde Durubû Emsal. *Jîn*. J.14. Upsala: Weşanxana Deng.
- İzgöer, A.Z. (1999). Diyarbakır Salnameleri, 3.c. (170) İstanbul: Diyarbakır Büyükşehir Belediyesi yayınları.
- İzgöer, A.Z. (1999) Diyarbakır Salnameleri, 2.c. (74/335) İstanbul, Diyarbakır Büyükşehir Belediyesi yayınları.
- İzoli, D. (Amd.), (2000). *Ferheng*. İstanbul: Weşanên Deng.
- Jîn, (1986) "Sersal", J.14, c.3. (599) Sweden, Weşanxana Deng.
- Kankal, A. (Ed.). (2007). *235 Nolu Mardîn Şer'îye Sicili Belge Ve Özetleri*. İstanbul: Mardin Tarihi İhtisas Kütüphanesi.
- Kaya, D. (2010) *Ansiklopedik Türk Halk Edebiyatı Terimleri Sözlüğü*. Ankara: Akçağ Yayınları.
- Kıran, E. (2003). *Kürt Milan Aşiret konfederasyonu*. İstanbul: Elma yayınları. Kocaer, A.F. (hazırlayan) (2004). *Sahih Buhari* 2. Cilt. Konya: Hüner yayınları. Kömür, M. (2003). Akçadağ-Elbistan Ağzıyla Kürt Folkloründen Seçmeler. Stenbol: Weşanên Enstîtuya Kurdî.
- Mazî, Ç. (2014). *Bexek Ji Folklorê Kurdî Ji Derdora Mêrdîn*. İstanbul: Berbang.
- Meretowar, A. (2014). Hunera Axaftina Xweş û nivîsandina rind. Amed: Weşanên Enstîtuya Zimanê Kurdî.
- Modanlı, X. (1913). Ziman. *Rojê Kurd*, J. 3, 87-88.

- Mukriyanî, M. (2015). Navlêk. *Folklor Kurdan*. J.1. Amed: 13
- Nebez, J. (2007). *Kurd (Dîrok û Kultura Wan)*. İstanbul: Weşanên Avesta.
- Noyan, S. (2009). *1950 Mardin İlinin Monografisi*.
- Nuhrat, C.(Ed.) (1993). Genel Sağlık Ansiklopedisi. İstanbul: Ana Yayıncılık. s. 55-56.
- Nursî, B.S, (2004 a). *Îçtîmaî Dersler*, İstanbul: Zehra yayıncılık.
- Nursi, B.S. (2004 b). *Muhakemat*, İstanbul: Zehra yayıncılık.
- Orbelli, i.A. (2011). *Li Miksê Folklor û jiyana Rojane*, Stenbol: Weşanên Nûbihar.
- Özcoşar, İ. (2007 a). *Mardin (Önemli Simalar-Dini Topluluklar)*. İstanbul: Mardin Tarihi İhtisas kütüphanesi.
- Özcoşar, İ.(2007b). *Mardin (Tarih-Coğrafya)*. İstanbul:Mardin Tarihi İhtisas Kütüphanesi.
- Öztürk, C. (Ed.). (2005). *İmparatorluktan Ulus Devlete Türk İnkılap Tarihi*. Ankara: Pegem Yayıncılık.
- Öztürk, M.(2015) Vekolînek Derbarê Gotinên Pêşiyên Ên Kurmancî de. *Mukaddime Dergisi*. Mardin Artuklu Üniversitesi. Kovara Şeş Mehane. Jimare: 2. Cilt:6 319-337. Mukaddime.artuklu.edu.tr/issue/archive. Dema gihîştinê:17.02.2016.
- Pala, İ. (2009) *Ansiklopedik Divan şiiri sözlüğü*, İstanbul: Kapı Yayınları.
- Pertev, R. (2015). *Edebiyata Kurdî ya Gelêrî*. (çapa 1.). Stenbol: Weşanên Avesta.
- Propp, V. (1998). *Folklor Teori ve Tarih*. Stenbol: Weşanên Avesta.
- Reşît, L. (1986). Kurdlerde Atasozlerî. Jîn. J.3 Upsala: Weşanxana Deng.
- Sadîni, M. X. (2012). *Ji Kelepora kurdî Pêkenok*. Stenbol: Nûbihar.
- Sazan, L. (2014). *Sözlü Tarih Çalışması: Derikli Ermenilerde ve Kürtlerde Mekan ve Hafıza*, basılmamış yüksek lisans tezi: İstanbul: İstanbul Bilgi Üniversitesi.
- Subaşı, K. (2016). *Vegotina Hêmayî û Metaforîk di Mamikên Kurdî de*. The Journal of Mesopotamian Studies. cilt 1. sayı. 1. Mardin. (71-90)
- Taşğın, A. (2007). Mardin önemli simalar-Dini topluluklar (Yezidiler, Becirmaniler, Karaçiler) İstanbul: Mardin Yüksek ihtisas Kütüphanesi.
- Türkçe Sözlük. (1998) Ankara: TDK Yayınları
- Xanî, E. (2010). *Mem û Zîn*. Stenbol: Nûbihar. www.politikars.com-news_detail Dema gihîştinê: 20.09. 2016.

Yıldırım, K. (2012). *Kürtçe Dilbilgisi*. Mardin: Türkiye’de Yaşayan Diller Enstitüsü Yayınları 2. Baskı.

Yıldırım, K. Pertev, R. Aslan, M. (2013) *Ji Destpêkê Heta Niha Folklorê Kurdî*. İstanbul: M. A. Ü. T. Y. D Enstitüsü yayınları.



LÎSTEYA KESÊN ÇAVKANÎ⁷⁵

- Abdullah Aras, 19, Lise, Xwendevan, Misûrî, 23.02.2016
Ayhan Deniz, 53, Nexwende, Bermalî, Navend, 31.12.2015
Aykut Ateş, 38, Lise, Sabûnçêker, Navend, 25.05.2016
Bayram Tur, 24, Zanîngeh, Tenduristvan, Qizilê, 01.03.2016
Bengül Erol, 25, Zaningeh, Mamoste, Navend, 11.04.2015
Cemal Çeviren, 23, Zanîngeh, Veterîner, Xirarê, 20.07.2016
Cemîle Meşkînî, 76 Nexwende Naxebite Meşkîna 08.09.2015
Derwêş Özer, 33, Dib. Seretayî, Cotyar, Şêxamed, 23.05.2016
Engin Özgen, 40, Lîse, Cilfiroş, Navend, 24.05.2016
Ercument Selçuk, 34 Dib. Seretayî, Esnaf, Maşmaşk, 25.10.2015
Ersin Tekin, 34, Dib. Seretayî, Karker, Maşmaşk, 08.05.2016
E.qadir Qubilmî, 35, Zanîngeh, Memur, Qubilmê, 20.07.2016
Ezize Tekîn, 75, Nexwende, Kevanî, Maşmaşk, 28.02.2016
Ezîza Remo, 55, Nexwende, X. Demsalî, Remok, 19.05.2016
Faik Deniz, 27, Zanîngeh, Mamoste, Navend, 16-17.02.2016
Faruk Ekinci, 33, Dib. Seretayî, Bazirgan, Navend, 03.06.2016
Hecî Evdirrihman, 60, Dib. Navîn, Tacir, Qindefî, 16.05.2016
Hecî Şêxmûs, 72, Nexwende, Cotyar, Eynterî, 28.10.2015
İdris Çeviren, 30, Dib. Navîn, Betal, Xirar, 20.07.2016
İmdat Xoce, 33, Zanîngeh, Cîgirê Midûr, Navend, 03.06.2016
İzzettin Ece, 63, Xwende, Cotyar, Maşmaşk, 12.13.2015
M. Ali Ece, 46, Lise, Esnaf, Maşmaşk, 12.11.2015
M.Can Tüfek, 58, Dib. Seretayî, Cotyar, Heramiyê, 21.07.2016
Mehmed Güneş, 47, Lise, Şerabçêker, Navend, 25.05.2016
Mehmed Vural, 80, Dib. Seretayî, Derzîvan, Navend, 24.05.2016
Mela Mehmûd, 79, Zimannasê Erebî, Miderris, Meşkîna, 14.05.2016
Mela Seydo, 70, Medrese, Mela, Xanok, 25.05.2016
Mele Bûbê, 52, Ilmê Erebî, Mela, Xirar, 20.07.2016
Mihemed Sönmez, 30, Nexwende, Şivan, Xanok, 20.09.2015

⁷⁵ Kesên çavkanî digel *nav-paşnav, temen, perwerde, pîşe, cihê zayinê û dema hevdişinê* hatine nîşandayin.

M. Ûsibê Hemê, 34, Zanîngeh, Mamoste, Qizil, 12.11.2015
Müslüm Ertekin, 38, Zanîngeh, Mamost, Xanok, 15.10.2015
Mehmet Selçuk, 51, Dib. Seretayî, Esnaf, Maşmaşk, 28.02.2016
Naif Demirci, 68, Nexwende, Hesinkar, Navend, 03.02.2016
Neşet Ertekin, 72, Nexwende, Betal, Xanok, 20.09.2015
Nurê Tur, 70, Nexwende, Bermalî, Qizil, 01.03.2016
Qedriya Ezîzê N, 55, Nexwende, Bermalî, Maşmaşk, 25.10.2015
Qeside Güler, 72, Nexwende, Bermalî, Qizil, 09.05.2016
Ramazan Tur, 32, Zanîngeh, Endezyar, Qizilê, 01.03.2016
Remziye Vural, 47, Dibistana navîn, Bermalî, Navend, 20.05.2016
Rustem Çakıl, 36, Dibistana navîn, Bazirgan, Eynterî, 16.07.2015
Sakîne Yücel, 51, Nexwende, Bermalî, Navend, 20.05.2016
Salimê Heno, 53, Nexwende, Şivan, Eynterî, 23.10.2016
Sebrî Vural, 48, Dibistana srt, Esnaf, Navend, 03.02.2016
Seydê Kevirşînî, 72, Nexwende, Şopger, Kevirşîn, 03.04.2016
Silêman Dinç, 34, Zanîngeh, Rêvebirê fermî, Navend, 12.09.2016
Silêman Sönmez, 68, Nexwende, Betal, Xanok, 20.09.2015
Sultan Sûlhan, 65, Dib. Seretayî, Malnişîn, Heramiyê, 21.07.2016
Şemsê Temel, 56, Nexwende, Esnaf, Navend, 03.06.2016
Şêx Silêman, 83, Dixwîne-dinîvîsîne, teqawîtbûyî, Navend, 03.06.2016
Şêx Zerga, 62, Nexwende, Kevaniya malê, Maşmaşk, 05.07.2015
Şêxmûs Yurtgulî, 17, Lîse, Xwendevan, Qizil, 11.12.2015
Wetfa Tûfek, 54, Nexwende, Bermalî-kevanî, Heramiyê, 21.07.2016
Xaltîka Xatûnê, 72, Nexwende, Bermalî, Xirarê, 20.07.2016
Yaziya Ş. Eyšê, 63, Nexwende, Bermalî, Eynterî, 06.06.2015
Yilmaz Ekîncî, 48, Zanîngeh, Gerînendeyê giştî, Navend, 03.06.2016
Yusuf Dengiz, 34, Dibistana navîn, Serbest, Eynterî, 11.10.2015
Zibêda M. Qado, 60, Nexwende, Bermalî, Qoser, 20-21.08.2015



Ji taxa çiyê dîmenek Dêrikê



Sewalvanên hiriya beranê xwe dibirrin



Atolyeyeke sabûna zeytûnan



Nanê daweteke Dêrikiyan



Li Qizilê ciwanên li meydana gund dilîzin



Ermen-Îsewîyekî Dêrikî û Emre ECE



Li bejahiya bajêr kon û pezê koçeran



Dermanê bayê sor



Awayê deqandina jinan li Dêrikê



Girêdana bi kitanê ya jinek Dêrikî



Dîmenek ji Maşmaşkê



Peykerê Xeto û Remo li meydana bajêr.



Deriyê Dêra Sor



Zarokên li kolanan dilîzin



Rewresmeke mirî veşartinê



Dahnok